7

# Kurdiname Akademik

e-ISSN : 2687-5438
Number:/Jimar 7
November/Mijdar 2022

e-Journal

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

## CONTENT - NAVEROK

## Research Articles / Gotarên Lêkolînî


| | | Rûpel |
|---|---|---|
| 1 | **DANASÎNA NUSXEYÊN DESTXET ÊN BERHEMÊN FEQIYÊ TEYRAN ÊN KOLEKSÎYONA ALEXANDER JABA**<br>Şehmus KURT-Mardin Artuklu University- Turkey | 1-18 |
| 2 | **TAYBETMENDÎYÊN COGRAFÎ Û MORFOLOJÎK ÊN DEVOKA XERZAN DI NAV DEVOKÊN KURMANCÎ DE**<br>Ayhan YILDIZ - Mardin Artuklu University- Turkey<br>M. Zahir ERTEKİN –Bingöl University -Turkey | 19-39 |
| 3 | **NIRXANDINEK DERBARÊ BERHEMÊN XEBATA KELEPORÎ YA EUGEN PRYM Û ALBERT SOCINI**<br>Mustafa ASLAN - Mardin Artuklu University- Turkey | 40-58 |
| 4 | **BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ Û WERGERÊN DUBEYTIYAN YÊN BI KURMANCÎ**<br>Murat ÇELİK- Turkey | 59-73 |
| 5 | **DAHÛRÎNEKE TESEWIFÎ LI SER QESÎDEYA “ÇELEBÎ” YA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ QUTBÊ EXLATÎ**<br>Yakup AYKAÇ- Mardin Artuklu University -Turkey<br>Veysel BAŞÇI – Batman University- Turkey | 74-103 |
| 6 | **DI ÇARÇOVEYA TEFSÎRA ÇEND AYETÊN QUR’ANA PÎROZ DE KURD**<br>Mustafa ÖNCÜ-Mersin University-Turkey | 104-111 |
| 7 | **ORF Û EDETÊN DAWETAN LI FARQîNÊ YÊN DI NAVBERA SALÊN 1980 û 2000î DE**<br>Abdulhalim EKEN-Turkey | 112-127 |
| 8 | **LÊKOLÎNEK LI SER ROJNAMEGERÎYA KURDÎ YA LI BAŞÛRÊ KURDISTANÊ**<br>Rabeea Ismael Khalid ZEBARI - Knowledge University- Kurdistan/Iraq<br>Bafreen Rasheed HUSEEIN- Duhok University- Kurdistan/Iraq<br>Luqman Muhammed ABDULRAHMAN - Kurdistan/Iraq<br>Shahwan Taher Mohemed AMEEN - Kurdistan/Iraq | 128-138 |
| 9 | **A STUDY ON ADJUSTMENT STRATEGIES OF THE KURDISH INTERNATIONAL STUDENTS EXPERIENCED CULTURE SHOCK IN THE UK**<br>Beway Mahmood SAHEB - Halabja University, Kurdistan-Iraq | 139-146 |
| 10 | **MEDHÎYEYEKE ŞÊX ŞEHABEDDÎNÊ TÎLÎ**<br>M. Zana KARAK - Turkey | 147-160 |


## Other Articles / Gotarên Din


| | | |
|---|---|---|
| 11 | **SÊ KLASÎKÊN ME YÊN NENAS: MELA HESEN Û QASIM Û MELA ŞEMS**<br>OUR THREE UNKNOWN CLASSICS: MOLA HASAN, QASEM, MOLA SHAMS<br>Tehsîn Îbrahîm DOSKÎ – Kurdistan-Iraq | 161-174 |


## Translation Articles / Gotarên Wergerî


| | | |
|---|---|---|
| 12 | **NÊRÎTA NIVÎSANDINA FERHENGÊN PEYVAN JI BO ZAROKAN: -JI “NISAB’US-SIBYAN”A EBÛ NESRÊ FERAHÎ HETA NÛBIHARA BIÇÛKAN A EHMEDÊ XANIYÎ-**<br>Werger: Barat GHAVI-ANDAM-Iran | 175-184 |
| 13 | **ZAZAKÎYA (DIMILKÎ) BAŞÛRÎ SER O NOTÎ**<br>Açarnayox: Esat ŞANLI- Turkey | 185-198 |


## Book Review / Nirxandina Pirtûkan


| | | |
|---|---|---|
| 14 | **HOPO**<br>Ebubekir GÖREN-Turkey | 199-201 |


7

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

Kovara Kurdiname'yê ya Bi Hakem û Navnetewî
**International Peer-Reviewed Journal of Kurdiname**
Uluslararası Hakemli Kurdiname Dergisi
**(e-Journal)**

**Chief Editor And Publisher-**Serokedîtor û Weşanger
Assoc.Prof. Osman ASLANOĞLU –Dicle University- Turkey
email: aslanogluosman@gmail.com

**Editorial Board** // Licneya Edîtorîyê
Prof. Dr. Hayreddin KIZIL (Dicle University) email: hkhayreddin@gmail.com
Assoc. Prof. Hacı ÖNEN (Dicle University) email: hacionen@gmail.com
Asst. Prof. İlyas SUVAĞCİ. (Hakkari University) email: ilyascembeli@gmail.com

**Assistants of Editor** // Alîkarên Edîtor

R. A. Resul GEYİK // Mardin Artuklu University - resulteacher@gmail.com
R.A. Betül ÇOBAN // Mardin Artuklu University - cbnbetul@gmail.com
PhD student Esat ŞANLI

**Advisory Board** // Licneya Şêwirmendîyê

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK / Mardin Artuklu University: abdurrahmanadak@gmail.com
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN / Mardin Artuklu University: tahirhan@hotmail.com
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ / Dicle University: tanriverdi21@hotmail.com
Prof. Dr. M. Edip ÇAĞMAR / Dicle University: mecagmar@hotmail.com
Prof. Dr. M. Mesut ERGİN / Dicle University: emesutergin@gmail.com
Prof. Dr. Nesim DORU / Mardin Artuklu University: nesimdoru@artuklu.edu.tr
Prof. Dr. Yadgar R. Hamadameen / Soran University: Iraq: ya@soran.edu.iq
Prof. Dr. Carina Jahani, Uppsala University, Sweden, E-mail:carina.jahani@lingfil.uu.se
Prof. Dr. Hayreddin KIZIL / Dicle University: hkhayreddin@gmail.com
Assoc. Prof. Zahir ERTEKİN / Bingöl University: zahirertekin@hotmail.com
Assoc. Prof. Hayrullah ACAR / Mardin Artuklu University : hayrullahacar@hotmail.com
Assoc. Prof. Ayhan TEK /Muş Alparslan University: ayhan_tek@hotmail.com
Assoc. Prof. Nesim SÖNMEZ /Van Yüzüncü Yıl University: nesimsonmez@gmail.com
Assoc. Prof. Mustafa ÖZTÜRK / Mardin Artuklu University: mustafaozturk47@gmail.com
Assoc. Prof. Mustafa ÖNCÜ / Mersin University: mistefaoncu63@hotmail.com
Assoc. Prof. Canser KARDAŞ /Muş Alparslan University: kardascanser@gmail.com
Assoc. Prof. Osman ASLANOĞLU / Dicle University: aslanogluosman@gmail.com
Assoc. Prof. İlyas AKMAN / Mardin Artuklu University: ilyas.akman21@gmail.com
Assoc. Prof. Ahmet GEMİ / Mardin Artuklu University : ahmetgemi04@gmail.com
Assoc. Prof. Birgül Açıkyıldız / Paul Valéry Montpellier III University, birgul@acikyildiz.com
Assoc. Prof. Necat KESKİN / Mardin Artuklu University: necatkeskin@gmail.com
Assoc. Prof. Hassan Sarbaz / Kurdistan University: Sanandaj- Iran h.sarbaz@uok.ac.ir
Assoc. Prof. Mustafa ASLAN / Mardin Artuklu University: mustafaaslan@artuklu.edu.tr
Assoc. Prof. Hacı ÖNEN / Dicle University: hacionen@gmail.com
Assoc. Prof. Ahmet KIRKAN / Mardin Artuklu University: ahmetkirkan@gmail.com
Assoc. Prof. Ercan GÜMÜŞ / Mardin Artuklu University: ercangumus1977@gmail.com
Assoc.Prof. Nurettin BELTEKİN / Mardin Artuklu University: nbeltekin@yahoo.com
Assoc.Prof. Mehmet Emin PURÇAK / Muş Alparslan University: epurcak@hotmail.com
Asst. Prof. Hemin Omar Ahmad AHMAD / Soran University: Irak: hemin.ahmad@soran.edu.iq
Asst. Prof. Yusuf BALUKEN /Yozgat Bozok University: yusufbaluken@gmail.com
Asst. Prof. İlyas SUVAĞCİ / Hakkari University: ilyascembeli@gmail.com

Asst. Prof. Mehmet Rezan Ekinci / Mardin Artuklu University: merekinci@gmail.com
Asst. Prof. Zafer AÇAR /Bingöl University: zafer13acar65@gmail.com
Asst.Prof. Bakhtiyar Sajjadi / Kurdistan University: Sanandaj /Iran: bakhtiar_sadjadi@yahoo.com
Asst.Prof. Yadullah Peşadadi / Kurdistan University: Sanandaj /Iran: y.pashabadiuok.ac.ir
Asst.Prof. Arkhwan MOHAMMED OBAID - Karkuk University: Iraq: arkhawanmohammed83@uokirkuk.edu.iq
Asst.Prof. Kenan SUBAŞI / Mardin Artuklu University: kenanenado@gmail.com
Asst.Prof. Mehmet YONAT / Mardin Artuklu University: mehmetyonat49@gmail.com
Dr. Lect.Zülküf Ergün / Mardin Artuklu University: zxweshevi@gmail.com
Dr. Hewa Salam Khalid/ Koya University: Iran: hewasalam@gmail.com
Dr. M. Şirin FİLİZ / Mardin Artuklu University: mehmetsirinfiliz@gmail.com
Dr. Yakub AYKAÇ / Mardin Artuklu University: aykacyakup@gmail.com
Dr. Mikail BÜLBÜL - : mikailbilbil@hotmail.com

## Referee Board / Licneya Hakeman

Journal of Kurdiname uses double-blind review for research articles fulfilled by at least two reviewers. Referee names are kept confidential.
*(Kovara Kurdinameyê ji bo nirxandina gotarên lêkolînî herî kêm "du hakemên kor" bikar tîne. Navên hakeman tên veşartin)*

## INDEX

**ICI Index Copernicus, Worldcat, Crossref, MLA, ISI, SIS, ISIFI, ASOS, BASE, TEI, ASI, ESJI, DRJI, SAJI, Citefactor, Asian Research Index, EuroPub, Jats Tech, İdealonline, Ipindexing, Entirewe, Google scholar, Rootingindex, ResearchBib, Journalsdirectory, ISSN PORTAL, Advanced Science Index, IJIFACTOR, Openaire, infobase, Paperity, İSAM, sjifactor, Academia.**

## CONTACT/TÊKILÎ

**Chief-Editor and Publisher:** aslanogluosman@gmail.com
**Journal** : kurdiname1@gmail.com
**Website:** https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname

## ABOUT JOURNAL

Kurdiname is a Refereed International Journal Published in Electronic
Publish period is biannual (Twice for a year )
This journal uses double-blind review
Publishing article is free for authors
The journal articles are open access for readers
Articles being controlled for plagiarism before review
All articles are licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0)
The Responsibility of the articles published in the journals belongs to the author/authors.

Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

# CONTENT / NAVEROK

## Research Articles / Gotarên Lêkolînî


| | | Page/ Rûpel |
|---|---|---|
| 1 | **DANASÎNA NUSXEYÊN DESTXET ÊN BERHEMÊN FEQIYÊ TEYRAN ÊN KOLEKSÎYONA ALEXANDER JABA**<br>(AN INTRODUCTION OF MANUSCRIPTS OF FEQIYÊ TEYRAN'S WORKS INCLUDED IN ALEXANDER JABA'S COLLECTION)<br>Şehmus KURT-Mardin Artuklu University- Turkey | **1-18** |
| 2 | **TAYBETMENDÎYÊN COGRAFÎ Û MORFOLOJÎK ÊN DEVOKA XERZAN DI NAV DEVOKÊN KURMANCÎ DE**<br>(THE PLACE OF GEOGRAPHICAL AND LEXICAL FEATURES OF KHARZAN DIALECTS IN KURMANJI DIALECTS)<br>Ayhan YILDIZ - Mardin Artuklu University- Turkey<br>M. Zahir ERTEKİN –Bingöl University -Turkey | **19-39** |
| 3 | **NIRXANDINEK DERBARÊ BERHEMÊN XEBATA KELEPORÎ YA EUGEN PRYM Û ALBERT SOCINI**<br>(AN ANALYSIS OF COMPILATION WORKS OF EUGEN PRYM AND ALBERT SOCIN'S BOOK)<br>Mustafa ASLAN - Mardin Artuklu University- Turkey | **40-58** |
| 4 | **BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ Û WERGERÊN DUBEYTIYAN YÊN BI KURMANCÎ**<br>(BABA TAHIR-I HAMADANI AND THE KURDISH TRANSLATIONS OF HIS DUBEYTIS) | **59-73** |
| 5 | **DAHÛRÎNEKE TESEWIFÎ LI SER QESÎDEYA "ÇELEBÎ" YA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ QUTBÊ EXLATÎ**<br>(A SUFISTIC ANALYSIS ON SHEIKH SHAMSEDDIN QUTUB-I AKHLATÎ'S QASIDA NAMED "ÇELEBI")<br>Yakup AYKAÇ- Mardin Artuklu University -Turkey<br>Veysel BAŞÇI – Batman University- Turkey | **74-103** |
| 6 | **DI ÇARÇOVEYA TEFSÎRA ÇEND AYETÊN QUR'ANA PÎROZ DE KURD**<br>(KURDS IN THE FRAMEWORK OF THE COMMENTARY OF SOME VERSES OF THE HOLY QUR'AN)<br>Mustafa ÖNCÜ-Mersin University-Turkey | **104-111** |
| 7 | **ORF Û EDETÊN DAWETAN LI FARQîNÊ YÊN DI NAVBERA SALÊN 1980 û 2000î DE**<br>(DIYARBAKIR CASTLE FORMED BY COINCIDENCE AND LEGENDS)<br>Abdulhalim EKEN-Turkey | **112-127** |
| 8 | **LÊKOLÎNEK LI SER ROJNAMEGERÎYA KURDÎ YA LI BAŞÛRÊ KURDISTANÊ**<br>(A STUDY ON THE KURDISH PRESS IN SOUTH KURDISTAN)<br>Rabeea Ismael Khalid ZEBARI - Knowledge University- Kurdistan/Iraq<br>Bafreen Rasheed HUSEEIN- Duhok University- Kurdistan/Iraq<br>Luqman Muhammed ABDULRAHMAN - Kurdistan/Iraq<br>Shahwan Taher Mohemed AMEEN - Kurdistan/Iraq | **128-138** |
| 9 | **A STUDY ON ADJUSTMENT STRATEGIES OF THE KURDISH INTERNATIONAL STUDENTS EXPERIENCED CULTURE SHOCK IN THE UK**<br>LÊKOLÎNEKE LI SER STRATEJIYA ADAPTASYONA XWENDEKARÊN KURD ÊN NAVNETEWÎ LI BRÎTANYAYÊ YÊN KU ŞOKA ÇANDÊ JÎYAYE<br>Beway Mahmood SAHEB - University of Halabja, Kurdistan-Iraq | **139-146** |
| 10 | **MEDHÎYEYEKE ŞÊX ŞEHABEDDÎNÊ TÎLÎ**<br>(A EULOGY OF SHEIKH SHAHABEDDIN TÎLÎ)<br>M. Zana KARAK - Turkey | **147-160** |

## Other Articles / Gotarên din


| | | |
|---|---|---|
| **11** | **SÊ KLASÎKÊN ME YÊN NENAS: MELA HESEN Û QASIM Û MELA ŞEMS**<br>OUR THREE UNKNOWN CLASSICS: MOLA HASAN, QASEM, MOLA SHAMS<br>Tehsîn Îbrahîm DOSKÎ – Kurdistan-Iraq | **161-174** |


## Translation Articles / Gotarên Wergerî


| | | |
|---|---|---|
| **12** | **NÊRÎTA NIVÎSANDINA FERHENGÊN PEYVAN JI BO ZAROKAN:**<br>**-JI “NISAB’US-SIBYAN”A EBÛ NESRÊ FERAHÎ HETA NÛBIHARA BIÇÛKAN A EHMEDÊ XANIYÎ-**<br>THE TRADITION OF WRITING DICTIONARIES FOR CHILDREN:<br>-FROM *“NISAB AL-SIBYAN”* BY ABU NASR AL-FARAHI TO *“NÛBIHARA BIÇÛKAN”* BY AHMAD AL-KHANI<br>Werger: Barat GHAVI-ANDAM-Iran | **175-184** |
| **13** | **ZAZAKÎYA (DIMILKÎ) BAŞÛRÎ SER O NOTÎ**<br>(NOTES ON SOUTHERN ZAZA (DIMILÎ)<br>Açarnayox: Esat ŞANLI- Turkey | **185-198** |


## Book Review / Nirxandina Pirtûkan


| | | |
|---|---|---|
| **14** | **HOPO**<br>Ebubekir GÖREN-Turkey | **199-201** |

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname E-ISSN-2687-5438

# DANASÎNA NUSXEYÊN DESTXET ÊN BERHEMÊN FEQIYÊ TEYRAN ÊN KOLEKSÎYONA ALEXANDER JABA

FEQİYÊ TEYRAN'NIN ALEXANDER JABA KOLEKSİYONUNDAKİ ESERLERİNİN ELYAZMA NÜSHALARININ TANITIMI

AN INTRODUCTION OF MANUSCRIPTS OF FEQIYÊ TEYRAN'S WORKS INCLUDED IN ALEXANDER JABA'S COLLECTION

Şehmus KURT*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 31.08.2022
**Accepted // Pejirandin:** 14.10. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 1-18
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1169260

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Kurt, Şehmus (2022). Danasîna Nusxeyên Destxet Ên Berhemên Feqiyê Teyran Ên Koleksîyona Alexander Jaba, *Kurdiname*, no. 7, p. 1-18

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

## Kurte

Koleksîyan destxetên kurdî ya Aleksander Auguste Jabayî ya ku bi alîkarîya Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye amadekirin di dîroka xebatên Kurdolojiyê de xwedî payeyekî bilind e. Ji ber ku hem derbarê Kurdan û jiyana wan a di sedsala 19an de agahiyên berkeftî dayîne, hem jî gelek helbest, çîrok, destan û mesnewî ji nemanê xilas kirine û gehandine roja me. Ev koleksîyon ji bo tarîxa edebiyata kurdî jî girîng e, ji ber ku digel gelek xebatên dî yên edebiyata klasîk, edebiyata gelêrî û qadên dîtir ên wekî tarîx, bawerî, civaknasîyê Jaba di nava vê koleksîyonê de heşt helbestvanên Kurd ên edebiyata klasîk a kurdî jî dide nasin. Navê Feqiyê Teyran jî di nava wan helbestvanan de tê hejmartin û derbarê jiyan û berhemên wî de agahî tên dayîn. Herwiha di koleksîyonê bi xwe de digel gelekên dî ên di berhevokên cuda cuda de, şeş nusxeyên berhemên Feqiyê Teyran ên serbixwe jî hene. Ji wan nusxeyan du lib destxetên *Ey Av û Avê n*e ku di dawiya wan de bêyî serenav qismek ji helbesta *Îro qewî girya me tê* heye. Her çar nusxeyên dî destxetên Şêxê Sen'anî ne. Ji wan nusxeyan yek destxeteke kêm e, lê yên mayî nusxeyên kamil in. Armanca vê xebatê danasîna hemû xebatên Feqî ne yên ku di koleksîyona Jabayî de hene. Em hêvî dikin ev xebat ji bo xebatên ku siberojê li ser Feqî bêne kirin, dê rêyekê bo lêkoleran veke û di peydakirina berhemên Feqî de karê lêkoleran hêsantir bike. Di xebatê de me behsa dîrokçeya koleksîyona Jabayî kiriye, derheqê jiyan û berhemên Feqiyê Teyran de bi kurtasî agahî pêşkeş kirine û me her şeş nusxeyên serbixwe yên *Ey Av û Avê* û *Şêxê Sen'anî* digel du nusxeyên dî yên menzûmeya *Ey Ev û Avê* yên ku di mecmûayên cuda cuda de cih digirin, di bin banê 27 xalan de dayîne nasîn.

**Peyvên Sereke:** Feqiyê Teyran, Mela Mehmûdê Bazidî, Koleksîyona Jaba, Nusxe, Destxet.

## Öz

Aleksander Auguste Jaba'nın Mela Mehmûdê Bazîdî'nin yardımıyla hazırladığı Kürtçe elyazmaları koleksiyonu Kürdoloji çalışmaları tarihinde önemli bir yere sahiptır; çünkü hem Kürtler, hem de onların 19. yüzyıldaki yaşayışları hakkında değerli bilgiler vermiş ayrıca çok sayıda şiir, hikâye, şarkı, destan ve mesneviyi yok olmaktan kurtarmış ve günümüze ulaşmalarını sağlamıştır. Jaba'nın bu koleksiyonu Kürt edebiyatı tarihi

* Arş. Gör. Dr. Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, sehmuzkurt@gmail.com ORCID ID: https://orcid.org/0000-0003-1083-8133

için de önemlidir; çünkü başka pek çok klasik edebiyat ve folklor çalışmalarının yanısıra sekiz klasik Kürt edebiyatı şairini de tanıtmıştır. Tanıtılan bu şairlerin arasında Feqiyê Teyran'ın da adı geçmekte ve onun hayatı ve eserleri hakkında bilgiler verilmektedir. Yine arşivin kendisinde de, farklı mecmualarda yer alan şiirlerinin yanında Feqiyê Teyran'ın eserlerini barındıran altı adet ayrı nüsha vardır. O nüshalardan ikisi *Ey av û avê* adlı şiire aittir, fakat bu elyazmaların sonunda başlıksız ve aralıksız olarak *Îro qewi girya me tê* şiirinden bir kısım yer almaktadır. Geri kalan dört nüsha da *Şêxê Sen'anî* adlı şiirin elyazmalarına aittir. Bu nüshalardan biri eksik bir nüshadır, geri kalan üç tanesi ise eksiksizdir. Bu çalışmanın amacı Feqiyê Teyran'ın Jaba koleksiyonunda yer alan eserlerinin elyazması nüshalarını tanıtmaktır. Bu çalışmanın gelecekte Feqiyê Teyran üzerine yapılacak çalışmalarda araştırmacılara yeni yollar açmasını ve Feqiyê Teyranin eserlerini bulmada araştırmacılara yardımcı olmasını umuyoruz. Bu çalışmada önce Jaba koleksiyonunun kısa bir tarihçesi verilmiş, ardında Feqiyê Teyran'ın hayatı ve eserleri hakkında bilgiler verilmiştir. Daha sonra sırayla *Ey Av û Avê* ve *Şêxê Sen'anî* eserlerine ait her altı nüsha ve *Ey Av û Avê* manzumesinin ayrı mecmualarda yer alan iki adet nüshası toplam 27 başlık altında tanıtılmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Feqiyê Teyran, Mela Mehmûdê Bazidî, Jaba Kolaksiyonu, Nüsha, Elyazması.

**Abstract**

Aleksander Auguste Jaba's Kurdish manuscript collection which was prepared with the Mollah Mahmoud-i Bazidi has an important place in the history of Kurdish Studies. As it gives valuable information both on Kurds and their 19th century lives and also has saved many poems, stories, songs, epics and masnawis from being destroyed and reached them to the day. This Jaba's collection is also important for the history of Kurdish literature because it has introduced eight classic Kurdish literary poets along with many other classic and folk literature works. Feqiyê Teyran is also named among these poets and information on his life and works is given. Moreover, in the collection itself, there are six independent copies of the works of Feqiyê Teyran beside the poems in different gildings. Two copies belong to the poem *Ey av û avê*, but at the end of the manuscript there is a part of *Îro qewi giryê me tê* poem untitled and uninterrupted. The remaining four copies are manuscripts of Sheikh Senani poetry. One of these copies is incomplete but the remaining three are complete copies. The main objective of this study is to introduce Faqiyê Teyran's works that take part in Jaba's collection. We hope that this work will open a way for the researchers for future studies on Feqi and make it easier for the researchers to find the works of Feqi. In this study, a short history of Jaba's collectio has been given, followed by information about the life and works of Feqiyê Teyran. Subsequently, six independent copies of *Ey Av û Avê* and *Sheikh Senani* and two copies of *Ey Av û Avê* which places in different gildings are presented under a total of 27 titles.
**Keywords:** Feqiyê Teyran, Mollah Mahmoud Bazidi, Jaba Collection, Transcipt, Manuscript.

## 1. DESTPÊK

Aleksander A. Jaba yê ku eslê xwe polonî ye û beşa zimanên rojhilatê xwendiye, di navbera salên 1848-1866 de li Erziromê wek konsolosê Rûsyayê xebitîye. Di wê demê de ew ewil dixwaze hînî kurdî bibe û ji Mela Mehmûdê Bazîdî, yê ku wê demê li Erziromê melatiyê dike û zana û alimekî navdar ê dema xwe ye, dersên zimanê kurdî werdigire. Paşî Jaba li ser daxwaza Akademîya Zanîstî ya St. Petersburgê li ser ziman, dîrok, folklor û edebiyata kurdî dest bi lêkolînan dike. Di çarçoveya van lêkolînan de ji mela û alimên Kurd ên wê demê komeke xebatê pêk tîne û Mela Mehmûdê Bazîdî jî wek serokê wê komê tayîn dike (Kurdo 1992:14).

Ew koma xebatê – ya ku mirov dikare wekî komxebata ewil a kurdolojiyê bin av bikedest bi berhevkariyê dike û derbarê jiyana rojane ya kurdan, adet û rêwresmên wan de xebatên folklorîk/etnografîk; derbarê ziman û rêzimanî de xebatên lînguîstîk; bi komkirina çîrok û destanên kurdî ve xebatên edebiyata devkî; bi tomarkirina helbest, dîwan û mesnewiyên ve xebatên edebiyata klasîk/nivîskî pêk tînin û di encamên de di bin 54 beşan de lodeke mezin a nivîskî ya 4017 rûpelî, bi zimanê kurdî derdikeve meydanê (Rohat, 1991: 99). Jabayî bi xwe jî bi zimanê frensî katalogeke naveroka van destxetan amade kiriye (bnr. Arşîva A.Jaba, Kurd-53.)

Gava mirov ji aliyê şikl û sêwirandinê li destxetên wan berhevkariyan dinêre, bo me aşkere dibe ku piranîya wan li gorî pergalekê hatine amadekirin. Di gelek destxetan de rûpelê rastê wekî du sitûn hatiye xêzkirin, li stûnê rastê bi herfên erebî naveroka kurdî heye, li kêleka wê, li sitûnê çepê jî dîsa herfên latînî-kurdî hene. Li rûpelê çepê jî wergera wan a bi frensî heye. Lê hinek destxet tenê bi herfên erebî hatine nivîsîn. Aleksander Jabayî hinek ji wan destxetan dayîne çapkirin: “Ballade Kurde” (*Journal Asiatique*, 1859, Paris; çîroka Siyahmed û Şemsê), wergera çend rîsale û *Cemî’yê Rîsaliyan û H’ikayetan bi Zimanî kurdî* a Mela Mehmûdê Bazîdî (*Recueil de Notices et récits kourdes*-1860, St. Petersburg), ferhenga kurdî-Frensî (bi hevkariya F. Justi, 1879, St. Petersburg) û strana Gewrê û Xelîl Beg (*Bulletin de l'Athénée oriental*, 1881, Paris). Lê belê piraniya wan destxetan demeke dirêj wekî xwe, neçapkirî mane heta ku Qanatê Kurdo û xwendekara wî M. B. Rûdenko li ser wan dixebitin. Rûdenko katalogeke destxetan derdixe û hinek destxetan wek pirtûk amade dike û bi navê “Mem û Zîna Ehmedî Xanî” (Moskova-1962), “Şêx Sen’an a Feqiyê Teyran” (Moskova-1965), “Nivîsara Mele Mehmûdê Bayzêdî-Jiyîn û Ayîna Kurdan” (1963), “Leyl û Mecnûna Xaris Bitlîsî” (1963), “Nivîsandin li Nav û Nîşanên Destnivîsarên Kurdî” (Moskova-1961) dide çapkirin (Kurdo, 1992:18).

Koleksîyona destxetên kurdî ya A. Jabayî bi berhem û agahiyên xwe ve ji bo xebatên Kurdolojiyê û dîroka wan xebatan xaleke werçerxê ne. Ji ber ku di wê koleksîyonê de hem derbarê Kurdan û jiyana wan a di sedsala 19an agahiyên bêhempa hatine pêşkêşkirin, hem jî bi saya wê koleksîyonê gelek berhemên wekî helbest, çirok, destan û mesnewî hatine parastin û gehiştine serdemên modern (Rohat, 1991:97-98). Herwisa di pirtûka *Recueil de Notices et récits en langue kourmanji* (St. Petersburg-1860) de hinek çîrok û serpêhatiyên Kurdan û navê van heşt helbestvanên edebiyata klasîk a kurdî tê pêşkêşkirin: Elî Herîrî, Melayê Cizirî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî, Îsmaîlê Bazîdî, Şerefxan Hekarî, Miradxanê Bazîdî. Jixwe piraniya destxetên arşîva Jabayî ji berhemên van helbestvanan pêk tê.

Yek ji helbestvanên ku navê wî di koleksiyona Jabayî de derbas dibe Feqiyê Teyran e. Di nav destxetan de digel ên cuda cuda di nav berhevokên dî de, şeş nusxeyên serbixwe yên berhemên Feqiyê Teyran hene, du ji wan destxetên “Ey av û av”ê ne[1], çar lib jî destxetên

[1] Di serlewheya her du nusxeyan de jî “Haza beytu Feqiyê Teyran, b’avê re xeber da” tê nivîsîn û her du destxet wekî “Ey av û avê hey av û avê” dest pê bikin û aşkere wekî nusxeyên qesîdeya “Ey av û avê” ne, lê belê di nusxeya Kurd 19 de piştî rêza 192yan û di nusxeya Kurd 20ê de jî piştî rêza 187an, bêyî serenav, an jî navber vêca helbesteke dî ya Feqî dest pê dike ya ku bêtir bi navê “Îro qewî girya me tê” an jî “Hûn werin lazim werin” bi qederê 40 rêzan berdewam dike. Herwiha di her du nusxeyan de jî piştî dawîbûna rêzên “Îro qewî girya me tê” nêzî heşt rêzan hesabeke ebcedê heye ku wek hesaba Nesredînê Tûsî tête nasîn. Di dawiya her du destxetan de jî

“Şêxê Senanî” ne (Öztürk, 2017:93-138). Di vê xebata xwe de em dê hewl bidin ku van destxetên serbixwe yên berhemên Feqî yên di Koleksîyona Jabayî de digel du nusxeyên dî yên menzûmeya *Ey Ev û Avê* yên ku di mecmûayên cuda cuda de cih digirin, bi awayekî sîstematîk bidin nasîn. Beriya nasandina destxetan em dê bi kurtasî behsa Feqîyê Teyran, cihê wî di edebiyata kurdî de û berhemên wî bikin da ku di nava peywenda berhemên Feqî de cih û girîngiya van destxetan bêtir aşkere bibe.

## 2. JIYAN Û BERHEMÊN FEQIYÊ TEYRAN

Li ser jiyan û berhemên Feqiyê Teyran di pirtûka “*Recueil de Notices et récits kourdes”* de agahî tên dayîn. Li gor agahiyên wê pirtûkê, navê Feqiyê Teyran ê rastîn Muhammed e, ew eslê xwe ji Miksê[2] ye; hîkayeta Şêxê Sen’an, qiseya Pirsîsayê (Bersis), Qewlê Hespê Reş û gelek beyt û helbestên dî gotine û nasnavê Mîm û Hê bi kar anîye, qederê heftê û pênc salan emir kiriye û di tarîxa heft sed û heftê (koçî) merhûm bûye û li Miksê medfûn e (Jaba, 2000: 33). Gelek Kurdologan, bi taybetî jî yên rojavayî daye pey van agahiyan û derbarê serdema Feqiyê Teyran da agahiyên guherbar dayîne. Her çend wek gelek helbestvanên dî yên edebiyata kurdî ya klasîk li ser serdema Feqiyê Teyran, dîroka jidayikbûn û mirina wî nîqaş hebin jî hem bi hisaba ebcedê ya ji berhemên wî, hem jî li ber ronahiya lêkolîn û vedîtinên nava van salên dawî hatine kirin, êdî aşkere ye ku Feqî helbestvanekî sedsalên 16-17an e. Ew di sala 971ê h. / 1563yê m. li gundê Warezûra (Warezoz) Miksê hatiye dinyayê û sala 1041ê h. / 1632yê m. li gundê Şandûs a li ser Xîzanê koça dawî kiriye. Feqî li Miksê dest bi xwendina xwe kiriye û li Finik û Cizirî Botan jî maye. Feqî hemdemê Melayê Cizirî ye û dema li Cizirê bûye wî û Melayî muşa’ere kiriye. Navê wî yê esil Mihemed e, navê bavê wî Ebdullah e. Feqiyê Teyran di berhemên xwe de mexlesên wekî Feqî, Feqiyê Teyran, Muksî, Mîm û Hê bi kar anîne. (Sadinî, 2012; Dêreşî 2011; Yıldırım,2014; Adak, 2015; Adak û yên dî 2014, Aykaç, 2022).

Feqiyê Teyran hem ji aliyê hejmar û qelîteya berheman hem jî ji aliyê bandordarbûna li ser nivşê dûv xwe ve ligel Ehmedê Xanî û Melayê Cizirî yek ji sê navên herî girîng e di edebiyata kurdî de (bnr. Adak, 2015). Feqî yek ji wan helbestvanên edebiyata klasîk a kurdî ye ku derbarê jiyan û berhêmên wî da agahiyên zelal bi dest dikevin. Ehmedê Xanî bi xwe di dîbaceya mesnewiya xwe ya payebilind Mem û Zînê de ligel Melayê Cizirî û Elî Herîrî navê Feqiyê Teyran jî dide û bi vi awayî cih û qedrê wî diyar dike.[3] Dîsa di pirtûka “*Recueil de Notices et récits kourdes”* de ku ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye amadekirin û ji aliyê Aleksander Jaba ve hatiye wergerandin û sala 1860î de li St.Petersburgê ve hatiye çapkirin, ligel heft helbestvanên dî navê Feqiyê Teyran di rêza sêyê de derbas dibe û derbarê jiyan û berhemên wî de agahî tê dayîn (Jaba 2000: 33). Dîsa digel gelek zanyarên edebiyata klasîk a

---

bi zimanên frensî raveya vê hisabê û dîrokçeya wê hatiye dayîn, di nusxeya Kurd 20 de digel raveyê tableyeke vê hesaba jî cih digire.

[2] Miks (Bahçesaray) niha bi ser Wanê ve ye lê wextekî li ser Hekarîyê dihate hesabê.

[3]“Alî bikira li banê gerdûn
Binavê ruhê Melê Cizirî
Pê hê bikira Elî Herîrî
Keyfek wê bida Feqê Teyran
Heta ba ebed bima heyran”

kurdî, Qanadê Kurdo (1992), Abdurrahman Adak (2015) jî di xebatên xwe yên li ser dîroka edebiyata kurdî de derbarê jiyan û berhemên Feqiyê Teyran agahiyên berfireh didin.

Hema bêje hemû lêkolîner û zanyarên edebiyata klasîk a kurdî li ser berhemên Feqiyê Teyran li hev dikin ku ew ji aliyê naverok û şêweyê ve avakarê ekolekî ye. Li gor hin lêkolîneran, di edebiyata klasîk a kurdî de Feqî pêşengê zimanê xwerû yê gel e. Bêje û gotinên zimanên serdest ên wê demê, anku erebî û farisî kêm in di berhemên wî de. Wek helbestvanekî avakar bandora Feqî gelek çêbûye li ser peyrewên xwe. Feqe Reşîdê Hekarî, Bekir Begê Erizî û hwd. hinek ji wan helbestvanan in ku berhemên xwe di bin bandora berhemên Feqiyê Teyran de nivîsîne (Adak, 2015: 37).

Berhemên Feqiyê Teyran di bin du serenavên giştî de kom dibin. Hikayetên menzûm û helbestên serbixwe yên wekî qesîde, xezel û hwd.

**Hikayetên menzûm**: Şêxê Sen’an, Bersisê Abid, Zembîlfiroş, Dimdim.

**Helbestên curbicur**: Ey Av Av, Îro Qewî Girya Me Tê, Beyta Dilî, Îlahî Ger Gunahkarem Ellah Çi Zatek Ehsen e, Muxatebeê Feqî û Mela, Feqî û Bilbil Îlahî Ebduke Atak, Xwedavenda Tu Sebbûh î, Ellah Sehergeha Ezel, Ordeka Ava Cizîrê, Bi Çar Kerîman, Ey Dîlberê, Ji Işqê Sohtime Welleh, Îro ji Destê Husna Hebib, Qewî Îro Zeîfhal im (Sadinî, 2012; Yıldırım, 2014; Adak, 2015).

### *2.1. Bibliyografyaya Berhemên Feqiyê Teyran*

Helbest û manzûmeyên Feqiyê Teyran li cih û demên cur bi cur de ji aliyê gelek kesan ve hatine berhevkirin û weşandin. Cara pêşî sala 1965an E.M. Rûdenko menzûmeya Şêxê Sen’anî çapkiriye. Piştre ew berhem ji aliyê Memo Yetkîn ve hate wergerandin û sala 1986an li Stokholmê ji nav weşanên Roja Nû’yê da çapkirin.

Li Başûr, cara ewil Saîd Dêreşî berhemên Feqî berhev kirin û berê li Bexdayê paşî sala 2005an li Hewlêrê çap kirin. Heman xebat sala 2011an bi herfên latînî li Diyarbekirê ji aliyê weşanxaneya Lîsê hate çapkirin (bnr. Dêreşî, 2011).

Li Bakur cara ewil M. Reşît Irgat û Îsmet Kiliçaslan, sala 1999an bi navê “Ey Av û Avê” guldesteyek ji helbestên Feqî çapkirin. Dîsa M. Xalid Sadinî li ser jiyan, berhem û helbestên Feqî xebateke edîsyon krîtîk pêk anîye (bnr.Sadinî, 2012). Herwisa Qedrî Yildirim (2014) jî bi taybetî li ser destxetên berhemên Feqiyê Teyran ên di Koleksîyona A. Jaba de xebateke berawirdî kiriye û ew berhem wergerandine ser zimanî tirkî.

## *3.* DANASÎNA DESTXETAN

Di Koleksîyona A. Jaba de şeş nusxeyên berhemên Feqiyê Teyran ên serbixwe cih digirin. Ji wan destxetan du lib nusxeyên “Ey Av û Av” in ku wek Kurd-19, Kurd-20[4]; çar lib nusxe jî destxetên “Şêxê Sen’anî” ne ku wek Kurd-23, Kurd-24, Kurd-25 û Kurd-44 hatine jimarekirin. Li jêrî em dê berê herdu nusxeyan “Ey av û av” yên serbixwe û du nusxeyên dî yên di mecmûayên cuda cuda da hene, bidin nasîn; paşî jî em ê derbasî nasandina nusxeyên “Şêxê Sen’anî” bibin.

[4]bnr. jêrenot 1.

## 3. 1. NUSXEYÊN *EY AV Û AVÊ*

### 3.1.1. Nusxeya Kurd-19: Ey av û avê

### 3. 1. 2. Nasandina Nusxeyê

1. **Navê berhemê** : Ey Av û Av
2. **Te'lif, tercume, şerh** : Te'lîf
3. **Navê nivîskar** : Feqiyê Teyran
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Petersburg, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Petersburgê
6. **Koleksîyon** : Koleksiyona A. Jaba
7. **Pirtûkxane no** : Kurd -19
8. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
9. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
10. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
11. **Rengê kaxezê** : Zer
12. **Rizîbûna kaxezê** : Saxlem e.
13. **Jimara wereqan** : 8
14. **Ebadên kaxezê** : 25*15
15. **Cureya xetê** : Şexsî
16. **Îmla** : Bêhereke ye.
17. **Murekkeb** : Di temamê destxetê de mirekebê reş hatiye bikaranîn.
18. **Cedwel** : Bêcedwel e
19. **Serlewhe** : Haza beytû Feqiyê Teyran - B'av ra xeber da, beytinê pir xweş in, guh bidin kemala Xuldan.
20. **Besmele** : Nîne
21. **Jimara beşan** : Bêbeş e
22. **Sernav** : Bêsernav e
23. **Jimara rêzan** : Rûpelên 1 û 7 deh rêz, rûpelên 2,3,4,5, 6, 8, 9 û 10ê yanzdeh rêz û rûpelê 11an jî danzdeh rêz in û bi temamî dibin 120 rêz. Ji wan 120 rêzan 95 rêz *Ey av û avê*, 20 rêz *Îro qewî girya me tê* û 5 rêz jî Hisaba Tûsî ne. Her rêz beyteke û du rêz dibin bendek.
24. **Peyva te'qîbê** : Heye
25. **Derkenar** : Di dawiya destxetê de jî bi zimanê frensî raveya hisaba Tûsî û dîrokçeya wê hisabê hatiye.
26. **Destpêka destxetê** :

Ey av û av hey av û av
Ma tu bi mewc û muhbetî (Ey av û av).

Ey hûn werin lazim werin
Cînar û xelkê hêşetê (Îro qewî girya me tê).

Temam bîst teyr in
Ji Tirkan çar û ji Hindîyan (Hisaba Tûsî).

**27. Dawiya destxetê :**

Di xîzmeta Xûdê xwe bû
Heta roja axretê (Ey av û avê).

Ji haniyan yarî te dûr e
Qebr û bendana fîrqetê (Îro qewî girya me tê).

Çû neh neh bijmêre
Yek bikûje cihudekî (Hisaba Tûsî).

**3. 1. 2. Nusxeya Kurd-20: Ey av û avê**

**3. 1. 2. 1. Nasandina Nusxeyê**

1. **Navê berhemê** : Ey Av û Av
2. **Te'lif, tercume, şerh** : Te'lîf
3. **Navê nivîskar** : Feqiyê Teyran
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Petersburg, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Petersburgê
6. **Koleksîyon** : Koleksiyona A. Jaba
7. **Pirtûkxane no** : Kurd-20
8. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
9. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
10. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
11. **Rengê kaxezê** : Zer
12. **Rizîbûna kaxezê** : Saxlem e.
13. **Jimara wereqan** : Nusxe 41 wereq e.
14. **Ebadên kaxezê** : 25*15
15. **Cureya xetê** : Şexsî
16. **Îmla** : Bêhereke ye.
17. **Murekkeb** : Reş
18. **Cedwel** : Bicedwel e. Rûpelê rastê wekî du sitûn hatine parvekirin, li mile rastê destxeta bi herfên erebî heye, milê çepê û rûpelê çepê vala ne.
19. **Serlewhe** : Haza beytû Feqiyê Teyran - B'av ra xeber da, beytinê pir xweş in, guh bidin kemala Xuldanê
20. **Besmele** : Nîne
21. **Jimara beşan** : Bêbeş e
22. **Sernav** : Bêsernav e
23. **Jimara rêzan** : Ji nava wan rûpelên nivîsandî de li 38 rûpelan şeş rêz hene, li rûpelekî 5 rêz û li rûpelê dawiyê jî 4 rêz, bi temamî 237 rêz hene, her rêz risteyek e û çar riste jî dibin bendek. Ji wan 187 rêz qesîdeya "Ey av û avê" ne, 40 rêz helbesta "Îro qewî girya me tê" ne û neh rêzên dawî jî "Hisaba Tûsî" ne.
24. **Peyva te'qîbê** : Heye

**25.** **Derkenar** **:** Di dawiya destxetê de jî bi zimanê frensî raveya hisaba Tûsî û dîrokçeya wê digel tabloyeke wê hisabê hatiye.

**26.** **Destpêka destxetê** **:**

Ey av û av hey av û av
Ma tu bi mewc û muhbetî (Ey av û av).

Ey hûn werin lazim werin
Cînar û xelkê hêşetê (Îro qewî girya me tê).

Temamî bîst teyr in
Ji Tirkan çar û ji Hindîyan (Hisaba Tûsî).

**27.** **Dawiya destxetê** **:**

Di xîzmeta Xûdê xwe bûn
Heta roja axretê (Ey av û avê).

Ji haniyan yar û te dûr e
Qebr û bendana fîrqetê(Îro qewî girya me tê)

Çû neh neh bijmêre
Yek bikûje cihudekî (Hisaba Tûsî).

### 3.1.3. Nusxeya Kurd-27

Ev destxet wek mecmû'eyek hatiye amadekirin ku tê de du helbestên Ehmedê Xanî, helbesteke Melayê Bateyî û çar helbestên dirêj (menzûme) yên Feqiyê Teyran hene. Digel wan helbestan menzûmeya Qewlê Newala Sîseban û Zenbîlfiroşa[5] Feqiyê Teyran jî heye. Di vê mecmueyê de zanyariyên rûpela pêşîn, hejmara sitûnan û qeyda temetê tuneye.

1. **Navê Berhemê**: Li berga pêşîn hatiye nivîsîn.
2. **Bi kurdî**: Mecmû'e [مجمعا]
3. **Taybetiyên Bergê**: Bergekî şîn e û karton e. Hemû kaxezên nava bergê ji aliye piştê ve bi bendê bi hev ve hatine dirûn.
4. **Taybetiyên Kaxezê**: Kaxezên vê mecmû'eyê zer e û di her rûpelê de 10 rêz hene.
5. **Hejmara Wereqan**: Bi temamî 38 wereq in.
6. **Hejmara Rêzan:** Nêzîkî 740 rêz in.
7. **Ebadên Destxetê**: 26x9 cm.

[5] Derheqê menzûmeya Zenbîlfiroş de agahî di mecmuaya Kurd 26an de hatiye dayîn, ji ber vê me cardin li vir dubare nekir.

8. **Dîroka Îstinsaxkirinê**: Di wereqa 17an de dawiya helbestê tenê sala wê, h. 1272 (m. 1855) hatiye nivîsîn.
9. **Rengê Murekkebê**: Tenê bi murekkeba reş hatiye nivîsîn.
10. **Pêşiya Nusxeyê**: (Mecmû'e) Haza beytu Sîseban bi cenwizyan ceng kiryîm / Guh bidne hikayetê, şerê cenwizan qissetê / Gelî yar û ehbaban ji seyyîdê sadatan / Wan çendî ehbaban di riya dîn kirin xebatê (Berga Pêşiyê).
11. **Paşiya Nusxeyê:** Canan ji te ey Xanî canan bixazîtin / Ha nuqte li bin danî fîl hal di mizgîn da (wr. 38b).
12. **Sernav**: Di serê her helbestê sernavek hatiye danîn. Wek mînak; Haza Beytun Sîseban, Zenbilfiroş, Goftî Xanî û hwd. Murekkeba nivîsan reş e.
13. **Derkenar**: Di wereqa 23an de bi zimanê erebî weha nivîsiye: “Nemmeqehu heqîru feqîr ila muhtaci te‘ala feqî feyzullah ah mine‘l-mewt”
14. **Taybetiyên Din**: Ji bo ku helbest tevlihev nebin li dawiya her helbestê xetek hatiye kişandin. di vê nusxeyê de tenê rûpela dawiyê vala ye, wekî din wereqeke vala tuneye.

Li jêrê em ê yek bi yek helbestên vê mecmu‘eyê bidine nasandinê.

*Helbest No, 4*: Helbesta çaran “Ey Av û Av”a Feqiyê Teyran e. Ev helbest di arşîva Kurd 45an (wr. 1a) de jî heye.

Goftê Feqiyê Teyran

Ey av û av ey av û av
Ma tu bê ‘işq û muhbetî
Mewc û pêlan davê bilav
Bê sekn û bê rahetî (wr. 23a)
...
Mîm û Hê bi qelb û mitalan
Yan bi van [her][6] fikr û xilalan
Ras dike bend û misalan
Şa‘irê nesihetê (wr. 26a)

### 3.1.4. Nusxeya Kurd-45

Di vê mecmû'eyê de bi temamî sê helbest hene. Ji wan ya yekem *Ey Av û Av*a Feqiyê Teyran e; ya duyem Qewlê Newala Sîsebanê[7] ye û ya sêyem jî Zenbîlfiroş e. Menzûmeya Ey Av û Av di mecmû'eya Kurd 27an de jî heye û di hin cihan de cudahiyên biçûk hene di navbera herdu destxetan de, lê bi giştî wek hev in. Di wan mecmû'eyan de ya herî zêde hatiye nivîsandin menzûmeya Zenbîlfiroş e. Di wan mecmû'eyan de du guhertoyên Zenbîlfiroşê hene. Zenbîlfiroşa vê mecmueyê wekî yên Kurd 28 û 29an e.

1. **Navê Berhemê**: Li berga pêşîn hatiye nivîsî.
2. **Bi Frensî**: Manuscrit contenant Trors poeimes Kurdes
3. **Zanyariyên Rûpela Pêşîn**:

[6] Di vê rêzê de peyva “her” heye, lê ji ber ku weznê xira dikir me ev di nav kewanekê de nîşan da.
[7] Qewlê Newala Sîsebanê di mecmuayên Kurd 27, 28 û 29an de jî derbas bûbû û me di Kurd 27an de derheqê vê de hinek ahagî dabûn. Lewre cardin em behsa vê nakin.

1. Réverie sur les bords de de la ruirere de Mikis,
2. Nevala Siseban ou bataille luluireceé aur Djenevir par Faki – Teiran
3. Zenbil-Ferouch (vendeur de paniers) par Mella Baté

Di wereqa 16a`yê de jî zanyariyên helbestên hene, weha dinivîse: Nevala Siseban ou bataille livreé aur Djeneviz (Penois) Dans la valeé de Siseban par Faki Teiran

Di wereqa 46a`yê de jî sernaveke din heye ku weha ye: Zenbil-ferouch (vendeur de paniers) par Mella Bate, voir le résumé de ce poème, en français, à la fin de ce méme poème.

4. **Taybetiyên Bergê**: Berga mecmû'eyê tuneye. Hemû kaxezên nava bergê ji aliye piştê ve bi bendê bi hev ve hatine dirûtin.
5. **Taybetiyên Kaxezê**: Kaxezên vê mecmû'eyê zer e û di her rûpelê de 9 rêz hene.
6. **Hejmara Wereqan**: Bi temamî 59 wereq in.
7. **Hejmara Sitûnan**: Her rûpel ji du sitûnan pêk tê.
8. **Ebadên Destxetê**: 24x17 cm.
9. **Qeyda Temetê**: Di dawiya manzûmeya Qewlê Newala Sîsebanê de qeyda temambûnê weha ye; Temmet qisset Sîseban fî şîtaî Erzurum.
10. **Dîroka Îstinsaxkirinê**: h. 1282. (m. 1866)
11. **Destpêka Nusxeyê**:

Haza beyti Feqî Teyran bi avê ra xeber daye

Beytê dibin pir xoş in
Guh didin xwedan kemal
Ey av û ave hey av û av
Ma tu bê ‘işq û muhbet î
Mewc û pêlan davê bêlav
Bê sekûn û bê rahet î (wr. 1a)

12. **Dawîya Nusxeyê**:

Her çî pê ji min bawer netê
Ne musteheqqê şefa‘etê
Mexrec dûr e roja axretê
Ya Muhemmed herçî pê ji ne bawer e
Bizan ne ummeta pêxember e
Ew bê hêvî ye ji şefa‘etê
Temmet (wr. 58b)

13. **Sernav**: Di vê mecmû'eyê de sernava hersê helbestan hatiye danîn. Sernav bi erebî dest pê dikin lê bi kurdî dewam dikin. Bo nimûne, di helbesta ewil de sernav weha ye; Haza Beyti Feqiyê Teyran bi avê ra xeber daye.
14. **Derkenar**: Gelek nîşeyên bi fransizî-latînî li ser deqê hatine girtin. Carinan bi wan notan wergera peyvê yan jî hevokê kirine carinan jî wek jêrenot hin tişt derbarê helbestê de hatiye nivîsîn.
15. **Taybetiyên Din**: Bi tenê di rûpela yekem de hejmar ji bo sahifeyê hatiye danîn ku ew jî 7 e, ji bilî vê tu hejmar tuneye. Herwiha xêncî wereqa ewil, di wereqên din de tenê milê rastê hatiye nivîsîn û milê çepê vala hîştine.

Helbestên vê mecmueyê wiha ne;

*Helbest No, 1*: Ev helbest a Feqî Teyran e. Di arşiva Kurd 27an (wr. 23a – 26b) de jî Ey av û av a Feqî heye. Wereqa ku dawiya helbestê tê de cih digire nîvco ye, hatiye birîn yan jî dirandin. Ji ber vê ev helbest di vê mecmû'eyê de tam nîne. Helbest weha dest pê dike;

Haza Beyti Feqiyê Teyran bi avê ra xeber daye.

Beytê di min pir xweş in,
Guh diden xwedan kemal
Ey av û av e hey av û av
Ma tu bê ‘işq û muhbet î
Mewc û pêlan dawî bilav
Bê sekûn û bê rahet î (wr. 1a.)
…
Hetta xoş in kul man birîn
Diket maye çerx û ‘adetê
Felek tu bê wefa yî
Te çira mihnet nedayê (wr. 15b)

**3.1.5. Teshîs û Têbîniyên di Derkenaran de**

Li ser bergê destpêka Kurd 19an, ji bilî serlewheyê derbarê naveroka destxetê de çi agahî nînin, lê belê di rûpelê piştî bergê ewil a nusxeya Kurd-20 de, bi zimanê frensî derbarê naveroka vê destxetê ev gotin hatine nivîsîn: “*Sohbeta xeyalî li ber çemê Miksê (ya girêdayî herêma Wanê) ji aliyê Feqiyê Teyran hatiye gotin*.”

Herwiha di dawîya metnê nusxeyên Kurd-19 û Kurd-20ê de bi zimanê frensî ev gotinên jêrî cih digirin, nivîsa di dawiya Kurd-19yê de li gelek cihan hatiye xêzkirin û jêbirin û veguhastin, lewma xwendina wê û jê fehmkirin gelek bi zehmet e, lê belê nivîsa di dawiya Kurd-20ê de gelek xweşîk û bêmidaxeleye ye, lewma baştir tête xwendin. Ew nivîsa bi frensî wisa ye:

“*Hisaba ku li vê derê tête behskirin ji aliyê Hecî Nesredîn Tûsî yê wezîrê Hûlagû Xan hatiye îcatkirin. Ew wekî Xoce Nesredîn Tûsî jî tête nasîn.* (Tenê Kurd- 19)

*Tête gotin ku gava rojekê Tûsî li ser keştiyekê seferê dike, dikevin xetereya noqîbûnê û naxwaze nîvî rêvingan ji keştiyê bên avêtin û pêşniyaz dike ku bila qeder bixwe biryar bide ka kî bimîne kî biçe. Li gorî pêşniyaza wî dê heta nehê bête hejmartinû neh bê ser kê ew ê xwe pavêje avê. Her kes pêşniyaza wî qebûl dike û yê nehê xwe davêje nava avê. Bi vî awayî tenê misilmanên di keştiyê de xilas diibin ûdigehin qerexê behrê.*

*Ew ji tirkmenan dest bi hejmartinê dikin, yek misilmanan û sifir jî kesên nemisilman temsîl dike.”*

**3.1.6. Nirxandina Nusxeyên *Ey Av û Av*ê**

Nusxeyên Kurd-19 û Kurd-20 yên *Ey Av û Avê* gelek baş hatine parastin. Rûpelên wan saxlem in. Di nusxeya Kurd-19an de jimareya rûpelan nehatiye diyarkirin, lê nusxeya Kurd 20ê de li ser her rûpelekî, li quncê jorî jimareya rûpelan bi herfên erebî hatiye nivîsîn. Di her

du destxetan de jî peyva teqîbê heye ku berdewamiya xwendinê hêsantir dikin. Li ser her du nusxeyan jî qeyda îstinsaxê nîne, lewma derbarê cih û sala îstînsaxkirinê de agahî nehatine dayîn.

Di serlewheweya her du nusxeyan de jî "Haza beytu Feqiyê Teyran, b'avê re xeber da" tê nivîsîn û herdu destxet wekî "Ey av û avê hey av û avê" dest pê bikin û aşkere wekî nusxeyên qesîdeya "Ey av û avê" ne, lê belê di nusxeya Kurd-19 de piştî rêza 192yan û di nusxeya Kurd-20ê de jî piştî rêza 187an, bêyî serenav, an jî navber vêca helbesteke dî ya Feqî dest pê dike ya ku bêtir bi navê "Îro qewî girya me tê" an jî "Hûn werin lazim werin" tête zanîn, bi qederê 40 rêzan berdewam dike. Herwiha di herdu nusxeyan de jî piştî dawîbûna rêzên "Îro qewî girya me tê" nêzî heşt rêzan hesabeke matematîkê heye ku wek hesaba Nesredînê Tûsî tête nasîn. Di dawiya her du destxetan de jî bi zimanên frensî raveya vê hisabê û dîrokçeya wê hatiye dayîn, di nusxeya Kurd 20 de digel raveyê tableyeke vê hisaba jî cih digire

## 3. 2. NUSXEYÊN *ŞÊXÊ SEN'ANÎ*

### 3.2.1. Nusxeya Kurd-23: Şêxê Sen'anî

#### 3. 2.1.1. Nasandina Nusxeyê

| | | |
|---|---|---|
| 1. | **Navê berhemê** | : Şêxê Sen'an |
| 2. | **Te'lif, tercume, şerh** | : Te'lîf |
| 3. | **Navê nivîskar** | : Feqiyê Teyran |
| 4. | **Cih (bajar û dewlet)** | : Petersburg, Rûsya |
| 5. | **Navê Pirtûkxaneyê** | : Pirtûkxaneya Giştî ya Petersburgê |
| 6. | **Koleksîyon** | : Koleksiyona A. Jaba |
| 7. | **Pirtûkxane no** | : Kurd-23 |
| 8. | **Zimanê destxetê** | : Kurdî (Kurmancî) |
| 9. | **Serbixwe-mecmû'e** | : Serbixwe |
| 10. | **Menzûm-mensûr** | : Menzûm |
| 11. | **Rengê kaxezê** | : Zer |
| 12. | **Rizîbûna kaxezê** | : Saxlem e. |
| 13. | **Jimara wereqan** | : 23 |
| 14. | **Ebadên kaxezê** | : 25*15 |
| 15. | **Cureya xetê** | : Şexsî |
| 16. | **Îmla** | : Bihereke ye. |
| 17. | **Murekkeb** | : Reş û li hin cihan sor |
| 18. | **Cedwel** | : Bêcedwel e. |
| 19. | **Serlewhe** | : Haza Hikayatî Şêx Sen'aniyan |
| 20. | **Besmele** | : Heye |
| 21. | **Jimara beşan** | : Bêbeş e |
| 22. | **Sernav** | : Bê sernav e. |
| 23. | **Jimara rêzan** | : 532 |
| 24. | **Peyva te'qîbê** | : Heye |

25. **Cihê istînsaxê** : Ne dîyar e
26. **Qeyda istînsaxê** : Nîne
27. **Destpêka destxetê** :

Guh biderin nutqê aşiqan
Da ez bixwînim vê xetê

28. **Dawiya destxetê** :

Çavan ji kêra kil bikim
Dê postekî li mil bikim
Çim cennetê hasil bikim.

**3. 2. 2. Nusxeya Kurd-24: Şêxê Sen'an**

**3. 2. 2. 1. Nasandina Nusxeyê**

1. **Navê berhemê** : Şêxê Sen'an
2. **Te'lif, tercume, şerh** : Te'lîf
3. **Navê nivîskar** : Feqiyê Teyran
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Petersburg, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Petersburgê
6. **Koleksîyon** : Koleksiyona A. Jaba
7. **Pirtûkxane no** : Kurd-24
8. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
9. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
10. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
11. **Rengê kaxezê** : Zer
12. **Rizîbûna kaxezê** : Bi derkenaran ve rizî ye. Hema bêje niviyê bergê dawiyê rizî ye û xet nayên xwendin. Rûpelên 1-2, 3-4, 28-27, 83-84, 85-86 ji qüncên jorî û rûpelên 1, 14, 29-30, 36-37, 47, 51-52, 62-68, 68-69, 74-75, 80-81 û 86 jî ji naviyê hatine te'mîrkirin.
13. **Jimara wereqan** : 44
14. **Ebadên kaxezê** : 25*15
15. **Cureya xetê** : Şexsî
16. **Îmla** : Bihereke ye.
17. **Murekkeb** : Reş.
18. **Cedwel** : Bêcedwel e.
19. **Serlewhe** : Nîne
20. **Besmele** : Nîne
21. **Jimara beşan** : Bêbeş e
22. **Sernav** : Bê sernav e.
23. **Jimara rêzan** : 684
24. **Peyva te'qîbê** : Heye
25. **Cihê istînsaxê** : Ne dîyar e

**26. Destpêka destxetê :**

Bese can ji meya muweddetê
Can ji meyê têr nab…[8]

**27. Dawiya destxetê :**

Her singekî di meyla taritî
Axir nike dibît ya …[9]

### 3. 2. 3. Nusxeya Kurd-25: Şêxê Sen'an

#### 3. 2. 3. 1. Nasandina Nusxeyê

1. **Navê berhemê** : Şêxê Sen'an
2. **Te'lif, tercume, şerh** : Te'lîf
3. **Navê nivîskar** : Feqiyê Teyran
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Petersburg, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Petersburgê
6. **Koleksîyon** : Koleksiyona A. Jaba
7. **Pirtûkxane no** : Kurd-25
8. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
9. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
10. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
11. **Rengê kaxezê** : Zer
12. **Rizîbûna kaxezê** : Saxlem e.
13. **Jimara wereqan** : 19
14. **Ebadên kaxezê** : 25*15
15. **Cureya xetê** : Şexsî
16. **Îmla** : Bihereke ye.
17. **Murekkeb** : Reş û li hinek rêz sor in.
18. **Cedwel** : Bêcedwel e.
19. **Serlewhe** : Haza Hikayatî Şêx Sen'aniyan
20. **Besmele** : Heye
21. **Jimara beşan** : Bêbeş e.
22. **Jimara rêzan** : 467
23. **Peyva te'qîbê** : Heye
24. **Cihê istînsaxê** : Ne dîyar e
25. **Temelluk** : Hecî Mistefa îbnî Hesen Axa …
26. **Derkenar** : Li 110 cihan, li kêlaka rêzan, peyvên giran bi taybetî jî peyvên bingeh 'erebî û farisî bi hemwateyên wan ên kurdî ve hatine dayîn
27. **Destpêka destxetê :**

Guh biderin nutqê aşiqan
Da ez bixwînim vê xetê

---

[8] Riste kêm e.
[9] Riste nayête xwendin.

**28. Dawiya destxetê :**

Ezraîl ruhanê wan
Lê wê qebz kirî
Wan bi cinnetê şa kir
Ew man li wê sunnetê.

### 3. 2. 4. Nusxeya Kurd-44: Şêxê Sen’an

#### 3. 2. 4. 1. Nasandina Nusxeyê

1. **Navê berhemê** : Şêxê Sen’an
2. **Te’lif, tercume, şerh** : Te’lîf
3. **Navê nivîskar** : Feqiyê Teyran
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Petersburg, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Petersburgê
6. **Koleksîyon** : Koleksiyona A. Jaba
7. **Pirtûkxane no** : Kurd-44
8. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
9. **Serbixwe-mecmû’e** : Serbixwe
10. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
11. **Rengê kaxezê** : Zer
12. **Rizîbûna kaxezê** : Saxlem e
13. **Jimara wereqan** : 35
14. **Ebadên kaxezê** : 25*15
15. **Cureya xetê** : Şexsî
16. **Îmla** : Bihereke ye.
17. **Murekkeb** : Reş.
18. **Cedwel** : Bicedwel e. Her rûpel du sitûn û neh rêz in. Li ser her rêzê destxet bi herfên erebî-kurdî ye, li ser wan wergera wan a bi frensî heye.
19. **Serlewhe** : Kitabû qissa Şêxê Sen’an
20. **Besmele** : Heye
21. **Jimara beşan** : Beşek heye.
22. **Sernav** : Îbtidayî qissetê.
23. **Jimara rêzan** : 1215
24. **Peyva te’qîbê** : Heye
25. **Cihê istînsaxê** : Ne dîyar e
26. **Qeyda istînsaxê** : Bi frensî hatiye nivîsîn. “Şêxê Sen’anî, bi gotineke dî Sena’anîyan, helbest ji aliyê Feqî Teyran, Muhammed. Di nav van menzûmeyan de ew bi piranî bi herfên serbixwe ên wekî “Mîm –He” yên ku tên wateya Muhammed bi kar tîne, car caran jî hema Muhammed bixwe dinivîsîne.”
27. **Tarîxa istînsaxê** : 27 Tîrmeh 1865
28. **Cihê istînsaxê** : Erzurum
29. **Derkenar** : Wergera gelek peyvan bi frensî hatiye dayîn.

**30. Destpêka destxetê :**

Guh biderinê vê nutqa aşiqan
Da ez bixwînim vê xetê

**31. Dawiya destxetê :**

Ezraîl ruhê di wan
Li wê bi qebz kir û bi cinnetê şa kir
Ew man li wê di cinnetê.

### 3.2.5. Teshîs û Têbîniyên di Derkenaran de

Di nusxeyên Kurd-23 û Kurd-24 de li derkenaran çi agahî û serastkirin nîn in. Lê belê li derkenarên Kurd-25ê de bi temamî li 110 cihan, li kêlaka rêzan, peyvên giran bi taybetî jî peyvên bingeh ‘erebî û farisî bi hemwateyên wan ên kurdî ve hatine dayîn. Bo mînak, hema di rêza ewil de peyva “nutq” derbas dibe, li kêleka rêza ewil hemwateya wê wek “xeberdan” hatiye dayîn.

Her çi nusxeya Kurd-44 e, ew nusxeyeke taybet a bicedwel e û hema bêje li ser her rêzê wergera frensî ya peyvekê an jî komeke peyvan hatiye dayîn. Jixwe di dawiya destxetê de, di beşa agahiyên derbarê îstînsaxê de ev xebat bi van peyvên frensî hatine ravekirin: “Peyvên ji hemîyan zehmettir bi frensî hatine ravekirin da ku wergerê hêsan bikin.”

### 3.2.6. Nirxandina Nusxeyên *Şêxê Sen’anî*

Ji nava nusxeyên Şêxê Sen’anî yên di koleksiyona A. Jaba de, nusxeya ku herî ji şiklê xebata Jaba û defterên wî dûr ev nusxeya Kurd-23 ye, ji ber ku nusxe ji dirûvê menzûmeyê dûr e û bêtir şiklê berhemeke mensûr dide. Lewma bi taybetî di rûpelên ewil ên destxetê de gelek zehmet e mirov riste û bendan jêk cûda bike. Mirov dikare bêje belkî ev destxet ne ji aliyê koma xebatê ya Jabayî ve hatiye amadekirin, lê ji aliyê kesekî dî ve û gelek berê xebata wan hatibe îstinsaxkirin. Lê belê ji ber ku ne cih û dîroka îstinsaxkirinê, ne jî nav û agahiyên dî yên derbareyî mistensixî de li ser destxetê nîn in, em nikarin bi hêsanî bibêjin ka ew destxetek e ji komxebatê ye yan na. Destxet bi temamî 532 rêz e, hinek rêz du rist, hinek sê hinek jî zêdetir in. Ber bi dawiya destxetê ve bendên menzûmeyê bi sembolên taybet ên wekî stêrkan jêk têne cûdakirin. Rûpelê ewil ê destxetê, yê ku serlewhe, besmele û destpêka menzûmeyê li ser in, bi rengekî zerê zelal e, lê rûpelên dî bi zerê tarî ne. Diyar e ku li ser vê nusxayê xebata te’mîrê hatiye kirin, lewre kaxeza ji heman zerê rûpelê ewil li hinek cihan ji bo pêkvegirêdana rûpelan hatiye bikaranîn.

Ji nava nusxeyên Şêxê Sen’anî yên di arşîva A. Jaba de ya herî şepirze û xwedî kêmasî nusxeya Kurd-24 e. Ew ji destxetên dî nêzikî 20 rêzan kêmtir e. Bi temamî 86 rûpel e û li jimareya rûpelan bi latinî hatine nivîsîn. Rûpelên 1-2, 3-4, 28-27, 83-84, 85-86 ji quncên jorî ve bi kaxezeke zerê zelal ve hatine serastkirin. Herwisa rûpelên 1, 14, 29-30, 36-37, 47, 51-52, 62-68, 68-69, 74-75, 80-81 û 86 jî ji nîvekê ve dîsa bi heman kaxeza zer a zelal ve pêk ve hatine zeliqandin

Nusxeya Şêxê Sen'anî ya ku wek Kurd-25 hatiye qeydkirin bi temamî 467 rêz e. Her rêzek ji beytekê pêk tê, riste ji hev cuda hatine nivîsîn. Destpêka wê wekî ya nusxeyên dî ye, lê belê dawiya wê ji wan cudatir e.

Nusxeya Şêxê Sen'anî ya ku wek Kurd-44 hatiye qeydkirin, ji gelek aliyan ve ji nusxeyên dî yên Şêxê Sen'anî cudatir e. Beriya menzûmeyê bi awayê pexşankî danasîneke menzûmeyê heye ku nirxekî bilind dide nusxeyê. Herwisa ji ber ku di dawiya nusxeyê de hatiye nivîsîn ku ev nusxe sala 1865an li Erzeromê hatiye îstinsaxkirin, ew danasîna pexşankî ya hikayata Şêxê Senanî dibe yek ji ewiltirîn metnên pexşana kurdî. Ew danasîn wiha ye:

"Ev rîsaleya qisseya Şêxê Sen'anî ye. Meal û netîceya vê rîsaleyê ew ku di zemanêm pêşîn şêx û mirşûdekî pîr û heştê salî sahibê zuhd û teqwa û ehlê irşadê hebûye ku pansed mirêdî wî hebûye. Qezaen carekê riya wî bi semtê Gurcistanê ketiye, keçekî mîrê gurciyan hebûye. Mehbûb ziman û afetê dewranan, rastgele ew keç li banê dêrê, seyr û temaşa dikirî, çavêd şêxî bi keçê ketî, aşiq û miptela û dîn û şeyda bûyî. Bi dereceyekî ku zikr û fikrê xelfet û irşad û mirûd pêk ve terikandî, û mecnûn sifet çûyî bal keça kuffarî û dîn û îman ma'zelleh hêlayî û bûye tabi'ê keçê û kelamûllah sewtiye û pêxas û serkol çûye ber berazan û ji destê keçê mey vexwarî û belku gihaye dereca kufrê. Mudedekê bi vî wechî mayî û herçend miridên wî şîret û pend lê kirin, fayde nedayê. Paşî miridekî wî li mal mabû, wekû bihîst, qewî bedhal bûye, hate hizûra Şêx 'Ettar, ehwal îfade kirî. Îcarê Şêxê Ettar û civadekî miridan hatî nêzikî dêrê, zikr û dia kirî, diayêd wan qebûl bûyî, şêx poşman bûyî, digel wan hatiye. Îcarê 'aşqê kiçê li kar siwar bûyî, li pey hatî, lire gihayî şêx, misilman bûyî, herdu jî wefat kirîne, qebrêt wan niha li semtê Oltiyê bûyîne ziyaretgah.

Wallahû alem bî heqîqetihî"

**Encam**

Feqiyê Teyran hem bi qewareya berhemên xwe hem jî bi naverok û zimanê wan berheman ve digel Ehmedê Xanî û Melayî Cizirî yek ji serkêşên sereke yên edebiyata kurdî ya klasîk e. Di koleksiyona A. Jabayî de jî çi serbixwe, çi jî di nav mecmûeyên cur bi cur de hejmareke zede ya nusxeyên berhemên Feqîyê Teyran hene. Di vê xebata xwe de me şeş nusxeyên serbixwe yên berhemên Feqî (Kurd-19, Kurd-20, Kurd-23, Kurd-24, Kurd-25, Kurd-44) digel du nusxeyên dî yên di nav mecmûeyan da (Kurd-27, Kurd-47) dane nasîn.

Ji wan nusxeyan Kurd-19 û Kurd-20 yên *Ey Av û Avê* gelek baş hatine parastin. rûpelên wan saxlem in. Di serlewheweya herdu nusxeyan de jî "Haza beytû Feqiyê Teyran, b'avê re xeber da" tê nivîsîn û herdu destxet wekî "Ey av û avê hey av û avê" dest pê bikin û aşkere wekî nusxeyên qesîdeya "Ey av û avê" ne, lê belê di nusxeya Kurd-19 de piştî rêza 192yan û di nusxeya Kurd-20ê de jî piştî rêza 187an, bêyî serenav, an jî navber vêca helbesteke dî ya Feqî dest pê dike ya ku bêtir bi navê "Îro qewî girya me tê" an jî "Hûn werin lazim werin" tête zanîn, bi qederê 40 rêzan berdewam dike. Herwiha di herdu nusxeyan de jî piştî dawîbûna rêzên "Îro qewî girya me tê" nêzî heşt rêzan hesabeke matematîkê heye ku wek hesaba Nasredîn Tûsî tête nasîn.

Ji nava nusxeyên Şêxê Sen'anî yên di arşîva A. Jaba de (Kurd-23, Kurd-24, Kurd-25, Kurd-44), nusxeya ku herî ji şiklê xebata Jaba û defterên wî dûr ev nusxeya Kurd-23 ye, ji ber ku nusxe ji dirûvê menzûmeyê dûr e û bêtir şiklê berhemeke mensûr dide. Lewma bi taybetî di rûpelên ewil ên destxetê de gelek zehmet e mirov riste û bendan jêk cûda bike. Ji nava nusxeyên Şêxê Sen'anî yên di arşîva A. Jaba de ya herî şepirze û xwedî kêmasî nusxeya Kurd-24 e. Ew ji destxetên dî nêzikî 20 rêzan kêmtir e. Bi temamî 86 rûpel e û li jimareya rûpelan bi latinî hatine nivîsîn. Her çi nusxeya Kurd-44 e, ew nusxeyeke taybet a bicedwel e û hema bêje li ser her rêzê wergera frensî ya peyvekê an jî komeke peyvan hatiye dayîn. Jixwe di dawiya destxetê de, di beşa agahiyên derbarê îstînsaxê de ev xebat bi van peyvên frensî hatine ravekirin: "Peyvên ji hemîyan zehmettir bi frensî hatine ravekirin da ku wergerê hêsan bikin."

## ÇAVKANÎ

Adak, A. (2015). *Destpêka Edebiyat kurdî ya Klasîk*, (ç.3) Stenbol: Nûbihar.

Adak, A.; Baluken, Y.; Acar, H. (2014). "Gora Feqiyê Teyran" *Nûbihar Akademî, 1/1, 111-120.*

Aykaç, Y. (2021). "Danasîn û Tewsîfa Mecmû'eyên Helbestan di Koleksîyona Aleksandre Jaba de". *Kurdiyat*, (4), 23-60. https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyat/issue/66314/1003150

Aykaç, Y. (2022). "Miks: Navendeke Dîrokî, 'Ilmî, Tesewufî û Edebî". The Journal of Mesopotamian Studies , 7 (1) , 67-102 . DOI: 10.35859/jms.2022.1070581

Dêreşî, S. (2011). *Dîwana Feqiyê Teyran*. Weşanên Lîs: Diyarbekir.

Jaba, Aleksander. (2000). *Çîrokên Kurmancî*, Amd. Cankurd. Stokholm: Çanda Nûjen.

Kurdo, Q. (1992). *Tarîxa Edebyata kurdî*, (2. B.). Ankara: Özge Yayınları.

Öztürk. M. (2017). Koleksîyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî (Vekolî&Saloxdan). Diyarbekir: Lîs:

Rohat. (1991). Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987). (ç.2). İstanbul: Deng

Sadinî, M.X. (2012).*Feqiyê Teyran-Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, (ç.6). Stenbol: Nûbihar.

Yıldırım, K. (2014). *Dîwana Feqiyê Teyran*, Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.

Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

# TAYBETMENDÎYÊN COGRAFÎ Û MORFOLOJÎK ÊN DEVOKA XERZAN DI NAV DEVOKÊN KURMANCÎ DE

GARZAN AĞZININ COĞRAFİ VE SÖZCÜKBİLİM ÖZELLİKLERİNİN KURMANCİ AĞIZLARI İÇİNDEKİ YERİ

THE PLACE OF GEOGRAPHICAL AND LEXICAL FEATURES OF KHARZAN DIALECTS IN KURMANJI DIALECTS

Ayhan YILDIZ *
M. Zahir ERTEKİN**

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 29.10.2022
**Accepted // Pejirandin:** 15.11. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 19-39
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1196272

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Yıldız, Ayhan û Ertekin, Zahir M (2022). Taybetmendîyên Cografî Û Morfolojîk Ên Devoka Xerzan Di Nav Devokên Kurmancî De, *Kurdiname*, no. 7, p. 19-39

**Plagiarism/İntîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

**Kurte**

Zanyarên zimannasîyê, ji serê sedsala nozdehan ve zimanê kurdî ji hêla taybetmendîyên wî yên "cografî" ve li şaxên mîna "kurdîya bakur, kurdîya başûr, kurdîya naverast û kurdîya rojava" dabeş kirîye; ji hêla taybetmendîyên wî yên rêzimanî ve li dîyalektên mîna kurdîya kurmancî, kurdîya soranî, kurdîya lorî, kurdîya goranî û kurdîya dimilî/kirmanckî dabeş kirine. Zimannasan ev dîyalekt jî, li gor awayê axaftina axiverên wan û taybetmendîyên cografyaya wan dabeşî devok û şêweyên cîya cîya yên mîna botî, torî, serhedî, badînanî û efrînî kirine. Devoka Xerzan ku mijara vê lêkolînê ye, ji hêla cografyaya axiverên xwe ve di nav kîjan devera cografyaya kurmancî de cih digire û ji hêla kîjan taybetmendîyên xwe yên gramerî-morfolojîk ve ji devokên din ên kurmancî cîyawaz dibe, wekî "pirsgirêka vê lêkolînê" hat dîyarkirin.

Piştî ku ji lîteratura zimannasîya kurdî, qada xebatên dîyalektnasîyê di ber çavan re hat derbaskirin, hat dîtin ku devoka Xerzan bi awayekî baş bi ber çavdêrîya lêkolînerên zimannasîya kurdî neketîye û taybetmendîyên wê yên cografî û gramerî nehatine nirxandin. Li ser vê sedemê pêdivî hat dîtin ev xebat li ser wê bihê kirin. Lewra mebest bi vê lêkolînê ew e ku taybetmendîyên cografî û morfolojîk ên vê devokê bihên tesbîtkirin û cihê wê yê di nav dîyalekta kurmancî de bihê dîyarkirin.

Ji ber ku devoka Xerzan jî mîna devokên kurmancîya jorîn ên mîna botî, torî, serhedî û badînî xwedan cihêrengîyên cografî û morfolojîk bû, xebata li serê ji bo qada zimannasîya zimanê kurdî giring hat dîtin. Lewra ji bo vê tesbîtê, çawa ku ji çavkanîyên nivîskî yên li ser devok û dîyalektên kurdî ku di lîteraturê de cih girtine sûd hat wergirtin, ji axiverên wê yên zindî jî daneyên mînak hatin wergirtin. Di encama lêkolînê de hat dîtin ku devoka Xerzan ji hêla devera xwe ya cografî ve di nav tixûbên "kurdîya bakur" de dimîne; ji hêla taybetmendîyên xwe yên xweser ên zimanî ve jî di nav tixûbên dîyalekta kurmancîya jorîn de cih digire.

**Bêjeyên Sereke:** Zimanê kurdî, Dîyalektên kurdî, devokên kurmancî, devoka Xerzan, atlasa devokan

* Öğrt. Gör. Mardin Artuklu Üniversitesi, Kürt Dili ve Edebiyatı ayhanmeretowar21@gmail.com, Orcid:/0000-0002-8763-4182
** Doç. Dr., Zanîngeha Bîngolê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, zahirertekin@hotmail.com, Orcid: 0000-0003-3519-9892

**Özet**

Dilbilim insanları, ondokuzundcu yüzyıldan itibaren Kürt dilini coğrafi özellikleri yönünden kuzey Kürtçe, güney Kürtçe, orta Kürtçe ve batı Kürtçe olarak; dilbilgisi özellikleri bakımından da Kurmancî, Soranî, Lorî, Goranî ve Zazakî Kürtçesi gibi lehçelere ayırmışlardır. Dilbilimciler, bu lehçeleri de onların konuşucularının konuşma biçimlerine ve cografyalarının özelliklerine göre çeşitli ağız ve şivelere ayırmışlardır. Bu araştırmanın konusu olan Garzan ağzı, konuşucularının cografyası bakımından Kurmancinin hangi yerinde yer almakta ve dilbilgisi ile sözcükbilimin hangi özelliklerine göre Kurmancinin diğer ağızlarından farklılıklar gösterdiği, "araştırmanın sorunu" olarak belirlendi.

Kürtçe dilbilim alanyazınından lehçebilim çalışmaları alanı tarandıktan sonra, Garzan ağzının Kürtçe dilbilim araştırmacılarının gözlemlerinde iyi bir şekilde yer almadığı ve onun coğrafi ve sözcükbilim özelliklerinin yeterince değerlendirilmediği tespit edildi. Bu yüzden bu çalışmanın yapılması gerekli görüldü. Bu çalışmayla Garzan ağzının cografi ve dilbilgisel özelliklerinin tespit edilmesi ve Kurmancî lehçesi içindeki yerinin belirlenmesi amaçlandı.

Garzan ağzı yukarı Kürmancinin Boti, Tori ve Serhedi ağızları gibi coğrafi ve morfolojik farklılıklara sahip olduğundan, Kürt dilinin dilbilim alanı için önemli bir çalışma alanı olarak görüldü. Dolayısıyla bu tespit için, alanyazındaki yazılı kaynaklardan yararlanıldığı gibi, onun canlı konuşucularından da örnek veriler alınmıştır. Araştırma sonucunda Garzan ağzının, cografi alanına göre Kuzey Kürtçesi sınırları içinde kaldığı; kendine özgü dil özellikleri açısından da yukarı Kurmancî lehçesi içinde yer aldığı görüldü.
**Anahtar Sözcükler:** Kürt dili, Kürtçenin lehçeleri, Kurmanci ağızları, Garzan ağzı, ağız atlası

**Summary**

Linguists have classified the Kurdish language as northern Kurdish, southern Kurdish, central Kurdish and western Kurdish in terms of geographical features since the nineteenth century; In terms of their grammatical features, they divided them into dialects such as Kurmanci, Sorani, Lorî, Gorani and Zazaki Kurdish. Linguists have divided these dialects into various dialects and dialects according to the way their speakers speak and the characteristics of their geography. The subject of this research, the Garzan accent, is located in which part of Kurmanji in terms of the geography of its speakers, and according to which features of grammar and lexicology it differs from other Kurmanji dialects, it has been determined as the "problem of the research".

After scanning the field of dialectology studies from the Kurdish linguistics literature, it was determined that the Garzan accent was not well included in the observations of Kurdish linguistics researchers and its geographical and linguistic features were not adequately evaluated. Therefore, this study was deemed necessary. With this study, it was aimed to determine the geographical and morphologycal features of the Garzan accent and to determine its place in the Kurmanji dialect.

Since the Garzan accent has geographical and morphological differences like the Boti, Tori and Serhedi accents of the upper Kurmanci, it was seen as an important field of study for the linguistics of the Kurdish language. Therefore, for this determination, examples were taken from his live speakers as well as from the written sources in the literature. As a result of the research, it was determined that the Garzan accent remained within the borders of Northern Kurdish according to its geographical area; It was seen that it was included in the upper Kurmanji dialect in terms of its unique language features.
**Keywords:** Kurdish language, dialects of Kurdish, Kurmanji accents, Garzan accent, atlas of accent

## DESTPÊK

Zanîna bi qayîdeyên zimanekî wekî şaxekî zanistê dihê hesibandin, lewra zanyarên îslamê jê re "serf û nehiw" gotîye, zanyarên ewrûpî jê re "linguistics" dibêjin û zanyarên kurdan navê "zimannasî"yê lê danîye. Xebatên li ser awa û qayîdeyên zimannasîyê ji serdemên antîk ve li welatên mîna Hind û Yûnanistanê dest pê kirine û li gor ku mirov ji dîroknasên felsefeyê hîn dibe ev cure xebat bi destê lêkolîneran heta sedsala me bi awayê silsileyî berdewan dikin.

Fîlozofê îslamê Farabî (wf. 339/950) zanistan dabeşî şaxan dike û zanista zimanî, wekî şaxê ewil derdixe pêş. Li gor wî jiberkirina bêjeyan û zanîna bi qayîdeyên têkildarî bêjeyên zimanekî, ji bo gelan giring e. Çunkî çawa ku hekîm bi xêra zanista tibbê, cotyar bi xêra zanîna fellahîyê, bazirgan bi xêra hunera bazirganîyê fêrî karê xwe dibe, axiverên zimanekî jî, bi xêra

zanîna bi van qayîdeyên zimanî hînî hunera pîr û pergala zimanê xwe dibe. Lewra çawa ku ji bo her hunerekî qanûnek heye, ji bo hunera zimanan jî qanûn hene. (el-Farabî 1931, 4). Çawa ku Dittmar amaje pê dike gava em bixwazin metnekî derxin holê, pêdivîya me bi mijara rêzimanîyê, zanîna qayîde û zanîna helwest-tevgerê heye (Demir 2011, 8). Rêzimanî, agadarîyên di heqqê zimanekî de dide ku ew ka ji kengê ve çê bûye, yasayên wî çi ne û kana wî ya peyvê çawa ye. Digel van, şaxê rêzimanîyê, ferq û cîyawazîyên navbera “varyant”an jî dide. Çunkî ji bo her varyantekê, taybetmendîyên cîya cîya hene.

Di peydabûna “dîyalekt”ên zimanekî de hêmanên mîna komelayetî, sîyaset, cografya, radeya rewşenbîrî, dengsazî, aborî, bîyolojîkî û fîzîkî, çend hokarên gewre yên karîger in. Ji bo danasîna van hokaran derbirînên pisporan hatine qeydkirin. Çawa ku pispor amaje pê dikin hokara komelayetîyê, bi ‘edet, teqlîd, xûrewişta nav, komelge-civak û dabeşbûna çînên komelgayê têkildar e. Hokara sîyasetê, ji du hêlan ve dihête nirxandin: Yek jê ew gelên ku hukûmeta wan a navendî heye, ya din ew gelên ku hukûmeta wan a navendî tuneye. Gava di cografyaya zimanekî de hukmê hukûmeta navendî negihîje hemû dever û navçeyan, axiverên wî zimanî li her cih û navendekê, bi awayên curbicur dipeyîvin û “dîyalekt” û “devok”ên cîya cîya çê dibin (Nawxoş ve Xoşnaw, Zimanewanî (Bergekanî Çiwarem) 2010, 173).

Cografyaya axiverên kurdî, ji Herîr û Erdelana li hudûdê Îranê heta axa Heleb û Şamê bîst-bîst û pênc qonax e, a herî hindik, bi qasî mesafeya panzdeh qonaxan e. Li vir milet bi zimanên curbicur ên mîna zazayî, lûlû, Culoya hekkarî, ewnikî, mehmûdî, şêrwanî, cizrewî, sincarî, ardelanî, soranî, xalidî, îmadî, û zimanê rojikî diaxive (Derwîş 1314, 473-474). Desthilatdarên sîyasî yên cîyawaz, dikarin axiverên zimanekî, li gor herêma xwe dîzayn bikin û ji axiverên herêmên din cihê bikin. Bi vî awayî di nav axiverên heman zimanî de varyantên curbicur derdikevin. Lewra di çêbûna varyantên zimanekî de “karîgerîya “cografya”yê jî heye. Çîyayên asê, çem, gol-behr û deştên bêserûber jî dibe ku bibin sedem ku axiverên zimanekî, ji hêla “devok” û “dîyalekt”an ve ji hev dûr bikevin. Wekî mînak di nav herêma Dîyarbekir û Serhedê de çîyayên asê hene û dibe ku ji ber wan hokaran, kurmancîya kurmancîaxivên van her du herêman ji hev dûr ketibe. Wekî vê, îca axiverên devoka Mêrdîn û herêma Rojava, ji ber ku nêzî hev in, digel ku di navbera wan de tixûbên sîyasî yên du dewletên cîya hene jî, devoka kurmancî ya van her du herêman bi temamî dişibe hev.

Ji Garzonî (1734-1804) vir ve gelek xebat bi zimanên mîna îtalî, fransî, almanî, îngilîzî, rûsî, erebî, tirkî û farisî hatine kirin. Zanyar li ser zar, rêziman, dîyalekt, zarava, şêwezar, devokên kurdî xebitîne û wan xebatên xwe çap kirine. Di van salên piştî 2010î de bi taybetî li Tirkîyeyê derdora akademîsyenên zanîngehan jî lêkolînên akademîk li ser gramer, dîyalektnasî û morfolojîya kurmancî, soranî, goranî û zazakî amade dikin û “lîteratur”eke baş derketîye meydanê. Bi tevî van xebatan hîn jî hin qadên zimannasîya kurdî li benda lêkolînê ne. Bi taybetî awayê dabeşkirina zimanê kurdî li dîyalekt, zarava, şêwezar û liqan, mijareke giran e û di vê biwarê de pêdivî bi “çexereke hevbeş” heye.

Bi awayê kronolojîk ji destpêkê heta roja me, lêkolînên ku li ser dîyalekt, devok, zar, zarava, şêwezar, gover û morfolojîya kurdî hatine kirin, li gor hed û derfetên ber dest di ber çavan re hatin derbaskirin. Di vê geryanê de çav “li cîyên vala” yên lêkolînên têkildarî zimannasîya kurdî, dîyalektolojîya kurdî, devoknasîya kurdî û bi taybetî devoknasîya kurmancî hat gerandin, hat mereqkirin bê ka gelo kîjan alîyê devoknasîya kurmancî di lîteratura lêkolînên zanistî de “kêm” maye. Piştî vê taqîkirinê, “pirsgirêk”a vê lêkolînê hat dîyarkirin:

Digel ku heta niha zimannas li ser morfolojîya kurmancî ya devoka Xerzan hindik xebitîne û piranîya wan ew wekî devokeke xweser a kurmancî nehesibandîye jî, axiverên kurmancî yên Xerzî, li gor zanista dîyalektolojîyê, xwedan taybetmendîyên wisa cîyawaz ên devokî ne ku mirov dikare bi hêsanî wê wekî devokeke serbixwe ya dîyalekta kurmancî li qelem bide. Bi qenaeta me, kurmancîya axiverên Xerzan, bi cîyawazîyên xwe yên fonetîk, fonolojîk û morfolojîk, mîna devoka Botan, devoka Badînan û devoka Torê, devokeke xweser e. Devoka Xerzan[1] di nav temamîya lêkolînên têkildarî devokên kurmancî de yan hindik cih girtîye û basa wê gelek kêm û lawaz maye. Lewre vê lêkolînê ev rewş wekî "pirsgirêk"ekê li qelem da û ew kir mijara lêkolîneke nû. Di vê lêkolînê de dê hewl bihê dayîn ku bersiva van pirsên jêrîn bihê dayîn: 1. Gelo bi navê DX devokeke kurmancî heye? 2. Gelo birra bi rastî jî ev devok, bi çîyên xwe devokeke xweser e? 3. Gelo alîyên dîrokî, cografî û morfolojî yên ku vê devokê ji devokên din ên kurmancî cîyawaz dikin çi ne?

## 2. Lîteratura Qadê

Di danasîn û nirxandina lîteratura vê qadê de li vir pêşî ew xebatên "lêkolînerên dinyayê" ku li çend alîyên dinyayê li ser dîyalekt û devokên kurdî hatine kirin û têkildarî vê lêkolînê ne, li gor rêza tarîxa wan dê bihên nirxandin, peyre jî ew xebatên ku "lêkolînerên kurd ew bi zimanê kurdî" li welêt an jî derveyî welêt kirine dê bihên destnîşankirin û nirxandin. Şeref Xan (943/1543-1010/1604) di *Şerefname*yê (1597) de behsa zimanê kurdî, devok û dîyalektên wî kirîye (Han 1971, 20). Herçendî kurmancîya Xerzan cîranê herêma wî ye jî, wî agadarîyek li serê nedaye. E. Çelebî (1611-1682) li ser dîyalekt û devokên zimanê kurdî, hin agadarî dide. Digel ku basa 12 cureyên zimanê kurdî dike û navên wan dide jî, navê "xerz"an tê de tuneye. G. Givrinli (1836) çend meqale li ser zimanê kurdî û etnografyaya wî belav kirîye û zimanê kurdî bi navê "kurdîya jorîn" û "kurdîya jêrîn" dabeşî du şaxan kirîye. Li gor wî "kurdîya jorîn", ji kurdîya mukrî, hekarî, şukakî û bayezîdî; kurdîya jêrîn ji lurr, gelhurr, lekî û goranî pêk dihê (Hewramanî 1981, 52). F. Dêtil (1847) bi xebata xwe ya *Sê Sal Gera Balkêş li Kurdistanê* ketîye ser şopa zimanê kurdî û ji Dîyarbekir, Ruha, Mêrdîn heta tixûbê Sûrîyeyê kurd zîyaret kirine û digihîje wê encamê ku hejmara dîyalektên kurdî zaf zêde ye (Marif 1989, 289).

P. Lerch (1858) di xebata xwe de, zimanê kurdî li ser şaxê zazakî, kurmancî, kelhurî, goranî û lûrî dabeşî pênc dîyalektan kirîye (Marif 1989, 255). A. Jaba (1858) lêkolînek amade kirîye û li ser dîyalektên kurdî agadarîyan dide. (Ciwan 1992, 19). E. Wilhelm (1883) di xebata xwe de li ser kurmancîya kurdên alîyê navbera Urmîye û Gola Wanê, çîyayên Zagrosê, bakurê Lorê, Goran, Erdelan, Beyazid, Erzurûm, Erzincan, Nisibe, Mardin, Urfa, Alagoz û Anîyê kûr bûye (Soane 1913, iv). E. Prym û A. Socin (1887) li ser dîyalektên kurdî agehî nivîsîye. (Marif 1989, 282). Ji navê wê dîyar dibe ku wan ji dîyalektên kurmancî cih daye bin-dîyalekta "Torê". Y. Zîyaeddîn Paşa (1893), di xebata xwe de agehî li ser dîyalektên kurdî dide. Li gor wî zimanê kurdî di nav zimanan de wisa ye ku herî zêde ji hev û din cîyawaz dibe (Meqdisî 2021, 106). Meqdîsî di ferhengê de navê "xerzan" jî rave kirîye. H. Makas (1926) li ser şêweyên kurdî, bi taybetî li ser devoka kurmancî ya êzîdîyên herêma Mêrdînê xebitîye û meqaleya xwe belav kirîye (Marif 1989, 277). Lêkolînerekî din ê ewrûpî ku bi taybetî li ser dîyalektên kurdî xebitîye J. Morgan e (1904). Wî di pirtûka xwe de yazdeh şêweyên kurdî hejmartine: mukrî, gerûsî,

[1] Ji vir bi şûn de li şûna Devoka Xerzan, dê kurteya wê DX bihê bikaranîn.

yezîdî, bayezîdî, sehneyî, kirmanşanî, hewramanî, rêjawî, silêmanî, lekî, xocewendî. (Marif 1989, 280).

E. B. Soane (1881-1923) li ser dîyalektên kurdî, bi taybetî li ser dîyalekta kurmancî meqale û pirtûk nivîsîne. Wî li ser ziman, dîyalekt, bin-dîyalekt û rêzimana kurdî lêkolîn kirine (Marif 1989, 284-285). L. O. Fossum (1919) di pirtûka xwe de dîyalekt û devokên kurdî dinikirîne û nexşeya atlasa wan" jî dide. M. M. Hilav (1918) di *Muqeddimetu'l-'Îrfan*a xwe de cihekî berfireh daye mijara dîyalekt û devokên kurdî. R. F. Jardine (1922) di pirtûka xwe behsa dîyalektên kurdî û cografyaya wan kirîye û hinek "atlas"a wan destnîşan kirîye. D. N. Mackenzie (1957) di pirtûkên xwe de cih daye dîyalektên kurmancîya xwarê; beşa duyem ji bo dîyalekta kurmancîya jorê veqetandîye. (Marif 1989, 275-276). C. Bedir-Xan û R. Lescot di xebata xwe de li ser navê bêjeya Xerzan sekinîne û ew wê wekî "devokeke kurmancî" bi nav dikin. Di vê xebatê de ev amajepêkirina wan bi vê devokê, bû hokareke gewre ji bo halanê. Z. Gökalp (1975) jî di xebata xwe ya sala 1922yan de cihekî berfireh dide şax, dîyalekt, devok û şêweyên zimanê kurdî. Tiştê ku heye wî behsa KX nekirîye. Q. Kurdo (1978) di xebata xwe de li ser gramera dîyalektî ya kurmancî û soranî kûr bûye (Marif 1989, 248-249). M. Ciwan (1992) jî di qada dîyalektnasîya kurdî de xebitîye. Wî qenaeta xwe li ser atlasa devok û dîyalektên kurdî derbirîye (Ciwan 1992, 26-29). K. Yıldırım (2012) di pirtûka xwe de dabeşkirina dîyalektên kurdî li gor rêbaza C. Nebez dike (Yıldırım 2012, 25).

Piştî ku di vê biwarê de em ketin nav lêgerînên xebatên bi zimanên derî kurdî, hat dîtin ku ev sê devokên mijara xebatê, ji hêla morfolojîyê ve xwedan taybetmendîyên cîyawaz in û hêjayî lêkolînê ne. Bi vî awayî mirov dibîne ku lêkolînerên dinyayê, -Şeref Xan, E. Çelebî û Garzonî ne tê de-, ji serê sedsala 19an ve dest pê kirîye, heta nêzî dawîya sedsala 20î berdewam kirîye û li ser dîyalekt û devokên kurdî xebitîne û wan xebatên xwe li payîtextên welatê xwe, bi zimanê xwe çap kirine. Ji van xebatan hinek jê gihaştine ber destê me; lêbelê hinek jê hîn negihaştine. Encama ku ji xebatên wan derdikeve lêkolînên wan bi piranî li ser dîyalekta kurmacnîya xwarê (soranî) ne; kurmancîya jorê kêm maye. Lewra wan nekarîye bi awayekî berfireh devokên dîyalekta kurmancî polîn bikin.

Gava mirov di pey xebatên lêkolînerên dinyayê de berê bala xwe dide "xebatên ku bi kurdî li welat û derveyî welêt" hatine kirin dibîne ku raborîya wan jî mîna raborîya xebatên ku bi destê lêkolînerên ewrûpî û rûsî hatine kirin diçe digihîje nîvê duyem ê sedsala 19an. M. M. Bazidî (1797-1867), zimanê kurdî li ser çar zaravayan dabeş dike (Bazidî, Cami'eya Risaleyan û Hik, (Amadekar: Z. Avci) 2010, 15-19). Di vê xebatê de ji awayê dabeşkirina wî dê sûd bihê wergirtin. Dîroknasê tarîxa kurdan M. E. Zekî (1880-1948) di pirtûka xwe ya *Xulaseyekî Tarîxî Kurd û Kurdistan*ê C. I (1931) de li ser zimanê kurdî û dîyalektên wî kûr bûye (Beg 2018, 288-289). Meyla vî lêkolînerî li ser awayê dabeşkirina Ş. Xan e. T. Wehbî (1940) meqaleyek belav kirîye û di pey neqilkirina nêrînên Şeref Xan ên têkildarî dîyalektên kurdî, dor diêne ser nêrîna xwe û dîyar dike ku bêjeya "kurmanc" hemî kurdên beşa mezin digire bin banê xwe û ji beyta Xanî sûd werdigire ku ew çawa bêjeya "kurmanc" bi bêjeya "kurd" re di heman wateyê de bi kar diêne. (Amêdî 2012, 27-30). Ji xebata wî dîyar e ku Wehbî, di dabeşkirina dîyalektên kurdî de daye ser rêça M. Soane (Ciwan 1992, 21).

M. Xamo (1965) lêkolînek li ser fonetîk, morfolojî û sentaksa vê dîyalektê kirîye (Marif 1989, 258). E. C. Paşa (1972) li ser dîyalektên kurdî kûr bûye û dîyar kirîye digel ku gelek zêde dîyalektên kurdî hene jî, wî tenê "kurmancî, soranî û zazakî" wekî dîyalektên eslî li qelem dane

û hewl daye ku bi referansên dîrokî qenaeta xwe bipeyîtîne (E. C. Paşa 1995, 18). K. Fuad (1368) kurdîya kurmancî bi "kurdîya rojava" bi nav kirîye û wî ew li ser "devokên sereke" û "şêwe"yên mîna efrînî, cizîrî-botanî, sincarî, badînî, hekarî û şikakî dabeş kirine (Ciwan 1992, 21). F. H. Xurşîd di pirtûka xwe de cihekî berfireh dide devok û dîyalektên kurmancî (Hurşîd 1985, 40). Li gor wî dîyalekta kurmancî ya "bakur", ji şêweya beyazidî, hekkarî, botanî, şemdînanî, behdînanî pêk dihê. S. B. Amêdî (1987) bi vê xebata xwe bi awayekî gelek berfireh li ser devok, şêwe û dîyalektên zimanê kurdî kûr bûye. Ew piştî ku sernavekî ji bo "egerên parvebûna zimanê kurdî li zar û dîyalektan" datîne û vê dinikirîne, dor diêne ser kurmancî û soranî û wan wekî du dîyalektên bingehîn ên zimanê kurdî li qelem dide (Amêdî 2012, 41): kurmancîya jorî (kurmancî) û kurmancîya jêrî (soranî). Li gor M. R. Izady zimanê kurdî di destpêkê de dabeşî şaxê "kurmancî û "pehlewanî" dibe. Kurmancî jî di nav xwe de dabeşî "kurmancîya bakur (badînan)" û "kurmancîya başûr (soranî)" dibe. Kurmancîya başûr li ser "soranî" û "kelhûrî" dabeş dibe (Izady 2007, 301). Pêdivî heye bi dîyarkirinê ku Izady jî li ser çexera T. Wehbî dabeşkirina dîyalektan kirîye. Z. Haco teblîxek li ser dîyalektên kurdî pêşkêş kirîye û wî di vê xebatê de cihekî gewre daye devokên kurmancî.

Meyla S. Tan (2015) di dabeşkirina zaravayên kurdî de li ser wê yekê ye ku zimanê kurdî li ser awayê kurmancîya jorîn, kurmancîya jêrîn, goranî û kirmanckî bihê dabeşkirin (Tan, Rêzimana Kurmancî 2015, 28-29). Z. Açar (2015), piştî ku awayê dabeşkirina zimanê kurdî ya li dîyalektan ji Şeref Xan neqil dike, cih dide rêbaza C. Nebez û ku K. Yıldırım jî dabû ser çexera wî. Husein Muhammed (2015) bi navê "Parvekirina Devokên Kurmancî" meqaleyek belav kirîye. Wî bi tevî nexşeyê devok û dîyalektan, cîyawazîyên fonetîk ên devokan jî tesbît kirine (Muhammed 2015). Ew jî li gor rêbaza T. Wehbî çûye. S. Akın di xebata xwe ya bi navê *Lêkolînên Zimannasîya Kurdî* de cih daye DX û bi taybetî li ser zayenda navdêrên axiverên kurmancî ya Hezzoyê ku di nav tixûbên vê devokê de dimîne kûr bûye. Ew jî di wê qenaetê de ye ku kurmancîya Hezzoyê, divê wekî devokeke xweser a kurmancî ya bi navê "xerzî" bihê hesibîn (Akin 2013, 114). A. Kırkan (2019) û M. Yonat (2019) jî di tezên xwe yên doktorayê de cihekî berfireh didin devok û dîyalektên kurdî. Meqaleyeke A. Yıldız ser DX hatîye weşandin (Yıldız 2019, 260). Z. Açar di teza xwe ya doktorayê de dor diêne ser wê yekê ku lêkolîna Haig û Öpengin a li ser devok û dîyalektên kurdî maqûl e (Açar 2019, 25). A. Ç. Jiyan (2020) di meqaleya xwe ya "Devoka Gurdilan (Xerzan, Sêrt)" de dîyar kirîye ku li Misirc û herêma Xerzan, "kurmancîya Xerzan" li kêleka dimilî, devokên kurmancî torî û botî, wekî "devoka xerzî" dihê axaftin (Jiyan 2020, 1).

Çawa ku ji van xebat û lêkolînên bi kurdî dîyar dibe, piranîya wan zimanê kurdî li ser awayê kurdîya bakur, kurdîya başûr-naverast û kurdîya rojava dabeşî devok û dîyalektan kirine. Giranîya meyla lêkolîneran, ji zimanasên berê li ser Sonae û T. Wehbî ye; ji yên nû jî li ser awayê dabeşkirina Haig û Öpengin e.

### 3. Armanc

DX ku wekî mijara vê lêkolînê hatîye hilbijartin, di nav devokên dîyalekta kurmancî de xwedî hin taybetiyên cîyawaz e. Di vê xebatê de armanc ew e ku digel hin taybetiyên wê yên morfolojîk, di nav devokan de cihê wê yê cografî bihê tesbîtkirin. Bi tevî vê, nîyet pê ew e ku dirûvdarîya binyad û kêşana lêkerên kurmancî yên vê devokê bihê tesbîtkirin û bi vî awayî mirov pê serwext bibin bê ka gelo cîyawazîyên morfolojîk ên vê devokê, li pêşberî morfolojîya standard a kurmancî çawa ye.

**4. Sedemê Hilbijartina Mijarê**

Zimanê kurdî, mîna zimanên piranîya gelên dinyayê, bi dîyalekt û devokên xwe xwedî kaneke dewlemend e. Heta niha hindek ji lêkolînerên dinyayê bi zimanên mîna farisî, tirkîya osmanî, îngilîzî, erebî û rûsî çend lêkolîn li ser dîyalekt û devokên kurdî amade kirine; çi heye ku piranîya wan di nav devokên kurmancî de bi awayê taybet cih nedaye DX. Lewre ev sersedemê ewil e ku ev xebat, ji devokên dîyalekta kurmancî, li ser DX be. DX a kurmancî ku li gor tradîsyona dabeşkirina devokên kurmancî, heta niha kêm caran hatîye hilbijartin, li gor ku ji lêkolîna sehayî hat famkirin, Herçiqas di navbera devoka Başûr û devoka Bakûr de cih digire jî di xebatên têkildarî qada dîyalektnasî û devoknasîya kurdî de behsa wê nahête kirin. Ev sedemê duyem e ku ev xebat dihê kirin. Di serdema me de di bin banê zanîngehên Tirkîyeyê de li ser devokên mîna devoka Torê û Botan çend tezên cîya cîya yên masterê hatine amadekirin. Li ser vê şopê, nîyet pê ew e ku ev devok jî bikeve nav mijarên lêkolînên kurmancî, da ku cîyawazîya wê tesbît bibe û cîyê wê digel nexşeya wê ya atlasî di qada zimannasîya kurdî de bihê destnîşankirin.

**5. Giringîya Mijarê**

Gelek taybetîyên devokên kurmancî, ji ber multî-medyayê bi domana demê re hatine ber wendabûnê. Çawa ku taybetîyên cîyawaz ên her yek dîyalekteke zimanekî, ji bo wî zimanî giring in, helbet taybetîyên her yek devokeke wî zimanî jî giring in. Heger em îro wan taybetîyan qeyd nekin û li ser wan nexebitin, piştî demekê êdî nema ku em bikaribin xwe bigihînin resenîya wan. Cihêrengîya devokan, cihêrengîya dîyalektan; cihêrengîya dîyalektan jî, cihêrengîya zimanan diparêze. Ev xebat jî hewldaneke bi vî awayî ye ku milê xwe dide ber parastina cîyawazîyên devokeke dîyalekta kurmancî. Em dikarin li ser vê rewşê dîyar bikin ku xebatên li ser devokên kurmancî kêm in; lewre pêdivîyeke gelek mezin e ku lêkolînên li ser wan bihên kirin; lewra me jî ev mijar neqand. Bi taybetî jî xebatên akamdemîk ên li ser DX, heta niha ne di asta lîsansa bilind de hatine kirin, ne jî di asta doktorayê de.

**6. Tixûbên Mijara Lêkolînê**

Em dê hewil bidin ku taybetmendîyên cografî û morfolojîk ên DX, tesbît bikin û bibînin bê ka teşeyên wê yên ji devokên din kurmancî cîyawaz çi ne. Zayend di îzafeyên axiverên vê devokê de çawa ye, morfolojîya wê ya kêşanî, bi çi awayî ji devokên din ên kurmancî cihê dibe, ev dê bibin mijara lêkolîna me. Piştî van tixûbdarkirinan me di warê materyalên xwe yên xebatê de jî hudûdek dîyar kir. Em dê hemû deverên ku axiverên kurmancî yên DX lê dijîn nedin ber xwe; bes tenê em li ser kurmancîya navçeya Hezo û Hawêl û gundewarên derdora Kurtalanê kûr bibin.

**7. Rêbaz**

Piştî pêdaçûna bi lîtaratura qadê re, dê cîyê DX di nav devokên kurmancî de bihê tesbîtkirin. Çawa ku ji çavkanîyên zindî, ji “kes”ên çavkanî ku wekî “çavkanîyên devkî” jî dihên zanîn agadarîyên têkildarî mijara lêkolînê ji populasyona qadê dê bihên berhevkirin, ji çavkanîyên nivîskî jî dê agadarî bihên berhevkirin. Ji bo ku hîpoteza xebatê bihê peyîtandin, ji axiverên vê devokê metnên edebîyata devkî ya gel dê bihên berhevkirin û wekî dane li ser wan taqîkirin bihê kirin. Li ser bingeha van metnên devkî, cîyawazîyên devokî yên vê devokê, dê bi devoka standart a kurmancîya nivîskî re bihê berawirdkirin û analîzkirin.

Ji ber ku keresteyên vê xebatê, metnên devkî yên axiverên zindî yên vê deverê ne û materyal ji qada vê deverê dê bihên berhevkirin, têkildarîya vê lêkolînê ji şax û teorîyên zimannasîyê, bi "zimannasîya wesfî" re li ser bingeha rêbaza dîyakronîk heye. Ji bo ku mijar, armanc, giringî, rêbaz, tixûb û hîpoteza vê xebatê hêsantir bihe têgihaştin, wekî agadarîyên paşxaneya mijarê, dê term û têgehên zimannasî yên mîna dîyalekt, devok û atlasa devokan bi kurtebêjî bihên danasîn. Ji ber ku li ber destê me metnên zemanê berê, ku bi vê devokê hatibin nivîsîn tunene, me ne metoda dîyakronîk; bes "metoda zimannasî ya senkronîk" (synchronic linguistics) şopand ku ji vê metodê re "zimanzanîya şayesî" jî dihê gotin. Ev rêbaz palê xwe dide zimannasîya binyadparêz (structural linguistics). Li gor vê rêbazê lêkolîn, li ser sîstem û binyada ziman dihê kirin û lêkolîner, li ser têkilîya navbera yekeyên zimanî kûr dibe. Herçiqas me di lêkolîna xwe de rêbaza senkronîk bingeh girtibe jî; dîsa di pêvajoya lêkolînê de me, ji xebatên ku bi metoda zimannasîya dîrokî (historical linguistics) hatine kirin jî mifa wergirt. Ji ber ku xebatên etîmolojîk bi rêbazên zimanzanîya dîrokî dihên kirin, pêdivîya me bi etîmolojîyê re jî çê bû. Herwiha di vê lêkolîna xwe de me sîstema zimannasîya wesfî/şayesî meşand. Di vê rêbazê de dijberî sîstema "zimannasîya qayîdeparêz", zimanê îro di çi rewşê de be, tenê li ser binyad û teşeyê wê disekine û giringîyê dide peywendê. Li gor vê sîstemê ziman tenê ne ji binyadê ne jî ji wateyê pêk dihê. Çunkî zimannasîya wesfî (discriptive linguistics), ev şaxê zanista zimanî ye ku bayexî bi şîkirin, şayesandin û pêşandana şêwe û çawanîya karkirina zimanî dide ku ji alîyê civaka gelekî ve dihê bikaranîn. (Emîn, 2009: 157).

Vê xebatê ji desenên/şêwazên xebatê yên "rêbaza kalîtatîf" modela "xebata rewşî (case study)" ku yek ji hêmanên bingehîn ên dîzayna "pêdeçûn"ê ye ji xwe re mînak girtîye.[*]Şêwaza pêdaçûnê" ew cureyê xebatê ye ku lêkolerek, ji nav "unîversa"yeke (ing. universa, tr. evren) dîyarkirî, hin nimûneyan hildibijêre, li ser wan dixebite û li ser meyla giştî ya wê unîversaya dîyarkirî nêrînên xwe dişayesêne (Aldatmaz 2021, 126). Lêkolîner rewşek an çend rewşan (barûdoxan) dide ber xwe û lêkolîneke berfireh li serê dike. Ew di lêkolîna xwe de digel analîza hemû faktorên karîger û hemû alîyên giring ên wê rewşê vedikole (Fezulla 2016, 42). Zanyar ji bo xebatên rewşê modela "pêdaçûna rûdanmînak" (tr. örnekolay tarama modeli) jî dibêjin. Di awayê vê xebatê de lêkoler unîteyeke dîyar a mîna ferd, malbat, dibistan, komele û mîna van ji unîverseya xebatê digel hundir û têkildarîya wê ya bi derdora wê re vedikole û hewl dide ku wê bi van alîyên wê taqî bike û bide naskirin. Lewre zanyar ji bo wê "xebata monografî û rûdanê" jî dibêjin (Karasar 2022, 119). Li gor modela vê lêkolînê (er. dirasetu'l-haleti) lêkolîner li pey wê armancê ne ku geşepêdana kesekî yan dezgayekê bi awayê analîzîya giştîkir bikole (Meczûb 2007, 15).

## 8. Termên Têkildarî Mijarê

### 8.1. Zar û Ziman

Bêjeya "zar" li gor ferhengên soranî bi awayekî; li gor ên kurmancî bi awayekî din hatîye ravekirin. Bêjeya "zar" li gor ferhengên soranî çawa ku dihê wateya "dev", wisa jî navê her yek cureyên "ziman"î ye ku bi bêje, rêziman û rawêj (şîret), ji liqeyên din ên wî zimanî cîya dibe û dabeşî çend "şêwezar"î dibe. Mîna "zarê kurmancî". Wekî din bi wateya "qise" û "gotin"ê jî dihê bikaranîn. Mîna "zarê şirîn" (Senendecî, Peşabadî ve Kerîmanî 1397, 1386). Li gor

[*] Bêjeya "pêdaçûn"ê ku li pêşberî "review"a ingilîzî û "tarama"ya tirkî ye, ji bo vê xebatê ji kurdîya soranî hat wergirtin.

ferhengên kurmancî “zar” bi wateya “ziman, şêwe û dîyalekt”ê (Îzolî 2013, 658), “devok, şêwe” ye (Farqînî 2000, 1081). Bêjeya “zar”, di wateya “şiklê bikaranîna ziman” û “cureyên zimanî/language variety” de dihê bikaranîn. Bêjeya “şêwezar” ji bo *language variety*ê, “komezar” ji bo *sosyolekt*ê, “yekezar” ji bo *îdyolekt*ê û “duzarî” ji bo *diglossia*yê dihê bikaranîn (Açar 2019, 11).

**8.2. Zarava û Dîyalekt**

Bêjeya “zarawa” di soranî de bi teşeyê “zarav” û “zarawe” hatîye qeydkirin (Mukriyanî 1999, 517) û dihê wateya çawanîya bilêvkirin û gotina bêjeyên zimanekî bi şêwaza axaftina zimanekî din. Wekî mînak dibêjin “Ew kurdî, bi zarawayê farisî qise dike.” Îca bêjeya “zaraw” bi wateya şêweya qisekirinê dihê bikaranîn (Senendecî, Peşabadî ve Kerîmanî 1397, 1386). Wekî din li pêşberî bêjeya “zarawe” bi zimanê îngilîzî bêjeya “terminolgy” û “glossary” (ferheng) hatîye nivîsîn (Qezaz 2000, 315). Dîyalekt (dialect) zaravayekî latînî ye. Piranîya neteweyên cîhanê di zimanê xwe de wê bi kar diênin. Di zimanekî de ji dîyalektê biçûktir, “sub dialect” yaxud “semi dialect” heye ku bi zimanê erebî jê re “lehçe” dibêjin. Zimanzanên ereb, di zimanê xwe de ji bo wan ji dîyalektê biçûktir, “tehte lehçe” (bin zarava) yaxud “şibih lehçe” (dirûvdarê zarava) dibêjin. Zanyarên zimanê kurdî di vê biwarê de ji bo bêjeya “dîyalekt”ê, bêjeyên mîna “zar, zarava, zarawa, zarave, şêwe” bi kar diênin; ji bo zimanên bin dîyalektê jî, bêjeyên mîna “liq û beş” (Ezîz 2018, 1).

**8.3. Devok û Aksan**

Li gor ferhengê “devok” ji bo “şive”ya ku zimannas di zimanê tirkî de bi kar diênin hatîye watedarkirin (Îzolî 2013, 161). Devok, wekî şaxeke ji zaravayê zimanekî dihê hesibandin ku bi cîyawazîya telefûzê derdikeve pêş (Açar 2019, 23). Di zimanê tirkî de jê re “ağız” dihê gotin. Îca “ağız” di zimannasîya tirkî de ji wan şaxên axaftinê re dihê gotin ku di zimanê axaftinê de ji hev cîyawaz dibin. Devok navê wî awayê zimanekî yaxud dîyalektekê ye ku li herêmên biçûktir xelk pê diaxive û li gor zimanê nivîsê ji hev cihêrengî dibin (Z. K. Kıran 2018, 134).

Bêjeya “aksan” ji bêjeya latînî “accent”ê hatîye û navê awayekî axaftina komeke ji axiverên zimanekî ye. Di vî awayî axaftinê de qiseker bi hin cudahîyên civakî û herêmî yên axaftina xwe, ji yên din cuda dibin. Ev cudatîya telefûzî, bi domana demê re di nav axiverên zimanekî de çê dibin ku ji hêla cografî ve hinek dûrî hev dimînin (Açar 2019, 26). Di nav zimanekî de devok, ew awayê axaftina herêmî ye û bi giştî û bi piranî, bi awayê devkî ye. Ev varyant, di dibistanan de nahê hînkirin; bes tenê di nav civînên dost û nasan de dihê bikaranîn (Demir, 2011: 12). Hudûdên devokên zimanekî, ji hêla cografî ve dhên zanîn. Ji bo her devokê, navê herêma wê ya cografî, yan jî navê eşîrên wê dihê danîn.

**8.4. Şêwe û Şêwezar**

Wekî têgeheke zimannasîyê bêjeya “şêwe” li gor ferhengê bi bêjeya “şîwe” re hemwate ye (Mukriyanî 1999, 658). “Şêwe” di termînolojîya zimannasîyê de bi awayê “şêwezar” dihê bikaranîn û dihê wateya “devok”ê (Senendecî, Peşabadî ve Kerîmanî 1397, 1793). Digel vê di soranî de li pêşberî bêjeya “şêwe” bi zimanê îngilîzî bêjeyên mîna “method, way, procedure, manner û mode” hatîye qeydkirin (Qezaz 2000, 389). Elî Rexzade gava kurdî li gor awayê axaftina axiveran û cografyaya wan polîn dike, serê pêşî li şûna bêjeya “dîyalekt”ê têgeha

“şaxe” bi kar diêne, peyre ji bo awayên bin şaxeyan têgeha “zarawe” peyre têgeha “binzarawe” bi kar diêne (Rexzadî 1389, 13).

Bêjeya “şêwezar”, di rêzimanîyê de ji bo derbirîna hêla cografî yaxud sosyalî ya axiverên zimanekî dihê bikaranîn. Li pêşberî bêjeya “şêwezar” mirov dikane bêjeyên mîna “variation”, “dialect variation”, an jî “language variety” bi kar biêne. Çunkî ev têgeh, ji bo şikil û şêweyên axaftina kes û komên civakî dihên bikaranîn (Açar 2019, 18). Şêwe/şîwe, nêzî wateya “accent”ê ye. Wekî ji devoka Botan, şîweya Cizîrê. Wisa xuya dibe ku ev têgeh dê bi vê wateyê, di xebatên têkildarî devok û dîyalektên kurdî de cih bigire.

**8.5. Zimanê Ferdî**

Her mirovek di warê axaftinê de xwedî hin cîyawazîyên şexsî ye. Mirovek li gor rewş û mercên herêm, pîşe, derdor, temen, zayend û qanûnên fêrkarîya xwe û mercên jîyana xwe, bi awayekî zimanê xwe diaxive. Lewra mumkin e ku zimanê her yek mirovekî ji yê din cihêrengî dibe. Ji ber vê zanyar ji vî zimanî re “idiolekt” ango “zimanê şexsî” dibêjin (Z. K. Kıran 2018, 135).

**8.6. Devoka Bingeh (Subdialect)**

Zimanê îstîqrarkirî, yaxud giştîya (temamîya) wan teşe û awayên axaftina ferdan e ku di heman dîyalektekê de axiverên wê pê ji hev û din tê digihêjin. Wekî mînak axiverên devoka Kutahya, Rize û Newşehîrê heye jî, axiverên van hemû devokan, li gor devoka Stenbolê ku ji bo zimanê tirkî wekî devoka biîstîqrar hatîye neqandin digihîjin hev (İmer, Kocaman ve Özsoy 2011, 19).

**9. Dîyalekt û Devokên Kurdî**

Şeref Xan (1543-1604) dîyar dike ku civak û eşîrên kurd ji alîyê ziman, kevneşopî û rewşa xwe ya sosyalî ve dabeşî çar şaxên mezin dibin; zimanê wan jî, ji çar şaxên bingehîn pêk dihê. Şaxê yekem kurmancî ye, yê duyem lûr, ê sêyem kelhûr û ê çarem goran e (Han 1971, 20). Li gor ku E. Çelebî (1611-1682) ji dîroknas Meqdîsî radigihîne: “Piştî Tûfana Nuh, bajarê ewil ku hatîye avakirin, Cûdî ye, piştra Keleha Sencer û Keleha Meyafariqînê hatîye avakirin. Xwedîyê bajarê Cûdîyê, ji ummeta Hz. Nûh Melîk Kurdim e. Ew (…) li dîyarên Kurdistanê gerîyaye û hatîye Meyafariqînê, (…) li wir bi cih bûye. (…) bi zimanekî ku ji zimanê ibrî û ji zimanê ecemî cîyawaz e axivîye. Ev ziman ne ibrî, ne erebî, ne ecemî ne jî zimanê durî ye. Îro jî jê re dibêjin zimanê kurdî. Ev zimanê kurdî îro jî li van dîyaran dihê bikaranîn. Lêbelê 12 cure zimanên kurdî hene û gelek bêje û dîyalektên wan ku naşibihin hev û din (…). Serîyekî Kurdistanê ji bakur, ji dîyarê Erzurûm, Wan, dîyarê Hekkarî, Cizîr, Îmadîye, Mûsul, Şehrezor, Herîr, Ardelan, Bexdad, Derne, heta Derteng yaxud heta Besrayê, heftê qonax Kurdistan û Sinkistan dihê hesibandin. (…) Li vê dera ku di nav çîya û beldeyên ku di nav dîyarê Iraq û Benîosmanîyan de ye şeş hezar eşîrên kurd û qebîleyên wan hene. (…) Îca firehîya Kurdistanê, mîna dirêjahîya wê ne fireh e. Li hêla rojhilat, ji Herîr û Erdelana li hudûdê Îranê heta axa Heleb û Şamê bîst – bîst û pênc qonax, a herî hindik, bi qasî mesafeya panzdeh qonaxan e. (…) Li vir milet bi zimanên curbicur diaxivin. Ew jî zimanê zazayî, lûlû, zimanê Culoya Hekkarî, zimanê ewnikî, zimanê mehmûdî, zimanê şêrwanî, zimanê cizrewî, zimanê pesanî, zimanê sincarî, zimanê herîrî, zimanê ardelanî, zimanê soranî, zimanê xalttî, zimanê cekwanî, zimanê îmadî, û zimanê rozikî ye û fesîhtirê van heye” (Derwîş 1314, 473-474). Geryar, di pey van agadarîyan

de hin hejmar û risteyên kurmancî wergerandine tirkî. Li vir hejmara kurdîyên ku Çelebî navên wan dide, ne “duwazdeh” bes gihaştîye “panzdeh”an.

F. Dêtil di serdema desthilatdarîya osmanîyan de li cografyaya kurmancîaxivan gerîyaye û li ser devokên kurmancî xebitîye. Wî di meqaleya xwe de tesbîtên li ser dîyalektên kurdî yên li Mêrdîn, Dîyarbekir, Nisêbîn, Ruha/Urfa û navçeyên van bajaran nivîsîne. Ew di vê lêgerîn û lêkolîna xwe de gihaştîye wê qenaetê ku hejmara dîyalektên kurdî yên di bin desthilatdarîya Dewleta Osmanî de zaf zêde ye. (Marif 1989, 239-240). Dêtil ji bo ku vê lêkolîna xwe bibe serî, di nav sê sed hozên kurdan de geryan kirîye (Kurdo 2013, 19).

Li gor M. M. Bazidî (1797-1867) “Zaravaya ewil zaravaya rawendî (Çeldêran, Qers, Bayezid, Mûş, Bedlîs, Wan, Xarpût, Diyarbekir, Mêrdîn, Erzirûm û derdora Yerîvanê), ya duyem zaravaya Hekarî (Mehmûdî, Şêrwanî, Botanî, Hêzanî, Muksî, Sipayêrtî, Şinoyî, Somayî, Biradostî, Şemdînanî û Bikartî), zaravaya sêyem zaravaya Silêmanî (Baban, Bilbas, Zerzan, Şukrîyan, Şehrezor) û zaravaya çarem zaravaya zazayî ye. Ev zarava jî kurdî ye. Ji ‘êla Duçik re dibêjin ‘Êla Zaza. Axiverên wê li Tercan (bi Erzirûmê ve girêdayî ye), Dêrsim heta Çîyayê Acî rûdinin. Ev zarava ji yên din gelek dûr bûye. Tu eşîrên din wisa li tevahîya Kurdistanê nînin. Ew bi zaravaya hekarî dinivîsin; lê bi zaravaya xwe dipeyivin û di peyîvîna xwe de ji hemû zaravayên din ên kurdî werdigirin. Ev zarava çiqas cude be jî, ji zimanê kurdî cuda nabe. Çendî ku ev zarava ji hev cuda ne jî, nûnerên tayîfeên cuda dikarin her yek bi zaravaya xwe bipeyivin û ji hev fam bikin. Çunkî bingeha van zaravayan yek e: nan, av, herin, werin, patin, standin û gelek gotinên wan ên mayî jî wekî hev in û ji rehekê ne. Loma ferqa van çar zaravayan ji hev tenê di ferqa nav peyvan de xwanê dike. Lêbelê zimanê ‘êla Baban gelek ji zimanê zazayan dûr e” (Bazidî, 2010: 19).

Li gor Hilavî kurdî dabeşî van dîyalektan dibe: “1. Hewramî, axiverên wê di navbera Silêmanî û Sineyê de niştecih in, 2) Zazakî, axiverên wê li Azerbaycan, Erzerom, Xarpêt, Diyarbekir û beşeke Bedlîsê niştecih in, 3) Feylî, piranîya axiverên wê li Îranê û hinek jî li Kerkûkê dijîn, 4) Bilbasî, axiverên wê bi piranî li Azerbaycana Îranê, li Savcbulak û hinek li Mûsulê niştecih in, 5) Kurdî, li Sine, Mûsul û Bexdadê axiverên wê hene û 6) Kurmancî, axiverên wê bajarê Wan, Bedlîs, Erzerom, Diyarbekir, Sêwas, Ankara, Konya û Helebê hene. Wekî din li herêmên Azerbaycana Îranê, Kavkas û Sûrîyeyê axiverên wê hene. Di pey feylîyan de para herî pir a kurdan kurmanc in” (Mihrî 1918, 116-117). Kurdîya mukrî, bradost, şîkak û Mardîn dîyalektên kurdî ne û zazakî jî dîyalekteke kurdî ye û li alîyê bakur dimîne. Axiverên dîyalekta zazayî li bakûrê Kurdistanê; kurmancîaxiv li başûr û navenda Kurdistanê û axiverên dîyalekta lûr û kelhûr li başûrê wê dijîn. Axiverên zazayî ji dîyalekta kurmancî tê digihên (Fossum 1919, 8).

Li gor Z. Gökalp zimanê kurdî, digel bextîyarî (lûrî, feylî û lekî), kelhurî, kurmancî, zazakî (goranî-dunbulî) û soranî (baban, kehûr) şeş zimanên serbixwe ne. Her yek ji van zimanan ji hev fam nakin. Ji hêla rêzimanî, ristesazî û bêjeyan ve di navbera wan de ferqên mezin hene. Lewra her yek ji wan zimanekî serbixwe ye û ji lehçeyên cîyawaz pêk hatine. Digel vê, ev çar ziman/lîsan, bi temamî ji hev re bîyanî ne. Hemû ji yek kurdîyekê hatine ku ew jî, “kurdîya qedîm/berê” ye. Çawa ku di navbera zimanên Neo-Latîn û latînî de peywendî heye, di navbera kurdîya qedîm û van kurdîyên nû de jî ew peywendî hene. Gokalp dîyalekta kurmancî ji beyta Xanî ya “Bohtî û Mehmedî û Silîvî / Hin la‘l û hinek ji zêr û zîvî” sûd

werdigire û dîyar dike ku kurmancîya li ser devoka botan, mehmedî û silîvî dabeşî devokan dibe (Gökalp 2009, 30-31).

Li gor dabeşkirineke din "kurmancî" dabeşî van "devokên sereke" dibe (Ciwan 1992, 26-29):

"a. Kurmancîya Rojava: Atlasa axiverên vê devokê ji herêma Efrînê dest pê dike, heta Enteb, Kirikxan, Mereş, Adiyaman, Meletî, Ruha, suruç, Birecîk û Xelfetîyê dewam dike.

b. Rewendî: Cografyaya axiverên wê ji bakurê Gola Wanê dest pê dike, heta herêma Şikak, Çemê Aras, Qers, Agirî, Erzurûm, Wan, Mûş û Erzincanê dewam dike.

c. Şikakî: Kurmancên herêma Gola Ûrmîye, Şemdînan û Başqaleyê pê diaxivin.

ç. Hekarî: Kurmancên başûrê Şirnex û derdora Hekarîyê pê diaxivin.

d. Botî: Kurmancên Cizîrê, bakurê Zaxoyê, rojavayê Erûhê, herêmên rojhilat û başûrê Bidlîsê, li herêma Sêrtê, ji Çemê Batmanê heta rojhilatê Mêrdînê pê diaxivin.

e. Badînî: Kurmancên Zaxo, Amadîye, Akre, Zêbar û Dihokê pê diaxivin.

f. Sincarî: Kurmancên Çîyayê Sincarê û devera Şêxan pê diaxivin.

g. Kurmancîya naverast: Kurmancên derdora Dîyarbekir, derdorên rojavayê Mêrdînê, rojhilatê Çemê Ferêt û rojhilat û başûrê Elezîzê pê diaxivin."

Li gor dabeşkirineke din zimanê kurdî li dîyalektan û nexşeya wî ya cografî weha hatîye dîyarkirin (Xeznedar 2001, 37-39): "1. Kirmancî dabeşî du beşan dibe:

a. Kirmancîya Serû: Cografyaya wê ji bakurê ve: Yerîvan, Fars, Erzincan, Erzerom, Meletîye û Mereş heta Eskenderûnê ye. Cografyaya wê ji başûrê ve: Gola Wanê, bi dirêjahîya Zêya Gewre, Rûbarê Dicleyê.

b. Kirmancîya Xwarê: Cografyaya wê ji bakurê ve: Gola Wanê, bi dirêjahîya Zêyê Gewre, Rûbarê Dicleyê. Cografyaya wê ji başûrê ve: Xaneqîn û Rûbarê Dicleyê.

2. Lurî: Cografyaya wê ji bakurê ve: Sultanabad, Dewletabad, Kirmaşan, Xaneqîn û Rûbarê Dicleyê. Cografyaya wê ji başûrê ve: Şîraz, Kazerûne, ta nêzîkî Kendawê.

3. Goranî: Ji xeta Sine-Kirmaşan ber bi rojava, ji hindek gundên nêzîkî tixûbê Iraqê û Îranê werdigire.

4. Zazayî: Ji hindek parçeyên bajarên Erzerûm, Xerpût, Bidlîs û Diyarbekirê pê dihê axaftin."

Xebatên dawî yên vê lîteraturê di wê qenaetê de ne ku ji bo her dîyalekteke kurdî, tabîra "zimanên kurdî" bihê bikaranîn maqûl e (Kırkan 2019, 47-52) û zimanê weha bihê dabeşkirin: "*i)* Kurdîya bakur, *ii)* Kurdîya naverast, *iii)* Kurdîya başûr, *iv)* Kurdîya goranî, *v)* Kurdîya zazakî ew kurdî li ser pêncan dabeş dike." Kırkanî ji awayê polînkirina berhema Refîq Şiwanî ya bi navê *Zimanî Kurdî û Şiwênî le Naw Zimanekanî Cihan da* sûd wergirtîye û bi vî awayî "devokên Kurdîya Bakur" û cografyaya wan li qelem daye: "Devoka serhedî li alîyê Qers, Agirî, Erzurûm, Mûş û Wanê; devoka şikakî li Urmîye, Yuksekova, Başqale û Şemdînanê; devoka hekarî li bajarê Hekarîyê û derdora wê; devoka botanî, li Cizîr, Şirnex, Eruh, Bidlîs, Sêrt, Batman û Mêrdînê; devoka behdînî li Zaxo, Amêdîye, Akrê, Zêbar û Dihokê; devoka sincarî li Çîyayê Sincar û devera Şêxanê; devoka bayezîdî li derdora bajarê Bazidê; devoka silîvî/kîkî-milî li derdora Dîyarbekir, Elezîz, Mêrdîn û alîyê rojhilatê Firatê gel pê diaxive. Wisa dîyar e ku ev lêkolîner di vê xebata xwe de meyla xwe qenaeta xwe dide ser polînkirina zar, devok û dîyalektên kurdî ya lêkolîner Hasanpourî."

Li gor zimannasên îranî dîyalektên zimanê kurdî û cografyaya wan weha ye (Rexzadî 1389, 13): “*i)* Şaxeyê Kirmancîya Bakur, *ii)* Şaxeyê Kirmancîya Başûr, *iii)* Şaxê Kirmanşanî-Lûrî, *iv)* Şaxeyê Goranî-Zazayî.

Zimanê kurdî → Şaxeyê kirmancîya başûr → Zarawayê mukrî → Binzaraweyê mehabadî”

Ji ber ku dîyalekta kurmancî ya jorîn, bi cografya xwe berfirehtir e û bi şênîyên xwe ji dîyalektên din ên zimanê kurdî zaftir e, di dîyarkirina devokên wê de pirsgirêk heye û hîn jî bi awayekî tam û tekûz devokên wê nehatine dîyarkirin. S. Nawxoş û N. Xoşnaw (2010) li ser devokên kurmancîya Kurdistana Tirkîyeyê kûr bûne û wan jî hewl daye ku hejmara devokên wê, digel ên her deverên kurmancan li qelem bidin. Çi heye ji ber ku dûrî herêmê ne, wan tenê bajarên mîna Bazid, Wan, Colemêrg, Sêrt, Mûş, Mêrdîn, Dîyarbekir, Xerpût, Adiyaman (Semsûr), Xazîantep ku li rojhilatê Tirkîyeyê dimînin û bajarên mîna Mereş, Sêwas, başûrê Erzurûm û Qers ku li Rojavayê Tirkîyeyê dimînin, wekî cografyaya axiverên dîyalekta kurmancî li qelem dane. Bivê nevê divê mirov bipirse, ka bajarên mîna Meletî, Batman, Bingol, Bidlîs û Şirnexê? Heta axiverên çend bajarên Bakûrê Sûrîyeyê, li Ermenistan û Rûsyayê jî, dîsa axiverên kurmancî hene. Li gor wan devokên kurmancîyê ev in (Xoşnaw, 2010: 179):

“Bayezidî: Li bakûr û bakûrê rojhilatê zeryaçeya Wanê dikeve.

Hekarî: Li başûr û başûrê rojhilatê zeryaçeya Wanê dikeve.

Botanî: Dewrûberê dolê Botan û şarê Sêrt, Ertûş, Cizîr û Dîyarbekirê (Amedê).

Şemdînanî: Goşegeya başûrê rojhilatê Tirkîyeyê û rojhilatê zêya jorîn û navçeyên nêzîkî vê zêyê li hêla Îranê.

Badînanî: Bajarê Dihok, qezayên Amêdî Zêbar, Sincar, Şêxan, Akrê dgire nav xwe.

Beşa Rojava: Xerpût, Ûrfe/Ruha, Efrîn û Mereşê digire nav xwe.”

Gava mirov li van devokan dinihêre dibîne ku bi rastî gelek qels û lawaz e. Van lêkoleran tixûbên devoka Botan anîye ser Dîyarbekirê jî. Çi heye ku devoka Dîyarbekirê ne di bin banê devoka Botanî de ye. HX ku di navbera herêma Botan, Torê, Serhed û Mêrdînê de ye, bi cîyawazîyeke gir û qerase ji van devokên navbihurî giştcîya dibe.

Piştî van polînkirinan/tesnîfan, xebata Haig û Öpengin (2014) tê. Van lêkoleran, li gor delîlên linguîstîk, devokên dîyalekta kurmancî, bi nexeşeyekî dabeşî devokan kirine. Wan di xebata xwe ya bi navê *Regional Variation in Kurmanji: A Preliminary Classidfication of Dialects [Varyasyonên Herêmî di Kurmancî de: Pêşpolînkirineke Devokan]* de, navê devokan, li gor hêlên/alîyên rojhilatê başûr, başûr, bakûr, rojavayê başûr û rojavayê bakûr dîyar kirine (Yonat 2019, 13):

*“Devoka rojhilatê başûr:* Devoka Behdînî, Hekarî û Duhokê.

*Devoka başûr:* Devoka Mêrdîn, Batman, Dîyarbekir, Şirnex û Ruhayê. Ev devok li Hesekê jî tê axaftin.

*Devoka bakûr:* Devoka Serhedê ye. Ev devok li bajarên mîna Mûş, Erzirom, Agirî, Bidlîs, Bingol, Dîyarbekir û Wanê jî tê axaftin.

*Devoka rojavayê başûr:* Li hin cîyên Semsûr, Entab, Ruha û Helebê pê tê axaftin.

*Devoka rojavayê bakûr:* Axiverên herêma Mereş, Meletî û Sêwazê pê diaxivin.”

Li gor zimannasekî din ê başûrî dîyalektên zimanê kurdî ji kirmancî, lûrî, goranî û zazayî pêk tên. Dîyalekta kirmancî ji du “beş/zarav”an pêk dihê: kirmancîya xwarê û kirmancîya jorê. Ji bo her yek ji van du zaravan jî çend “liq” hene. Liqên kirmancîya xwarê: mukrî, mehabadî, soranî, hewlêrî, suleymanî û sineyî; liqên kirmancîya jorê: badînanî, botanî, aştîyanî, hekarî û

bayezîdî. Heger mirov liqa suleymanî di nav giştîya dîyalektên zimanê kurdî de tarîf bike, dê weha be (Ezîz 2018, 1):
“Zimanê kurdî → Dîyalekta kirmancî → Beşa kirmancîya xwarê → Liqê suleymanî”

**10. Dîrokçeya Devera Xerzan**

Li gor Diriver, qiralê hêzdar ê asûrîyan Tiglath Pileser, sala 1000î ya BZ. li çîyayên Azuyê (Hezoyê), li hember qewmekî bi navê “kurtie” şer kirîye û ev çîya jî, çîyayên navbera Hezo û Sasonê ne *(Zeki 1961, 39)*. Ev herêm ji çaxên antîk ve ketîye bin desthilatdarîya qewmên mîna urartî, med, pers û îskenderî. Di salên 332yê BZ. de selevkosan, di salên 129ê BZ. de partan, di salên 63yê PZ. de romayîyan ev der girtîye bin destê xwe û heta sedsala 5an romayî, bîzansî peyre sasanî bûne desthilatdar. Erebên muslim di sala 637an de li vir bûne hakim. Di serdema dewleta merwanîyan de di sedsala 10an de bajarê Erzen navendeke giring a dewletê bûye *(Cibo 2016, 27)*. Di pey merwanîyan de selçûqî hatine herêmê.

Hukumdarê eyyûbî Melîk Kamil sala 1231ê dawî li Mîrektîya Artûqîyên Heskîfê anîye. Eyyûbîyan ku navê xwe ji navê bavê Selaheddînî girtîye, sê sedsalan (630-931koçî) li ser Heskîf (Hisinkeyf) û derdora Hezoyê hukum kir. Dema ku moxolîyan di derdora salên 1260 û serê salên 1300î êrîş û texrîbatên bidehşet anîn serê cografyaya îslamê, hêza eyyûbîyan jî qels bû; lê wan nekarî dawî li rêveberîya wan a herêma Xerzan û derdora wê biênin (*Sönmezsoy & Yılmaz, 1994: 37)*.

Li gor ku mirov ji dîroka eyyûbîyên Hesenkêfê tê digihîje bêjeya “ghezreddîn” wekî navekî birêvebir ê ji melîkên vê hukûmatê heye. Nivîskarê kitêba *Tarîxu Hisnkeyfa*yê Hesen b. Îbrahîm (wf. 1420) piranîya agadarîyên dîrokî ji Xerzeddîn Me‘tûq werdigire. Ev nivîskar jî di salên 1420î de jîyaye. Îhtîmal heye ku HX navê xwe jê wergirtibe. Çunkî li HX gundek bi navê Sarimê heye ku di heman kitêbê de bêjeya “Sarmedddîn” wekî navê emîrekî Dewleta Eyyûbîyan li kêleka navê Xezreddîn derbas dibe (Husnî 2019, 254). Bi tevî vê, di vê serdemê de Keleha Comanîyê ava ye û hindek ji malbatên birêvebir ên Hesenkêfê, piştî êrîşên moxolan hatine li Comanîyê bi cih bûne. (KÇ3).

Li gor kîtabeya bi zimanê erebî ya li ser Camîya Xidir Beg, ku ji Xanedanîya Gherz Mîrê Hezo û Sasonê û Celaleddîn Xidir Begê lawê Ebû Bekir er-Roşkî ew di salên 890/1485an de li Hezoyê ava kirîye (Boran, Tüfekçioğlu ve Yıldız 2008, 17) û hîna jî îro berhema herî mezin a mîmarî ya bajarokê Hezoyê ye bêjeya *xerz* bi herfên erebî, bi awayê غرز (gherz) hatîye nivîsîn:

ابو بكر الروشكى من بيت الغرز صاحب حزوه و ساسون خلد الله ملكه و سلطانه ..... اثها سنة تسعين و ثمانمئة هجرة”

Ebû Bekr er-Roşkî min Beyti’l-Ġerz ṣaḥibi Ḥezu we Sasûn xelledellahu mulkehu we selṭenetehu …. Esseha senete tis‘îne we semanîyete hicret.” (Ebû Bekirê Rojkî yê ji Mala Xerz xwedîyê Hezo û Sasonê Ellah mulk û selteneta wî bi xêr bihêle … sala 890ê hicrî ev ava kirîye.).

Di serê sedsala 19an de li herêma Silêmanîyeyê mîrektîya Baban û li herêma Rewanduzê mîrektîya Soran, li herêma Amêdîye mîrektîya Badînan, li herêma Colemêrgê mîrektîya Hekarî, li herêma Cizîrê mîrektîya Botan, li herêma Bidlîs û Xweşavê mîrektîya Mehmûdî û Hîzanê, li herêma Xerzan mîrektîya Xerzan û li herêma Şîrwanê mîrektîya Şîrwanê karîger bûye (Kardam 2011, 69).

Navê “Xerzan” di çavkanîyên dîroka gelê ermen de jî bi berfirehî cih girtîye. Ev bêje bi teşeyên mîna “khaldan, khaltan, garzan, gharzan” hatîye qeydkirin. Di serdema dawî ya

osmanîyan de bi navê Xerzan qezayek hebû û li ser sancaqa Sêrtê bû. Di sala 1890î de navçeya Kharzanê li ser Sêrtê; Hezzo li ser mîrektîya Sasonê bû. Lê ji berê ve Xerzan li ser Sasonê bûye. Di sala 1882yan de li Xerzanê 111 gund hebûne, di sêzdehê ji van gundan de 8.282 ermen, 7.597 kurd, 1.600 suryan û 1.159 êzîdî hebûne (Martirosyan 2022, 1).

**11. Tixûbê Devoka Xerzan (Atlasa Devokê)**

Di zimannasîyê de ji bo wan tixûbên ku dîyalekt, yaxud devoka deverekê, ji wê dîyalekt yaxud devoka ku li herêmeke din tê axaftin cîya dike “tixûbê dîyalektê” dibêjin. Peywendîya vê termê bi terma “atlasa zimanî” re heye. Di qadê de termeke zimannasîyê ya bi navê geolinguistics (jeolingusitik) heye ku mirov dikare bi kurmancî navê “cografyaya zimannasî” lê dêne. Cografyaya zimannasî, ew şax e ku li ser kirûyên zimanekî yên li cografyayekê belav dibin dikole, tixûbên wan ên herêmî li ser nexşeyê dihûne û rê li ber atlasa zimanî vedike. Jeolinguistîk, pêşîya dîroka çand û bicihbûnê ronahî dike û bi lêkolînên zimanî yên wesifcivakî re alîkarî dike (İmer, Kocaman ve Özsoy, 2011: 251).

Ji ber ku wekî derîyekî Rojava di navbera Rojhilat û Serhedê cîyê xwe digire, di dîrokê da behsa HX bi berfirehî hatîye kirin. HX wekî cografya, ji alîyê şaroşkeyan/navçeyan ve ji hêla başûr ve ji bajarokê Qubînê (Beşîrî) dest pê dike tê Misircê (Kurtalan) û diçe heta bajarokê Hewêlê (Baykanê); ji hêla bakur ve ji bajarokê Hezo (Kozluk)ê dest pê dike diçe digihîje heta navçeya Sasonê. Hudûdê herêmê, bi çemê Batmanê ku di navbera sînorê Dîyarbekir/Amid û Batmanê da diherike ji cografyaya mîrektîya Silîva cihê dibe. Alîyê başûr ên HX bi gundên eşîra reşkotan bi dawî dibe. Li hêla Bidlîs û Sêrtê jî çemê ku ji Bidlîsê tê diherike hêla başûr, bûye sînorê herêmê. Ji bakûr ve çîyayê Mereto û Helqîs û Kopê, wekî sînorên siruştî yên herêmê dihên zanîn.

**12. Cîyê Devoka Xerzan di Nav Devokên Kurmancî de**

Soane (1909) di lêkolîna xwe ya li ser dîyalektên kurdî de dîyar dike ku li jora Mezopotamyayê hin devok û şêweyên xwemalî hene. Li herêma Sêrtê hin axiverên kurmancî, bi devokeke xerîb dipeyivin. Ji bilî vê, li çîyayên Sasonê jî eşîreke biçûk a bi navê Balikî (Balokî) heye ku dîyalekta wan ji kurdî-ermenî-erebî pêk dihe. Ev eşîr ne muslim ne jî xirîstîyan e. Zemanê berê gelek qewm û eşîr ji ber zordarî û qetlîamên desthilatdaran revîyane û wan xwe li çîyayên Kurdistanê girtine. Li van deveran di nav kurdan de hînî zimanê kurdî bûne û bi tevî zimanên wan û kurdî, zimanekî têkel çê bûYe ku wekî devok, şêwe û dîyalektên xerîb derketine pêş (Bulut, 2002: 278-9).

Kurmancîya Hezzoyê, devokeke xweser a kurmancî ye û navê wê jî “devoka xerzî” ye (Akin 2013, 114). Ev qenaeta Akin ji bo vê lêkolînê referanseke gewre ye. Li gor nexşeya dabeşkirina devokên kurmancî ya Haig û Öpengin (2014) mirov dikare cihê DX di nav tixûbên kurmancîya navbera “devoka başûr” û “devoka bakur” de bi keys bike. Çi heye ku Celadet û Lescot (1990: 17) di nav devokên kurmancî yên mîna Botan, Behdînan û Hekarîyê de navê devoka “Xerzan” jî li qelem didin. C. Bedirxan û Roger (1990: 23), di vê lêkolîna xwe de DX, digel devoka Botan, di nav herêm û qada kurmancî ya “Rojava” de nîşan didin. Ev navlêkirina wan li gor kîjan nexşeyê ye, bi rastî cîyê mereqê ye. Heger li gor nexşeya welatê mezin ê kurdan be, HX dikeve bakur; heger li gor nexşeya herêma Botan be, dikeve bakur-rojava. Dibe ku wan li gor herêma Botan devera Xerzan bi nav kiribe. Çunkî li gor dîroknasên îslamê, bi taybetî li

gor Qehhale ji çar navendên eslî û sereke yên eşîrên kurdan navendeke eslî, Botan e û tixûbên wê ji Zaxo û Dihokê dest pê dike, li başûr heta nêzî Reqqa, li bakur heta Bingolê û li rojava heta Kilîsê dewam dike (Bozkurt 2021, 587).

Li gor Z. Zinar ku hinekî din jî hejmara devokên kurmancî zêde ye, dîsa navê DX tuneye (Yonat 2019, 12): "Devoka efrînê, devoka cizîrê, devoka sincarê, devoka behdînî, devoka hekarî, devoka şikakî, devoka bazîdî, devoka botan, devoka şemdînanî û devoka rojavayî." Wisan dîyar e ku digel ku ev lêkolîner ji hêla herêma xwe ve cîranê HX ye jî, cih nedaye DX.

## 13. Çend Taybetmendîyên Morfolojîk ên Xasî bi Devoka Xerzan

### 13.1. Awayê Kêşana Karê Alîkar "bû"

Digel ku di piranîya devokên kurmancî de lêkera/karê alîkar "bû" gava tê ser bêjeyeke navdêr/nav, bi formata "be" ye jî, di DX de bi şiklê "bî" ye:

(1) a. Qewet **bî** ji we re. (KÇ1)
(Qewet be ji we re.)
b. Ku li ba te **hebî**, gênc dikarin wan tiştan çê kin. (KÇ2)
(Ku li ba te hebe, gênc dikarin wan tiştan çê kin.)
c. Wele **nabî nabî nabî**, wele ez nadim nadim. (KÇ5)
(Wele nabe nabe nabe, wele e nadim nadim.)
d. Bila ava germ zêde neb**î**, tê bihel**î** (KÇ6).

Çawa ku ji mînaka 1(a) û 1(b)yê dîyar dibe, koka *karê alîkar* "bû"yînê û di mînaka 1(c)yê de *karê eslî* yê "bû""yînê, digel ku rewşa "neerênî" de ye jî, di DX de bi teşeyê "bî"yê ye. Di mînaka 1(d)yê de digel ku karê "bû"yînê, di rewşa "fermanîya nerasterast" de "bila nebî" ketîye kêşanê jî, bi awayê "bî" teşe girtîye û di karê "hiştin"ê de dîsa bi awayê "bihêlî" teşe girtîye.

### 13.2. Zayenda Navdêran

Herçiqas li hin deverên dûrî navenda vê herêmê carinan "zayenda mê" ya bêjeyên navdêr hebe jî, bi giştî di kurmancîya Xerzan de ji bo navê mirov, heywan, têgeh û mewcûdan tenê yek zayendek heye ku ew di kurmancîya standard de nêrtîyê nîşan dide û gireya wê her û her {-ê} ye:

(2) a. **Qîzê** Şerîfê Cafer im. (KÇ1)
(Qîza Şerîfê Cafer im.)
b. Navê **dîyê** min Nado ye. (KÇ1)
(Navê dîya min Nado ye.)
c. **Darê** ber derîyê me bilind e.
(Dara ber derîyê me bilind e.)

Çawa ku ji mînakên jorîn 2(a) û 2(b)yê xuya dibe, di "zayenda siruştî/bîyolojîk" de, û di "zayenda rêzimanî" mînaka 2(c)yê de "zayenda mêtîyê" {-a} ji nav devoka Xerzan rabûye, tenê teşeyê {-ê} heye.

Axiverên kurmancî yên devera Xerzan, bi taybetî li devera Comanîyê, gireya zayenda mê {-a}yê, di rewşa îzafeyê de bi awayê {-e} bi kar diênin (KÇ3):

(3) a. xwişke min

(Xwîşka min)
b. dare çinarê
(dara çinarê)

Axiverên kurmancî yên devera Xerzan, çi zayenda mê ya kêşayî {-eke} û çi zayenda nêr a kêşayî {-ekî}yê be, di rewşa "îzafeya navdêrîn" de bi awayê {-ekê} bi kar diênin (KÇ3):

(4) a. Keç**ekê** min heye.
(Keçeke min heye.)
b. Kur**ekê** min heye.
(Kurekî min heye.)
c. Gotin**ekê** min heye.
(Gotineke min heye.)

Axiverên kurmancî yên devera Xerzan, çi zayenda mê ya kêşayî {-ê} û çi zayenda nêr a kêşayî {-î}yê be, di rewşa "îzafeya hevalnavî" de bi awayê tewandî{-î} bi kar diênin (KÇ3):

(5) a. navê vî kurik**î**
b. navê vî keçik**î**

Di mînaka 5(a)yê de navdêra "kur" ji alîyê zayenda xwe ve "nêr" e; di mînaka 5(b)yê de bêjeya "keç" ji hêla zayenda xwe ve "mê" ye, bi tevî vê yekê jî, ev her du bêjeyên navdêr digel bêjeya hevalnav "vî" ketine îzafeya hevalnavîyê û wan her duyan jî gireya tewangê {-î} wergirtîye.

**13.3. Taybetmendîyên Cihnavan**

Axiverên kurmancî li vê deverê li gor taybetmendîyên cîyawaz ku di devokên din ên kurmancî de tunene artîkela "ya" digel cihnavan bi kar diênin (Jiyan 2020):

(6) a. Min **ya** te dît
(Min tu dîtî. /Min te dît.)
b. Ez **ya** wî dibînim.
(Ez wî dibînim.)
c. Te do **ya** wî dît?
(Te do ew dît?)
d. Min **ya** wan anî malê.
(Min wan anî malê.)

Çawa ku ji mînaka 6(a)yê dîyar dibe karê "dîtin"ê ji hêla awanîya xwe ve têper e, bi dema bihurî ya dîyar ketîye kêşanê û artîkela "ya"yê wergirtîye, di mînaka 6(b)yê de karê "dîtin"ê ji hêla awanîya xwe ve têper e, bi dema niha ketîye kêşanê û artîkela "ya"yê wergirtîye

Axiverên kurmancî yên DX, cihnava {wî} û {wê} bi awayekî hevbeş, bi awayê {wî}bi kar diênin (KÇ3):

(7) a. Nevê **wî kurikî**
(Navê wî kurikî)
b. Nevê **wî keçikî**
(Navê wê keçikê)

Çawa ku di mînaka 7(b)yê de xuya dibe, digel ku zayenda navdêra "keçik"ê mê ye jî, mîna zayenda bêjeya "kurik"î, cihnava {wî} wergirtîye.

Axiverên kurmancî li vê deverê li gor taybetmendîyên cîyawaz ku di devokên din ên kurmancî de tuneye cihnava {wî} û {wê} bi awayekî cîyawaz, hin caran bi awayê {hî}bi kar diênin (KÇ3):

(8) a. Mete **hî**
(Meta wê)
b. Dîye **hî**
(Dîya wê)

**13.4. Taybetmendîya Artîkela {ya} di Kêşana Deman de**

Axiverên DX, artîkela {ya} deman de bi kar diênin (KÇ3). Ev dem dibe ku demên bihurî bin û dibe dibe dema niha be. Bi tevî vê taybetmendîyê, tiştê ku bala mirovan dikêşe ew e ku karên pêvebera risteyê ji hêla awanîya xwe ve têper in:

(9) a. Min **ya** te dît. (dema bihurî ya dîyar)
(Min tu dîtî)
b. Wî **ya** wî anî. (dema bihurî ya dîyar)
(Wî tu anîtî.)
c. Em tê **ya** wî bibînin. (dema bihê)
(Em dê wî bibînin.)
d. Em **ya** jinî nas dikin. (dema niha)
(Ew min nas dike.)
e. Te **ya** min didît. (hikayeya dema bihurî)
(Te ez didîtim.)

Çawa ku ji mînakên jorîn jî dîyar dibe, digel ku karên ku bûne "pêveber"a risteyan di demên cîya cîya de ketine kêşanê jî, giştan artîkela {ya} wergirtîye. Di mînaka 9(a) û (b)yê de dema bihurî ya dîyar, di mînaka 9(c)yê dema bê, di mînaka (d)yê de dema niha û di mînaka 9(e)yê de hikayeya dema bihurî, bêjeya kar ketîye kêşanê, îca ev karên pêveber ên van risteyan gişt ji hêla awanîya xwe ve têper (gerguhêz) in, giştan artîkela {ya} wergirtîye. Zayenda van "berkar" (obje) ên van risteyan çi "mê" bin çi jî "nêr" bin ferq nekirîye.

**13.5. Taybetmendîya Dema Bihê (Dahatî)**

Axiverên devoka Xerzan, gava karekî di dema dahatî de bixin kêşanê, li şûna artîkela dema dahatîyê "dê" artîkela "tê" bi kar diênin:

(10) a. Yanî ku bavê min nebûwa, ew hiş û ew qabîlîyet **tê** bi mi re tunebûya. (KÇ3).
b. Me digo pêşî **tê** çawa, piştî sed hezarî du sed hezarî **tê** bisekine, îdî **tê** çawa çê kin? (KÇ4).

**Encam**

Axiverên zimanekî, çiqas belavî cîyên curbicur bibin, awayê axaftina zimanê wan jî ewqas cur bi cur dibe û cîyawazîyên navbera axiverên wî zimanî ewqas zêde dibin. Gund û beldeyên ku axiverên zimanekî lê dijîn ji hêla cografyayî ve çiqas ji hev cihê bin, cîyawazîya di nav awayê axaftina wî zimanî de ewqas zêde dibe. Kurdî jî zimanekî wisan e ku axiverên wî li gelek cîyên curbicur dijîn û cîyawazîya awayê axaftina wî pir zêde ye. Gelek bêjeyên kurdî

hene ku li cîyekî, taîfeyek wan bi kar diênin, li cîyekî din ew wê bi kar naênin, yaxud wateyeke din didinê. Ev cîyawazîya ha, li gor dirêjahîya mesafeya navbera van deverên wan zêdetir dibe.

DX di nav devokên din ên kurmancî de xwedî taybetmendîyên xweser ên cografî û morfolojîk e. Li rojavayê wê, devoka Dîyarbekir-Farqîn, li başûrê wê devoka Batman, Mêrdîn û Torê, li rojhilatê wê devoka Botê û Bidlîsê û li bakurê wê jî devoka Serhedê heye, heta tixûbên xwe yên cografîk, di nav van devokan gişt de cîyawazîya xwe diparêze. Mîna devokên herêma Behdînan, Tor û Botê, ew jî taybetmendîyên xwe yên xweserî xwe di nav tixûbên cografyaya xwe de diparêze. Çend taybetmendîyên cîyawaz ên morfolojîk ên DX ev in:

1. Zayend çi bîyolojîk be çi jî rêzimanî be, ji nav navdêrên wê rabûye.

2. Axiverên DX artîkela {ya} di piranîya deman de bi kar diênin. Taybetmendîyê vê artîkelê ew e ku axiver, di karên ku ji hêla awanîya xwe ve têper in de wê bi kar diênin.

3. Axiverên DX di kêşana dema bihê de li şûna artîkela “dê” artîkela “tê” bi kar diênin.

4. Axiverên vê deverê cihnava {wî} û {wê} hin caran di îzafeyên hevalnavî de bi awayê {hî}bi kar diênin.

5. Axiverên DX karê alîkar “bû” ne bi formata “be”yê; bes bi şiklê “bî”yê bi kar diênin.

Nexwe ew jî mîna van devokên navbihurî, devokeke xweser a dîyalekta kurmancî ye.

**Çavkanîyên Zindî û Kesên Çavkanî**

KÇ1 Daykê Qesîde, 70 salî, gundê Mişrîta, Hezo (Kozluk) – Batman, kevanîya malê

KÇ2 Tahsin Bayar, 60 salî, gundê Comanîyê, Baykan, Sêrt, malnişînê karker.

KÇ3 Adnan Firat Bayar, 55 salî, gundê Comanîyê, Baykan, Sêrt, mamoste.

Kç4 Ebdulxeffarê, 47 salî, gundê Darê, Qurtelan, Sêrt, esnaf.

KÇ5 Pîreka Timoqî, 49 salî, gundê Timoq, Hezo, kevanîya malê.

KÇ6 Mela Cesîm, 70 salî ye û ji Koxa Weyselqearnî ye, li Batmanê rûdine, melayê malnişîn.

## Çavkanî

Açar, Zafer. *Tesîra Helwestê li ser Tercîha Ziman di Jîyana Kurdîzanan de (Nimûneya Wan) (Teza Neçapkirî ya Doktarayê).* Bingol: Bîngöl Üniv. Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dilil ve Edebiyatı Anabilim Dalı, 2019.

Akin, Salih. *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî.* İstanbul: Avesta, 2013.

Aldatmaz, Nadire Güntaş. *Tehlike Altındaki Bir Di Kırmancca/Zazaca.* İstanbul: Vate Yayınları, 2021.

Amêdî, Sadiq Bahaeddînê. *Hevberkirina Kurmancî-Soranî, Rêzimana Kurdî, Kurmanciya Jorî û Jêrî ya Hevberkirî.* İstanbul: Dîwan, 2012.

Bayezîdî, Mela Mehmûdê. *‘Adat û Rusûmetnameê Ekradîyye, (Ravekirin, Tîpguhêzî û Lêkolîn: Jan Dost).* İstanbul: Nûbihar, 2010.

Bazidî, Mela Mehmûdê. *Cami‘eya Risaleyan û Hik, (Amadekar: Z. Avci).* İstanbul: LÎs, 2010.

—. *Kêşana Karên Kurdî, (Nirxandin-Metna Sadekirî, Latînîzekirî-Faksîmîle: Mikail Bülbül & Mustafa Öztürk).* İstanbul: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê, 2020.

Bazîdîyî, Mela Mehmûdê. *Tuhfetu'l-Cillan fî Zimanê Kurdan (Nirxandin-Metin-Faksîmîle: Mikaîl Bilbil & Mistefa Oztirk).* İstanbul: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê, 2019.

Beg, Muhammed Emîn Zekî. *Kürtler ve Kürdistan Tarihi (Türkçeye Çevirenler: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan).* İstanbul: Nûbihar, 2018.

Boran, Ali, Abdülhamit Tüfekçioğlu, ve İrfan Yıldız. *Kozluk.* Ankara: Uyum Ajans, 2008.

Bozkurt, İbrahim. *Aşiretler Tarihi.* İstanbul: Nûbihar, 2021.

Cibo, Nezîrê. *Kürt Tarihinde Garzan ve Pencinarîler.* İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları, 2016.

Ciwan, Mûrad. *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanc Lehçesi).* Balınge: Jîna Nû Yayınları, 1992.

Demir, Nurettin. «Dil Kültürü.» *Türkçe Sözlü Anlatım* içinde, yazan Ş. Dilek Belet, 3. Eskişehir: T.C. Anadolu Üniversitesi Yayını, 2011.

Derwîş, Evliya Çelebî Muhammed Zillî Îbn. *Evliya Çelebî Seyahatnamesi (Tabiî: Ahmed Cewdet), lk baski, c. IV.* İstanbul: Derseade "Îqdam" Matbaasi, 1314.

el-Farabî, Eba Nesr. *Ihsau'l-Ulûm (Sehhehu we Weqefe el Tebihi: Usman Muhemmed EMîn).* Misir: Mektebetulxancî, 1931.

Ezîz, Husên Miuhemmed. *wtarkurd.info.* 16 02 2018. https://www.wtarkurd.info (erişildi: 10 25, 2022).

Farqînî, Zana. *Büyük Türkçe-Kürtçe Sözlük.* İstanbul: İstanbul Kürt Enstitüsü, 2000.

Fezulla, Husên Nizar. *Puxteyek le Rêbazî Tiwêjînewe.* Hewlêr: Çapxaney Hêvî, 2016.

Fossum, L. O. *A Pratical Kurdish Grammar.* Minneapolis: The Inter-Synodical Ev. Lutheran Orient-Mission Society, 1919.

Gökalp, Ziya. *Kürt Aşiretleri Üzerine Sosyolojik Tetkikler.* İstanbul: Kaynak Yayınları, 2009.

Haco, Zerdeşt. «Bipêşveçûna Dîrokî ya Zimanê Kurdî û Hin Taybetmendiyên wî yên Xweser.» *Konferansa li ser Zimanê Kurdî.* Köln: Weşanên Komkar , ? 50-51.

Han, Şeref. *Şerefname (Arapçadan Çeviren: Mehmet Emin Bozarslan).* İatanbul: Ant Yayınları, 1971.

Hewramanî, Mehemed Emîn. *Zarî Zimanî Kurdî le Terazûyî Berawird da (Neqilker: M. Ciwan).* Bagdad: ?, 1981.

Hurşîd, Fuad Heme. *Zimanî Kurdî: Dabeşbûnî Cografyayîy Dîyalêktekanîy.* Bexdad: Çapxaneyî Afaq Arabiye, 1985.

Husnî, Hesen b. Îbrahîm el-Munşiul. *Tarîxu Hisinkeyfa (Tehqîq we Dirase: Yûsuf Baluken).* İstanbul: Nûbihar, 2019.

İmer, K., A. Kocaman, ve A. Sumru Özsoy. *Dilbilim Sözlüğü.* İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi, 2011.

Izady, Mehrdad R. *Kürtler: Bir El KİtabıI (İngilizceden Çeviren: Cemal Atila)* . İstanbul: Doz Yayınları, 2007.

Îzolî, D. *Ferheng: Kurdî-Tirkî & Türkçe-Kürtçe (Amadekar: Kamer Beysulen).* İstanbul: Weşanên Deng, 2013.

Jiyan, Amed Çeko. *zimannas.* 04 10 2020. https://zimannas.wordpress.com (erişildi: 10 29, 2022).

Karasar, Niyazi. *Bilimsel Araştırma Yöntemi: Kavramlar, İlkeler, Teknikler (37. Basım).* Ankara: Nobel Akademik Yayıncılık,, 2022.

Kardam, Ahmet. *Cizre-Bohtan Beyi Bedirhan-Direniş ve İsyan Yılları.* Ankara: Dipnot Yayınları, 2011.

Kıran, Zeynel, ve Ayşe Eziler Kıran. *Dilbilime Giriş.* Ankara: Seçkin Yayıncılık, 2018.

Kırkan, Ahmet. *Zazacanın Fonetik Açıdan İncelenmesi; Kuzey, Güney ve Merkez Zazacasının Karşılaştırılması (Teza Neçakirî).* Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dslı , 2019.

Kurdo, Qanatê. *Rêzimana Kurdî: Kurmancî-Soranî (Ji Kurdîya Soranî: Zülküf Ergün).* İstanbul: Nûbihar, 2013.

Lescot, Emir Celadet Bedir Han û Roger. *Kürtçe Grameri (Kürmanci Lehçesi).* Paris: Avesta, 2004.

Marif, Ewrehmanî Hacî. *Raberî Serçawe Le Barey Zimanî Kurdîyewe.* Bexda: Komarî Êraq Wezaretî Roşenbîrî û Rageyandin Dezgay Roşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî, 1989.

Martirosyan, Tigran. *househamadyan.* 23 06 2022. https://www.houshamadyan.org/map (erişildi: 11 12, 2022).

Meczûb, Telal. *Rêbazî Lêkolînewe u Amadekiridinî Lêkolîneweyekî Tiyorî u Praktîkî (Wergêranî: Merîwan Ebdull).* Hewlêr: Çapxaney Xanî, 2007.

Meqdisî, Zîyaeddîn Paşayê. *el-Kavaidu'l-Lugati'l-Kurdîyye (Analîz, Krîtîk û Werger: Ahmed Gemî digel Ayhan Yıldız).* İstanbul: Weşanên Dara, 2021.

Mihrî, Mihemed. *Mqeddimetu'l-Îrfan (Çapkirin: Arwasîzade Seyyid Mehmed Şeîfq; Amadekar: Seîd Veroj).* İstanbul: Necm-i Îsytiqlal Matbaasi, 1918.

Muhammed, Husein. *zimannas.* 06 06 2015. https://zimannas.wordpress.com (erişildi: 10 27, 2022).

Mukriyanî, Gîwî. *Ferhengî Kurdistan.* Hewlêr: Dezgay Çap û Belawkirdinewey Aras, 1999.

Nawxoş, Selam, ve Nerîman Xoşnaw. *Zimanewanî (Bergekanî Çiwarem).* Hewlêr: Çapxaney Minare, 2010.
—. *Zimanewanî (Bergekanî Yekem, Duyem Sêyem).* Hewlêr: Çapxaney Minare, 2010.
Paşa, Ekrem Cemîl. *Dîroka Kurdistan bi Kurtebirî.* Leuven: Enstîtuya Kurdî ya Brukselê, 1995.
Qezaz, Şefîq. *Ferhengî Şarezûr: Kurdî-Îngilîzî.* Hewlêr: Dezgay Çaxp û Belawkirdinewey Aras, 2000.
Rexzadî, Elî. *Rêzimanî Kurdî Soranî.* Sine: Întişaratê Kurdistan, 1389.
Senendecî, Mehdî, Yedulla Peşabadî, ve Mehyedîn Kerîmanî. *Ferhengî Zanistgay Kurdistan (Bergî Duyem).* ?: Danişgay Kurdistan, 1397.
Soane, E. B. *Grammar of the Kurmanji or Kurdish Language.* London: Luzac & Co, 1913.
Tan, Samî. *Analîza Du Berhemên Destpêkî yên Rêzimana Kurmancî.* İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2019.
—. *Rêzimana Kurmancî.* İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2015.
Xeznedar, Marif. *Mêjuwî Edebî Kurdî.* Hewlêr: Dezgay Çap û Belawkirdinewy Aras, 2001.
Yıldırım, Kadri. *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi).* İstanbul: Mardin Artuklu Üniv. TYDE Yayınları, 2012.
Yıldız, Ayhan. «Cîyê Fonetîk Fonolojî û Gramera Devoka Xerzan di nav Kurmancî û Dîyalektên Kurdî da.» *The Journal pf Mesopotamian Studies*, 08 2019: 247-267.
Yonat, Mehmet. *Kurmancî Kürtçesi Ağızları Hakkında Sosyolinguistik Bir İnceleme* . Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı (Teza neçapkirî ya Doktorayê), 2019.
Zeki, Mehmet Emin. *Xulasetu Tarixu'l-Kurd we Kurdıstan.* Baxdad: Tevn, 1961.

Pêvek : Nexşeya herêma Xerzan di nav tixûbên Sêrt, Bidlîs, Mûş, Dîyarbekir û Batmanê de



Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname E-ISSN-2687-5438

# NIRXANDINEK DERBARÊ BERHEMÊN XEBATA KELEPORÎ YA EUGEN PRYM Û ALBERT SOCINI

EUGEN PRYM VE ALBERT SOCİN'İN DERLEME ÇALIŞMASINDA YER ALAN ESERLER HAKKINDA BİR DEĞERLENDİRME

AN ANALYSIS OF COMPILATION WORKS OF EUGEN PRYM AND ALBERT SOCIN'S BOOK

Mustafa ASLAN*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 15.11.2022
**Accepted // Pejirandin:** 22.11. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 40-58
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1204924

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Aslan, Mustafa (2022). Nirxandinek Derbarê Berhemên Xebata Keleporî Ya Eugen Prym Û Albert Socini, Kurdiname, no. 7, p.40-58
**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

**Kurte**

Ji serê nîveka duyem ya sedsala XIXem heta dawîya nîveka yekem ya sedsala XXem gelek xebatên berhevkarî yên zargotina kurdî ji alîyê vekoler û gerokên bîyanî ve hatine kirin. Yek ji van xebatan ya du cildî ya rojhilatnas û zimannasên alman Eugen Prym û Albert Socin ya bi navê *Kurdische Sammlungen*ê ye.

Di vê gotarê da li ser berhemên di vê xebata navborî da cî girtine hate rawestin. Piştî danasîna nivîskaran û rêbaza wan ya berhevkarîyê û hinek agahî derbarê ger û rêwîtîya Albert Socinî analîza berhemên di vê xebatê da ji alî naverok û avahîsazî ve hatin analiz kirin. Di çarçoveya analîza berhemên pexşan da li ser rêzincîra bûyeran û serborîyên lehengan û taybetmendîyên wan ku ji alî çîrokbêj (vegêran) ve hatine taswîr kirin hate rawestin. Bi vî awayî hewl hate dayîn ku hêmanên derasayî yên di van çîrokan da bêne destnîşankirin. Bi heman şêweyî analîza hinek destan û stranên şer wekî mînak hate kirin û li ser taswîrên ku dengbêjan derbarê lehengan û kiryarên wan de kirine hate rawestîn.

Wekî encam du xalên sereke ji analîza van berheman derdikevin pêş: yek jê ew e ku çîrokbêj/vegêranan di honandin û pêşkêşkirina çîrok, hîkayet an serpêhatîyan de gelek hêmanên derasayî û fantastîk, wekî lehengên xwedî hêzek taybet an girtina devê kanîyê ji alî mar ve, keça teyrê Sîmir ku bi xortekî re dizewice, hwd. bikaranîn e. Bi heman zîrektîyê berhemên destanî û stranî/helbestî hatine honandin. Dengbêjan cesarat û hêza lehengên van berheman birine asta herî jorîn, maldarî û comerdiya wan bi awayekî mubalexe taswîr kirin e. Ev herdu xal dikarin wekî nîşaneya gencîne û dewlemendîya edebî ya zargotina kurdî bêne nirxandin.

**Peyvên Sereke:** Eugen Prym, Albert Socin, Çîrok, Serpêhatî, Destan, Zargotina Kurdî

**Özet**

XIX. yüzyılın ikinci yarısından XX. yüzyılın birinci yarısının sonuna kadar yabancı gezgin ve araştırmacılar tarafından Kürt sözlü edebiyatıyla ilgili birçok derleme çalışması gerçekleştirilmiştir. Bu çalışmalardan biri de Alman dilbilimciler Eugen Prym ve Albert Socin'in iki ciltten oluşan *Kurdische Sammlungen* adlı çalışmadır.

Bu çalışmada söz konusu yazarların çalışmasında yer alan eser üzerinde duruldu. Yazarlar ve derleme yöntemleri ile Albert Socin'in yolculuğu hakkında bilgi verildikten sonra her iki ciltte yer alan eserlerin içerik ve yapı açısından analizi yapıldı. Nesir eserlerin analizi çerçevesinde olaylar zinciri ile kahramanların başından

* Doç. Dr. Zanîngeha Mardin Artuklu, Beşa Ziman û Çanda Kurdî. Mêrdîn/Tirkîye. E-mail: mustafaaslan@artuklu.edu.tr, Orcid: 0000-0002-1543-3154

geçenler ve hikaye anlatıcıları tarafından tasvir edilen özellikleri üzerinde duruldu. Böylece söz konusu hikayelerde bulunan olağanüstü unsurlara dikkat çekilmek istendi. Aynı şekilde çalışmada yer alan bazı destan ve kahramanlık stranlar örnek olarak analiz edilerek dengbêjlerin söz konusu eserlerin kahramanları ve yaptıklarına dair tasvirler üzerinde duruldu.

Sonuç olarak ele alınan eserlerin analizinden iki nokta öne çıkmaktadır: Birincisi hikaye anlatıcıların masal ve hikayelerin doku ve anlatımı sırasında olağanüstü güce sahip kahraman, yılanın pınarın başını tutması, Anqa (Simur) kuşunun kızının bir genç ile evlenmesi, vs. gibi birçok fantastik ve olağanüstü unsuru becerikli bir şekilde kullanmışlar. Aynı beceri ile destan ve kahramanlık şarkıları da örülmüştür. Bu eserlerde dengbêjler kahramanın gücü ve cesaretini en üst seviyeye çıkarmışlar, onların zenginlik ve cömertliklerini abartılı bir şekilde tasvir etmişler. Bu iki nokta Kürt sözlü edebiyatının estetik ve zenginliğinin işaretleri olarak değerlendirilebilir.
**Anahtar Kelimler:** Eugen Prym, Albert Socin, Hikâye, Serüven, Destan, Kürt Sözlü Edebiyatı

**Abstract**

From the second half of the XIX century to the end of the first half of the XX century, many compilation studies on Kurdish oral literature were carried out by foreign travelers and researchers. One of these studies is the two-volume named Kurdische Sammlungen by German linguists Eugen Prym and Albert Socin.

In this paper, the aformentioned work, which is consisted in two volumes is studied. After giving information about the authors and their compilation methods and Albert Socin's journey, the works in both volumes were analyzed in terms of content and structure. Within the framework of the analysis of purpose works, the chain of events, the traits and the characteristics of the heroes described by the storytellers were emphasized. Thus, the attention has been drawn to the extraordinary elements found in the stories in question. In the same way, some epic and heroic songs existing in the work were analyzed as examples, and the descripitions the dengbêjs make about the heroes and their actions are emphasized.

As conclusion, in the analysis of the works discussed two points come to the fore: First one is that the storytellers make a skillful use of many fantastic and extraordinary elements as the hero with extraordinary power, the snake holding the head of the spring, the marriage of the daughter of the Anqa (Simur) bird with a young person, etc. Epic and heroic songs are also composed with the same skill. In these works, dengbêjs maximized the hero's strength and courage, with exaggerating their wealth and generosity. These two points can be considered as signs of the aesthetics and richness of Kurdish oral literature.
**Keywords:** Eugen Prym, Albert Socin, Story, Adventure, Kurdish Oral Literature

## Destpêk

Ji serê nîveka duyem ya sedsala XIXan heta dawîya nîveka yekem ya sedsala XXan gelek lêkolîner û zimanzanên rojavayî, rûs û ermen berhevkarî derbarê zargotina kurdî da kirine. Mînak lêkolînerê rûs yê bi navê Îosîf Abgarovich Orbelî, di salên 1911 û 1912yan de li ser navê Akademiya Zanistê ya Petersbûrgê li devera Wanê lêkolîn kirine. Her çend armanca lêkolînên wî li ser ermeniyan be jî, wî li navçeya Miksê û derdora wê, derbareyê kurdan de jî gelek keresteyên folklorî berhev kirine. Di pirtûka wî ya bi navê *Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane* de derbarê folklora kurdan de agahiyên girîng hene.

Ji xeynî Orbeli, digel Eugen Prym û Albert Socinî gelek lêkolîner û zimanzanên wekî Hugo Makas (1857-1901), Sargis Haykûnî (1832-1893), Peter Ivanovic Lerch (1828-1884), Iosif Abgaroviç Orbeli (1887-1961), Ferdinand Justi (1837-1907), Oskar Mann (1867-1917), Albert von le Coq (1860-1930) û Alexandre Jaba (1801-1894) di wan demên navborî da derbarê ziman û zargotina kurdan da berhemên giranbiha çap kirine.

Ji van kesan Hugo Makas, rojhelatnasê Almanî, di sala 1850an de bi kurmanciya bakur xebateke mezin kiriye. Di vê xebata bi navê *Kurdische Texte und Studien* (Xebat û Metnên Kurdî) de Hugo Makas digel zûgotinok, gotinên pêşîyan, şêweya “bixêrhatinê” ango pêşwazîkirina mêvanan û “terqîna êzîdîyan” cî daye destanên kurdî yên naskirî wekî “Memê Alan”, “Zembîlfiroş”, “Rustem”,

"Siyamendê Slîvî" û çend stranên evînê / dîlanan û yên şeran wekî ya "Hemê Mûsîkî Axa" û strana "Mîr Magra Silêmanî"[1]. Zêmarek ku dayîkek li ser lawê xwe yê nexweş dibêje û yek ku li ser kesekî bi navê Edlan Begê li Erzeromê hatiye zindankirin jî cih girtin e. Lê di vê berhema Makas da çîrokên kurdî cî ne girtin e.

Lêkolînerekî din yê Alman bi navê Oskar Mann derbarê edebiyata gelêrî ya kurdî de kereste berhevkirine û wî ew xebata xwe di sala 1906an de bi navê *Texte in Phonetischer und Persischer Umschrift* (Lêkolînên Kurdî û Farisî) li Berlînê çap kiriye. Di vê berhema Oskar Mann de, ku bi zaravayê soranî hatiye berhev kirin û nivîsîn, bi tevayî 16 berhemên destanî hene. Varyantên destanên kurdî yên wekî "Mem û Zîn", "Dimdim" û "Zembîlfiroş" digel varyantek hîkayeta "Ferx û Stî" cî girtin e. Varyantên van heman destanan û hîkayeta Ferx û Sitî di berhema Eugen Prym û Albert Socinî de jî cî girtin e. Her wekî Mann, rojhilatnasê elman Frederick Albert von Le Coq jî di sala 1901ê de li herêma Mukriyan û hinek deverên bakurê Mukriyan geriyaye û digel çîrok û gotinên pêşiyan varyantên destanên kurdî civandine. Di sala 1903yan de ev keresteyên berhevkirî bi navê *Kurdische Texte* (Metnên Kurdî) li Berlînê çap kiriye. Ev xebat wekî du cild hatiye çapkirin. Cilda yekem bi alfabeya erebî hatiye çap kirin û tê de N*ûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî û *Mewlûda Kurmancî* ya Melayê Bateyî cî digirin. Di cilda duyem de ku bi alfabeya latînî çap bûye de ev herdu berhem tune ne[2].

Di vê xebata Le Coq de bi tevahî 20 berhem cî girtine: ji vana varyantek Zembîlfiroş ji devê kesek bi navê Hafiz hatiye tomar kirin. Berhemek jî bi zaravayê zazakî derbarê Brahîm Paşa ji devê kesek bi navê Omer ibn Ali Kose hatiye girtin. Her weha varyantek din ya destana Zembîlfiroş û varyantek ya destana Memê Alan ji devê kesek bi navê Ali Gewende Delîka hatine girtin. Digel van berheman şeş berhemên bi navên cuda ji devê kesek bi navê Yaxib Oxlû Yûsib Xelîka hatine girtin. Du ji van berheman destanên bi navên Dünya Güzelî û Şêxmûs we İnce Yûsib in. Yên din hîkayetên derbarê mijarên wekî dîroka eşîreta Rişwanan û eşîreta Xelîkan, birrîna hirîyê, çêkirina rîs û tevna konan de ne. Vebêjerek din bi navê Xafar Oxlu Seidi Bia ji Le Coq re digel destana Zembîlfiroş 9 destanên din gotin e. Ji xeynî destana Zembîlfiroş ku di berhemê de wekî hîkayetê hatiye tomar kirin her çiqas yên din wekî destan hatine tomar kirin jî ew di forma şeran de ne ku di navbera du eşîr an malbatên dijber de qewimî ne.

Ji alî naverokê û berhemên tê de cî girtin e, xebata keleporî ya Eugen Prym û Albert Socinî ji xebatên navborî tevan balkêştir e. Wekî li jor jî hate destnîşankirin, mînak di xebatên Oskar Mann, Hugo Makas û Albert von Le Coq de, digel berhemên destanî û çîrokên gelêrî gotinên pêşîyan, zûgotinok û ferhenga peyivan jî cî girtin e. Lê di xebata Eugen Prym û Albert Socinî de tenê berhemên wekî hîkayet, serpêhatî, stranên şer û destan hatine tomar- kirin.

Ev berhemên navborî ku di du cildan da hatine çap kirin mijara vê gotarê ne. Ji analiz û nîqaşên teorîk zêdetir, ji alî naverok, rêzezincîra bûyeran, têkîlîyên navbera lehengan, taswîra lehengan û hêza wan ve, berhem hatine nirxandin. Berhemên di herdu cildan da dikarin di bin banê du beşên sereke bêne dabeşkirin: berhemên pexşan ango vegotinên gelêrî ku bi piranî yan serpêhatî yan jî derasayî ne û berhemên helbestî ku ew jî bi piranî destanî ne (stranên şer an zêmar jî di nav de), lê hinek ji wan pexşan, hinek hem pexşan hem helbestî û hinek jî helbestî ne. Çi pexşan bin çi helbestî bin, zêdetir derbarê berhemên ku varyantên wan zêde nayên naskirin an ji alî struktur (avahîsazî) û rêzezincîra bûyeran ve taybetmend in nirxandin hate kirin. Her çiqas ji alî hunera edebî ve pir dewlemend in jî destanên wekî "Mêm û Zîn", "Zembîlfiroş", "Dimdim", "Evdal Xan", "Qewlê Newala Sîsebanê" û "Hespê Reş" ku di cilda duyem da cî girtine, li derveyî nirxandinê hatin girtin, lewre ev berhemên

[1] Di metnê resen de navê van berheman weha ye: Mem û Zînê, Zembîlferoş, Rustem, Sîamet Esselîwî; Hamy Musîkî, Mîr Magra Sulaymanî

[2] Ji bo vê xebatê me sûd ji vî cilda bi alfabeya latînî sûd wergirtiye.

navborî hem naskirî ne hem gelek varyantên wan hene û digel vê jî ji mêj de bûne mijara xebatên zanistî

Gotar ji sê beşên sereke pêk tê. Di beşa yekem da agahî derbarê nivîskaran û berheman da hatine dayîn. Piştî danasîna nivîskaran di serê beşê da berhem bi giştî hatine danasîn, agahî derbarê wan da hatine dayîn.

Di beşa duyem de, berhemên pexşan di bin du sernavan de, “serpêhatî” û “çîrokên xwedî hêmanên derasayî” hatine nirxandin û analîza hêmanên derasayî û karakteran (lehengên) hatiye kirin. Ji çîrok an serpêhatîyên ku zêde nenas in, varyantên wan ku di xebatên din da cih girtine wekî referans hatine dayîn.

Di beşa sêyem da jî berhemên helbestî û destanî di bin sê sernavan de, “stranên evînê”, “stranên şer” û “destan” hatine nirxandin. Bi taybetî li ser taswîrên ku dengbêjan derbarê kesayetîya leheng û kirinên wan ên derasayî hatiye rawestîn, bi riya mînakan berhem hatine analizkirin.

Di encamê da me hewl da em balê bikşînin ser hunera dengbêjî û vegêrana (çîrokbêjî) kurdî di afirandin, îcrakirin û pêşkêşkirina berhemên zargotinî de. Her weha bal hate kişandin ser hunera vegêran û dengbêjên kurd ya bikaranîna hevoksazî û rengdêran di taswîra erdnîgarî û têkilîyên mirovantîyê de û bi taybetî jî têkilîyên civakî da.

**Agahî derbarê nivîskarên xebatê de**[3]

Ji nivîskarên xebatê Albert Socin (1844-1899), li çend zanîngehên ewropî zimanên rojhilatî xwendiye. Sala 1867an da ji zanîngeha Halle (Berlîn) pîleya doktorayê wergirtiye. Di navbera salên 1868 û 1870an da li Rojhilat maye û tevlî Eugen Prym xebat û lêkolîn li ser zimanên Erebî, Suryanî û Kurdî kirine.

Eugen Prym (1843-1913) jî wekî Albert Socin rojhilatnasekî almanî ye. Zanista Zimanê Berawirdker û Zimanên Rojhilatî xwendiye û di sala 1868an pîleya doktorayê ji zanîngeha Bonn wergirtiye. Ji bo lêkolînên ser zaravên nûjen bû hevparê Albert Socinî di geştên ber bi Rojhilat ve. Li Şamê kesekî suryanî ji herêma Tûrabidîn nas kir û gelek helbest, çîrokên gelêrî keleporî bi suryanî û kurdî ji devê wî girtin û di sala 1881an da çap kir. Ev xebat bû bingehek ji karên wî bi Albert Sociîn re yên di rojên pêş de. Jiyana xwe bi mamostetî û hînkirina zimanên sanskrîtî û farisî li zanîngeha Bonn bûrand.

Derbarê kesên ku berhem ji wan re gotine de, nivîskaran ne di pêşgotina cildê yekem da û ne di pêşgotina cildê duyem da agahî nedane.Tenê di rûpelên XV-XVIIIan yên cildê duyem da derbarê vê babetê da Albert Socinî hinek agahî dide. Lê pêşî hin agahîyan derbarê gera xwe ya li herêmê dide. Paşê behsa hevdîtina xwe ya bi kesên ku ji wan berhem berhev kirine dike, bêyî ku navên van kesan diyar bike. Dibêje ku ji bo şirovekirina van berheman wî carnan alîkarî ji hin kesan xwestiye, lê ev kes kî ne Socinî tu agahîyan nade.

Digel vena Socinî radigihîne ku di meha Hezîrana sala 1870yî da ew ji Mûsilê derketiye û berê xwe daye gundê Tilkêfê ku niştecihên wî xaçperest bûn. Socinî wan bi navê “fillehan"[4] dide naskirin. Li wir çend rojan maye û ji devê niştecihên gund hin stran tomar kirine. Piştre, ji wir çûye gundê Alqoş yê xaçperestan û çend rojan li dêra gund maye. Socinî dibêje ku li vî gundî li dengbêjekî kurd rast hatiye û ji devê wî helbesteke dirêj qeyd kiriye[5], lê dengbêjî nikarîbû ji Socinî re helbestê xweş şirove bike, ji ber ku xweş bi zimanê erebî nizanîbû û xelkên Alqoş jî xweş bi kurdî nizanîbûn da ku di wergerê da alîkariya wî bikin. Socinî ji Alqoş derbasî Duhokê dibe û li wir keşeyekî Keldanî yê bi

---

[3] Agahîyên jêrîn ji pêşkêşiya cildê yekem ya bi elmanî, li ser daxwaza me ji alî Farûk İsmaîl ve bi kurtasî hatine werherandin.

[4] Wekî tê zanîn kurdên misilman ji xaçperestên suryan û ermen re dibêjin “filleh”.

[5] Berhema 27an ev helbest e ku varyantek destana *Kelha Dimdim* e.

navê Yûnān[6] nas dike; ev keşeyê ku bi kurdî jî zanîbû helbesta ku Socinî li Alqoş berhev kiribû jê re şirove dike.

Piştre Socinî ji Duhokê diçe Zaxoyê û li dêra Mar Yaqûb çend rojan dimîne[7]. Piştî çend rojan Socinî biryar dide ku ji bo karê wî Zaxoyê cihekî baş e, loma li wir dimîne. Li gor agahîyên ku Socinî dide ew bi tevahî sê hefteyan li Zaxoyê maye û li wir li dengbêjekî kor rast tê ku jê re çend stranan bi zimanê suryanî dibêje. Lê piştre ji ber ku gelê Zaxoyê bawer nedikir ku armanca wî berhevkarîya çîrok û stranan e, jê re astengîyan derdixin. Herweha dengbêjan, ji ber ku baş bi erebî nizanîbûn û ji tirsa ku Socinî şiroveya berheman bi erebî ji wan bixwaze, jê re stran negotin e. Socinî dibêje ku dîsa jî wî hinek dengbêj qayîl kirin da ku jê re bistrên, hin kesên derdorê jî jê re wergera stranên ku hatin gotin kirin. Socinî ji dengbêjên ku jê re stran e re behsa dengbêj Binhasê cihû dike ku bi kurdî û "fillehî" zanîbû û di nav gel da bi navê "Rawî" (gotbêj) dihat naskirin. Socinî dibêje ku Rawî ango Binhas li nav êlên herêmên Botan û Hekarê digerîya û dengbêjekî navdar bû. Lê ji xeynî van agahîyan Socinî tu agahîyên din nade û zelal nake gelo berhemên ku di cildê duyem da cih digrin ji devê Binhasê rawî girtine yan na.

Wekî hemû xebatên kurdî yên kevin, Eugen Prym û Albert Socinî berhemên ku berhev kirine bi tîpên Erebî nivîsîne. Lê ji ber ku li hemberî hinek tîpên bêdeng ên zimanê kurdî tîpên erebî tunene, wan rêbaza tîpguhêzîya ku di nav lêkolinerên ewropî yên ku li ser zimanên rojhilatî dixebitin bi kar anîne. Bi sûdwergirtina ji vê rêbazê wan alfabeyek latînî ya taybet ji bo xebata xwe ya keleporî amadekirin e. Bi xêra vê alfabeyê digel hinek zehmetîyan mirov dikare berheman bixwîne û naveroka wan fêm bike.

**Agahî Derbarê Berheman de**

Wekî li jor amaje pê hat kirin, berhema Eugen Prym û Albert Socinî ji du cildan pêk tê: Cildê yekem ji alî Eugen Pyrm û Albert Socinî ve hatîye çapkirin û di nav da 13 çîrok û 17 stranan cî girtine. Di vî cildî da tenê destanek ango varyantek derbarê Ezdîn Şêr da cî girtiye. Li gor mijar an naveroka wan, ji 17 stranan -ji xeynî strana Casimo- stranên cildê yekem tevde yên evînê ne. Dudo ji van stranên evînê (Strana Ferho û ya Faris Axa û Brahîm Axa), ji yên din cuda ne, lewre di formata stranên şer da hatine gotin. Mînak li ser keça Brahîm Axa ku Faris Axa wê dixwaze û birayên wê dij derdikevin, şer di navbera herdu malbatan derdikeve, çend kesan ji hev dikujin lê dawîyê keça Brahîm Axa ji Faris Axa re dimîne. Bi heman şêweyî Ferho keça Îskan Axa dixwaze, lê birayên wê dij derdikevin û ev jî dibe sedema şer di navbera wan da; herdu malbat mêran ji hev dikujin lê di dawîyê da Ferho keça Îskan Axa ji xwe re têne. Di vî cildî tenê yek zêmar ya bi navê Casimo cî girtîye. Di çavkanîyên berhevkarî yên berdest da em li varyantê vê stranê rast nehatin. Ji naveroka wê tê famkirin ku dayîka Casimo pîrejinek e û Casimo ji alî du kesên bi navê Xoce Tomas û Hesen Beg ve tê kuştin. Bûyer li herêma navbera Zaxo û Cizîrê qewimîye; Casimo bi zordarî hatiye kuştin û dayîka wî ji desthilatdaran xwestiye ku kujerên lawê wê bên darizandin lê kesî bersiva wê nedaye.

Wekî sernavê berhemê jî diyar dike çîrok û stranên vî cildî li herêma Torê ango Tûrabdîn hatine berhevkirin û bi devoka vê herêmê hatine gotin. Ji alî naverok û mijarê ve çîrok balkêş in; hin ji wan di forma "serpêhatî" / "memorat" an da ne. Her weha ji stranên evînê ku di cilda yekem de cî girtine ya Mihemedê Hena pir balkêş e. Lewre derbarê evîna keça Şêxê Ewêna û Mehemedê Hena yê xaçperest da ye. Di edebiyata devkî ya kurdî da gelek stranên derbarê evîna misilman û xaçperestan de hene, lê herdem mijar evîna navbera xortekî kurdê misilman û keçek xaçperest de ye, weke mînaka

[6] Di metnê resen da (r. XVI) "Yûnan" hatiye nivîsandin, lê bi bawerîya me ya rast "Yûhan" e.

[7] Di jêrenotên rûpelên 272 û 273an yên cildê duyem da Albert Socin dibêje ku wî du stranên nav nediyar (39 û 40) li vê dêrê berhev kirine. Di herdu stranan da jî behsa derdora Nisêbînê û Mêrdînê tê kirin. Lê dêra ku Socin bahs dike ne Dêr Mar Yaqûba ku li gundê Telesseqif/ Tisqûya, 30 km li bakurî Musilê dimînê û dikeve navbera Elqoşê û Telkêfê da heye.

strana bi nav û deng ya Kirîvê. Berovajî van mînakan strana Mihemedê Hena derbarê evîna keça şêxekî de ye ku li gorî stranê li Ewêna dimînê. Li jêr em ê nirxandina vê bikin.

Cildê duyem ji alî Albert Socinî hatîye çapkirin û bi tevahî 21 berhem tê da hene. Ji wan dudo bênav 6 stranên evînê û 5 stranên şer in ku di formata destanî da hatine honandin. Destanên naskirî, wekî “Mem û Zîn”, “Yûsif û Zuleyxa”, “Zembîlfiroş” (du varyant), “Cembelî”, “Rustem” (du varyant), “Dimdim”[8] û varyantek destana “Ezdîn Şêr”, di vî cildî da cî girtine. Ji xeynî van destanek evînî ya bi navê “Ferx û Sitîyê” ku wekî pexşan hatiye gotin jî di vî cildî da heye. Varyantek vê destanê ji alî kurdolog û folklorzanê kurd Hecîyê Cindî ve bi navê “Ferxê û Stîya Ala” di destpêka sedsala XXem da hatiye berhevkirin û di sala 1957an da berhema bi navê *Folklora Kurmancî*yê da hatiye çapkirin[9]. Ev varyant jî wekî ya di xebata Socinî de pexşan e. Her weha birayên Celîlan jî di sala 1957an da ji devê çîrokbêjek ermen varyantek heman berhemê bi navê “Stî û Ferxî” qeyd kirin e û di sala 1978an di berhema bi navê *Zargotina Kurda* da çap kirin e[10]. Her çiqas mijar û lehengên sereke yek bin jî her sê varyant ji hev cuda ne. Li vir ya balkêş ev e ku wekî hemû destanên kurdî ev her sê varyant li du erdnîgarîyên ji hev dûr hatine gotin û di demên cuda da hatine berhevkirin. Zimanzanê elman Oskar Mann jî varyantek heman destanê bi navê “Shekh Färkh û Khatûn Ästi” (Şêx Ferx û Xatûna Stî)[11] bi zaravayê soranî berhev kiriye. Ev varyant berovajî ya Socînî helbestî ye. Her weha Sadiq Bahaeddin Amêdî varyantek vê berhemê di sala “1972an da ji Seîdê Pîroy ji gundê Darhozanê bi ser Zaxo” berhev kirîye. Amêdî destan wekî “Çîroka Sitî û Ferxê” bi nav kiriye, (Amêdî, 2013, r. 52). Her çiqas beşin jê helbestkî bin jî ev varyant bi piranî pexşan e û dibe ku loma Amêdî ji vê berhemê re gotiye “çîrok”.

Sê destanên dînî jî di cilda duyem da hene. Dudo ji wan destanên bi nav û deng, “Newala Sîsebanê” û “Qewlê Hespê Reş” in. Varyantên van herdu destanan ji alî kesên wekî Feqîyê Teyran û Ehmedê Xanî ve hatine nivîsandin. Nusxeyek destana “Newala Sîsebanê” ku ji alî Feqîyê Teyran ve hatiye nivîsandin, di koleksyona Alexandre Jaba da cî girtîye. Varyantek vê destanê di xebata keleporî ya berhevkar Sadiq Bahaeddîn Amêdî bi navê Folklora Kurdî da bi navê “Sîseban” cî girtîye. Berhevkar dibêje wî ev varyant “ji nivîsîna ku Muhsîn Salih ‘Ebdul’ezîz di 05.02.1970 da ji destnivîseka bênav” girtîye, (Amêdî, h.b., r. 134). Li gorî agahiyên ku Jaba ji Mela Mehmûd Beyazîdî vediguhêzê Feqîyê Teyran destana “Qewlê Hespê Reş” (ku wekî hespê Hz. Muhammed tê qebûlkirin) jî bi helbestî nivîsîye. (Jaba, 1860, r. 8). Folklorzan Ordîxan û Celîlê Celîl jî varyantên van herdu destanan ji nav kurdên Qafqasyayê berhev kirine û çap kirine[12].

Ya sêyem, ku bi navê “Cimcime Siltan”/”Siltan Cimcime” hatiye qeydkirin, derbarê rasthatina Îsa Pêxember li qoqê serî yê mirovek mirî da ye. Ev cara yekem e ku di berhemeke nivîskî da em li vê destanê rast tên. Tenê nêzîkî çil sal berya niha mirovek ji herêma Nisêbînê, navçeya Mêrdînê varyanteke kurt ya vê destanê digot[13]. Lê li gor agahîyên ku dîrokzan Farûk İsmaîl bi dest xistine, du destnivîs bi vî navî, bi zaravê Goranî, di nav Destnivîsên Kurdî li Berlînê, yên ku Oskar Mann ji Kermanşah dane hev, hene[14]. Ev berhem ku helbestek di forma mesnewî da û li ser kerametên

---

[8] Varyantek din ya vê destanê bi navê Evdal Omer (33) di vî cildî cî girtî ye.

[9] Bnr. Cindî H., 2016, *Folklora Kurmancîyê (Berevok)*, Lîs: Diyarbakır, rr. 115-138.

[10] Bnr. Celîl O. & Celîl C., 1978, *Zargotina Kurda, Para I*, Neşirxana Naûka, Moskova, rr. 203-213.

[11] Bnr Mann O. 1906, *Die Mundart Der Mukri-Kurden*, Druck Und Verlag. Von Georg Reimer, Berlin, rr. 136-192.

[12] Bnr. Celîl C. 2004, Keşkûla Kurmancî, Wien, rr. 265-301.

[13] Beriya nêzîkî 40 salan carekê min bi xwe jî li vî kesî ev hîkaye guhdarî kir.

[14] 1- Ms.or.oct 1153: Navê nivîskar tune, Daner: Ni'matullāh, di 1. Ša'bān 1313 h. / 16. Jan. 1896 de, 6 rûpel e; 2- Ms.or.oct 1179. Nivîskar: Malla Nūr-'Alī Kandūlayī. Navê Daner tune, sala 1318 h. / 1900-1901, li Kermanşahê, ji ber nusxeyek Orîjînal, ji sala 1250 h. / 1834-1835, hatiye nivîsîn û 16 rûpel e. Ez spasîya Farûk Îsmail dikim ku ev agahî dane min.

('ecêbên) Îmam 'Ali yên ku li Babilê qoqek avêtî bi jiyan kir û pê re axivîye, di nav Şî'îyan da gelek berbelav e. Di destanê da Îsa Pêxember pirsan ji qoq dike û qoq jî bersiva wî dide. Di dawîya cildê diduyan da helbestek Sîyapûş û yeke Elî Herîrî jî cî girtîye. Ji agahîyên di pêşgotina cildê duyem da tê famkirin ku piranîya berhemên di vê cildî da ji alî Albert Socin ve, li Zaxoyê hatine berhevkirin[15]. Berhemên di cildê duyem da bi devoka Botan hatine nivîsandin. Ji xeynî destana *Mem û Zîn* ku hem pexşan û hem menzûm hatiye gotin du varyantên destana Rustem, destanên din helbest ango menzûm in.

**Nirxandin Berhemên Pexşan (Çîrok û Serpêhatî)**

Ji alî honandina avahîsazîya çîrokan ve vebêjer serkeftî ye, lê gûman bi mirov re çêdibe ku wî hin beşên çîrokan di dema gotinê da lê zêde kiribin[16]. Di çîrokan da peyvên argo û erotîk bi şêweya dubare hatine bikaranîn. Gelo çîrokbêj ev peyiv wekî bihîstine bi kar anîne yan wîna li çîrokan zêde kirine, em nizanin. Wekî em ê hewl bidin li jêrê destnîşan bikin, ji alî naverokê û hêman û karakter/lehengên derasayî ev çîrok pir dewlemend in. Hinek ji wan di formata çîrokên derasayî/fantastîk da hatine gotin. Hebûna mar wekî lehengê sereke di çîroka 2an û 10an da an jî lehenga keç ku li pêşberî mirovên din xwe dike meymûn herweha lehenga çîroka 13em ku keça teyrê Sîmir e lê dema bedlê teyra ji xwe dike dibe mirov, sê mînakên çîrokên fantastîk in. Di xebata ansiklopedik ya birayên Celîlan da çîrokek bi navê “Tîrem‘er” ku leheng mar e û wekî “Şah Meymûn”[17] li pêşberî mirovan mar e lê di rastîya xwe da xortekî lawîn e û yek bi navê “Xatûn Meymûn”[18] ku varyantek çîroka “Şah Meymûn” e cî girtine. Ji xeynî van mînakan hema hema di tevahiya çîrokên di berhema Pyrm û Socinî de lehengên lawir hene û hinek ji wan wekî mar lehengên sereke ne. Li gor Dorson, di çîrokan de lehengên lawir wekî “aktorên [lîstikvanên] rasteqîn yên di lîstikekê de ne. Heta her çiqas navên lawiran li ser wan be jî ev aktor temsîla mirovan in û êrîşkarîyên dijminî û hêvîyên fantezî yên di çîrokan de temsîl dikin. Edebiyata gelêrî ji jiyana derve zêdetir gire (stres) û tirsên çandê destnîşan dikin.” Ji ber vê Dorson îdia dike ku France Boas û “hevalên wî yên folklorzan bi şaşî lehengên lawir yên çîrokan wekî lawirên rasteqîn dinirxênin” lewre ev “aktorên lawir di heman demê de temsîla mirovên xeternak sadîst an mirovên dewlemend û xwedî hêz dikin” (Dorson, 1963, r. 103). Dema mirov bala xwe dide çîrokên berhema Prym û Socinî vê nirxandina Dorson bi zelalî dibîne, lewre her çiqas leheng wekî mar hatibe binavkirin jî di rastiya xwe de ew mirovekî ku li dû tolhildanê ye ji mirovên ku zerer û tadeyî danê. Bi heman şêweyî lêhengên lawir wekî rovî bi rola xweyî xapînok, hirç bi bi hêza xwe ya zordar di hîkayetan de cî girtin e. Li jêrê em ê di bin du sernavan serpêhatî û çîrokên derasayî ango fantastîk ji alî cure û mijarê ve binirxênin û bi riya çend mînakan hewl bidin balê bikşênin ser hebûna lehengên lawir wekî temsîlkarên mirovan.

**a) Serpêhatî**

[15] Berhemên ku Socin li Zaxo berhev kirin e ev in: 26. Hespê Reş, 27. Cimcime Siltan, 30. Boz Beg, 31. Heme Teyar, 33. Evdal Omer, 34. Ezdîn Şêr, 35. Kakeyî Efendî, 36. Xezalê, 37. Cembeli, 42. Beyta Bilbil, 43. Sîyapûş û 44. Elî Herîrî

[16] Ji xwe nivîskar bi xwe balê dikşênin ser vê xalê. Mînak dibêjin ku dengbêj Cano (Schano) ku navdartirîn dengbêjê Torê ku wan balpiştî pê dikir, deq diguhertin û xweşik nizanîbû ji ber bistra (Prym, E. & Socin, A., 1890, r. XIX).

[17] Di metnê resen de nivîskaran sernav li berhemên çîrokî ne kirine, berhem bi jimaryên romayî I, II, III… hatine rêz kirin. Lê ji bo analîzê me li gor navê lehengê sereke berhem binavkirin e. Mînak ev çîroka ku me navê Şah Meymûn lê kiriye di metnê resen de çîroka XIem e.

[18] Bnr. Celîl O. & Celîl C., 2015, *Zargotina Kurda: Çîrok, Çîvanok*, Cild. 9, Înstîtûta Kurdzanîyê, Wien, rr. 226-244; 461-466.

Ji xeynî çîroka "Mêrik û Jina Wî" ku kurt e û derbarê sedaqeta navbera jin û mêr da ye, çîrokên din ku serpêhatî ne ji alî mijar û honandinê ve balkêş in. Naveroka wan derbarê têkilîyên mirovan da ne; di tevan da pêbahwerî, bêbextî, xayîntî, kuştin heye. Herweha di wan da pend hene, ango hişyarî didin mirov da ku karên çewt nekin, li dij pîvanên exlaqî yên civakê tev negerin. Mînak di çîroka "Mêrik û Jina Wî" da mêr bi jina xwe ne bawer e û lê di şikê da ye ku bi mêrên din re têkeve têkilîya cinsî. Piştî ku jin vê dibîne, bi mêrekî din wî dixapêne û piştre jê re dibêje ku ew bi mêrî re kete têkilîya cinsî. Li ser vê mêrik diçe bajêr ji bo kar bike û hin dirav bi dest bixe. Li wir ew jî carek bi jinekê re dikeve têkilîya cinsî û vê yeke ji jina xwe re dibêje. Piştre herdu soz didin hev ku carek din tiştên weha nekin.

Çîroka "Wezîr" jî bi heman şêweyî hatîye honandin û di dawîyê da peyam ev e ku ger mirov li dijî îradeya Xweda derkeve, ew ê têk here. Lehengê sereke wezîr xwedî du keç û du lawan e û digel dijderketina derdora wî ku jê re dibêjin ev yek li dijî îradeya Xweda ye, keç û lawên xwe li hev mahr dike. Piştre hem herdu lawê wî, hem ew dimirin û kesên din herdu keçên wî û jina wî li xwe mahr dikin.

Serpêhatîya "Yûsif û Selîm" wekî çîrokên din, ji alî vegêran ve bi hostayî hatiye honandin. Digel hebûna hefrît wekî leheng û hêmank derasayî çîrok pirtir di formata serpêhatîyê da hatiye honandin lwere peyamên giring têda hene ku mirovan hişyar dikin da ku di têkilîyên bihevre da çewtîyan nekin û xwe ji tevgerên dijexlaqî dûr bikin. Çîrok derbarê hevaltîya van herdu kesan da ye ku li girtîgeha Amedê hev nas dikin. Ya balkêş ew e ku li ser şertgirtinê pêşî Selîm jina Yûsif jê distêne û dibe Mûsilê, paşê Yûsif diçe hem jina xwe hem ya Selîm direvêne û tê bajarê xwe Mêrdînê. Li ser vê Selîm tê Mêrdînê, mala Yûsif ku di girtîgehêde ye li Amedê, jina Yûsif û jina xwe dixapêne û wan carek din dibe Mûsilê. Di dawîya çîrokê da Selîm û jina xwe dimrin û, piştî ku ji girtîgehê derdikeve, Yûsif diçe Mûsilê jina xwe têne.

Çîroka "Yûsif Bajarî" derbarê serborîya keçekê da ye ku bavê wê ji ber feqîrîyê wê difroşe bazirganekî. Çîrok ji kirinên ku mirovên cuda cuda (xulam, bazirgan, wezîr) tênin serê vê keçikê pêk tê. Di dawîya çîrokê da keçik li wezîr tê mahrkirin bêyî daxwaza wê! Serpêhatîya dawî derbarê kurê jinebîyekê da ye. Wekî em zanin pirîn caran lehengê çîrokên kurdî xortekî sêwî, bav mirî ye û piştî gelek bûyerên ku tên serê wî û astengîyan lehengê xort digihe armanca xwe. Ev çîrok jî bi heman şêweyî hatiye honandin. Xort ji alî rêvbirên bajêr wekî paşa tê bijartin, lê piştre gelek bûyer tên serê wî û dawîyê digel hemû astengîyan serkeftî dibe û wekî paşayê bajêr dimîne. Di vê çîrokê da xala balkêş ew e ku yek kesên ku astengîyan ji paşa re derdixe hefrîtek e ku jina paşa bi zor li cem xwe digire, pê re dirazê, ji hefrît lawek ji jina paşa re çêdibê, lê paşê ev law ji alî paşa tê xwedîkirin û li ser daxwaza paşa diçe bavê xwe yî hefrît, ku tê êrîşî bajarê wan dike, dikuje (Prym & Socin, 1887, r. 12-14).

**b) Çîrokên xwedî hêmanên derasayî**

Piranîya çîrokên di vê berhemê de xwedî hêmanên derasayî ne. Yek ji van çîrokan ya bi navê "Ferhat Axa" ye. Çîrok bi kurtasî weha ye: Lehengê çîrokê Ferhat Axa hîna di zikê dayîka xwe de ye dayîka wî dimre, wê dixin tirbê. Di tirbê da Ferhat ji dayîk dibe. Piştî ku bavê wî jê haydar dibe, diçe wî ji tirbê derdixe û mezin dike. Ferhat Axa di cihê bavê xwe da dibe axayek tundrew. Gel serî li ber radike û ji welat derdixin. Ferhat Axa diçe warek ku niştecih bi roj kêç in bi şev mirov in. Piştî gelek bûyer ku tên serê wî, Ferhat Axa digel du jinên xwe vedigere welatê xwe. Çîrokbêj çîrokê weha bi dawî dike: "Du jin ji xwa re anîn, weka wa nîna. Herdû jin tevda bi hemil bûn, Xwedê du kurik dayê, salik dî Xwedê du keçik dayê. Mezin bûn, li mal li hev mahrkirin. Xwedê mala wî zêde kir, bûn şêst nefs, li mal ji hev di zewicin." (Prym & Socin, h.b., r. 3).

Çîrokeke din ku xwedî hêmanên derasayî ye ya binavê "Mar û Kurê Wezîr" e. Çîrok bi têkilîya navbera mirovekî xizan (feqîr) û marekî dest pê dike. Mar her roj zêrek ji mirovê xizan re tîne ta ku rojek lawê mirovê xizan dixwaze mar bikuje û zêran tevan ji qula mar derxe, lê bi ser nakeve û mar wî

dikuje. Ev beşa destpêkê ya vê çîrokê wekî çîrokek ku li herêma Mêrdînê tê gotin. Di varyanta herêma Mêrdînê de tê gotin ku mirov mar ji devê teyrekî xelas dike, li hemberî vê qencîyê mar her roj zêrekî têne devê qula xwe û dide mirov, ta ku rojek lawê mirov tê û êrîşî mar dike ji bo bikuje û zêrê di qula wî da tevda derxe. Mar pê vedidê û dikujê, piştre bavê law tê êrîşî mar dike û dûvê wî jê dike lê mar nayê kuştin. Paşê mirov poşman dibe û ji mar lêborînê dixwazê û pêşniyaz dike wekî berê bibin dost lê mar dibêje "na, here heta ku tirba lawê te pêşberî te bê û dûvê minî qut li bîra min bê em nikarin carek din bibin dost". Lê varyanta di berhema Pyrim û Socinî da çîrok berdewam dike, lewre mar namire û dibe lehengê sereke yê çîrokê. Piştî şerê navbera wî û xortê ku hewl da wî bikuje xwe diguhere dibe derya û rê li ber bazirganekî digire, wekî derya bi bazirgan re xeber didê, baca rê jê dixwazê, bazirgan wekî bac barê hêstirek didiyê. Paşê derya dîse dibe mar û baca xwe dibe şikefta xwe, vedike ku jinek tê da ye. Lawê wezîrê Qoçhesarê ku derketîye nêçîrê li mar û keçikê rast tê, bi wan re diçe şikeftê. Keça Delû Mîrxanê Kîkî[19] jî li heman şikeftê ye; mar keçikê li lawê wezîr mehr dike, zora jina ku ji Mûsilê di nav barê bazirgan de derketiye diçe, ji şikeftê derdikeve diçe. Paşê lawê wezîr û jina wî li du hespên "bayî" siwar dibin, hesp wan ji şkefta mar derdixin, dibin Qoçhesarê. Mar bi dû wan dikeve û keçikê direvêne. Lawê wezîr bi alîkarîya mîrê cinan jina xwe ji destê mar rizgar dike, çîrok bi dawî dibê.

Heman hêmanên derasayî di çîroka "Marê Devê Kanîyê" da jî hene. Ev çîrok jî weha dest pê dike: Li gundekî kanîyek heye, gundî ava xwe jê tênin. Rojekê marek tê dikevê devê kanîyê û nahêlê gundî ji xwe re avê jê bibin; ji wan re dibêje "her roja înê keçikekê bidine min, ez bixwim, ez ê avê berdim" (Pyrim & Socin, h.b., r. 23). Her în keçikekê dixemilênin û ji mar re dibin. Rojek dor tê ser keça siltan, "ew xemilandin ji zîv û zêr, ew bi tenê çû devê kahnîyê". Efrît li keça siltan digere; hat devê kahnîyê, keça siltan dî, rahişt keça siltan. "Mar dî efrît rahişt keçikê, mar bderket, hat efrît. Sultan û bajar difericin; efrît û mar şer dikin. Efrît şûr kişand û mar devê xwa vekir, rahişt lingê efrît, di devê xwa danî. Efrît şûrek li nîvê wî xist, kir du perçe. Keçik sax ji zikê mar bderketin" (Pyrim & Socin, h.b., r. 23). Di berdewamîya çîrokê de siltanê mara digel artêşa xwe diçe efrît dikujê û keçikê tênê cem xwe. Piştre mar bi jina mirovek bi navê Çeleng Evdal ê Keleha Comanîyê vedidin, jinik dimrê. Çeleng Evdal diçe cem siltanê mara gilî dikê ku maran bi jina wî veda ye. Siltan di cihê jina wî de keça siltanê ku ji efrît standibû dide Çeleng Evdal. Dema bavê keçikê dibihîze tê bi ser kelehê de digrê deh kesan digel Çeleng Evdal dikujê û keça xwe dibe mal. Piştî deh rojan keçik jî dimrê û bi vî awayî çîrok bi dawî dibê.

Çîrokeke din ku bi hêmanên derasayî xemilandîye ya *Şah Meymûn* e. Şah Meymûn darî çavan[20] meymûn e lê di rastiyê da jineke spehî (xweşik) ye. Balkêş e ku hin caran leheng mêr be jî wekî çîroka "Tîremar" ku brayên Celîlan berhev kirine leheng ango "tîrem'er" di rastiya xwe da xortekî çeleng û lihevhatî ye û wekî Xatûn Meymûn xwedî hêzên derasayî ye. Di hin çîrokên ku mijara vê xebatê ne da hirç wekî lehengê sereke ye; lê lehenga hirç her tim mê ye û mirovekî ciwan û çeleng dîl digire û wekî hevjînê xwe zorê lê dike ku pê re têkeve têkilîya cinsî. Li herêma Mêrdînê ku Tûrabidîn beşek jê ye, di nav gel da çîrokên derbarê hirça ku mêran dîl digire û bi zor bi wan re dikeve têkilîya cinsî, an derbarê hevaltîya hirç û mirovan de, têne gotin. Di çîroka "Lawê Pîrebîyê" da bi heman şêweyî hirçeke mê, xortê ku şahê mara xezîneyek dabûyê bedêla marê ku xwedî kirîye, dixapêne bi mahneya ku ew ê jî xezîneyekê bidîyê û wî li cem xwe dîl digire. Piştre şêr tê wî ji destê hirçê rizgar dike, dibe cem xwe. Di berdewamîya çîrokê da lehengê xort rizgar dibe û bi keça şêr re dizewice, wê direvîne tê welatê xwe…(Pyrim & Socin, h.b., r. 28-30).

Çîroka bi navê "Herdu Xulamên Osman Beg û Keça Teyrê Sîmir" jî ji hêman û bûyerên derasayî pêk tê. Herdu birayên xulam keça teyrê Sîmir ku ji alî evd ve hatiye dîlkirin, rizgar dikin, paşê ji bo keçikê şer dikin û yek ji wan birayê xwe dikuje, keçikê li xwe mahr dike. Lê demek paşê

[19] Delû Mîrxanê Kîkî yek ji lehengê strana şer ya Boz Beg e ku di cildê duyem da cih girtîye.

[20] Ev biwêj li herêma Tûrabidîn tê gotin di wateya "le ber çavan".

dilê jina xwe dihêle, ew jî bedlê teyra li xwe dike û diçe welatê bavê xwe, Deşta Helanê. Dema leheng têdighêje ku jina wî winda bûye, dest pê dike lê digere, li teyrekî rast tê, teyr wî li ser pişta xwe dideyne û dibe Deşta Helanê. Leheng li wir diçê mala teyrê Sîmir, jina wî leheng nas dike, dibêje dayîka xwe ku ev hevjînê wê ye. Bavê wê qebûl dike ku leheng jina xwe bibe û here. Wekî em dibînin di vê çîrokê da jî wekî yên din hêman û karakterên derasayî, (evd, teyrê sîmir, keça wî ku hem dibê teyr hem jin, tevgera teyrê din ku leheng li ser pişta xwe dike dibe Deşta Helanê, welatê teyrê Sîmir) hene û digel lehengên mirov tevdigerin.

Bi gotineke din, hem leheng hem bûyerên van çîrokan tev derasa ango fantastîk in. Di gelek çîrokên kurdî yên derasayî da lehengên derasayî wekî dêw/dêwê heft serî, hefrît, cin/mîrê cina, hene ku hinek ji wan alîkarê lehengên mirovan in û hinek ji wan dijber in ango astengîyan ji lehengan re derdixin, li hember wan şer dikin. Di van çîrokên Prym û Socinî da jî bi piranî mar, hirç û şêr wekî lehengê sereke carna wekî alîkar/parêzer û carnan jî dijberê/dijminê lehengê mirovî tevdigerin.

**Nirxandin Berhemên Helbestî û Destanî**[21]

Berhemên destanî jî çi stranî/helbestî çi pexşan, wekî çîrokan, bi awayekî serkeftî hatine honandin. Dengbêjan di van berheman de sahneyên şer pir bi hûrgulî pêşkêş kirine û hewl dane ku kesên amade hestên guhdaran gur bikin. Heman rêbaz ji bo stranên evînê jî hatiye bikaranîn, bi taybetî dema evîndar hestên xwe pêşkêş dikin an teswîra xweşikbûna (qeşengî) evîndara/ê tê kirin. Li jêr em ê hewl bidin bi riya mînakan van taybetmendîyan derxin pêş.

**a) Stranên Evînê**

Ji stranên evînê ya herî balkêş ya “Mihemedê Hena”[22] ye ku di cildê yekem da cî girtîye, lewre derbarê serborîya keça şêxê Ewêna[23] ku dil dikeve Mihemedê Hena da ye. Mihemedê Hena xortekî xaçperest e û wekî berhevkarê bacê li ser navê metranê Dêra Zaferanê diçe Ewêna. Li wir Medo keça şêx wî dibîne dil dikevîyê, ew red dike lê keçik dev jê bernade. Gelek sergêjî ji Mihemedê Hena re çêdibin lê di encamê da ew û keça şêx dimînin jin û mêrê hevdu. Wekî li jor hate destnîşan kirin di demên borî de bi gelemperî li herêma Tûrabidîn ku suryanî û kurdên misilman digel hev dijîn mêrên misilman bi keçên xaçperest re dizewicîn, heta pirîn caran xortên misilman keçên xaçperest revandine. Ev cara yekem e ku em li mînakek berovajî rast tên[24].

Mînak strana bi navê “Mêremê” ku di cildê yekem da ye, evîndarê mêr misilman e û hezkirya wî keçek xaçperest bi navê Mêremê ye. Ji rista “ji dêrê heta bdêrê” diyar dibe ku Mêremê xaçperest e. Ev stran jî balkêş e, bi taybetî ji alî teswîra hestên evîndaran ve. Di dirêjahîya stranê da bi mubalexa hatiye teswîrkirin bê çawa Mêrêmê tevgerîya ye da ku “sayîya delalê” xwe, ku “bi qasî bîst perek lewitî” bû di avê da bişo. Ji bo vêna Mêremê diçe Diyarbekirê, “li ber keleha Heskîfê dibûrê”, ji wir diçe Ridwanê (gundeki bi ser bajarê Batmanê ve ye), derbasî Slîva dibe; bi ava wir ne razî ye ku sayîyê delalê xwe tê de bişo. Ji wir diçe Stewrê (navçeya Mêrdînê), ji wir diçe ser çemê Mûradê, lê ava çemê Mûradê ne li gor dilê Mêremê ye, loma ji wir vedigere Mêrdînê, gundê ‘Eyncewzê. Li wir jî sayîyê delalê xwe naşo, derbasî ser ava Nisêbînê (navçeya Mêrdînê) dibe, li wir sayîyê delalê xwe dişo. (Pyrim & Socin, h.b., r. 60-62).

[21] Berovajî serpêhatî û çîrokan berhemên destanî û helbestî bi sernav in.
[22] Ev stran du varyant in: Yek jê bê nav e û hem pexşan hem helbestî ye, ya duyem bi sernavê Mihemedê Hena ye û tenê peşan e.
[23] Ewêna di roja me da bajorkek bi Mêrdînê ve ye, bi qasî 30 km dikeve bakurê bajêr.
[24] Di pêşgotina xebata xwe da Socinî dibêje ku wî kesek suryan bi navê Cano li Şamê nas kirîye û jê re gelek stran, çîrok û berhemên din yên zargotina kurdî gotine. Gelo stranbêj Cano ye ku ji Socin re ev stran gotîye, ne diyar e, lewre di berhemê da agahî derbarê vê mijarê da ne hatine dayîn.

Di edebiyata devkî ya kurdî da gelek stranên evînê hene ku derbarê nakokîyên navbera du malbatan da ne. Hinek ji van nakokîyan li ser xwestina keçekê derdikevin: ji ber ku malbata keçikê naxwaze ew bi hezkiryê xwe re bizewice, şer di navbera herdu malbatan da derdikeve, di vî şerî da mêr têne kuştin. Strana "Ferho" ku di cildê yekem da ye mînakek weha ye. Ferho diçe Xecko keça Îskan Axa dixwaze lê Îskan Axa keça xwe li xulamê xwe Çeto mehr dike. Ferho diçe Çeto dikuje û Xecko bi zorê direvîne. Li ser vê şer di navbera malbata Ferho û ya Xecko da derdikeve, çend mêran ji hev dikujin lê di dawîyê da Xecko ji Ferho re dimîne. Mijara strana şerê navbera Brahîm Axa û Faris Axa jî derbarê evînek weha de ye. Faris Axa diçê bi ser mala Brahîm Axa de digrê û bi zorê keça wî ji xwe re dibe li ser vê Brahîm Axa jî diçe bi ser mala Faris Axa de digre çar keçan ji mala Faris Axa bi zorê digre tîne. Di dawîyê de Faris Axa, Brahîm Axa dikujê û keça wî li xwe mahr dikê. (Pyrim & Socin, h.b., r. 46-47).

**b) Stranên Şer**

Wekî li jor hate destnîşan kirin, di xebata Prym û Socinî da şeş stranên şer hene. Ji wan tenê strana "Osê Zerî" ku di cildê yekem da ye bi devoka Tûrabidîn e; her pênc stranên din bi devoka botan in, lê tevde di forma destanan da hatine gotin. Her şeş jî derbarê nakokî û berberî (berevanî) yên navbera serokeşîran da ne. Ji wan strana *Osê Zerî* û ya *Ehmedê Şeng* helbestî ne. Strana Osê Zerî derbarê şerê li ser zozan di navbera malbata Osê Zerî û Xanê Bidlîsê de derketîye: Malbata Osê Zerî pezê xwe tênin zozanê Xanê Bidlîsê, ji wa tê xwestin ku ji zozan derkevin, lê qebûl nakin. Li ser vê şer dikin û gelek mêran ji hev dikujin. Dengbêj Miradê Kinê jî varyanteke vê stranê gotîye.[25] Mijar, bûyer, cîhê bûyerê û lehengên stranê di herdu varyantan da wekî hev in.[26] Miradê Kinê vê stranê carna pexşan carna bi stran dibêjê, berovajî varyanta berhevkîrî ji alî Albert Socinî ve ku bi tevahî helbestî ye. Her weha qewimîna bûyeran jî ji hev cuda ne, lê di varyanta Miradê Kinê da jî nakokî li ser zozanê Xanê Bidlîsê ye ku malbata Osê Zerî hatiye li serê danîye.

Strana "Ehmedê Şeng" jî derbarê şer da ye ku di navbera eşîra Gêsa û eşîra Ehmedê Şeng de derketiye. Taybetmendîyek strana Ehmedê Şeng ew e ku di vê stranê da formul[27] bi awayekî zîrek hatiye bikaranîn. Mînak ji bo hêza derasayî ya Ehmedê Şeng teswîr bike, dengbêj formula jêrîn sê caran bi kar anîye:

Li ser rikêba leylikê wê rabûye
Wekî rima hêzeranî hejandîye
Ser û binê vêkre gihandîye
Rim nêv guhê leylikê da danîye
Sibhan e ji ‘ezameta Xudê, mînayî birûska biharê li ‘erdê wê rijîye
Li çar rexê eskerê Gêsa gerîya
Eskerê Gêsa bi hev da şidandîye
Xwe li koma ‘eskerê Gêsa wê dayîye ji rexê zozanî
Li berîyê re derketîye
Ji qewlê qahêlî dibêjin bîst siwar jê avêtîye[28]

---

[25] Bnr. Aslan M. E., 2019, *Hostayê Ribabê Miradê Kinê û Analîza Şerê Wî Yê Bi Navê Osê Zerî* (Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî), Zanîngeha Van Yüzüncüyıl.

[26] Ji xeynî navê apê Osê Zerî ku di varyanta Albert Socin da navê wî Mîrz[a] Axa ye, di ya Miradê Kinê da Mihemed Axa ye.

[27] Formul yek ji taybetmendîyên destanan e. Li gor pisporê Homeros Milman Parry formul "ji bo îfadekirina fikreke/ramaneke bingehîn bikaranîna komeke peyv di bin heman mercên metrîk de." (Parry, 1971, r. XXXII).

[28] Ev formul sê cara hatiye dubare kirin, tenê jimare tê guhertin, pêşî bîst û şêş, piştre bîst û pênc û cara sêyem dibe bîst, bnr. Prym & Socin, 1890, r. 201-214.

**c) Destan**

Piranîya destanan bi helbestî hatine gotin. Tenê çar ji wan (Rostem I û II, Mem û Zîn, Ferxê û Sittî) pexşan in. Giring e ku bête gotin ku di piranîya destanên ku mijara vê xebatê ne formul nehatine bikaranîn. Tenê di destana “Evdal Omer” û ya “Cimcime Sultan” ku helbestî ne formul hatine bikaranîn. Mînak, ji bo hêza lehengê destanê Evdal Omer diyar bike dengbêj formuleke weha bi kar anîye:

“Evdal mîrek temam e
‘Eskerî xas û ‘am e
Xudba wê birî Şam e”[29]

Di destana Cimcime Siltan de jî formul hatiye bikar anîn, bi taybetî dema leheng sond dixwe. Ev formula sondê ku ji devê Cimcime Siltan hatiye gotin:

Ya Îsa bi wî dikim ê rehman e
Bi Xaliqê li erdan û ezman e
Ez bûm Cimcima Sultan e[30]

Çi pexşan û helbestî, çi tenê helbestî bin, ji naveroka destanan diyar dibe ku vebêjer / dengbêjê wan xwedî huner e û di bikaranîna teswîr û ziman da jî hosta û zîrek e. Mînak di destana *Rustem I* da ku pexşan e, xwe amadekirina Rustem weha hatiye teswîrkirin:

> “Subehî rabû, seharê rabû Rexşê Belekî kêşa derê, daxe li çil û çar mextera ‘horî, lRexşê Belek wepalişîn, mehes kir, gelweşîn kir, zînî mirosa ser piştêra kuta, teng û beltengê wi şidandin. Rikêbêt altozî pêve kirin. Şeş gazî çingale ber qelpûza zînî rakirin, qebûrê tîra ber qelpûza zînî rakirin. Lixavê zêrî da ser, gulfig qoteg jê berdan, gihmî û dukar tê deynan. Rostam rabû jpêva bejn û bala xwa wê fekirî, hev zerî, hev kumzerî ser êkûdû wergirtin, beşn û beyan avêt serê xwa, qeftek tîra ber pişta xwa rakirin, kemera xîretê avêt pişta xwa, bazbendê xêrê avêt milê xwa, hingustîra fet’hî kira tiliha xwa, îna keşarî bstoyê xwada kêşa, elmasê hindî avêt pişta xwa, metalê pîlayî avêt paşpîlê xwa, çekmanê zer pê xwada kêşa, qotya serêdûkî mel‘hemê slêmanî avêta delxanêda, pê xwa bi rikêbê deynat, destê rastê avêt gurzê giran, hezar û êk xunkarî, destê çepê avêt rima hijde gaz, dêna ser milê xwa” (Prym & Socin, 1890, r. 95).

Çawa ku mirov dibîne vebêjer/dengbêj li vir taswîrek derasayî kirîye. Çiqas bi hêz be jî gelo pêkan e ku mirovek karibe ewqas çek û sîleh li ser xwe hilgire? Bê gûman ev di jiyana rasteqîn da ne pêkan e. Lê dema mijar lehengê destanê Rustem be ku di dirêjayîya destanê de wekî kesekî derasayî tê teswîr kirin, tu kes vê pirsîyarê nake û bi gotina gelêrî vebêjer “li derewê naqelibêne” ango jê re nabêje “te çiqas derew kir”. Heman teswîrên derasayî di varyanta duyem ya destana Rustem da jî tê kirin, bi taybetî dema vebêjer behsa hespê Rustem, Rexşê Belek dike û dibêje bê çawa ji bahrê derketîye û dûre ew û Rustem bi hev re ketine berxwedanê. Li gor teswîra vebêjer ji sibehî ta piştî nîvro Rustem û Rexşê Belek li ber hev didin lê yek zora yê dî nabe, ta ku Rustem dibê “ez Rustemê Zal im” û dema hesp dengê wî dike xwe teslîmî wî dike. Piştî ku hesp hogirî wî dibe Rustem lê siwar dibe û dibe mal û wî ji bo siwarîya rêya dûr amade dike. Bi heman şêweya mubalexe vebêjer teswîra

[29] Ev formul di drêjayîya destanê da gelek caran hatiye dubare kirin, bnr. Prym & Socin, 1890, r. 234-239.
[30] Ev formul jî wekî ya jorîn di drêjayîya destanê da gelek caran hatiye dubare kirin, bnr. Prym & Socin, 1890, rr. 174-180.

amadekirina hesp dike. Piştî amadekarîyan Rustem li Rexşê Belek siwar dibe û diçe şerê "kafirê Tûranê" û wî dikuje. Ev şerê li hember kafirê Tûranê weha hatiye teswîr kirin: "Rostem li ser peya bû, herdu guhêd vî kafirî jê kirin, danîn ser pişta Rexşê. Rostem vegera hate mal. Îranî hatin pêşva, xeza lê pîroz kirin. Zîn li ser serê wî reşandin. Rostem guhik bir dîwana Keyxusra Paşa. *Pazde fêris rûniştin ser, qasî ma'hfûrek ji ber wan zêde bû*.[31]" (Prym & Socin, 1890, r. 108). Ger guhek ji yên kafirê Tûranê evqas gewre bê, gelo bedena wî çendî ye? Ya rast mubalexeya ku derbarê gewreyî ya kafirê Tûranê hatîye kirin ji bo hêza derasayî bê hempa ya Rustem bête destnîşankirin.

Ev hostayî û huner di teswîra lehengên stranên şeran da jî xwe dide der. Mînak lehengîya Osê Zerî ku me li jor behs kir weha hatîye taswîrkirin: Piştî ku li dîwana Xanê Bidlîsê apê wî Mîrz Axa tê kuştin, Osê êrîşî kesên dîwanê dike, bîst û heft kesan ji wan dikuje, diraje termê apê xwe û diçe li hespê xwe swar dibe, dikeve rê; di rê da li kemînê rast tê, ji lingê xwe birîndar dibe lê dîsa jî hêza xwe winda nake û sih zilamên din dikujê (Prym & Socin, 1887, rr. 36-37). Bi heman şêweyî maldarî (dewlemendî) ya Ferho Axa weha hatîye taswîrkirin. Dengbêj, da ku balê bikşênê ser vê maldarîyê, çûna Ferho ya ji bo xwazgînîya keça Îskan Axa Xecko, weha taswîr dike:

"Çar qantira pere bar kirîya;
Bsahrîyê dane rê, ketîya
Li mala Îskan Axa danîya
Go, Ferho hal û hewalê ta çiya?
Go, mi çar bar pere anîya
Ji boyî Xecko ji boy xwazgînîya
Dibê Xecko qebûl nekirîya", (Prym & Socin, 1887, r. 39).

Herçiqas wekî me li jor destnîşan kir, nivîskaran derbarê dengbêjan da zêde agahî nedabin jî, ji teswîra sahneyên şer ên destana Rustem diyar dibe ku heman kesî / kesan ev stranên şer û destanên cildê duyem navborî gotine. Diyar e ku dengbêj an dengbêjên van berheman, wekî hemû dengbêjan, pir girîngî dane taswîra sahneyên şer, lehengî û hêza bedenî û aborî ya lehengan. Ji alî taswîra sahneyên şer ve, destan û stranên şer yên di cildê duyem da pir dişibin destana *İliyada* ya Homeros. Wekî em dizanin, taybetmendîya herî bingehîn ya *İliyada* taswîra hostayî ya sahneyên şer û lehengîya lehengan in. Bê gûman ev hostayî û şiyankarîya dengbêjîyê di piranîya afirandin û îcrakirina berhemên destanî yên kurdî da xwe dide der, lê ji ber sînordarkirina xebatê bi berhemên xabata Prym û Socinî me mînak ji destanên din nedan. Gelek berhemên destanî yên zargotina kurda hene ku lêkolînên berfireh dikarin li ser wan bên kirin.

## Encam

Ji nirxandin û analîza berhemên di xebata keleporî ya Pyrim û Socinî sê xalên balkêş derdikevin pêş: yek jê avahîsazîya çîrokên derasayî yên gelêrî û berhemên destanî yên kurdî ye. Wekî li jor hate destnîşankirin, hem ji alî leheng û kiryarên wan ve hem ji alî qewimîna bûyeran ve çîrokên di vê xebata keleporî da cî girtine bi hêmanên derasayî dagirtî ne. Heta mirov dikare bibêje ku avahîsazîya wan li ser van bûyer û hêmanên derasayî hatiye sazkirin. Wekî ji mînakên ku ji çavkanîyên din hatin dayîn jî diyar e heman leheng, kiryar û hêmanên derasayî di gelek çîrokên kurdî da hene. Herweha di van çîrokan da bi gelemperî lehengên wekî mar, hirç, şêr, efrît, teyrê sîmir, hwd. digel lehengên mirovî (ku xwedî kiryar û hêzên derasayî ne) tevdigerin; carinan wekî dijberên lehengên mirov carinan jî wekî alîkarên wan û hevalbendên wan in.

[31] Ji alî min ve hatiye paldayîn (îtalîk).

Herçiqas di berhemên destanî da jî heman hêman û kiryarên derasayî hebin jî berovajî çîrokan di van berheman da leheng û karakterên lawir (heywan) an efsûnî (efrît, cin) tune ne. Dibe ku di hinekan da hebe lê ne di berhemên kelepora Prym û Socinî da ne di mînakên ku berdestê me da em lê rast nehatin. Berovajî çîrokan berhemên destanî ji alî taswîrên derbarê leheng, maldarî û kiryarên wan yên derasayî pir dewlemend in. Ji çend mînakên ku li jor hatine dayîn jî ev yek diyar dibe. Bêgûman çi çîrokên derasayî yên gelêrî çi berhemên destanî yên kurdî ji gelek hêlan ve (wekî hevoksazî, bikaranîna rengdêran, erdnîgarî, têkilîyên mirovantîyê bi taybetî û têkilîyên civakî bi gelemperî) dikarin bibin mijarên lêkolînên pir berfireh. Ev bar jî li ser milê pisporên sehayên navborî dimîne;

**ÇAVKANÎ**

Amêdî, S. B. (2013). *Folklora Kurdî*, Diyarbakir: Lîs.

Aslan, M. E. (201). *Hostayê Ribabê Miradê Kinê û Analîza Şerê Wî Yê Bi Navê Osê Zerî* (Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî), Zanîngeha Van Yuzuncuyil.

Celîl, O. & Celîl, C. (1978). *Zargotina Kurda, Para I*, Moskva: Neşirxana Naûka.

----------------------- (2015). *Zargotina Kurda: Çîrok, Çîvanok*, Benda 9, Wien: Înstîtûta Kurdzanîyê.

Cindî, H. (2016). *Folklora Kurmancîyê (Berevok)*, Diyarbakır: Lîs.

Dorson, R. M. (1963). Current Folklor Teories, *Current Anthropology*, 4(1) 93-112

Jaba, A. (1860). *Recueil da Notices et Récits Kourdes*, *servant à la connaissance da la langue, da la littérature et des tribus du Kourdistan* St. Petersbourg.

Justi, F. (1878). *Les noms d'animaux en Kurde*, Paris.

Le Coq von, A. (1903). *Kurdische Texte: Kurmangi-Erzahlungen und Lieder*, Berlin: Zweiter Teil.

Lerch, P. I. (1857). *Forschungen uber die Kurden und die Iranischen Nord-Chladaer*, St. Ptersbourg

Makas, H. (1900). *Kurdische Texte im Kurmanji Dialekte aus der Gegend von Mardin*, Heidelberg

Mann, O. (1906). *Die Mundart Der Mukri-Kurden*, Berlin: Druck Und Verlag, Von Georg Reimer.


Orbeli, I. A. (2011). *Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane* (Amd. Hakan S.), İstanbul: Nûbihar

Parry, M. (1971). *The Making of Homeric Verse. The Collected Papers of Milman Parry* (ed. Parry Adam), Oxford: Clarendon Press.

Prym E. & Socin A., 1887, *Kurdische Sammlungen*, St. Petersbourg.

Prym E. & Socin A., 1890, *Kurdische Sammlungen*, St. Petersbourg. Haykûnî, S., 1904, *Destanên Ermenî-Kurdî* Moskva.

Pêvek I: Berga cildê yekem ya xebata Eugen Pyrm û Albert Socin



KURDISCHE SAMMLUNGEN.

ERSTE ABTEILUNG.

ERZÄHLUNGEN UND LIEDER
IM DIALEKTE DES ṬÛR 'ABDÎN.

GESAMMELT, HERAUSGEGEBEN UND ÜBERSETZT
VON
EUGEN PRYM UND ALBERT SOCIN.

a. DIE TEXTE.

(*Présenté à l'Académie le 1 avril 1886.*)

ST.-PÉTERSBOURG, 1887.
Commissionnaires de l'Académie Impériale des sciences:
à St.-Pétersbourg: MM. Eggers et Cie et J. Glasounof; à Riga: M. N. Kymmel; à Leipzig: Voss' Sortiment (G. Haessel).

Prix 30 Kop. = 1 Mrk.

8° Imp. or. 402 (I)

Pêvek II: Berga cildê duyem ya xebata Eugen Pyrm û Albert Socin



# KURDISCHE SAMMLUNGEN.

ZWEITE ABTEILUNG.

ERZÄHLUNGEN UND LIEDER
IM DIALEKTE VON BOHTAN.

GESAMMELT, HERAUSGEGEBEN UND ÜBERSETZT

VON

ALBERT SOCIN.

a. DIE TEXTE.

*(Présenté à l'Académie le 1 avril 1886.)*

ST.-PÉTERSBOURG, 1890.
Commissionnaires de l'Académie Impériale des sciences:
à St.-Pétersbourg: MM. Eggers et C[ie] et J. Glasounof; à Riga: M. N. Kymmel; à Leipzig: Voss' Sortiment (G. Haessel).

Prix 2 Rbl. 25 Kop. = 5 Mrk. 60 Pfg.

Pêvek III: Destpêka destana Cimcime Siltan

174 XXXIX.

rekēbi ldindilḗ girtía,
žᵊnu̦ sundē-vī baṭál bú̦ya,
žsa̦r pištá dú̦ndu̦lē payá bu̦ya.

## XXXIX (12).

### jimjima̦ sulṭān[a]).

rōža̦kí bᵊrōžḗda
šim;ú̦n u-;ísa cōn bᵊrāvḗda[1]),
kelōḫáya[2]) díd berḗda.
šim;ú̦ni pehna-ḫva̦ lḗda.
;ísā rábī bevē-gáve,
lekelṓḫai kir seláve.
gō yā ;ísā tu̦ cí-tkī lᵊvē-náve?
gō yā kelṓḫı lerḗa,
tū̦ bᵘví-kı-yḗ-ḫudḗa[3]),
rṓža tu̦ bū̦ židāḗa,
tu̦i nḗr[4]) bū̦ áne mḗa?
yā́ kelṓḫē le;ardána,
tu̦ bᵊvú̦-kī ē-raḥmána,
bḗža min tu̦ jᵊhú̦ bı áne musulmána?
gō nái jᵊhú̦ bu̦m nái musulmána,
nai fellā́ḫ bu̦m nai gōrána,
kā́firi mi̦rtā́d ∘ bū̦m[5]),
gā́ya̦kī cār-cav[6]) ha̦bú̦n,

[a]) *Das hier folgende Stück dürfte ein Bruchteil eines grösseren Gan[...] und zwar eines Strophenepos sein; der Text ist jedoch sehr verderbt, so da[...] oft fraglich bleibt, wie die Verszeilen von einander abzutrennen sind. Ich ha[...] daher den Text genau nach dem Manuscripte abdrucken lassen. — D[...] Metrum war ursprünglich wohl ∠ × ∠ × ∠ × ∠; in Vers 104 — 142 wechs[...] damit jambischer Rythmus. Emendationen zu diesem Stücke zu geben, ha[...] ich unterlassen. Das Stück wurde in Sacho niedergeschrieben.*

[1]) U. rāḥu biddārb. — [2]) *Prosa* kelōḫ. — [3]) *Mscr.* bᵘvıkī yēḫ°; U. bill[...] ;alēki *(sic; so immer). O. Gl.: die Kurden schwören* bevī-dku̦m ya-ḫudē. — [4]) *Mscr.* tu̦ inēr. — [5]) *Mscr.* mi̦rtu̦ (*v. l.* mi̦rta̦) debu̦m; U.: murtad maqlūb. — [6]) *sp.* cab.

Pêvek IV: Destpêka destana Rustem



búm̤ᵊrin[66]) tēr náḫun. gōd hṳn sei bi-sitír[67]) bin, hūn žᵊmári rūstír bin ḥáta hūn bṳ́mrin, cắvē-va[68]) ᵊlbạr dạ́stē ḫálkē biḍ. vḗja fạ́rḫō du;ắ lḥva kir:

žᵊbaḥạ́šte ḥáta dṓžeh[69]),
fạ́rḫe āvdạl pắšē sittiye[70]),
īšálla nạmínit sḗ rōžē.

fạrḫṓ žᵊbắžerī dạ́rkạt cū lᵊnāv búqcē u-bắġēda, rūníšt ḥatá ēvắri, ēvắri háta māl, vḗ šạvē nevíst, dítra rṓže milyákạt hátạ sạr, rúḥa-vī stánd. dah gắz kṳtắn žḗra ắni kṳ́fᵊn kir, helgírt bir vạšárd[71]). ᵊžvḗre hátịm raḥmát lᵊdei bắbēd gohdára.

## XXXIII (10).

### rōstạm I[1]).

*gō jắrạg žejắra, — raḥmát lᵊdei bắbēd ᵊ gohdára[2]). — gō zeġaltḗ lsolmē bū[3]), — hạmzạlmạ́kkē u-medīnē bū[4]), — kei ḫisrạ́ pāšā pāšắe irắnē bū[5]), — rōstạ́m fḗrisē-ví bū, — *peṅjī peṅj fēris sạr táḫte īrắne runíštebun[6]), — *bḗžim-tā kí bū kí nabū[7]), — *nāve-vān bḗžim[8]) rōstạ́m bu[9]), — kure zālḗ bu, — zál kurḗ qārḗ bu[10]), — qár kurē sāmḗ bū, — sám kurē pīrī bū, — pír kurḗ nạlimắ bu[11]), — nạlimá kurē qaiterán bū[12]), — qaiterán kure

[66]) *Mscr.* bṳbᵊrin, *wohl Schreibfehler.* — [67]) *Mscr.* sei bir si tir bin. *Gl.* «*seid ohne* siter». — [68]) *Mscr.* vạn, U. ;ēnkum. — [69]) *v. l.* dōže. — [70]) *sic; ohne Reim!* — [71]) *v. l.* fạšārd.

[1]) *Da das hier folgende Stück für das Verständnis grosse Schwierigkeiten bietet, so stand ich, nachdem ich mir den Anfang der Erzählung hatte dictiren lassen, bald davon ab, weiter zu schreiben. Später liess ich mir das Ganze dennoch dictiren. Daher kommt es, dass der Anfang der Erzählung in doppelter, die Einleitung über die Abstammung Rustems (welche übrigens sehr schwer verständlich ist), sogar in dreifacher Gestalt (in den Anm. mit a, b, c bez.; letzterem folge ich meistens) vorliegt. Sehr stark ist ausserdem die Umgestaltung, welche der Text dieser Erzählung durch den Erklärer* (E.) *erfuhr.* — [2]) *fehlt a.* — [3]) *a* zᵊġaltēn solmēbu; *b* ō zᵊġaltēl ᵘ zolmḗ bu. — E. zālte lṣolmēbṳ. — U. solm = ẓālim. — [4]) *a* hạmza má kauma dínēbu; *b* hạmzál makaū ma dínē bū. — [5]) *a* ḫisrá; *b* pāšāʸe. — [6]) *fehlt a und b.* — [7]) *fehlt a.* — [8]) *fehlt a und b. Nach* bēžim *fügte* E. *zu c hinzu* ḫān tṳzī, nāzạ́r, ḫān qubād, gēve u-gohdạrz, ferāmạs, ferāmạs ēḫinc. — [9]) bu *fehlt a und b.* — [10]) *b und c* qarē; *vgl. unten die Parallelstelle p. 103.* — [11]) bū *fehlt a und b; so auch meist im Folgenden.* — E. *fügt bei* nạlimā kurḗ qawiyắ, qawiyā kurē qaiterán — [12]) *a* kait°; *b* kait° und qait°.

qāmerán bū[13]), — qāmerán žn̤avíye ādam bū[14]). gurgí kurḗ melādí bu[15]), — fēdạrs zaváye rōstạmí bu, — bḗžạn ḫvarzáe rōstạmí bu, — gurinís brāʸē rōstạmí bu, — kásimē kūn[16]) ḫváhạr, — fạrāmạ́s ē-ḫ̯ińc[17]) bū. — dīváną afrasái pašáē kāfírā bū[18]). — nāvḗt ḥākịmét-vi nāvḗd bāžára bun[19]), — gōt hát ḫāqáyē cīní[20]), — hát pīlạ́-bạndḗ hindī[21]), — hāt īckāpīsē bạrbạri, — hāt ickápīsḗ kạšáni[22]), — hát selmánē síndī[23]), — hát pīráne vai sạr máleḫői bu, — pīránī kạndạkáni, — ḥemētát jạmšíš[24]) jạmšár[23]) jạmbák, — *áwą ldīváne afrasái būn, — áv̨ą férisē dafrasái būn[25]).

rṓžạg[26]) rābű rōstạ́m, lecil u-cár mahtạrá ḫorí[27]), lerahšá bạlạ́k vapá-leži[28]), maḥáss u-gạlvạšín ker, zín avḗtą sạ́r pištḗ[29]), tạ́ñg u-bálatạ́ñget[30])-vī šēdándin, rekēbēt yaldōzí[31]) pē vạ́kerin, šạš gạzḗ cingála bạr qalpűsa[32]) zīní rákerin, leġávē zērí dā sạr, *gullifk ụ-kotịk[33]) žē bạ́rdān, gehíp u-dekạrk tē deinān. rṓstạm rābụ žpḗva, bạ́žnē u-bālaya-*ḫo ma[34]) fạkeri, hạv zerí hạv kúmzerí sạr-ēkudű vạrgírtin, tír u-kevān bạr pištá-ḫo rákerin, iná kašạrí bstői-ḫva dakēšá[35]), huñgustíra fạtḫi girạ́ telıá-ḫvá, almáse hindí[36]) avḗta pištá-ḫva, cạkmánu zạr pē-ḫva dạ́kēšá, kōtiya dohnḗ sanadűkī[37]) mạlḥáme slēmáni avḗtą dạlġánēda, pē-ḫvá kirą rekḗbe, suwár bu. dạz avēd ∘ gurzḗ grān, hezár u-ék ḫunkári[38]), deiná sạr milḗ-ḫva. dạstē cạpē ævḗt rumá hạšda

---

[13]) *a b c neben* kā°. — [14]) *a* kāmerān nạvi ādam. — [15]) *dies und das Folgende fehlt a.* — [16]) U. a¦raj. — [17]) E. ē-ḫ̯iṅj. — U. maqlūb, *in Prosa* ḫ̯ēj. — [18]) E. lᵒdī°. — *Hier wieder b:* afresāi pāšāē tūrānē bū. — [19]) *b* ḥākemē-vī bāžāre bū. — [20]) *b bloss* ḫaqāē cīní bū. E. qāqāne. — [21]) *b am Schlusse* bū. E. pōlabạnde. — [22]) *b beidemal* ickā pusē (*sic*); *die Namen umgestellt.* — [23]) *fehlt b.* — [24]) E. jạmšīr. — [25]) *b* avá dīvānē afrasāi būn. — [26]) *Auch das Folgende liegt teilweise in doppelter Recension (a b) vor; dazu kommen die Parallelst. p. 95, 4; 102, 21; 107, 9. Ich führe nur wichtigere Var. an.* — [27]) *b* dạnge lcụl u-cār mahterā (U. saiyis) ḫorí. — [28]) *fehlt b;* E. vaba°; *a* vạpa-liši. — *Ohne* U., *viell. vom pers.* پلشت. — [29]) *b* zīnē merōsā (*O. Gl.* «*Name*», *vgl. jedoch XXXIV Anm. 17 zur Uebers.*) sạr (E. lᵒsạr) pištḗ rakotá (U. ḍa-rabu). — [30]) *Von hier an bloss nach einem Text.* — [31]) *so* E.; *urspr.* altōzí. *O. Gl.* yāldūz. — [32]) *urspr.* kaspūza; *wohl Fehler.* — [33]) *urspr.* gulliv go kot°; *sp.* E. gul° ko qotās žē; *p. 95, 7* qotạs. — gul° *O. Gl. Vorderhemdchen ist viell pers.* كليم; qotās U. ṣāmūt. *Vgl. JJ.* قوتك. — [34]) *sp.* E. ḫva fạ°. — [35]) *sp.* E. inān qašạrí. — [36]) *sp.* E. dindī *ohne* U. — [37]) *nach* E.; *urspr.* sala-dūkī. — [38]) *so* E.; *urspr.* (*an verschiedenen Stellen*) unkāri, umkāri, unkạri (U. bạṭmān, mạn); *an einer Stelle auch* hezārēk. *Vgl. zu JJ.* كنتكار *Garzoni unter «peso».*

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

# BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ Û WERGERÊN DUBEYTIYAN YÊN BI KURMANCÎ

BABA TÂHİR-İ HEMEDÂNİ VE DUBEYTİLERİNİN KÜRTÇE TERCÜMELERİ
BABA TAHIR-I HAMADANI AND THE KURDISH TRANSLATIONS OF HIS DUBEYTIS

Murat ÇELİK[*]

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 28.07.2022
**Accepted // Pejirandin:** 06.10. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 59-73
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1150329

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Çelik, Murat (2022). Baba Tahirê Hemedanî Û Wergerên Dubeytiyan Yên Bi Kurmancî, Kurdiname, no. 7, p.59-73
**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

**Kurte**

Baba Tahirê Hemedanî di edebiyata Kurdî de ji şairên pêşîn tê qebûlkirin û bi dubeytiyên xwe bi nav û deng e. Her çendî li dinyayê û bi taybetî jî li rojava têra xwe nehatibe nasîn jî ji sedsala 19an pê ve xebatên li ser dubeytiyên wî zêde bûne, wergerên dubeytiyan yên bi zimanên cuda hatine weşandin û xebatên ilmî li ser hatine kirin. Her wiha Kurdan jî hema bibêje bi hemû zaravayên xwe li ser vê çavkaniya qedîm xebat kirine û wergerên wê yên curbecur weşandine. Di vê gotarê de sê wergerên Kurmancî yên dubeytiyan hatine nirxandin û çavkaniya wergeran, zimanê ku hatiye bikaranîn û hejmara şi'rên wergerandî hatiye berawirdkirin.
**Peyvên Sereke:** Baba Tahirê Hemedanî, Dubeytî, Lorî, Kurdî, Werger, Edebiyat

**Özet**

Kürt edebiyatının öncülerden kabul edilen Baba Tâhir-i Hemedâni, dubeytleriyle tanınan bir şairdir. Baba Tâhir dünyada ve özellikle de batıda yeterince tanınmasa da 19. yüzyıldan itibaren dubeytleriyle öne çıkmıştır. Dolayısıyla son dönemlerde Baba Tâhir hakkında yapılan çalışmalar bir hayli artmış, şiirleri farklı dillere tercüme edilip yorumlanmış ve ilmi incelemelere konu olmuştur. Aynı zamanda bu kadim kaynak hakkında Kürtçenin tüm lehçelerinde de çalışmalar yapılmış ve çeşitli tercümeleri yayınlanmıştır. Bu makalede Baba Tâhir'in dubeyitlerinin üç farklı Kurmancî tercümesi değerlendirilerek tercümelerde istifade edilen kaynaklar, kullanılan dil ve tercüme edilen şiirlerin sayısı karşılaştırılmıştır.
**Anahtar Kelimeler:** Baba Tâhir-i Hemedâni, Dubeyti, Lori, Kürtçe, Çeviri, Edebiyat

**Abstract**

Baba Tahir-i Hamadani who is considered to be one of the pioneers of Kurdish literature, is a poet known for his *dubeyti*s (double couplets). Although Baba Tahir is not well known throughout world and especially in the west, he has drawn attention and come into prominence thorugh his dubeytis since the 19th century. Studies on Baba Tahir have consequently increased to a great extent in recent years, and his poems have been translated and interpreted into various languages and have been the subject of scientific studies. Simultaneously, studies have been made about this ancient source in all dialects of Kurdish and different translations have been published. In this article, three different Kurmanji translations of Baba Tahir's dubeytis have been evaluated and the sources used in the translations, the language used and the number of translated poems have been compared.
**Keywords:** Baba Tahir-i Hamadani, Dubeyti, Lori, Kurdish, Translation, Literature

[*] Xwendekarê doktorayê, muradcelali@gmail.com, https://orcid.org/0000-0001-6840-3576A

## 1. Destpêk

Baba Tahirê Hemedanî bi dubeytiyên xwe ve di edebiyata Farisî û Kurdî de xwedî cihekî girîng e. Her çendî li ser nijad û zimanê wî nîqaş hebin jî li gor fikra Henri Samuel Nyberg (1889-1974) zimanê wî taybetiyên zimanê Pehlewî di xwe de dihewîne (Yazıcı, 1991: 371) û ev yek jî wê derfetê dide Kurd û Farisan da ku bikaribin xwedî li berhemên wî derkevin û wan wekî pareke ji ziman û edebiyata xwe qebûl bikin. Loma li gor dîroknasên edebiyata Kurdî (Rûhanî, 2017: 70; Sagniç, 2014: 69, Adak, 2013: 107-116.) Baba Tahir ji şairên pêşîn yên edebiyata Kurdî ye û bi zaravayê Kurdî Lorî/Goranî nivîsiye.

Emê di vê nivîsê de li ser sê wergerên dubeytiyên Baba Tahir yên Kurmancî rawestin û sê wergerên Kurmancî -Sabah Kara, Tehsîn Îbrahîm Doskî û Kadri Yıldırım- ku du heb li Bakur bi tîpên latînî hatine çapkirin û yek jî li Başûr bi tîpên Erebî hatiye çapkirin ji hêla çavkanî, ziman, hejmara dubeytiyan ve berawird bikin.

## 2. Baba Tahirê Hemedanî

Li ser dema bûyîn û mirina Baba Tahirê Hemedanî nîqaş hebin jî wisa tê qebûlkirin ku ew di sedsala 5an ya hîcrî de jiyaye. Li gor dîroka ku bi hesabê ebcedê ji helbesteke bi cureyê mu‘emayê hatiye nivîsîn û nîsbetî Baba Tahir tê kirin, sala bûyîna wî 326/938 e û sala mirina wî jî wekî Riza Qulî Xan diyar dike mîladî 1010 e (Hidayet, 1382: I, 326, Vgz. Çelik, 2015: 249). Lêbelê li gor hin lêkolîneran ne mimkun e ev dîrok dema jidayikbûna Baba Tahir nîşan bide û loma dibêjin ew mu‘ema ya wî nîne (Çelik, 2015: 249). Lewra li gor agahiyeke di *Rahetu’s-Sudûr we Ayetu’s-urûr*a Mihemed bîn Elî Rawendî (mirin 1207) de çaxê Tuxrul Beg di sala 447/1055an de hatiye Hemedanê bi sê alimên wê derê re hevdîtin kiriye û ji wan yek jî û heta yê herî zêde bandor li ser wî çêkiriye Baba Tahir e. Li gor vê agahiyê heya wê çaxê li heyatê bûye û her wiha di dubeytiyeke xwe de diyar dike ku 84 salî ye (Çelik, 2015: 288). Loma lêkolîner dibêjin gava ew dîroka di wê mu‘emayê de tê nîşandan (938) û hevdîtina bi Tuxrul Beg re (1055) tê muqayesekirin ev dîroka ji bo bûyîna wî tê nîşandan dûrî aqilan e.[1] Ji hêla din ve hin rîwayet hene ku dibêjin dema Eynulqudat el-Hemedanî (1098-1131) hatiye dardakirin Baba Tahir sax bûye û ev bûyer dîtiye, lê ev rîwayet bêbingeh tê dîtin û nayê qebûlkirin (Yazıcı, 1991: 371).[2]

Ya rastî der heqê dema bûyîn, wefat û hûrgiliyên jiyana wî de agahiyên vebir li ber dest tunene. Loma li ser van mijaran gelek nîqaş hatine kirin, bîr û rayên dijberê hevdu hene. Ji ber ku armanca vê nivîsê ne ew e ku jiyana Baba Tahir bi hûrgilî were vegotin, loma emê li ser wan nîqaşan nesekinin.

Baba Tahir xelkê Hemedanê ye û bi nîsbeta Hemedanî hatiye nasîn. Her wiha ji ber meşrebê xwe yê Qalenderiyê wekî Uryan jî tê nasîn (Sağlık, 2018: 714-715). Wekî din der

---

[1] Bi raya min ewqasî jî dûrî aqilan nîne. Lewra di navbera herdu dîrokan de (326-447/938-1055) teqrîben 121 û 117 sal hene û ev jî ji bo emrê merivan tiştekî dûrî aqilan nîne. Dibe ku Baba Tahir gelek salan emir kiribe. Lewra li der û dora me kesên hê ji van salan zêdetir jiyane jî hene. Bo mînak Zoro Axayê Bedlisî bi qasî 160 salî emir kiriye. Loma 120 sal qet jî dûrî aqilan nîne. Jixwe Ahmet Faruk Çelik şaşiyeke dîrokî dike 1055ê sala mîladî wekî 477 hîcrî dinivîse. Sala 477 hîcrî beranberî 1084ê mîladî ye. Ji bi Zoro Axa bnr. https://en.wikipedia.org/wiki/Zaro_Aga (23.03.2018)

[2] Yazıcı, di nivîsa xwe ya navborî de dîroka dardakirina Eynulqudat el-Hemedanî (1098-1131) wekî sala 1273yan nîşan dide, diyar ev şaş e, bnr. Yazıcı, 1991: 371.

heqê Yaresanîbûna wî de jî nêrînên cuda hene (Yıldırım, 2013: 23-27). Ligel vê ji ber ku helbestên xwe bi Lorî nivîsîne û bi nîsbeta Lorî jî tê zanîn (Bey, 998: 74).

## 3. Wergerên Dubeytiyan ên bi Kurmancî

Heya sedsala 19an li ser Baba Tahir û dubeytiyên wî pir zêde xebat nehatine kirin. Di tezkîreyên sedsalên 18 û 19an de helbestên Baba Tahir pir kêm cih girtine û loma zêde nehatiye nasîn. Lê piştî 1885an bi hewl û xebatên musteşrîqan eleqeya li ser dubeytiyên Baba Tahir zêde bûye. Di encama van xebatan de him li Îranê û him jî li Rojava li ser dubeytiyên wî lêkolîn hatine kirin, bi vî awayî jimara dubeytiyên wî yên tesbîtkirî jî zêde bûye (Yazıcı, 1991: 371). Ji wê rojê pê ve bi gelek zimanan lêkolîn, berhevkirin û wergerên dubeytiyan derçûne. Di nav wergerên dubeytiyên Baba Tahir de yên bi zimanê Kurdî ango bi zaravayên Kurmancî [3], Soranî, Hewramî (Yıldırım, 2013: 58-59) û Zazakî (Çolîg, 2016) hatine amadekirin jî hene. Her wiha bi deng jî li ser xebat hatine kirin (Bianet. 2018) û ev eleqeya li ser dubeytiyan piştî ku fikra neteweyî ya Kurdî xurt bû her ku diçe zêde dibe. Van salên dawîn him li Başûr û him jî Bakur li ser dubeytiyan xebatên zanistî zêde dibin. Bi gotar, werger û tezên lîsansa bilind (Yavuzer, 2016) ev qad geş dibe.

Bi qasî agahiyên me peyda kirin heya niha li Bakur du wergerên dubeytiyên Baba Tahir ên bi Kurmancî hatine çapkirin û yek jî li Başûr hatiye weşandin.[4] Ji wan wergeran ya pêşîn ya Sabah Kara ye ku heya niha du çapên wê çêbûne, çapa ewil di sala 1998an de û ya duduyan jî di sala 2010an de di nav weşanên Nûbiharê de weşiyaye. Wergera li Başûr jî ya Tehsîn Îbrahîm Doskî ye û di sala 2010an de li Duhokê hatiye weşandin û wergera duduyan ya li Bakur jî ya Kadri Yıldırım e û di sala 2013an de di nav weşanên Avestayê de hatiye çapkirin.

### 3.1. Wergera Sabah Kara

Wergera pêşîn ya ku di vê xebata xwe de em ê li ser bisekinin ya Sabah Kara ye û bi navê *Dubeytîya Baba Tahirê Uryan* du caran çap bûye. Çapa pêşîn ya vê wergerê di sala 1998an de bi destê Nûbiharê hatiye weşandin û her wiha di sala 2010an de çapa wê ya duduyan jî çêbûye (Uryan, 2010). Di vê nivîsê de jêdera me çapa duduyan e.

Kara di beşa bi sernavê "Pêşgotina Çapa Duyem" de qala zehmetiya wergera şi'rê ya bi form, wezn û qafiyeyan dike û destnîşan dike ku gava wergêr hewl dide maneya helbestê wergerîne form, wezn û qafiye xirab dibe, dema formê diparêze îcar mane, wezn û qafiye rast nabe û gava weznê rast dike wê çaxê jî mane, form û qafiye li hev nayê… Piştî diyarkirina van zehmetiyan Kara dibêje me di çapa pêşîn ya vê wergerê de ev karê zehmet bi muwefeqetiyeke mezin pêk aniye. Lê huner, bêdawî ye. Meriv şi'ra herî baş binivîse, wêneyê herî baş çêke jî dibe ku paşê yên hê baştir binivîse û çêbike. Her wiha diyar dike ku di vê çapa nû de hemû dubeytî bi eslê wan re ji nû ve hatine muqayesekirin, di hinek cihan de guherîn, zelalkirin û tekûzkirina wezn û qafiyeyan hatiye kirin.

Kara ji hêla din ve destnîşan dike ku di çapa duduyan de 57 dubeytiyên di nav nusxeyeke li Pirtûkxaneya Hîsarê ya Îzmirê de bi jimara 550yî de qeydkirî li dawiya wergerê hatiye zêdekirin. Ev nusxe bi destnivîsa Ebdissemed Tebrîzî hatiye nivîsîn û di 1319/1901ê de

---

[3] Di vê nivîsê de emê li ser sê wergerên Kurmancî rawestin.

[4] Dibe ku hin xebatên li ser beşeke dubeytiyan hatine kirin hebin, li vir mebest yên temam û weşandî ne.

li Stenbolê hatiye çapkirin (Uryan, 2010: 5-6). Ev nusxe bi şeklê orijînal di dawiya berhemê de hatiye bicihkirin (Uryan, 2010: 165-190) û bi metnê pirtûkê re hatiye muqayesekirin û cudahiyên wan hatine destnîşankirin.

Kara di beşa bi sernavê "Baba Tahirê Uryanî Hemedanî û Dubeytiyên Wî" de bi kurtî qala hevdîtina Baba Tahir û Tuxrul Beg dike û dibêje ev bûyer di navbera salên 1055 û 1058an de qewimiye û li ser Baba Tahir agahiya herî pêbawer e. Her wiha qala nusxeya muelif dike û dibêje biyografî û helbestên wî di tezkîreyên şa'iran de tunene, loma meriv bi awayekî teqez nikare tesbît bike ku kîjan dubeytî yên Baba Tahir in. Wekî din diyar dike ku çavkaniya herî kevn ku hinek lêkolîner şi'rên Baba Tahir nîsbetî wê dikin, ew mecmueya destxet e ku li Muzeya Qonyayê bi jimara 2546an qeyd kiriye û ev nusxe ji sala 848ê hîcrî maye. Ji hêla din ve diyar dike ku di tezkîreyan de zêde cih nedane dubeytiyên Baba Tahir û sedsala dawîn li Ewropayê li ser dubeytiyan xebat hatine kirin û ew jî tenê bi qasî 80 dubeytiyan di nav xwe de dihewînin. Her wiha Kara diyar dike ku nusxeya herî berfireh ya dubeytiyên Baba Tahir ya Wehîd Destgirdî ye ku ji 300î zêdetir dubeytiyan pêk tê û çavkaniya wergera wî jî ew nusxe ye.

Peyra qala şi'ra Îranî ya piştî Îslamê dike û dibêje ew wekî şi'rên gel bûn û bi navê Herareh yan Surûd dihatin nasîn. Bi demê re van helbestan navê Fehlewiyatê hildane û ji wan dubeytî çêbûne û dubeytiyên ji hêla şekil ve herî kamil jî yên Baba Tahirê Uryan in (Uryan, 2010: 7-8).

Di wergera Kara de 296 dubeytiyên esasî, 48 dubeytiyên biguman -ji wan du misra û peyvek kêm e- û 4 xezelên jimara beytên wan cuda (21, 8, 10, 6) hene. Herî dawiyê jî ferhengokeke piçûk heye. Di vê wergerê de metnê bi Lorî tîpên Erebî û yê Kurmancî jî bi tîpên latînî li rû hevdu hatine bicihkirin, ango rûpelek Lorî ye û rûpelê din jî wergera wê ya Kurmancî ye. Kara ji bo wezn, serwayê biparêze hewl daye. Loma di vî warî de bi ser ketiye. Zimanê wergera wî ji deqa eslî zêde dûr nîne û heta gelek cihan heman peyv û têgeh hatine bikaranîn û bi vî awayî derfet çêbûye ku xwîner herdu zaravayên Kurdî muqayese bike. Tu kompleks di wergêr de tuneye ku li pey peyvên cuda bikeve da ku werger ji metnê eslî dûr keve û heta heya ji dest hatiye xwe nêzî esl girtiye. Ev yek jî tehmeke şi'ra klasîk dide wergerê. Li hin cihan wergêr ji bo wezn û qafiye li hev bê serbest tevgeriyaye, hinek peyv û hêmanên di eslê helbestan de hene bi kar neanîne.

### 3.2. Wergera Tehsîn Îbrahîm Doskî

Wergera duduyan ya ku me li ser lêkolîn kir ya Tehsîn Îbrahîm Doskî ye ku bi navê *"Çarînên Baba Tahirê Uryan"* di sala 2010an de li Duhokê bi destê Sentera Vekolînên Kurdî li Zanîngeha Duhokê hatiye weşandin (Doskî, 2010).

Doskî di destpêkê de qala dema jidayikbûna Baba Tahir dike, diyar dike ku di vê mijarê de agahiyeke misoger tune û dibêje hinek lêkolîner dubeytiyeke wî ji bo dema bûyîna wî delîl tînin û li gor wê, dîroka bûyîna wî 326ê hîcrî ye û ev jî beranberî 937 mîladî ye û her wiha sala 401ê hîcrî ku ew jî beramberî 1010ê mîladî ye û dîroka wefata wî ye (Doskî, 2010: 5).

Doskî piştî ku bi kurtî qala vê mijarê dike balê dikişîne li ser zimanê çarînên Baba Tahir û dibêje zimanê dubeytiyan –lê ew bi xwe peyva çarînê bi kar tîne- têkel e û ev yek jî bûye eger ku li ser nîsbeta wan bal bi Baba Tahir hevrikiyeke germ pêk bê û loma diyar dike ku wê nekevine nav vê babetê (Doskî, 2010: 6). Jixwe li ser taybetiya zimanê dubeytiyên Baba Tahir

ev nîqaş hene û Mihemed Emîn Zekî Beg (1880-1948) jî balê dikişîne ser vê mijarê û dibêje zimanê wî dişibe Goranî jî (Bey, 1998: 74).

Li gor Doskî naveroka dubeytiyên Baba Tahir -ew nîsbeta wî ya Uryan bi kar tîne- li dor eşqa heqîqî û mecazî dizivirin, gelekê wan li ser sofîtî û xwedênasî û her wiha gelek jî li ser evîndarî û duristiyê ne û wekî din şi‘rên wî yên bi taybetî li ser jiyana wî bi xwe jî hene (Doskî, 2010: 6).

Doskî ji hêla naverokê ve dubeytiyên Baba Tahir û çarînên Omer Xeyam (1048-1131) muqayese dike. Bi gotina Doskî, Xeyam bi çavekî neyînî/selbî li rastiya mirinê dinihêre. Lê ev yek li nik Baba Tahir tuneye. Bi raya Doskî heke bi destê lêkolîneran bi awayekî heqane û duristî lêkolîn li ser “rubaiyatên” Baba Tahir bihata kirin, ewê jî derketana pêş, bihatana nasîn û ji rubaiyatên Xeyam kêmtir nedibûn (Doskî, 2010: 7).

Doskî li ser pîvana dubeytiyan jî agahiyê dide û dibêje Baba Tahir şi‘rên xwe li ser behra “el hecez el musedes el mehzuf”ê vehonane. Doskî zehmetiya wergera şi‘rê bal bi şi‘rê bi bîr dixe û paşê dibêje ligel dijwariya wê heya ji dest me hat me hewl da ku wergera wan ya Kurmancî li gor ya eslî pêk bînin.

Her wiha Doskî diyar dike di nivîsîna deqa Lorî û wergera wê ya Kurmancî de ji wergera Sabah Kara ya sala 1998an sûd wergirtiye.

Di vê wergerê de 294 dubeytiyên esasî, 37 dubeytiyên berguman û xezeleke bi sernavê “Ez im Tahir” ya bi 8 beytî di dawiyê de heye. Di vê wergerê de metnê Lorî û Kurmancî li rû hevdu hatiye bicihkirin. Ev ji bo muqayeseyê dibe hêsanî. Wekî Doskî bi xwe jî diyar dike di vê wergerê de taybetiyên zimanê helbestê, wezn û serwa hatine parastin. Gava meriv vê wergerê dixwîne tehma metnekî klasîk yê Kurmancî dide xwîner. Bi raya me ji hêla wergerê, parastina reseniya ziman ve wergera herî serkeftî ev e. Jixwe Doskî bi xwe jî tîne ziman, diyar e ev werger ketiye bin bandora ya Sabah Kara û ev gava berawirdî tê kirin bi eşkere tê xuyanê. Lê ev werger ji ya Kara baştir bûye. Ev yeka jî bi pisporî û xebatên Doskî yên di warê şi’ra klasîk ya Kurdî tîne bîra mirov. Lewra Doskî heya niha bi dehan berhemên ji qonaxa klasîk ya Kurdî bi edîsyon kirîtîkê ji nû ve ji bo çapê amade kirine û dane weşandin. Di vê wergerê de şop û rêça van xebatan xwe dide der.

### 3.3. Wergera Kadri Yıldırım

Wergera sisêyan ya dubeytiyan ya Kadri Yıldırım (1959-2021) e. Ev xebata bi navê *Espîdebazê Hemedanî: Baba Tahirê Uryan/Baba Tahirê Uryan Hayatı Görüşleri Diwanı* di sala 2013an de li Stenbolê di nav weşanên Avestayê de hatiye weşandin (Yıldırım, 2013).

Yıldırım di vê xebata xwe de di pêşgotinê de qala wergera xwe dike û diyar dike ku armanca wî ew e ku li ser jiyan, helbest û fikra Baba Tahirê ku bi zaravayê Lorî gotiye û nivîsiye agahiyan bide. Li gor vê di vê xebatê de ji bilî eslê dubeytiyan bi Lorî, wergera Hewramî, Kurmancî û Tirkî heye. Metnê Lorî hatiye latînîzekirin, wergera Hewramî ya Baqî Şefîî ye û wergerên Kurmancî û Tirkî jî yên Yıldırım in. Yıldırım dibêje Şefîî di wergera xwe ya Hewramî de xwe spartiye nusxeya Destgirdî -çavkaniya Kara jî ev e- lê ji ber ku ji 360 û çend dubeytiyan hinek biguman in Şefîî ji wan tenê 292 dubeytî hildane dîwana xwe û Yıldırım jî di wergera xwe de ev xebat ji xwe re wek çavkanî hildaye.

Yıldırım li ser nîqaşên dema bûyîna Baba Tahir disekine û dibêje bandora Baba Tahir li ser Omer Xeyam çêbûye. Her wiha beriya ku Îbn Erebî (1165-1240) yê ku wekî mîmarê

fikra Wehdetî Wicûdê û Wehdetî Edyanê tê zanîn were dinyayê Baba Tahir qala vê nêrînê kiriye û di helbestên xwe de ev raman parastiye. Ji hêla din ve Yıldırım balê dikişine ku her çendî Baba Tahir di "*Serencam*"a pirtûka firqeya Ehlê Heq de wekî kesekî ji wan bê nîşandan jî lê di berhema wî ya "*el-Kelîmatul-Qisar*" ya Erebî de tu şop û berateya nêrîna vê firqeyê yên wekî "tenasux" û "xulûl"ê nayên xuyanê. Bi gotina Yıldırım tenê şopa baweriya ku dibêje Xwedê beriya erd û esmanan "dureke spî" ya heftê hezar sal li ser avê maye afirandiye, di helbesteke Baba Tahir de tê dîtin û ev yek jî bi "teoriya dura ontolojîk" re tê têkildarkirin. Bi nêrîna Yıldırım, Baba Tahir kesekî şiiyê mutedil e û li ser mezhebê Îsna Eşereya ji firqeya Îmamiye ye. Baba Tahir bi xwe jî xwe wekî "pîr", "rind", "qelender" û "derwêş" bi nav kiriye. Ev yeka nîşan dide ku kesekî mîstîk û piralî ye.

Ev berhema Yıldırım ji du beşên sereke pêk tê û di beşa pêşîn de li ser jiyana Baba Tahir, nav û nasnavên wî, têkiliya wî ya bi Yaresanî/Ehlê Heq û tesewifê agahî tên dayîn, der heqê berhem û naveroka wan de tesbît tên kirin. Li ser Kurdbûna Loran û her weha Baba Tahir ji *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî (1543-1603) û *Qamusul-'Elam*a Şemseddîn Samî (1850-1904) delîlan nîşan dide ku Lorî Kurdî ye û Lor jî Kurd in. Nêrîna Baba Tahir ya li dinyayê, naverok, têgeh û sembolên hizrî û siruştî yên emilandine bi nimûneyên ji helbestên wî hatine şîrovekirin. Der heqê lêkolîn, xebat û wergerên dubeytiyan de bîbliyografiyek hatiye dayîn. Yıldırım pêvajoya berhevkirin, weşana dubeytiyan li ber çavan radixe. Bi kurtî behsa destêwerdan û guherandina li ser zimanê helbestan dike. Herî dawîn jî qala wergerê tê kirin. Li gor vê di ve xebatê de 292 dubeytî bi Lorî, Hewramî, Kurmancî û Tirkî cih digrin. Wergera Kurmancî û Tirkî bi destê Yıldırım hatine kirin û metnê Lorî û Hewramî jî bi destê Yıldırım hatiye latînîzekirin. Yıldırım dibeje hewl daye ku taybetiya ziman were parastin û werger bi vê hişmendiyê hatine amadekirin (Yıldırım, 2013: 7, 96).

Di nav hersê wergerên Kurmancî de li ser Baba Tahir, berhemên wî, lêkolîn û xebatên di vê mijarê de herî zêde agahî di pirtûka Yıldırım de hene. Ji ziman û pergala vê xebatê tê fêmkirin ku hinekî bi lez hatiye amadekirin. Dîsa jî bi vê xebatê xwînerekî ji rêzê dikare bibe xwedî agahiyên giştî. Ev taybetî, vê xebata Yıldırım ji yên din cuda dike. Lê zimanê beşa lêkolînê ya destpêka pirtûkê ne Kurdî ye û bi Tirkî ye. Ev yek jî vê wergerê ji herdu wergerên din cuda dike. Meriv dikare bibêje ev werger xebateke pirzimanî ye. Lewra dema dubeytiyên Baba Tahir hatine dayîn bi dor Lorî û wergera wan ya Hewramî û peyra Kurmancî û Tirkî hatiye dayîn.

Zimanê wergerê gava bi wergera Kara û Doskî re bê muqayesekirin qels tê xuyanê. Di herdu wergerên navborî de ji bo wezn, qafiye û form neguhere hewl hatiye dayîn. Heta jimara kiteyan, rêza serwayan li gor metnê orijînal hatiye edilandin. Lê Yıldırım her çendî guh dabe serwayan jî ji hêla form, ziman û jimara kiteyan de serbest tevgeriyaye. Ji şekl bêtir bala xwe daye ser maneyê û ji bo maneya helbestê bîne ziman xebitiye.

Wekî li jor jî hat destnîşankirin di esasê xwe de jêdera sereke ya hersê wergeran jî nusxeya Wehîd Destgirdî ye. Lê gava meriv jimara dubeytiyan, rêza wan dinihêre cudahî di navbera wan de heye. Heke qala dubeytiyên sereke bên kirin di wergera Kara de 296, di ya Doskî de 294 û di ya Yıldırım de jî 292 dubeytî hene. Her wiha ji ber dubarebûn, tevlihevî û cudahiyan jimara xezelan jî hevdu nagire. Di wergera Yıldırım de xezel di beşa pêşîn de hatine dayîn, lê wergera wan ya Kurmancî tuneye.

**4. Ji Çend Aliyan Ve Berawirdiya Wergeran**

**4.1. Ji Hêla Ziman Ve**

Ji bo ku em bikaribin di navbera werger, ziman û taybetiyên wan de muqayeseyekê bikin, emê ji wergeran her yekê pênc dubeytiyan bidin ber hevdu.[5] Bi vî awayî li ser çawaniya zimanê wergeran derfeta nirxandin û muqayeseyê dê çêbe.

**Kara**

Bedena min derdkêş e, ey Îlahî
Dilê min hesretkêş e, ey Îlahî
Ji şewqa war û derdê xerîbiyê
Agir sînga min de ye ey Îlahî (1)[6]

Bê te ya Reb bostan de gul venebe
Eger vebe, ti kes bêhna wê neke
Bê te kesê lêvê' xwe b'kenê veke
Ruwê xwe tim bi xwîna dil bişoye (2)

Şal lixwekim, kiras li bejna xwe kim
Gerîna çerxa felek temaşe kim
Bigerim hemû deryayan sertaser
Û avê li destê nankorê xwe kim (3)

Tu ku nexwediyî îlmê semawat
Tu ku neçûyiyî b'alyê xerabat
Tu ku kar û ziyana xwe nizanî
Tu kengî dighî yaran, heyhat heyhat (4)

Eger dil dilber be, ma dilber kî ye
Eger dilber dil be, navê dil çi ye
Ez dil û dilber tevlihev dibînim
Nizanim ku dil kî û dilber kî ye (5)

**Doskî**

Leşê min ey Xudaya derdemend e
Keserdar e dilê min dîl û bend e
Ji şewqa mesken û derdê xerîbîyê
Xuda.. pêta di vî singî de çend e! (1)

Di baxan bê te gul vebibit nebûye

---

[5] Dubeytiyên hatin berawirdkirin her çendî heman metin bin jî di wergeran de rêza wan guheriye, lê me jimara wan di bin dubeytiyan de diyar kir da ku tevlihevî çênebe.

[6] Reqemên li dawiya dubeytiyan rêza wan ya di çavkaniya destnîşankirî de nîşan didin, loma jimara rûpelan nehat diyarkirin.

Ku vebibit jî ji wê bêhnek nebûye
Gula bê te veket lêvan bi xende
Royê xo dê bi xûna dil bişûye (2)

E, dê xemlê li xo kem şalê bestim
Li seyra çerx û dewranê bi qestim
E, dê sehkem hemî derya seraser
Bişom da ji bênemek ez herdu destim (3)

Nexwendabî ji bo ilmê semawat
Nekey tu carekê qesta xerabat
Mifayê xo, ziyana xo, nezanî
Wîsala yar û ehbaban te heyhat (4)

Eger dil dilber e bêje: Kî ye dil?
Weger dilber dil e bêje: Çi ye dil?
Dil û dilber dibînim ez li hev tên
Nizanim lew kî ye dilber kî ye dil! (5)

**Yıldırım**
Laşekî min ê derdkêş heye Xwedêyo
Dilekî min ê hesretkêş heye Xwedêyo
Ji ber xerîbiyê bêrîkirina yar û war
Sîngekî min ê agirkêş heye Xwedêyo (2)

Bê te ya Reb, di bax de gul venabe
Bila tu kes wê bihn neke eger vebe
Kî bê te ji bo kenînê lêva xwe veke
Rûyê xwe naşo ji xwîna dilê xwe (3)

Ez şal girê bidim û li xwe bikim qedek
Ez bibînim çawa digere çerx û felek
Ez bigerim li ava deryayê ser û bin
Pê bişom du destên mirovê bênemek (1)

Tu yê ku te nexwendiye îlmê asîmanan
Tu yê ku tu neçûyî aliyê meyxaneyan
Tu yê ku tu venaqetînî kar û zirara xwe
Tu dê çawa bigîjî yarê, eman ha eman! (4)

Eger dil dilber e gelo dilber kîjan e?
Û eger dilber dil e gelo navê dil kîjan e?
Ez dil û dilberê di nav hev de dibînim

Ez nizanim dil kîjan e, dilber kîjan e (5)

Xebata Kara û Doskî ligel ku werger in bi giştî serkeftî ne û tehma helbesta klasîk ya Kurdî didin xwîner. Bi taybetî wergera Doskî mîna rasterast bi Kurmancî hatiye nivîsîn tê xuyanê û ji vê hêlê ve ji wergera Kara serkeftîtir e. Bo mînak di çarîna duduyan de wergera Kara herikbar nîne. Ligel vê heman dubeytî bi destê Doskî pir xweş û herikbar hatiye wergerandin. Her wiha wergera Yıldırım li gor wan herduyan qels e û kêmasiyên ku ji ber wergerê derdikevin holê di xwe de dihewîne. Wekî metnekî ku ji zewq û armancên edebî dûr û xalî, tenê ji bo veguheztina wateyê hatiye wergerandin tê xuyanê. Heta li hin cihan wateya misrayan ji peywendê dûr ketiye û guheriye. Bo mînak di misraya dawîn ya çarîna sêyem de kesê wekî "bênemek/nankor" tê tewsîfkirin bûye kesekî nediyar ango ne muxetab e, lêbelê di wergera Kara û Doskî de ew wesf îşaretî bi bal vebêj dike.

Di hersê wergerên Kurmancî de peyvên Erebî hatine bikaranîn û tu hewleke dijî wan nayê xuyanê. Lê bi qasî ku me dît peyvên Tirkî nehatine emilandin. Lêbelê peyvên hevpar yên Kurd û Faris bi kar tînin zehf in.

### 4.2. Ji Hêla Nêzîkbûna Metnê Eslî ve

Gava muqayeseyek di navbera hersê wergeran de tê kirin derdikeve holê ku Kara û Doskî xwe nêzî metnê esasî girtine û di warê bikaranîna peyvan de li gor wê tevgeriyane, lê Yıldırım di wergera xwe de li gor wergera Hewramî tev geriyaye. Ji bo mijar zelal bibe emê bo mînak ewil dubeytiyeke esil bi tîpên latînî bidin û peyra wergerên wê binêrin.

**Baba Tahir**
Te ke naxwandeyî îlmê semawat
Te ke naburdeyî reh der xerabat
Te ke sûd û ziyanê xwud nedanî
Bi yarûn[7] key resî! Heyhat, heyhat! (4)[8]

**Baqî Şefiî**
Tû ke newanat îlmî asîman
Tû ke nekoten ate w meyxanan
Le yekit nedan xasî û xirawî
Aman key miyawî tû we nazaran (4)

**Kara**
Tu ku nexwediyî îlmê semawat
Tu ku neçûyiyî b'alyê xerabat
Tu ku kar û ziyana xwe nizanî
Tu kengî dighî yaran, heyhat heyhat (4)

[7] Ev peyva "yarûn" di xebeta Kara û Yıldırım de wiha ye, lê Doskî ew wekî "yaran" nivîsiye. Bnr. Doskî, *Çarînên Baba Tahirê Uryan*, r. 8.
[8] Di xebata Yıldırım de metnê orijînal hatiye latînîzekirin, me jî latîniya ji wê xebatê bi kar anî.

**Doskî**
Nexwendabî ji bo ilmê semawat
Nekey tu carekê qesta xerabat
Mifayê xo, ziyana xo, nezanî
Wîsala yar û ehbaban te heyhat (4)

**Yıldırım**
Tu yê ku te nexwendiye îlmê asîmanan
Tu yê ku tu neçûyî aliyê meyxaneyan
Tu yê ku tu venaqetînî kar û zirara xwe
Tu dê çawa bigîjî yarê, eman ha eman! (4)

Gava ev mînak bê nirxandin ji wergeran ya herî zehf nêzî metnê orijînal ya Kara ye. Lewra wergera wî him ji hêla şekil ve û him jî ji hêla serwayê ve pir dişibe metnê Lorî. Meriv dikare bibêje ku wergêr hema ji hêla bilêvkirina peyvan ve dest bi wergera xwe kiriye, rêza peyvan jî neguherandiye, dest nedaye peyvan û bi hewla ku wan bike Kurmancî tev negeriyaye. Peyvên wekî semawat, xerabat, heyhat, îlm, yar û ziyanê neguherandine. Bi vî awayî him şekl û him jî mane hatiye parastin.

Ev helwest bi piranî di wergera Doskî de jî tê xuyanê. Di wergera wî de jî bi heman helwestê şi‘r hatiye wergerandin. Piraniya peyvan hatiye parastin. Lê gava wergera Doskî û Kara bê berawirdkirin ya Kara hê bêtir nêzî metnê eslî ye. Doskî peyvên wekî wîsal, ehbab, qest, mifa û carekê bi kar anîne. Ligel vê Doskî jî jimara kiteyan û şeklê serwayê mîna metnê eslî parastiye.

Wergera Yıldırım bi piranî ji herdu wergeran cuda ye, wî jî serwa parastiye, lê jimara kiteyan ya ku di metnê eslî û herdu wergerên Kurmancî de 11 ye di wergera wî de dibe 14. Lê wekî serwa di hersê wergeran de jî rêza “aaba”yê hatiye parastin. Wisa tê xuyanê ku Yıldırım hewl daye ku wergera wî ji herdu wergerên Kurmancî yên berê hatine weşandin cudatir be. Bi vî awayî peyvên cuda bi kar anîne. Loma peyvên wekî asîman, meyxane, eman hatine emilandin. Ji vê taybetiya xwe ji herdu wergeran cihê ye. Lê dema meriv bala xwe dide wergera Hewramî diyar dibe ku Yıldırım ketiye bin bandora wê û ew peyvên navborî “asîman, meyxane û aman” yên di wê wergera Baqî Şefîî de derbas dibin emilandine. (Yıldırım, 2013: 102). Jixwe Yıldırım bi xwe jî qalê dike ku wî ji bo wergera xwe wergera Hewramî wekî jêder hildaye (Yıldırım, 2013: 7).

Bi giştî her çendî Kara û Doskî xwe nêzî metnê eslî bigrin jî di hin dubeytiyan de ev yek diguhere, ya Yıldırım ji hin aliyan ve nêzî ya eslî dibe. Bo mînak di dubeytiya li jêr de ev yek derketiye holê.

**Baba Tahir**
Tenê mîhnetkeşî dîrum Xudaya
Dilê hesretkeşî dîrum Xudaya
Zi şoqe mesken û dadê xerîbî
Be sîne ateşî dîrum Xudaya (1)

**Kara**
Bedena min derdkêş e, ey Îlahî
Dilê min hesretkêş e, ey Îlahî
Ji şewqa war û derdê xerîbiyê
Agir sînga min de ye ey Îlahî (1)

**Doskî**
Leşê min ey Xudaya derdemend e
Keserdar e dilê min dîl û bend e
Ji şewqa mesken û derdê xerîbîyê
Xuda.. pêta di vî singî de çend e! (1)

**Yıldırım**
Laşekî min ê derdkêş heye Xwedêyo
Dilekî min ê hesretkêş heye Xwedêyo
Ji ber xerîbiyê bêrîkirina yar û war
Sîngekî min ê agirkêş heye Xwedêyo (2)

Peyva Xuda ya di metnê eslî de di ya Kara de bûye Îlah, lê Yıldırım ew bi forma Kurmancî wekî Xwedê bi kar aniye. Her wiha hesretkêş, xerîbî, dil dîsa hatine parastin, ev di ya Kara de jî hene û ew peyva "şewqê" jî diparêze. Lê di vê dubeytiyê de Doskî peyvên wekî derdemend, keserdar, dîl, bende, pêt bi kar anîne. Her wiha peyva xerîbî, şewq û mesken jî emilandiye. Lê peyva Xuda bi kar aniye. Ji hêla serwayê ve rêza hersê wergeran jî "aaba" ne lê jimara kiteyan di wergera Kara û Doskî de mîna eslê wê 11 ye û lêbelê di wergera Yıldırım de jimara kiteyan li hev nagire. Dema kiteyên çarîna li jor tê hesabkirin jimara kiteyên misrayan bi dor 12, 13, 14 û 13 ye. Ev yeka jî nîşan dide ku Yıldırım bala xwe nedaye ser vê mijarê.

**4.3. Ji Hêla Hevşibînê ve**

Dema muqayese di navbera wergeran de bê kirin tê dîtin ku hin dubeytî wekî hev hatine wergerandin, hinek gelekî ji hevdu dûr ketine. Ji bo wergerên pir dişibin hevdu ev mînakeke baş e:

**Sabah**
Şev tarî û rê bi kevir û ez mest
Qedeh ket ji destê min û qe neşkest
Parêzê wê, xweş parêziyê dike
Eger na, sed qedeh bê ketin şikest (6)

**Yıldırım**
Şev tarî ye, rê bikevir e, ez jî mest
Qedeh ji destê min ket û neşikest

Parêzvanê wê ew pir baş parastiye
Eger na, sed qedeh bê ketin şikest (8)

Wekî ku tê xuyan ji bilî çend guherînên piçûk wergera Yıldırım wekî ya Kara ye. Ji hela şekl, wate û peyvên hatine bikarînîn ve heman werger e. Lê divê ev yeka jî bê diyarkirin gava li deqa orijînal tê nêrîn, hevşibînên bi vî rengî di hin çarînan ji ber metnê jêder pêk hatine. Bo mînak çarîna Baba Tahir li gor çavkaniya berdest wiha ye:

Şeb tarîk û sengistan û mû mest
Qedeh ez dest mû uftad û neşikest
Nîgehdarendeeş nîkû nîgehdaşt
Wer ne, sed qedeh neftade bişikest (6)

Wisa tê xuyanê ev hevşibîn ji bo hin çarînan mecbûrî ye. Heke bi taybetî ji bo ji metnê jêder cuda û dûrxistinê hewl neyê dayîn, werger û metnê jêder nêzî hev dimîne. Bi raya me ev jî nabe kêmasî, heta ji bo nêzîkbûna zaravayên Kurdî û ji hevdu fêmkirina Kurdan derfeteke baş e jî.

**4.4. Ji Hêla ji Hevdu Dûrbûnê ve**

Her wiha dubeytiyên ji hêla peyvên hatine bikaranîn ve ji hevdu dûr jî hene, emê ji bo wê jî dubeytiya li jêr nimûne nîşan bidin:

**Kara**
Şal lixwekim, kiras li bejna xwe kim
Gerîna çerxa felek temaşe kim
Bigerim hemû deryayan sertaser
Û avê li destê nankorê xwe kim (3)

**Doskî**
E, dê xemlê li xo kem şalê bestim
Li seyra çerx û dewranê bi qestim
E, dê sehkem hemî derya seraser
Bişom da ji bênemek ez herdu destim (3)

**Yıldırım**
Ez şal girê bidim û li xwe bikim qedek
Ez bibînim çawa digere çerx û felek
Ez bigerim li ava deryayê ser û bin
Pê bişom du destên mirovê bênemek (1)

Wergera vê çarînê di hersê wergeran de ji hêla wateyê ve -ji bilî misraya dawîn- nêzî hev e, lêbelê ji hela peyvên emilandî û şekil ve ji hevdu cuda ne. Heke bi baldarî û hûrgilî neyê nirxandin, nayê fêmkirin wergera heman metnî ye. Ji hela din ve di misraya dawîn de

kesê ku bi "bênemekiyê" tê pênasekirin kesekî nediyar e, lêbelê di wergera Kara û Doskî de ew wesf îşaretî bi bal vebêj dike. Ev cudahiya ji hêla wateyê ve girîng e.

### 4.5. Ji Hêla Cudabûna Wateyê ve

Ev mînakên wergera ji hêla peyvan ji hev dûr bûn, lê wate hema bibêje yek e. Ji bilî van hin werger jî hene mane pir ji hev cuda ye. Bi tu awayî meriv nikare nêzî hev bike. Bo nimûne:

**Kara**
Xwezî bi yên here j'were cihê nakin
Qe ti tiştî nanvîsin û naxwînin
Weku Mecnûn berê xwe didin çolê
Ahûyan didin hev û diçêrînin (28)

**Doskî**
Xwezîka yên ji her wer naderînin
Çu herfan ew nezanin qet bixwînin
Wekî Mecnûn serî didanin beyaban
Xezalan ew diden ber xo diçêrînin (28)

**Yıldırım**
Xwezî bi kesên ku ker ji bar nas nakin
Ne karin herfekê binivîsin ne bixwînin
Mîna Mecnûn berê xwe didin çolê û
Li van çiyayan bi xezalan re diçêrin (24)

Di misraya pêşîn de wergera Kara û Doskî yek e û dibêje xwezî bi wan kesan ku herê û bêyê jî nas nakin, fêm nakin. Helbet li vir rexneyek li wan kesan tê kirin ku feraset û fehmê wan kêm e. Lê di wergera Yıldırım da ev peyva "her/e" dibe ker û peyva ber/wer/e jî dibe bar. Min bi xwe sedema vê cudahiyê fêm nekir. Lewra ez nizanim her çawa dibe "ker" wekî em dizanin di Farisî de ker wekî "xer / خر" tê nivîsandin. Wekî din di Zazakî de ji bo ker "her" tê gotin. Gelo di Lorî de ji bo ker "her" tê gotin? Heke wisa be herdu wergerên din çima ew wisa fêm nekirine? Herdu misrayên navîn bi mane nêzî hev in lê di misraya dawîn de jî maneyek cuda derdikeve holê. Di herdu wergerên pêşîn de "ew kesê mijara helbestê" li çolê mîna Mecnûn xezalan diçêrîne, lêbelê di wergera Yıldırım de ev kes li çiyan "tevî xezalan diçêre". Ev herdu wate ji hevdu pir dûr in.

Di navbera van hersê wergeran de cudahiyên bi vî rengî yên ji hêla wateyê ve hene. Ji ber sînorê vê xebatê em nikarin li ser hemûyan rawestin.

## 5. Encam

Dema li wergera Kara tê mêzekirin derdikeve holê ku seba parastina wezn, serwayê hewl daye û zimanê wergera wî ji deqa jêder zêde ne dûr e û heta li gelek cihan heman peyv hatine bikaranîn, rêz û hevoksazî jî hatiye raçavkirin. Wergêr li pey peyvên cuda neketiye, ji bo rengekî nû bide xebata xwe û ji metnê eslî dûr bikeve nexebitiye. Berevajî vê heya ji dest hatiye xwe nêzî esl girtiye. Ev yek jî tehmeke şi'ra klasîk dide wergera Kara. Lêbelê ji ber ku wergêr li hin cihan ji bo wezn û serwa li hev bê, serbest tevgeriyaye, loma hinek peyv û hêmanên di eslê helbestan de hene bi kar neanîne. Ligel ku wergera pêşîn ya dubeytiyên Baba Tahir ya Kurmancî ye jî bi giştî xebateke serkeftî ye.

Doskî jî wekî Kara di wergera xwe de taybetiyên zimanê dubeytiyan, wezn û serwayên wê parastine. Gava meriv vê wergerê dixwîne tehma metnekî klasîk yê Kurmancî dide xwîner. Bi raya me ji hêla wergerê, parastina reseniya ziman ve di nav wergerên hatin nirxandin de ya herî serkeftî ev e. Doskî bi xwe jî tîne ziman, ev werger ketiye bin bandora wergera Kara û ev yeka gava berawirdî tê kirin pir eşkere tê xuyanê. Ango ji ber ku ji wergera beriya xwe sûd wergirtiye, ji wê baştir bûye.

Di nav sê wergerên Kurmancî de herî zêde agahî di pirtûka Yıldırım de hene. Lêbelê ji ziman û pergala xebatê tê fêmkirin ku hinekî bi lez hatiye amadekirin û loma nirxandinên sethî û hin şaşiyên rastnivîsê hatine kirin. Ligel vê jî xwîner der heqê mijarê de dikare bibe xwedî agahiyên giştî. Lê zimanê beşa lêkolînê ya destpêka pirtûkê ne Kurdî ye û bi Tirkî ye. Ev yek jî vê wergerê ji herdu wergerên din cuda dike. Meriv dikare bibêje ev werger xebateke pirzimanî ye. Lewra dema dubeytiyên Baba Tahir hatine dayîn ewil Lorî û ji dû wê re wergera Hewramî, Kurmancî û Tirkî hatiye dayîn.

Zimanê wergerê gava bi wergera Kara û Doskî re tê muqayesekirin ji hêla edebî ve qels tê xuyanê, heta ya herî xerab e û ji zimanê edebiyata klasîk dûr ketiye. Ji şekl bêtir bala xwe daye ser maneyê. Her wiha di hin beşan de ji hêla wateyê ve jî ji yên din cuda ye. Di herdu wergerên navborî de ji bo wezn, serwa û form neguhere hewl hatiye dayîn. Heta jimara kiteyan, rêza serwayan li gor metnê orijînal hatiye edilandin. Lê Yıldırım her çendî guh dabe serwayan jî ji hêla form, ziman û jimara kiteyan de serbest tevgeriyaye.

**Çavkanî**

Adak, A. (2013). Destpêka Edebiyata Kurdî. Stenbol: Nûbihar.

Bey, M. E. Z. (1998). Kürt ve Kürdistan Ünlüleri. çev. M. Baban-M. Yağmur-S. Kutlay. Swêd: Weşanên Apec.

Çelik, A. F. (2015). "Bâbâ Tâhir-i Hemedânî Divanının Mehdî-i Hamîdî Nüshasında Geçen Dobeytileri ve Türkçe Tercümesi". Doğu Esintileri Dergisi, 3: 247-293. Sağlık, H. (2018). "Kalenderî Bir Sûfî Olarak Baba Tâhirê Uryan". e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi/Journal of Oriental Scientific Research (JOSR), 2 (20): 708-723

Çolîg, F. (2016). *Dîwonê Baba Tahirê Uryan'î*. Stenbol: Astun.

Doskî, T. Î. (2010) Çarînên Baba Tahirê Uryan. Duhok: Sentera Vekolînên Kurdî li Zanîngeha Duhokê.

Rûhanî, B. M. (2017). Kürt Meşhurları Tarihi, (cilt 1). çev. Hatice Yılmaz Arslan. Stenbol: Hîvda.

Sagniç, F. H. (2014). Dîroka Wejeya Kurdî. Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Uryan, B. T. (2010). *Dubeytî*, wer. Sabah Kara. Stenbol: Nûbihar.

Yavuzer, M. N. (2016). Baba Tahir di Wêjeya Kurdî de. Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî. Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi.

Yazıcı, T. (1991). “Baba Tahâr-i Uryân, Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, (cilt 4). Stenbol.

Yıldırım, K. (2013). *Baba Tahirê Uryan Hayatı Görüşleri Diwanı*. Stenbol: Avesta.

http://bianet.org/Kurdi/biamag/188275-diwana-dubeyti (23.03.2018)

http://www.iranicaonline.org/articles/baba-taher-oryan (23.03.2018)

https://en.wikipedia.org/wiki/Zaro_Aga (23.03.2018)

Kurdiname
Akademik
Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname E-ISSN-2687-5438

# DAHÛRÎNEKE TESEWIFÎ LI SER QESÎDEYA "ÇELEBÎ" YA ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ QUTBÊ EXLATÎ

(ŞEYH ŞEMSEDDİN KUTB-İ AHLATÎ'NİN "ÇELEBİ" ADLI KASİDESİ ÜZERİNE TASAVVUFÎ BİR ANALİZ)

(A SUFISTIC ANALYSIS ON SHEIKH SHAMSEDDIN QUTUB-I AKHLATÎ'S QASIDA NAMED "ÇELEBI")

Yakup AYKAÇ*
Veysel BAŞÇI**

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 13.11.2022
**Accepted // Pejirandin:** 23.11. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 74-103
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1203719

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Aykaç, Yakup û Başçı, Veysel (2022). Dahûrîneke Tesewifî li Ser Qesîdeya "Çelebî" ya Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî, *Kurdiname*, no. 7, p. 74-103

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

**Kurte**

Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî yek ji şêxên Xelwetî yên sedsala XVII-an e ku di dîroka kurdan a tesewifî de jî şair û mutesewifekî giring e. Wî li bajarê Xelatê di tekya û hengahan de xizmetên îrşadê bi rê ve biriye ku ev bajar di wê serdemê de yek ji navendên giring ên tesewifî yên Mîrektiya Bedlîsê bû. Malbata Şêx Şemsedîn, bi eslê xwe ji Hemedanê ye ku ew der dikeve herêma berfireh a Cîbal/Kohistanê. Wê malbatê di dîrokê de maweyeke dirêj ji bo terîqeta Suhrewerdiyê xizmet kiriye û piştre derbasî hêla Xelatê bûye. Li Xelatê, piştî ku întisaba terîqeta Xelwetiyeyê kiriye vê carê jî li vê deverê bûye nûnerê vê terîqetê û ji bo belavbûna wê gelek hewl daye. Îcar ji vê malbatê Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî herçiqas di silsileya Xelwetî de xwedî cihekî giring bigire û di warê tesewifê de hin berhem nivîsîbin jî îro tenê dîwançeyeke wî maye. Naveroka helbestên wî yên tesewifî bêtir esas û usûlên wehdetê wucûd, seyrê sulûk, evîna îlahî, zuhd, tezkiyeya nefsê û mijarên bi vî rengî dihewîne. Di nav wan helbestên wî de qesîdeya wî ya bi paşserwaya "Çelebî" ji hevdeh beytan pêk hatine ku ji aliyê ahenga mûzîkê û serwaya hundirî ve dewlemend e. Şair di vê qesîdeya xwe de ji ilmê belaxetê sûd wergirtiye û serî li hunerên wek *luzumî mala yulzem* yan jî *îltizam*ê daye û bi awayekî hostayane teknîkên *onomatopoeia* û *alîterasyon*ê bi kar anîne. Wî esasên bingehîn ên tesewifî yên wekî teqwa, zikrên şevê, nimêja teheccudê, înziwa û xelwetê di vê helbesta xwe de xebitandine. Me di vê xebatê de ev qesîde ji aliyê dîrokî, dînî, mûsîqî û edebî ve rave kir û li gorî rêbaza şiroveya modern analîza wê ya tesewifî kir. Armanca me bi vê nivîsarê ew e ku em bi rêya tehlîla qesîdeya Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî tevkariyê li lîteratura şirove û analîza helbestên kurdî bikin.

**Peyvên Sereke:** Dahûrîna qesîdeyê, Xelwetî, Exlatî, Şêx Şemsedîn, Çelebî.

**Özet**

XVII. yüzyılın önemli *Halveti* şeyhlerinden olan Şeyh Şemseddin Kutb-i Ahlatî, Kürt tasavvufunun önemli şair ve sûfilerindendir. Bitlis Kürt Mirliğinin mühim tasavvufi merkezlerinden olan Ahlat şehrindeki tekke ve hangahlarında önemli irşad faaliyetlerinde bulunmuştur. Tarih boyunca bir çok sufî ve mutasavvıfın doğup büyüdüğü Cibal/Kuhistan bölgesinin Hamedan şehrinden olan ve uzun bir süre Sühreverdiyye tarikatında

* Arş. Gör. Dr. Mardin Artuklu Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Mardin-Türkiye. e-mail: yakupaykac@artuklu.edu.tr ORCID: 0000-0002-2602-484X.

** Dr. Öğr. Üy., Batman Üniversitesi, İslami İlimler Fakültesi, Temel İslam Bilimleri Bölümü, Tasavvuf ABD. Batman-Türkiye. e-mail: veyselbasci77@gmail.com ORCID: 0000-0003-1525-0355.

hizmetleri olmuş ailesi, Halveti tarikatına intisab ettikten sonra Ahlat ve çevresinde ve daha sonra da İmadiyye ve Hakkari bölgelerinde bu tarikatın mümesilleri olmuş ve bu tarikatın bölgede yayılmasını sağlamışlardır. Halveti silsilesi içerisinde önemli bir yeri olan Şeyh Şemseddin Kutb-i Ahlatî'nin tasavvuf alanında çeşitli telif eserlerinin olduğu bilinse de bunlardan günümüze sadece on altı şiirini içeren bir divançesi ulaşmıştır. Tasavvufî şiirlerinin muhtevası vahdet-i vücud, seyrû sülûk, ilahi aşk, zühd ve nefis tezkiyesi gibi esas ve usulleri havidir. Bu şiirleri arasında on yedi beyitlik *Çelebi* redifli kasidesi sahip olduğu kafiye-i derûni ve musiki özellikleriyle dikkat çekmektedir. Şair bu şiirinde bedi' ilmine giren *luzumi mala yulzem* yahut *iltizam* denilen bir sanatla *onomatopoeia* ve *aliterasyon* tekniklerini ustaca kullanmıştır. Ahlatî bu şiriinde takva, ilahi aşk, gece ibadeti, teheccüd namazı, inziva ve halvet gibi tasavvuf esaslarını işlemiştir. Bu çalışmada söz konusu kasidenin tarihi, dinî, musikî ve edebi yönleri izah edilmiş olup tasavvufi analizi yapılmıştır. Bu çalışmayla amacımız klasik Kürt edebiyatının önemli bir şairi olan Şeyh Şemseddin Kutb-i Ahlatî üzerinden klasik Kürt şiirinin derinliklerinde yatan tasavvufî, edebî ve tarihî dokuyu gün yüzüne çıkararak tahlil ve şiir analizi litaratürüne katkıda bulunmaktır.
**Anahtar Kelimeler:** Kaside analizi, Halvetî, Ahlatî, Şeyh Şemseddin, Çelebi.

**Abstract**

Sheikh Shamseddin Qutub-i Akhlatî, one of the important Khalwati sheikhs of the XVIIth century, is one of the important poet and sufis of Kurdish sufism. He was involved in important sufi activities in his *takkah* and *hangahs* in the city of Akhlat/Khalat, one of the important sufi centres of the Kurdish emirate of Bitlis. His family, who was from the city of Hamadan in the Jibal/Kuhistan region, where many sufis were born and raised throughout history, and who served in the Suhrawardiyya Order for a long time, became representatives of this order in Akhlat and its surroundings and later in Imadiyya and Hakkari regions after their initiation into the Khalweti order and ensured the spread of this order in the region. Although it is known that Sheikh Shamseddin Qutub-i Akhlatî, who has an important place in the Khalwati lineage, has various works in the field of sufism, only a small *diwancha* containing sixteen poems has survived to our day. The content of his sufi poems is based on principles and procedures such as *wahdat al-wujud, seyru suluk,* divine love, *zuhd* and *soul cleansing*. Among these poems, the seventeen couplets of his poem with the repeated voice/redif "Çelebi" stands out with its internal-rhyme and musical features. In this poem, the poet skilfully used onomatopoeia and alliteration techniques with an art called *luzumi mala yulzem* or *iltizam*. In this poem, Akhlati has dealt with the principles of sufism such as piety, divine love, night worship, tahajjud prayer, seclusion and khalvah. In this study, the historical, religious, musical and literary aspects of this poem have been explained and a sufi analysis has been made according to the modern analysis method. Our aim with this study is to contribute to the literary analysis by revealing the sufistic, literary and historical texture lying in the depths of classical Kurdish poetry through Sheikh Shamseddin Qutub-i Akhlatî.
**Key Words**: Analysis on qasida, Khalwati, Akhlatî, Sheikh Shamseddin, Çelebi.

## Destpêk

Terîqeta Xelwetî û malbata Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî di dîroka tesewifî û edebî de cihekî giring digirin. Cihê vê malbatê ji du aliyan ve muhîm e: Yek, ji aliyê tesewifî ve ku têkiliya wan bi terîqetên wek Suhrewerdî, Xelwetî piştre jî Qadirî û Neqşibendî re çêbûye; dudu jî, ji aliyê edebî ve ye ku gelek şair û berhemên kurdî jê derketine. Lewma jî xebatên akademîk ên ku li ser vê malbatê hatine kirin, çi tesewifî çi jî edebî, qîmetdar in. Sedema hilbijartina vê mijarê jî yek ji wan e ku me xwest bi xebateke akademîk di çarçoveya tesewif û edebiyatê de nêzîkî Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî bibin û ji vî aliyê ve hizr û ramanên wî bi dahûrîna helbestên wî re derxine holê. Lê ji ber ku gotarên akademîk ji her aliyan ve sînordar in, lewma me ev armanca xwe di çarçoveya tehlîl û dahûrîneke tesewifî de tenê li ser helbesteke wî sepand. Lewma em dikarin bibêjin ku sînorên vê xebatê tenê dahûrîneke tesewifî ye li ser qesîdeya "Çelebî" ya Qutbê Exlatî. Sedema hilbijartina vê qesîdeyê xwe dispêre du sedemên sereke ku ji wan a ewil, ev qesîde ji aliyê aheng û armoniyê ve gelekî xurt bû ku têkiliya wê ya mûzîkal bi terîqeta Xelwetî re baş xuya dibû. Ya duyem, gelek têgeh û istilahên tesewifî cih digirtin ku îşaretî ibadet, zikr, wird, cizbe, rabite û gelek tiştên din ên bi esas û usûlên terîqetê re têkildar

dikirin. Lewma me hewce dît ku analîz û tehlîlkirina qesîdeyeke bi vî rengî tevkariyekê li lîteratura edebiyata kurdî ya klasîk bikin.

Berî vê xebatê li ser dîwançeya Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî pirtûkeke şerhê li Duhokê hatiye kirin ku navê vê berhemê *Lewami'u'ş-Şuhub fî şerhî Dîwanî'ş-Şemseddînî'l-Exlatiyî'l-Qutub* e. Nivîskarê vê berhemê Muhemed Emîn Doskî (2007) bi awayekî giştî helbestên şair di vir de nirxandine û bêtir ji aliyê maneya heqîqî ve li ser helbestên şairî sekiniye. Lewma bi vê xebatê me betir bal kêşa aliyê wê yê tesewifî û xaseten hewl da ku remz û istilahên nepen ên bi Xelwetiyan re têkildar, derxine holê.

Li gorî çavkanî û belgenameyên li ber destan tenê şanzdeh helbestên Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî gihîştine roja îro. Ji bilî van helbestan di hin çavkaniyan de behsa berhemên wî yên din hatibin kirin jî, halê hazir hê jî peyda nebûne. Li gorî diyarkirina Birîfkanî (2001: 10) Qutbê Exlatî dîwaneke din a bi zimanê erebî jî nivîsiye lê îro wenda ye. Ji aliyê lîteraturê ve helbestên Qutbê Exlatî yên heyî wek dîwançeyeke biçûk çar caran hatiye çapkirin. Çapa ewil li Stocholmê di sala 2001an de bi navê *Dîdarê Yar Dîwana Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî Birifkanî* ji nav weşanên Roja Nû der çûye ku li pêşiya berhemê derbarê Şêx Şemsedîn û binemala Exlatiyan de agahî dane. Heman berhem vê carê li Hewlêrê di sala 2001an de bi navê *Dîwana Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî* çap bûye. Çapa sêyemîn a berfirehkirî dîsa li Hewlêrê di sala 2002an de ji nav weşanên Arasê der çûye. Piştre li zanîngeha Mardin Artukluyê Serdar Yılmaz li ser helbestên Şêx Şemsedîn tezeke masterê amade kiriye ku di sala 2015an de jî wek pirtûk li weşanxaneya Nûbiharê çap kiriye. Yılmaz (2015: 87-118) di vê xebata xwe de beşek ji bo tehlîla helbestên Qutbê Exlatî veqetandiye û cih daye gelek têgeh û mezmûnên tesewifî.

Armanca me di vê gotarê de analîz, şirovekirina vê qesîdeyê ye. Lewma şirovekirina qesîdeyê dê bêtir li ser vê pirsê bisekine ku ka şair *çi* û *çawa* gotiye. Me di vê gotarê de uslûb û vegotina şair nirxand. Di rêbaza analîza vê qesîdeyê de me her beyteke vê qesîdeyê bi şiklê wê yê erebî nivîsî û piştre jî bi latînî xwendina wan dan. Ji bo ku tevlihevî û alozî çênebe, me ji bo her beytekê beşeke ferhengê amade kir û peyvên erebî, farisî û kurdî; dengên siruştî û heywanî, têgeh û istilahên tesewifî û edebî digel wateyên wan nivîsin. Paşê me analîz û tehlîla her beytekê cuda cuda kir ku di wê beşê de bi hûrgilî cihên nepen û girtî ji aliyê maneyê ve zelaltir bibe. Herweha me di beşa analîz û şiroveya qesîdeyê de hin caran ji edebiyata rojhilatê yên wekî kurdî, farisî û tirkî li dor peywendiya navbermetnî mînak anîn. Di beşên şerha beytan de me cih dan ayet, hedîs, gotinên wecîz ên alim û navdarên Îslamê û gotinên pêşiyan. Li dawiya şerha her beytê di bin sernava *Hunerên Edebî* de me ji ilmên me'anî, beyan û bedî' sûd wergirtin da ku xalên edebî û hunerî yên beytan bêtir bên fêmkirin. Em dikarin bibêjin ku di vê nivîsarê de me ji bo ravekirina remz û mezmûnên nepen hewl da. Herî dawî li pêvekê jî me nusxeyeke qesîdeyê danî ku ji aliyê Şêx Memdûhê Birîfkanî ve hatiye nivîsîn.

### 1. *Binemala Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî û Têkiliya Wan bi Terîqetan re*

Terîqeta Xelwetî li cografyaya Îslamî yek ji wan terîqetên berfireh bû. Xelwetîtî cara ewil li Îranê piştre jî li gelek welatên cuda xwe nîşan daye, wekî Misir, Bakurê Afrîkayê, Hebeşistan, Sûriyê, Iraq, Anatoliya navîn û gelek navendên din (Uludağ, 1997: 393). Li gorî texmînan li dawiya sedsala XIV-an gihîştiye herêma Bedlîsê û li wir bûye mezhera teweccuha alim û arifan. Bê guman di dîroka tesewifê de cihê mîrektiya Bedlîsê gelek giring e. Bi rastî jî li erdnigariya Îslamiyetê gelek terîqetên ji hev cuda hene ku hem ji aliyê hizrî û hem jî ji aliyê usûl û esasên xwe ve di bin bandora pîrê terîqeta Kubrewiyê, Şêx Necmedînê Kubra (kd. 1221) de maye. Şêx

Necmedînê Kubra di rêya terîqetê de seyrê sulûka xwe li Bedlîsê temam kiriye û li bajarê Xelatê, di tekya Ebu'n-Necîb Ziyaedînê Suhrewerdî (kd. 1168) de ji destê murîdê wî Şêx ‘Emmar Yasîrê Bedlîsê (kd. 1194) xirqeya sofitiyê li xwe kiriye. Gelek malbat û ehlê terîqetê hene ku di nav rûpelên dîrokê de li Bedlîsê mane, seyrê sulûka xwe temam kirine û di dîroka tesewifê de bûne şêx û murîdên mezin ku yek ji wan jî Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî û malbata wî ye.

Binemala Şêx Şemsedîn, wekî gelek malbatên ehlê terîqetê ji herêma Cîbal/Kohistanê, ji bajarê Hemedanê ne. Vê malbatê demeke dirêj ji bo terîqeta Suhrewerdiyeyê xizmetên mezin kirine. Em bi awayekî zelal nizanin ka ev malbat kengê û bi çi şiklî întisaba terîqeta Xelwetî kiriye. Lê bi xêra şecere û silsilenameya vê malbatê em pê dihesin ku, di kunyeya bapîrê mezin ê Şêx Şemsedîn, Ebu'l-Hesen ‘Elî el-Exlatî el-Xelwetî (kd. 1379) de îfadeya *Xelwetî* dinivîse. Lewma dikare bê gotin ku li wan çaxan bapîrên Şêx Şemsedîn întisaba terîqeta Xelwetî kirine (Ehmedî-Muderrîs, 1389: 330). Ji bilî vê întisab û girêdana terîqeta Xelwetî, giringiya vê malbatê di dîroka tesewifê de ji ber têkiliyên wan ên bi Kubrewiye, Suhrewerdiye, Nûrbexşiye û Xelwetiyê tê. Dîsa di nav bapîrên Şêx Şemsedîn de em rastî navê Şêx Huseynê Exlatî (kd. 1405) tên ku ew li Bedlis, Misir û Anatoliyayê di nav pîr û murşîdên mezin de cih girtiye.

Şêx Şemsedîn yek ji pêşeng û nûnerên terîqeta Xelwetiyan e di nav kurdan de. Wî di sedsala XVII-an de bi xebatên xwe yên tesewifî kiriye ku terîqeta Xelwetiye li bajarên wekî Xelat, Hekkarî, Amêdiye û gundê derdora Birîfkanê belav bibe. Ji ber van sedeman dikare bê gotin ku Şêx Şemsedîn ne tenê ji aliyê şêxîtiya xwe lê di heman demê de ji aliyê şairtiya xwe jî kesayetekî muhîm e. Herçiqas derbarê wî de behsa hin berhemên telîf hatibin kirin jî lêbelê îro li ber destan tenê dîwançeyeke biçûk ji wî maye. Qutbê Exlatî di vê dîwançeya xwe de wek mexles navên *Xelwetî* û *Şemsî* bi kar anîne. Di dîwançeya Qutbê Exlatî de xala yekem a ku bala mirovan dikêşe serwaya hundirîn û ahenga helbestên wî ne. Wî di helbestên xwe de dubarekirina tîp, deng û kîteyan bi hostatî bi kar aniye û li gorî şairên hevdemê xwe di helbestê de helwesteke nû ceribandiye. Wê helwest û uslûba Xelwetî ya serkeftî nîşanî me dide ku wî çiqas giringî dabûbe helbestê, ewqas jî daye mûsîqaya wê. Lewma dikare bê gotin ku di şi‘rên Xelwetî de xala sereke ya ku balê dikêşe, aheng û armoniyeke xurt e.

Tê zanîn çar şaxên sereke di terîqeta Xelwetî de peyda bûne ku ew jî Cemaliye, Şemsiye, Rûşeniye û Ehmediye ne. Ji van şaxan jî hin milên din peyda bûne ku terîqeta Gulşeniye jî yek ji wan e (Yılmaz, 2015: 41). Nûnerên ewil ê terîqeta Gulşeniyeyê, Îbrahîm Gulşenî (kd. 1533) ye (Azamat, 2000: 301-304) ku bi qasî sedsal berê Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî jiyaye. Di nav terîqeta Xelwetiyan de bi taybetî Gulşenî giringî dane mûsîqayê û herweha di belavbûn û îcrakirina mûsîqaya dînî de bûne pêşeng (Adar, 2012: 25). Lewma li dor vê zanîn û agahiyan têkiliya Qutbê Exlatî û Gulşeniyan balê dikêşe ser xwe ku ew jî belkî rojekê dê bibe mijara lêkolîneke xweser.

### 2. *Kurtejiyana Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî*

Malbata Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî binemaleke ehlê tesewifê ye. Bapîrê wî yê mezin Seyîd Ehmedê Exlatî li Hemedanê ji dayîk bûye û li wir perwerdeya xwe ya dînî û tesewifî dîtiye, îcazeya terîqeta Suhrewerdiyeyê di sala 1283-84an de girtiye û li wir bûye yek ji şêxên herî pêş ê terîqeta Suhrewerdiyeyê. Ji ber xizmetên wî yên dînî navlêka “Muwahhîdê Xorasanê” li wî hatiye danîn. Seyîd Ehmed (kd. 1315) li ser hosiya bavê xwe, ji bo îrşada terîqeta Suhrewerdiyeyê berê xwe daye behra Wanê û li bajarê Xelatê bi cih bûye (Birîfkanî, 2011:

350). Di wê serdemê de Xelat bajarekî girêdayî mîrektiya Bedlîsê ye û di heman demê de ji bo gelek terîqetan bûye navend. Xelat, ji ber vê taybetiya xwe, di serdema navîn de bi nasnava “Qubbetu'l-Îslam” navdar bûye. Şeref Xanê Bedlîsê jî di *Şerefname*yê (2013: 387) de gava ku behsa vî bajarî dike dibêje ku ew der cihê alim, şêx, arif û weliyan e. Îhtimaleke mezin Seyîd Ehmed jî ji ber van sedeman bajarê Xelatê tercîh kiriye û li vî bajarî bûye niştecih.

Lêkoler Zahid Birîfkanî (2011: 27-32) di berhema xwe de ji Seyîd Ehmed heta Şêx Şemsedînê Exlatî silsileya terîqeta Suhrewerdiye û Kubrewiyeyê weha rêz kiriye: Zeynelabidin ‘Elî Hemedanî ez-Zordanî (kd. 1286), Ehmedê Exlatî (kd. 1315), Nîzameddîn Exlatî (kd. 1350), ‘Eliyê Exlatî (kd. 1379), Huseynê Exlatî (kd. 1405), Baba Mensûrê Exlatî (kd. 1445), Îshaqê Exlatî (kd. 1485), Ebdulxeniyê Exlatî (kd. 1519), Suleymanê Exlatî (kd. 1554), Mûsayê Exlatî (kd. 1586), Ebdulkerîmê Exlatî (kd. 1617), Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî (kd. 1674).

Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî kurê Seyîd ‘Ebdulkerîmê Exlatî ye ku di sala 1588an de li Xelatê hatiye dinê. Li gorî diyarkirina Yılmaz (2015: 31) li dora 1617-18an de Seyîd ‘Ebdulkerîmê Exlatî digel herdu kurên xwe Şemsedîn û Muhemed Emîn Qutbedîn ber bi Hekkariyê ve diçin û li devera Oremarê li gundê Birîvayê bi cih dibin ku hingê Şêx Şemsedîn nêzîkî 29-30 salî ye. Bav û birayê Şêx Şemsedîn, li vî gundî wefat dikin. Piştî çar-pênc salan, Şêx Şemsedîn û biraziyê wî Seyîd Sen‘an terka gundê Birîvayê dikin û bi eşîra [H]ertoşiyan re ber bi Amêdiyê ve koç dikin. Amêdiyê di wê serdemê de paytexta mîrektiya Behdinanê ye û li ser mîrektiyê jî Mîr Sidî Xan ê kurê Mîr Qubad Beg hukûmranî dike. Li ser daxwaza Mîr Sidî Xan, Şêx Şemsedîn li wê herêmê cihwar dibe û bi piştgiriya mîr li Birîfkanê medrese û tekya ava dike. Mîr Sidî Xan digel gundê Birîfkanê bi tevahî heft gundan weqfî medrese û tekyaya Şêx Şemsedîn dike. Qutbê Exlatî li wê deverê li ser usûlên Suhrewerdiye û Xelwetiyeyê îrşada terîqetê heta wefata xwe didomîne (Yılmaz 2015: 43-45). Dikare bê gotin ku Qutbê Exlatî di jiyana xwe de bi qasî 29-30 salan li Xelatê, 4-5 salan li Oremarê, 52 salan jî li gundê Birîfkanê buhurandiye û di 86 saliya xwe de anku di sala 1674an de li Birîfkanê bi emrê Xwedê kiriye (Birîfkanî, 2011: 138-139).

Piştî wefata Şêx Şemsedîn, karê tekya û medreseyê dikeve ser milê zarokên wî û bi vî şiklî bênavber bi qasî du sed salan didome. Di dema Şêx Nûreddînê Birîfkanî (1790-1851) de ev malbat întisaba terîqeta Qadirî dike û piştre jî di nîveka sedsala XIX-an de li ser Neqşibenditiyê dewam dike. Herçiqas malbata Exlatiyan di serî de li ser rêya Suhrewerdiyeyê dest pê kiribe jî li Xelatê bi awayekî derbasî terîqeta Xelwetiyeyê bûye. Lê ji ber kêmasiya çavkanî û kronîkên wê serdemê mirov nizane ka kengê û çawa bûne Xelwetî. Lê gava rewşa Xelatê li ber çavan bê girtin, bi hêsanî dikare bê gotin ku Xelat di wê serdemê de navenda gelek terîqetan bû û herweha ji aliyê cografyayê ve jî nêzîkî Şîrwanê bû ku danerê terîqeta Şêx Yehyayê Şîrwanî (kd. 1466) li wir bû (bnr. Şirvanî: 2014). Li dor van zanînan, dikare bê gotin ku ev malbat li Xelatê bûye Xelwetî û li ser wê rêkê jî demeke dirêj dewam kiriye.

Malbata Exlatiyan ji xeynî aliyê xwe yê tesewifî, ji aliyê edebiyata kurdî ya klasîk ve jî malbateke giring e. Ji ber ku bi qasî tê zanîn ji vê malbatê sê şair derketine û li dû xwe dîwan û keşkûl hiştine. Piştî Qutbê Exlatî em dikarin ji vê malbatê wek şair jî navê Şêx Nûreddînê Birîfkanî û Şêx Memdûhê Birîfkanî (kd. 1976) bihejmêrin (Aykaç, 2017).

### 3. *Qesîdeya “Çelebî” ji aliyê Rûxsarê ve*

Ev şi‘ra Şêx Şemsedîn hin taybetiyên xezelan di xwe de bihewîne jî qesîde ye. Şair ev qesîde bi behra hezec di wezna “mef‘ûlu mefa‘îlun mef‘ûlu mefa‘îlun” de nivîsiye. Di her beytê

de serî li serwaya hundirîn daye ku ji vî aliyê ve ev şi‘r qesîdeyeke musemmet e. Serwaya hundirîn ji aliyê deng û ahengê ve mûsîqaya vê qesîdeyê bilindtir kiriye. Tekrarkirina deng, kîte û peyvan armoniyeke cuda daye şi‘rê ku taybetiya herî berbiçav jî ev e. Çawa ku di nesrê de ahenga peyvan hebe, bi heman rengî di şi‘rê de jî ahenga risteyan heye. Hişê mirov gava ku li nesrê dinêre li ser wateyê zîq dibe; lê di şi‘rê de hem li wateyê hem jî aheng û armoniyê hûr dibe (Kedkenî, 1386: 65). Ji ber vê yekê bi hêsanî dikare bê gotin ku Qutbê Exlatî di vehûnandina qesîdeyê de li ser herdu xalan rawestiyaye. Lewma jî di xezel û qesîdeyên dîwançeya wî de dengên ku ji zikr û wirdan hatine girtinê yên wekî “hû” “hey” “ya” “la” û hwd zêde ne.

Şair ji bo vê qesîdeyê paşserwayeke dirêj peyda kiriye ku ew jî “qum qum çelebî qum qum” e. Ji helbestên bi vî rengî re di edebiyata klasîk de *xezel/qesîdeya tercî‘* hatiye gotin ku paşserwaya wan li gorî paşserwayên edetî dirêjtir in (Şemîsa, 1375: 216). Çawa ku di vê qesîdeya Şêx Şemsedîn de ev taybetî tê dîtin, di esasê xwe de di hin qesîde û xezelên wî de jî ev taybetî wek uslûba sereke ya şair xwe daye der. Lewma em dikarin bibêjin ku xusûsiyeteke uslûba Şêx Şemsedîn ew e ku di şi‘rên xwe de gelek caran paşserwayên dirêj bi kar anîne wekî “ten tel e lat la la”, “tenenaha ya hû”, “kerê min parê mir”, “ez dibêjim ji derdê ‘işq”, “wey ku bibêm wey ku nebêm”, “ten im tenê we ten tenê”. Gelek mînakên xezel/qesîdeya tercî‘ di edebiyata kurdî ya klasîk de hene. Bo nimûne beyta Rûhî, mînakeke bi vî rengî ye ji bo qesîdeya musemmat û tesrî‘ê:

*Ey dil sebir ke ber firaq es-sebru miftahu'l-ferec*
*Çendî bikêşî îhtiraq es-sebru miftahu'l-ferec*

*Ger bêkes û bêçare yî dûr ez hebîb awareyî*
*Wer der serê kuhsare yî es-sebru miftahu'l-ferec* (Axtepî, 2002: 26)

### 3.1. Hin Taybetiyên Devoka Xelatê

Ji bilî uslûb û aliyê rûxsarî ya qesîdeyê, devoka Şêx Şemsedîn jî balê dikêşe ku ew jî di navdêr û lêkeran de li gorî devoka standart guherîna dengê “d”yê ber bi “t”yê ye. Çawa ku tê zanîn Şêx Şemsedîn ji Xelatê ye û heta sîh saliya xwe li wir maye. Ev taybetiya han a devoka Şêx Şemsedîn li gundên Xelat û Tetwanê hê jî berdeman e û wekî allofona fonema “d”yê di hin lêkeran de li kar e. Gelek caran tê dîtin ku şair di vê qesîdeyê de jî bi devoka xwe hin lêker û navdêran yên wekî “tikim, tiçim, ti, tibit, tirijin” bi lêv kirine. Herweha hokera demê, “par” jî li wê deverê wek “parê” tê gotin ku îro hê jî wisa ye.[1]

### 3.2. Nezîreyek li ser “Çelebî”: “Hey hey cebelî qum qum”

Qutbê Exlatî hem ji aliyê tesewifê û hem jî ji aliyê edebî bandorekê li ser şair û arifên li dû xwe kiriye. Wek mînak şair û mutesewifê Îranî, Nûr ‘Elîşahê Îsfehanî (kd. 1797) jî yek ji wan e. Nûr ‘Elîşah di sedsala XVIII-an de hatiye hêla Mûsilê û demeke dirêj li wê herêmê maye. Nûr ‘Elîşahê Îsfehanî ji terîqeta Xaksariyê ye û yek ji çar şaxên wê terîqetê bi wî ve hatiye nîsbetkirin. Li nav kurdan, nemaze li nav kurdên Yarsan, terefgîrên wê terîqeta heterodoksî çêbûne (Omarkhali, 2014: 32). Xala balkêş ew e ku Nûr ‘Elîşah bi heman redîf û

[1] Em spasiyên xwe pêşkêşî mamosta Zafer Açar dikin ji bo van tesbît û agahiyên derbarê devoka Xelat û derdora wê de bi me re par vekirin.

weznê nezîreyeke li ser qesîdeya Şêx Şemsedîn nivîsiye. Tê zanîn ku Nûr ‘Elîşah bi salan li Mûsilê maye û li wir jî wefat kiriye. Birîfkan jî di nav herêma Mûsilê de dihat hisabê û nêzîkî bajarê Mûsilê bû. Îhtimal ew e ku gava Nûr ‘Elîşah hatiye herêma Mûsilê li Birîfkanê jî maye û bi awayekî ji awayan çavê wî li berhemên Qutbê Exlatî ketine. Nûr ‘Elîşah di qesîdeya xwe de li şûna “çelebî” gotiye “cebelî” ku bi wateya *çiyayî* ye. Di qesîdeya wî ya irfanî de miraz ji mezmûna *çiyayî*, Mûsa pêxember e ku li çiyayê Tûrê ji bo temaşakirina nûra Heq Teala sekinîbû. Qesîdeya Nûr ‘Elîşahê Îsfehanî (Îsfehanî, 1374: 81-82) weha ye:

ما ابر گهر باریم هی هی جبلی قم قم    ما قلزم ز خاریم هی هی جبلی قم قم
گر نور خداجوئی بیهوده چه می پوئی    ما مشرق انواریم هی هی جبلی قم قم
اسرار نهانی را گر فاش و عیان خواهی    ما مخزن اسراریم هی هی جبلی قم قم
این روز تو همچون شب گر تیره و تاریکست    ما شمع شب تاریم هی هی جبلی قم قم
با قافله وحدت گر زانکه سری داریم    ما قافله سالاریم هی هی جبلی قم قم
ما رند قدح نوشیم از نام و نشان رسته    در میکده خماریم هی هی جبلی قم قم
در روز ازل با حق چون قول بلی گفتیم    ما بر سر اقراریم هی هی جبلی قم قم
با جنت و با دوزخ ما را نبود کاری    ما طالب دیداریم هی هی جبلی قم قم
ما باقی باللهیم فانی ز خودی خود    منصور سر داریم هی هی جبلی قم قم
در اول و در آخر در ظاهر و در باطن    ما پرتو دلداریم هی هی جبلی قم قم
در طور لوای حق رب ارنی گویان    مستغرق دیداریم هی هی جبلی قم قم
ای زاهد افسرده رو طعنه مزن ما را    ما آه شرربااریم هی هی جبلی قم قم
در میکده وحدت چون نور علی دایم    مست می جباریم هی هی جبلی قم قم[2]

### 4. *Têgeha “Çelebî” ji aliyê Wate, Dîrok û Tesewifê ve*

Di ferhengên tirkî de hatiye diyarkirin ku *çelebî* ji peyva *çalab* hatiye dariştin ku wateyên wek *me‘bûd* û *reb* di xwe de dihewîne. Şemseddin Sami (1317: 514) jî diyar kiriye ku ev peyv ji herifandina çelîpa (چلیپا)yê ye ku di zimanê suryanî de bi wateya xaçê ye û li Asyaya navîn bi têkiliya suryanan derbasî zimanê tirkî û moxolî bûye. Lê di zimanê suryanî de *xaç* “silîba” ye û ji peyva “silāb” (ܨܠܒ)ê hatiye dariştin ku ev jî bi wateya *xaçkirin, bi çarmîxê ve dardakirin, pîrozkirin* û *teqdîskirin* e lê bi wateyên wek *efendî, xwedî, îlah* û *reb* de dikare bê gotin (Bulut, 1996: 163). Şairê derwêş Yûnis Emre (kd. 1328) yek ji wan kesan e ku di dîrokê de peyva *çalab* di helbestên xwe de bi kar aniye. Wî li beyta jêrê xwe spartiye van herdu hedîsan ku Resûlê Ekrem weha ferman dike “أَنا عِنْد المنكسرة قُلُوبهم من أَجلي” (Ez di dilên [kesên ji bo min] xemgîn

[2] “Em wekî ‘ewrên durr-bar in, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Em [deryayên] qulzûm in ku ji zinaran difûrin, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Ger li pey nûra Xwedê bî çima wisa berhewa digerî? Em meşrîqa nûran in, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! [Ger] razên nepen bi rengê veşartî û vekirî bixwezî tu, em mehzena sirr û razan in, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Roja te wekî şevê bûye reş û tarî, em mûma şevên tarî ne, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Bi qafileya wehdetê ger hebe sirr û razeke me [bizan ku] em serekê qafileyê ne, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Em ew rind in ku qedehê rakirine serê xwe, dev ji nav û nîşanê berdane, sermestên meyxanê ne, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Me di roja elestê de soz dabû Xwedê ku hingê me got belê! Em hê jî li ser soza xwe ne, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Ti karê me bi buhişt û dojehê re tuneye, em talibê dîdar in, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Em ew fanî ne ku ji xwe ve çûne û di Xwedê de bûne baqî, em Hellacê li ser sêpê ne, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Di ezel û axir de, di batin û zahir de em nûra dildar in, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Li çiyayê Tûrê bi ala Heq û bi zikrê *Rebbî-ernî* (E‘raf/143) em di [nav] dîdarê de xeniqîne, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Ey zahidê reng-çilmisî, lomeyan li me meke! Em ku pêt û pirûskên êgir in, hey hey çiyayî [de] rabe rabe! Li pêş derê meyxaneya wehdetê wekî *Nûr ‘Elî* hertim, em ku bi meya Cebbar mest ketine, hey hey çiyayî [de] rabe rabe!”.

de me) û "القلوب بيت الرب" (Dil cihê Xwedê ye). Beyta Yûnis Emre weha ye ku peyva çalab di vir de bi wateya Xwedê ye:

*Gönül Çalab'ın tahtı, gönüle Çalap baktı*
*İki cihan bedbahtı kim gönül yıkar ise*[3] (Tatcı, 2013: 243)

Li gorî hin rîwayetan ev peyv ji yûnanî ye û bi wateya *dostê Xwedê, merivê Xwedê* û *hezkiriyê Xwedê* ye (Subhanî, 1388: 81). Basil Nikitin jî di vê nîqaşê de xwe spartiye oryantalîstên rûs û diyar kiriye ku ev jî tê wateyên wek *reb*, *xwedê* û tiştên ku bi xwedê re têkildar in, herweha wateya *îlah* û *yezdan* jî di xwe de digire ku piştre qertafa nîsbetê ya "î"yê girtiye dawiya xwe, ji lew, wek "çelebî" li cografyaya musilmanan hatiye bilêvkirin. Li ser van şiroveyan, Nikitin li navbera çelebî û Êzidiyan têkiliyek daniye û gotiye ku herçiqas li nav tirkan wateya wê *derwêş* be jî li nav kurdan digel heman wateyê, maneya *kesên gerok û sazbend* jî lê zêde bûye. Vê têkiliya ku Nikitin tesbît kiriye, pireke giring di navbera Êzidîtî û derwêşiyê de daniye. Li gorî wî, peyva *çelebî* dibe ku ji çelb (چلب)a farisî jî hatibe dariştin ku wê demê tê wateya *dengderxistin, bi amûrên dengî derxistina dengên wekî repetep û teqereqan* yan jî *çepiklêdanê* (Tebrizî, 1342: 2/581). Mirov dikare vê yekê ji aliyê wateyê ve bi wan derwêşan girêbide ku def û tembûr li dest in û kolan bi kolan, gund bi gund digerin (Nikitine, 2008: 428-432). Ji bilî van, di madeya "Çelebî" ya *Ansîklopediya Îslamê ya MEB*ê de jî hatiye diyarkirin ku li gorî gelek pisporan jî bêjeya *çelebî* bi kurdî ye. (Bnr. Barthold, 1987: 370).

Divê bê gotin ku di dîrokê de ev peyv di wateyên wek *axa, beg, xwedî, efendî* û *mewla* de jî hatiye bikaranîn (Samî, 1317: 515). Nemaze ji sedsala XV-an heta sedsala XVIII-an di burokrasiya Osmaniyan de ji bo çîna bilind a nêzîkî serayê, çîna ilmiyeyê, çîna qelemiyeyê, şairên dîwanê, katibên Dîwana Humayûn û gelek kesên xwende û alim, û heta hin kesên xeyrî-muslîm jî peyva *çelebî* wek unwan û navlêk li ber navê xwe danîne (Gökbel, 2019: 183). Di terîqeta Mewlewiyan de jî ji bo kesên postnişîn ev peyv wek unwan li wan hatiye danîn ku cara ewil li nav terîqeta Mewlewiyan de miqamê çelebîtiyê berbelav bûye (Tanrıkorur, 2004: 468-475). Li gorî diyarkirina Nikitin, di çanda Bektaşiyan de ev îfade ji wateya xwe derketiye û hin maneyên batinî jî di xwe de girtine. Bi rastî jî gelek derwêşên ku ji aliyê nijadê ve xwe spartine Hecî Bektaşê Welî (kd. 1271?), bûne pîrê terîqetê û li post rûniştine, ew jî gelek caran wek *Çelebî* yan jî *Babagan* hatine gazîkirin. Dîsa di hin şaxê Bektaşiyan de ji wî kesî ku rêvebiriya tekya û dergahan dikir, karûbarên li wan deran dida meşandinê jî navê *çelebî* girtiye. Helbet gava ku pîrê terîqetê hêjayî vê unwanê, miqamê *çelebîtî* yan jî *çelebîbûnê* bihata dîtin, wê demê bi merasîm û rêûresmên şikodar dihatin pîrozkirin (Gökbel, 2019: 183). Xasma di edet û keleporên Bektaşiyan de tê dîtin ku wateya çelebî wekî *qelender, 'ebdal* an jî *wefayî* di heman wateyê de tê bikaranîn. Çawa tê zanîn ku hin şêx û sofiyên wek Tacu'l-'Arifîn Şêx Ebu'l-Wefa (kd. 1107) û Baba Sultan [Geyikli Baba] demekê wekî derwêşên gerok jiyane, li gelek cih û deveran geriyane (Karakaya-Stump, 2016: 200-201). Li gorî hin lêkoleran jî sofiyên wekî Baba Tahirê 'Uryan (kd. 1055?), Fexredînê 'Iraqî (kd. 1289), Şemsê Tebrîzî (kd. 1247) jî derwêşên *qelenderî* û *wefayî* bûn, ji ber vê yekê meyla 'ebdalî û mûsîqayê kirine. Li dor van agahiyên heyî û li gorî tesbîtên Nikitin, *çelebî* bi awayekî eşkere tê wateya *derwêşên gerok*. Herweha

---

[3] "Dil textê Xwedê ye, [çunkî] Xwedê li wî nihêriye, kê ku dil[ê yekî] bihêle li herdu dunyayan jî malik wêran dibe."

mirov dikare bibêje ku îhtimaleke mezin *çelebîbûn* an jî *çelebîtî* di navbera qelenderî, ‘ebdalî û wefayîtî de cih digire ku taybetiyên hevpar di wan de peyda dibin.

### 5. *Dahûrînên Qesîdeya “Çelebî”*

**Beyt 1**.

جـــار جـار كه تبت شب شب هى هى چلبى قم قم
خوش خـوش تبم از حب حب هى هى چلبى قم قم

*Car car ki tibit şeb şeb hey hey çelebî qum qum*
*Xweş xweş tibim ez heb heb hey hey çelebî qum qum*

**Ki**: Ku. **Tibit**: Dibit, dibe, çêdibe. **Şeb**: Şev. **Hey hey**: Dengê banglêkirin an jî gazîkirinê, dengê hişyarkirinê. **Çelebî**: Derwêşê gerok ên ku gelek caran bi amûreke mûzîkê qesîdeyan dixwînin; qesîdebêj. **Qum**: Rabe, rabûn. **Tibim**: Dibim. **Heb**: Lib, heb, edet, dane; libên tizbiyê. **Xweş**: Rind, bedew, delal; baş, çê; lez, ecele, lezkirin, ecelekirin.

**Şirove**: Şair di vê qesîdeyê de unwana “çelebî” di wateyên “ey sofî, sofiyo, zatê muhterem, mibarek” gotiye ku muxataba wî dîsa bixwe ye. Lewma dikare bê gotin ku şair di vir de bangî xwe kiriye û bi alîkariya hunerên alîterasyonê aheng û mûsîqaya qesîdeyê xurttir kiriye. Bi rastî jî deng û peyvên wek *car car, şeb şeb, hey hey, qum qum, xweş weş, heb heb* armoniya qesîdeyê dewlemendtir kiriye. Şair van tekrara deng û peyvan wek hêmayan bi kar anîne ku deng û mûzîkên derwêşên gerok têne guhê mirov. Herweha şair deng û peyvên wisa dubare kirine ku ew dikarin mirovan di tarîtiya şevê de ji “xewa xefletê” hişyar bikin. Lewma şair di vê beytê de bangî xwe kiriye û herwekî gotiye “Hişyar be sofiyo!”. Helbet ji vê hişyarbûnê miraz çawa ku di ayetê kerîmeyê de jî ﴿قُمِ الَّيْلَ اِلَّا قَلِيلاًۙ﴾ hatiye gotin, ew ê “*nîvê şevê hişyar be*” û bi zikr û îbadetê re mijûl bibe (Mumezzil, 2). Wekî ku tê zanîn di tesewufê de yek ji nîşaneyên herî giring ên teqwa û zuhdê ew e ku îbadeta şevê, nimêja teheccudê û mijûlahiya bi zikr û wirdan e di nîvê şevê de. Bi rastî jî di gelek ayetên Qur'anê de li ser vê meselê ji Resûlê Ekrem re ferman hatiye dayîn ku yek ji wan weha ye:

﴿وَكَمْ اَهْلَكْنَا مِنَ الْقُرُونِ مِنْ بَعْدِ نُوحٍۜ وَكَفٰى بِرَبِّكَ بِذُنُوبِ عِبَادِه۪ خَب۪يراً بَص۪يرا﴾ “*Hinek ji şevê rabe bi Qur'anê nimêj bike ku ev zêdeyî (nimêjên ferz) xasê bi te ye. Da ku Xwedayê te, bi wê nimêjê te bişîne miqamê pesindayî (ku ew jî miqamê şefaeta mezin e).*” (‘Isra, 79). Îbadet û nimêja şevê baştirîn dem e ji bo salik an jî sofiyan ku bi Rebbê xwe re xelwetê bikin. Ji vê re *terîqê xelwet* tê gotin ku salik dikare bikeve nav ponijîn û tefekurekê û dîsa dikare ezma axaftinê bike bi Rebbê xwe re. Ji ber vê yekê şair di metle‘a qesîdeyê de niyeta xwe eşkere kiriye û aniye zimên ku divê ew wek sofiyekî Xelwetî bi Rebbê xwe re xelwetê bike. Şair dema ku vê yekê kiriye, mecazen dengên tekrarkirî wisa bi kar anîne ku wan dengan ew ji xewa xefletê hişyar kiriye.

Li ba Xelwetiyan seyrê sulûk bi wan heft navan tên kirin ku bi rêzê weha ne: *Laîlahe îllallah, Ellah, Hû, Heq, Heyy, Qeyyûm* û *Qehhar*. Sofî û salikên Xelwetî di zikrên xwe de li ser usûla *zikrê cehrî* diçin. Piştî zikrê xwe li *dewran*ê disekinin, anku piştî demekê zikir li ser pêyan dewam dike. Ji ber vê yekê ji îfadeyên şair yên wekî “qum qum” anku “rabe rabe” dikare ji bo vê yekê bê şirovekirin ku miraz jê “rabe li ser pêyan û li dewranê bisekine” ye. Di encama têkilhevbûna zikr û mûzîqê de sofî, ji aliyê rûhî ve kêfeke menewî jê digirin. Gava ku dengê mûzîkê li dîwanê deng dide herçiqas sofî li erdê di halê zikrê de bin jî manen li alema jorîn in.

Lewma ew herdu hebûn/mewcûdat di esnayê zikir de tim bandor li hev dikin û seyra xwe didomînin ku ji vî aliyê ve sûdwergirtina ji deng û mûzîkan bo Xelwetiyan giring e. Xelwetî li ser usûla *zikrê cehrî* diçin ku ji bo wan armanca mûzîkê, bilindbûneke menewî ye. Çunkî li gorî wan, zikir ne tenê bi zimên lê herweha bi ziman, giyan û dil ve tê kirin. Digel vê yekê, li cem Xelwetiyan herçiqas zikir bi civatî/tevahî bê kirin jî, zikrê bi ferdî/takekesî jî ewqas giring e (Çetin, 2017:189). Şair di vê beytê de gava bangî xwe dike û nîvê şevê xwe ji xewa xefletê hişyar dike, helbet ji bo zikrê takekesî ye. Jixwe di beytê de "heb heb" derbas dibe ku ew ji tizbiyê kînaye ye. Helbet miraz ji tizbiyê jî yadkirin û bibîranîna Xwedê ye ku ew jî zikr e. Di Qur'anê de gelek ayetên wekî "Ew bi şev Xwedê tînin bîra xwe" hene ku yek ji wan jî weha ye: ﴿فَسَبِّحْ بِحَمْدِ رَبِّكَ وَكُنْ مِنَ السَّاجِدِينَ﴾ "*Nexwe tu digel hemd û senayê, Xwedayê xwe pak bidêre û bibe ji secdekeran!*" (Hicr, 98). Peyva "heb" [حب] di heman demê de dikare wek "hub" jî bê xwendin ku wê demê wateya *muhebbetullah*ê anku hezkirina Xwedê dide. Di tesewifê de wateyeke din jî heye û ew jî terkkirina wesfên xwe ye li hember Xwedê, ku ew jî bingeha tesewifê ye (Uludağ, 2016: 232).

Di hemû beytan de hunera tekrîrê heye. Şair ji ilmê bedî'ê serî li hunerên lefzî dane û bi vê usûlê wateyên nû dane wan dengan ku ji vê yekê re di edebiyatê de newaya herf û dengan jî tê gotin. Ev hunerên lefzî û newaya dengan, musîqaya helbestê zêde dike. Di beytê de dubarekirina paşserwa ya "hey hey çelebî qum qum" ji ilmê bedî'ê taybetiyek e *luzumu mala yulzem* yan jî *îltizam* e ku şairên mutesewif gelek caran serî bi vê yekê daye. Mewlana Celaledînê Romî (kd. 1207) jî yek ji wan şairên mutesewif e ku wî di *Dîwana Kebîr* de gelek caran serî li hunera alîterasyon an jî tekrara dengan daye ku bi xêra van, newa û mûsîqaya beytan bilindtir kiriye (Romî, 1338: 131):

**ای جان جان جان جان ما نامدیم از بـــــهر نان**
**برجه گداروپی مکن در بزم سلطان ســــاقیـا**

*"Ey canê canê canê canê me, [bizane ku] em ji bo kerekî nên nehatine [li ber deriyê te]. Saqiyo! Belaheq wisa bi parsekiyê xwe li sifreya Xwedê danene."*

Ji bilî Mewlana, hunerên alîterasyon û tekrara dengan di edebiyata kurdî ya klasîk de jî gelek cih digire. Bo nimûne ji neviyên Qutbê Exlatî, şêxê tekya Birîfkanê, Şêx Nûredîn jî bi heman rengî şi'rek nivîsiye ku beyta metle'a wê weha ye (Birîfkanî, 2004: 39):

*Gehî îns im gehî cînn im gehî 'aqil gehî şeyda*
*Gehî der xelwexan im gehî dêr im gehî beyda*

Nemaze di qisma îbtidaya beyte de peyva "xweş xweş" [خوش خوش] dikare wek "xwiş xwiş" jî bê xwendin ku wê demê wateya dengê tizbiyan dide. Hingê dikare bê gotin sofî tizbiyê hildaye destê xwe û yek bi yek dikişîne ku ew jî delîla hişyarbûna wî ye ji xewa xefletê. Di heman demê de dubarekirina peyva "xweş" wateya lezkirin û ecelekirinê dide ku wê demê şair, wek îfadeyeke hişyarkirinê ev bi kar aniye û bi vê yekê xwestiye bibêje ku zûka dest bi zikrê bike.

**Hunerên Edebî**: Hunerên onomatopoeia û alîterasyon bi tekrara deng û herfan derketiye holê. Serwaya hundirîn di beytê de heye. *Çelebî* îstîare ye ji şair. Secî di navbera *şeb* û *heb* de peyda bûye. Bi *qum*ê ji ayetên jorê re telmîh çêbûye. Ji ber ku *qum* di heman demê de dewranê

tîne hişê mirov, lewma îhamê tebadur heye. *Hey hey*, dengê banglêkirinê ye, lewma nîda çêbûye. Dengên wek *heb heb* û *xweş xweş* di heman demê de dikarin wek *hub hub* û *xwiş xwiş* jî bên xwendin, lewma îham di van peyvan de peyda bûye. Zikrê cuz îradeyê kul di peyva *heb*ê de heye ku miraz jê hebên moriyên tizbiyê ne. Herweha tizbî jî bi mecazî zikrê Xwedê ye. Tenasub di navbera *car car* û *heb heb* de ji aliyê hejmartin û lib/heb/edetê ve heye.

**Beyt 2**.

سوتم ژ غمی مو مو تا چندی بچم سو سو
ای دوست وره زو زو هی هی چلبی قم قم

*Sotim ji xemê mû mû ta çendî biçim sû sû*
*Ey dost(i) were zû zû hey hey çelebî qum qum*

**Sotim**: Sotin, şewitîn. **Xem**: Keser, keder, kovan, kerb. **Mû**: Pirç; ta, bend; jar, zeîf, hejar, laxer; parçe parçe, ker kerî. **Sû**: Hêl, alî, ber, teref.

**Şirove**: Şair di vê beytê de bangî yarê kiriye û gazindeyên xwe yên ji ber dûrketina wê aniye zimên. Wê dûrketin û cudabûnê êş û janeke mezin daye şairê aşiq, ji ber vê yekê muzdarîb bûye û ji hal ketiye. Şair gava ku vî halê xwe teswîr kiriye, xwe wekî tayekî zirav dîtiye û di nav agirê işqê de sotina xwe îfade kiriye. Wî li hember şewata işqê, xwe her wekî pirçekî ku agir pêketî teswîr kiriye, û diyar kiriye ku geh ber bi wî alî gah ber bi vî alî ve diçe û tê ku ew jî gava salik Rebbê xwe digere bi awayekî ji awayan halê wî yê *muheyyer* resm dike.

Di tesewifê de mebest ji *dost*, yara îlahî ye ku ew jî Xwedê ye. Salik ji bo ku bigihîje heqîqetê tim di nav lêgerîn û seyrê de ye. Yek ji miqamê vê seyrê, miqamê muheyyer e. Li gorî pênasekirina Ferîduddînê ‘Ettar, miqamê *muheyyer* miqamekî berî *fena*yê (tunebûna di nav işqa îlahî de) ye. Bi rastî ‘Ettar (Kedkenî, 1387: 407) di *Mentiqu't-Teyr* de weha miqamê *heyret*ê formulîze kiriye:

بعد ازین وادی حیرت آیدت    کار دایم درد و حسرت آیدت
هر نفس اینجا چو تیغی باشدت    هر دمی اینجا دریغی باشدت
آه باشد، درد باشد، سوز هم    روز و شب باشد، نه شب نه روز هم
ازبن هر موی این کس نه به تیغ    میچکد خون مینگارد ای دریغ
آتشی باشد فسرده مرد این    یا یخی بس سوخته از درد این
مرد حیران چون رسد این جایگاه    در تحیر مانده و گم کرده راه
هرچه زد توحید بر جانش رقم    جمله گم گردد از و گم نیز هم[4]

Lewma şair di vê beytê de muheyyerbûn û sotina xwe ya di vî miqamî de aniye zimên û ji ber vê yekê jî ber bi her aliyê ve bezîna xwe îfade kiriye. Li gorî salik û sofiyan her rêyek derdikeve ber yara îlahî. Çawa ku di ayetê kerîmeyê de jî dibêje ﴿فَأَيْنَمَا تُوَلُّوا فَثَمَّ وَجْهُ اللَّهِ﴾ “*Çi cihê*

[4] “Piştî vê yekê deşta heyretê tê. Li vê deştê kar tim dibe hesret û derd. Di vî miqamî de her nefesek wekî xencerê ye. Her nefesek di vî miqamî de gazî û hewar û poşmanî ye; ax e, derd e, sotin e; hem şev e hem roj, ne şev dimîne ne jî roj. Pirçê [bedena] yekî di vî miqamî de ne bi gûzanê lê bi hewar û gazinan xwîn[a xwe] dirijîne. Ev miqam agirekî wisa ye ku kesê di wî de bişewite dibe qijik; herweha agirekî sikûsar e, yan jî parçeyekî cemedê ye ku bi vî derdî hatiye sotin. Yekî heyranbûyî gava bikeve vê deştê dikeve heyretan, şaş û metel dimîne, rêya xwe wenda dike. Derbarê wî de her çi hatibe nivîsîn li deşta tewhîdê wenda dibe, heta wendabûn jî [li wir] wenda dibe.”.

*hûn berê xwe bidinê Xwedê Teala li wê ye.*” (Beqere, 15). Bi rastî jî di terîqetê de gava bêhna salik an jî sofiyekî teng bibe û bikeve tengasiyê ji bo ku ji vê rewşê xwe xilas bike dibêje *ya dost* an jî *ya heq*. Ev nîda yan jî gazîkirin ji ayetên wekî ﴿وَكَفٰى بِاللّٰهِ وَلِيًّاۘ﴾ “*Xwedê bi dost û piştevanî besî we ye*” (Nîsa, 45) û ﴿اَللّٰهُ بِكَافٍ عَبْدَهُۜ﴾ “*Erê ma Xwedê ne besî bendeyê xwe ye?*” (Zumer, 36) mulhem in ku di terîqetan de ji bo sofiyan hatiye gotin ku bi Xwedê re xelwetê bikin. Ji ber vê yekê di beytê de şair ji bo ku tenêtiya xwe dane alîyekî û bibe hemhal, bi fermana maşûqa heqîqî ku dibêje ﴿اُدْعُونٖٓي اَسْتَجِبْ لَكُمْۜ﴾ “*Hûn hêvî û dua ji min bikin, ez ê jî bersiva we bidim*” (Xafir, 60) gazî yara îlahî dike. Şair gava bangî yara îlahî dike, li aliyê din ve jî halê xwe yê perîşan û bedena xwe ya jar û lawaz, bi ziraviya tayê re daye ber hev. Ji ber îfadeyên *sotin, xem* û *mû* mirov dikare wê şewatê bişibîne mûmê. Çunkî mûmek gava dişewite tenê bendika di orta wê de dimîne ku şair, lawazbûna xwe bi vê bendika ziravok re muqayese kiriye. Îfadeya *mû mû* dikare wek parçe parçe jî bê fêmkirin ku hingê dikare bê gotin, şair ji ber êş û derdan wekî mûmê parçe parçe, nuqit bi nuqit helîna xwe der biriye û bi gotina *ya dost* yan jî *ya heq* xwestiye ku hewara xwe bigihîne Rebbê xwe.

**Hunerên Edebî**: *Dost* bi mecazî Xwedê ye. Secî di navbera *sû*, *mû* û *zû* de peyda bûye. *Ji xemê sotin*, gotineke biwêjî ye. Di vê beytê de jî alîterasyon û tekrara dengan heye. Telmîh ji ayetên jorê re çêbûye. Peyva *mû* gava bi sotinê re tê xwendin hingê mûm/find tê hişê mirov ku wê demê îhamê tebadur peyda dibe. Nîda di îfadeya *ey dost* de heye.

**Beyt 3**.

محبوب که ڤهات خه خه ت دلم کر ها ره ره
دیسـان خوشم از وه وه هی هی چلبی قم قم

*Meḥbûb ki vehat xeh xeh ti dil im kir ha reh reh*
*Dîsan xweş im ez weh weh hey hey çelebî qum qum*

**Mehbûb**: Evîndar, yar, dilber, maşûq; Heq, Xwedê. **Vehat**: Hat, hatin; gihîştin, weslet. **Xeh**: Dengê şaş û metelmayînê ye, wekî dengê wax waxê. **Ti**: Di, daçeka têdebûnê. **Reh**: Rê; terîqet.

**Şirove**: Şair îfade kiriye ku ji ber ‘ubûdiyetê careke din bi dîtina yara mutleq dê kêfxweş bibe. Çawa ku ji beytê diyar dibe, şair bi muhebbeteke eslî li mehbûba xwe nihêriye û herweha ne ji bo tiştekî din, bes ji ber evîna li hember zatê wî, hezkirina xwe eşkere kiriye. Li dor vê hezkirinê bal kêşaye li ser daxwaza xwe ya gihîştina yarê û zehmetiya wê. Ji ber ku vê hezkirina gihîştina yarê dilê şair ker kerî kiriye, lê li gorî şairê aşiq kêşana ewqas êş û ezyet ji bo gihîştina yarê li dawiyê ber ketiye. Çunkî hişyarbûna nîvê şevê û bi zikrê Xwedê re mijûlbûn di heman demê de ji bo şair cureyekî gihîştina yarê ye. Li gorî şair dîtina yarê û bi wê re hemhalbûn gelek muhîm e. Bi vî şiklî şair hemû êş û ezyetên xwe ji bîr dike û cardin dilê wî xweş dibe.

Di qisma sedra beytê de peyvên *mehbûb* [muhebbet] û *reh* [terîq(et)] gava ku bên cem hev hingê hizr û ramana *terîqê muhebbet* pêk tê. Terîqê muhebbet di tesewifê de şiklekî *terîqê şuttar* e ku xwe dispêre işq û muhebet û cibeyê. Salik di vê rêyê de dixwaze ku qalikê xwe yê beşeriyetê bi agirê işq û cizbeyê bişewitîne. Di vê rê(ya terîqê şuttar) de gelek qayde hene ku yek ji wan jî bi ketina xelwetê û dewamkirina zikrê re salik berê xwe dide Rebbê xwe (Aynî,

1992: 235) ku şair li jorê hêviya vê yekê kiriye. Şair di beytê de diyar kiriye ku ji ber derdê evînê dilê wî pirt pirtî bûye. Helbet gotinên bi vî rengî beyteke *Neyname*ya Mewlana tîne hişê mirov ku weha ye (Muwehhîd, 1396: I/3):

**سینه خواهم شرحه شرحه از فراق تا بگویم شرح درد اشتیاق**[5]

Gelek rê û terîqet di tesewifê de hene ku mirovan digihînin Heq Teala û hejmara wan jî bi qasî henaseya mexlûqatan in. Şair di vê beytê de bi awayekî nepen aniye zimên ku ji bo gihîştina Xwedê gelek rê hene. Ev nêrîn jî di vê ayetê kerîmeyê de weha hatiye diyarkirin ﴿وَالسَّمَٓاءِ ذَاتِ الْحُبُكِۙ﴾ "*Sond bi asîmanê xwedan rêk*..." (Zariyat, 7).

**Hunerên Edebî**:

*Mehbûb* kînaye ye ji yara îlahî. *Xeh xeh* û *weh weh* îfadeyên heyirîn û şaşmayînê ne. Secî di navbera *xeh*, *reh* û *weh* de heye. Mebest ji *reh reh*ê ker kerî, pirtî pirtîbûn[a dilê aşiq] e ku wateya êş, jan, derd û elemê jî dide. Dîsa bi vê îfadeyê ji beyta Mewlana re îradê mesel çêbûye. Îham di îfadeya *ti* de heye, herçiqas li beytê wek bazinedaçeka têdebûnê (di…de) hatibe gotin jî lê di heman demê de dikare wek kesê yekjimar ê duyem, anku wek *tu* jî bê xwendin. Peyva xweş di nusxeya Şêx Memdûh de wek *xîş* hatiye nivîsîn. Ger wisa be, ev peyv tê wateya *hûr, hûrbûn*ê ku dîsa tenasubê bi wateya giştî ya beytê re saz dike.

**Beyt 4**.

**هون لیم نگرن زق زق ییک جار بویم شق شق**
**حق مـــــــایه تنئ حق حق هی هی چلبی قم قم**

*Hûn lêm negirin zeq zeq yêk car(i) bûyim şeq şeq*
*Ḥeq maye tenê ḥeq ḥeq hey hey çelebî qum qum*

**Lêm**: Li min. **Zeq**: Kurtkirina peyva *zewq*ê ye; (di vir de bi dubarekirina peyvê wateyeke weha jî derketiye) lome, lomekirin. **Negirin zeq zeq**: Lomeyan mekin. **Şeq**: Parçe parçe, ker kerî, pirtî pirtî. **Heq**: Xwedê Teala; rast, rastî, heqîqet, duristî.

**Şirove**: Şair di vê beytê de hezkirina xwe ya kûr a li hember Rebbê xwe aniye zimên. Lewma ji ber dûrketin û hesreta yarê, êş û janeke xedar di dilê wî de çêbûye. Şair ji ber vê rewşa xwe ji muxatabên xwe xwestiye ku lomeyan li wî nekin. Çunkî bi raya wî di wextekî nîvê şevê de bi wirdê *heq heq* zikrê Xwedê re mijûlbûn ji bo sofiyekî tiştekî ne xerîb e. Dîsa li gorî şair, di heqîqetê de tenê hebûnek heye ku ew jî Heq Teala ye, di wê demê de tenê Heq heye, hebûna sofî di zatê Heq de fena bûye, "*Her ew e yê ewwel û axir, her ew e yê zahir û batin*" (Hedîd, 3) ku di ayetê kerîmeyê de jî weha destnîşan kiriye: ﴿هُوَ الْاَوَّلُ وَالْاٰخِرُ وَالظَّاهِرُ وَالْبَاطِنُۚ﴾ Gava ku şair vê rewşê teswîr kiriye di tesewifê de îşaretî halê *zewq* û *wecd*ê kiriye. Bi rastî jî dengê *zeq zeq* di nusxeyê de dikare wek *zewq* jî bê xwendin ku hingê wateyên wek *tehm, hezz* û *lezzet*ê dide. Lêbelê di tesewifê de maneya *zewq*ê hêşînbûna tecelliyatên îlahî yan jî hasilbûna halê wecdê ye. Helbet hêşînbûn/peydabûna tecelliyatên îlahî destpêkirina halên curbicur in di derûniyeta sofiyan de. Di wê esnayê de bi tecellîkirina Heq Teala, nûra irfanê di dilê sofî de peyda dibe û sofî jî dikeve halekî wisa ku wê demê temaşaya Heq dike. Di halê zewqê de ruh, xwe ji

[5] "Sîne (sîng) dixwazim, yê ku ji ber derdê cudahiyê ker kerî bûye, [sîne dixwazim] da ku jê re miraza gihîştinê vebêjim."

masiwayê pak didêre. Zewq kêfeke rûhî ye ku di dilê ehlê sulûkê de bi tecellibûna nûrê re peyda dibe (Uludağ, 2016: 392). Ji ber van sedeman, şair li aliyekî halê xwe teswîr kiriye û li aliyê din jî hişyarî daye muxatabên xwe da ku lomeyan li halê wî nekin.

**Hunerên Edebî**: Secî di navbera *zeq*, *şeq* û *heq* de heye. Peyva *zewq* di nusxeyê de wek *zowq* hatiye nivîsîn ku vê yekê jî îham derxistiye holê. Cînasê laheq di navbera herdu *heq* de heye. *Şeqbûn* îstîare ye ji kerkerîbûna dil. *Zeqgirtin*, muteradîfa lomekirinê ye. *Zeq*, dikare wek *ziq* jî bê xwendin ku hingê awirên tûj ên ku mirovan bêrehet dikin tê hişê mirov, lewma îham di vir de jî çêbûye.

**Beyt 5**.

خوش خوش تا سا فبم از گش گش.........
وش وش هی هی چلبی قم قم.........

*…………... xweş xweş ta sa vebim ez geş geş*
*…………... weş weş hey hey çelebî qum qum*

**Xweş**: Rind, bedew, spehî; zû, lez, ‘ecele. **Sa**: Wekî, mîna, fena; kurtkirina kulîlka semenê, gula yasemen. **Vebim**: Vebûn, vekirina kulîlkê, bişkivîn, bişkiftîn. **Weş**: Wekî, mîna, notanî; -asa; rind, bedew, delal; navê cureyekî pembo yê Taberistanê ye ku ji wî qumaşê qedîfe, mexmer, etlas û hevrişîm tên çêkirin.

**Şirove**: Ji ber nîvcobûna beytê mirov nikare wateyeke tam bidê. Lêbelê bi qasî ku ji cihên wendabûyî tê fêmkirin, şair guherîna halê derûniya xwe wekî bişkivîna gulekê teswîr kiriye ku gava beytên pêş û paş bi hev re bê nirxandin, wê demê mirov dikare bibêje, qesda şair îhtimaleke xurt zikrê Xwedê ye. Çawa ku di ayetê de jî bi awayekî zelal hatiye diyarkirin ﴿وَاذْكُرُوا اللهَ كَثِيرًا لَعَلَّكُمْ تُفْلِحُونَ﴾ “*Xwedê pir bi bîr bînin da ku hûn bigihîjin felahê*” (Enfal, 45) anku bi zikrê Xwedê re guherîna derûniyeta aşiq wekî geşbûn û bişkivîna gulekê hatiye teswîrkirin.

**Hunerên Edebî**: Cînasê laheq di navbera *xweş* û *weş* de heye. Secî di navbera *geş*, *weş* û *xweş* de peyda bûye. Ji ber ku navê kulîlk û çîçekan di beytê de heye, lewma bi peyva vekirin/bişkivînê re tenasub di navbera *sa, weş, geş* û *vebûn* de saz bûye. Telmîh ji ayetên jorê re heye.

**Beyt 6**.

دم دم.........................................
وه دلم تچن غم غم هی هی چلبی قم قم

*……………………………………………… dem dem*
*We dilim tiçin xem xem hey hey çelebî qum qum*

**Dem**: Gav, wext, zeman, mecal; henase, bêhn, nefes. **Xem**: Êş, jan, elem; qirêjî, pîsî.

**Şirove**: Beyt kêm e lê risteya binî tam e û wateya vê jî zelal e. Şair li beytên jorê giringiya zikrê anîbû zimên, lewma di vê beytê de jî îşaret bi vê yekê kiriye ku bes bi zikrê Xwedê, xem

û keserên dilê mirovan dikarin biçin. Bi vî awayî jî dil digihîje sukûnet û aramiyê. Çawa ku di Qur'ana Pîroz de jî dibêje ﴿وَتَطْمَئِنُّ قُلُوبُهُمْ بِذِكْرِ اللّٰهِ﴾ "*Dilên wan bi zikrê Xwedê rihet û aram in.*" (Re'd, 28). Bi rastî jî li gorî tesewifê ew zikrê ku bi îxlasê tê kirin dikare perde û astengan di navbera 'ebd û Rebbê wî de rake. Di heman demê de zikr, herwekî sîqala dilan e ku dilê salik ji qirêjiyên menewî paqij dike û ji xefletê xilas dike. Dil, bi zikrê Xwedê dibiriqe û ji ber nûra wî geş û zindî dibe. Ew nûra ku bi zikrê tê, seranserî bedena mirov dipêçe ku her endameke mirov para xwe jê digire, geş dibe, dibiriqe û bi muhebbetullahê mişt tije dibe. Kesê ku di nav nûra zikrê Xwedê de wenda bibe hingê ew dibe yekî rûken, rûgeş û zarşirîn; nihêrîna wî kesî feyzek dide mirov û gava mirov bi wî kesî re be wê demê aramî lê peyda dibe. Kesên wisa her wekî şahid û wekîlê Xwedê ne li rûyê erdê. Çawa ku di hedîsekê de jî hatiye îşaretkirin, gava mirovên din li rûyê wan kesan binêre wê demê Xwedê tê bîra wan.

Herçiqas risteya ewil kêm be jî di dawiya wê de *dem dem* hatiye nivîsîn. Ji bilî wateya wext û zemanê, maneya henase û nefesê jî di vê peyvê de heye ku ew jî zikrê cehrî tîne bîra mirov. Ji ber ku di Xelwetiyan de zikr li ser usûla zikrê cehrî ye.

**Hunerên Edebî**: *Xem* bi mecazî qirêjiya dil e. Risteya duyem sehlê mumtenî ye. Telmîh ji ayeta jorê re çêbûye.

**Beyt 7**.

دل دل بریشته وکی بلبل ................................
بو............................. سل سل هی هی چلبی قم قم

*......................................dil dil birêşte wekî bilbil*
*Bû....................... sil sil hey hey çelebî qum qum*

**Birêşte**: Suxte, şewitî. **Sil**: Silbûn, tirsîn, bizdîn, xofgirtin.

**Şirove**: Qismeke beytê jê çûye, qisma sedr bi temamî nîne lê di qisma herb a beytê de şair dil şibandiye bilbilekî dilsoj. Şair xwendina bilbilê wekî wird û zikrê li ser zimanê salik dîtiye. Wekî risteya ewil qisma îbtidayê jî jê çûye ku şair di vir de bi îfadeya *sil*(bûn)ê îşaretî tirsa Xwedê kiriye. Ew jî vê ayetê tîne hişê mirov ku weha ye:

﴿الَّذِينَ يَخْشَوْنَ رَبَّهُمْۚ ثُمَّ تَلِينُ جُلُودُهُمْ وَقُلُوبُهُمْ اِلٰى ذِكْرِ اللّٰهِ﴾

"*Ew ên ku ji Xwedayê xwe ditirsin ji xwendina wê çermgij dibin, paşê çermên wan û dilên wan bi bal zikrê Xwedê ve aram û nerm dibin*." (Zumer, 23).

Ji bilî van agahiyan, di beytê de dengên dubarekirî eger ji hev cuda bên nivîsîn, wê demê peyva *bilbil* jî dê bibe *bil bil* ku ew jî dengê fûrdan (bilebil)a ava keliyayê tîne hişê mirov ku bi wateya giştî ya beytê re têkildar e. Herweha dikare bê gotin, ew *bil bil* dengê dilê salik e ku bi agirê işq û evîna Xwedê ve fûrdide.

**Hunerên Edebî**: Secî di navbera *dil* û *sil* de heye. *Bilbil* bi mecazî halê aşiq û zakir îfade dike. Herweha kînaye ye ji salikê ku di halê zikr û cizbeyê de ye. *Sil* kînaye ye ji teqwayê. Îhamê tebadur di navbera *sil sil* û *bil bil* de çêbûye.

**Beyt 8**.

تا از قخورم هر هر.........................

هی هی چلبی قم قم ………...…………

*……………………ta ez vexûrim her her*
*……………......…hey hey çelebî qum qum*

**Vexûrim**: Vexwim, vexwarin, noşkirin. **Her**: Hergav, tim, daîma.

**Şirove**: Di beytê de lêkera *vexûrim* cih digire ku ev jî vexwarina şerabê tîne hişê mirov. Şerab di edebiyatê de mezmûneke tesewifî ye ku mebest jê feyza îlahî ye. Di ayetê kerîmeyê de jî dibêje ﴿وَسَقٰيهُمْ رَبُّهُمْ شَرَابًا طَهُورًا﴾ "*Xwedayê wan dê ji şerabeke paqij bi wan bide vexwarinê.*" (Însan, 21). Helbet miraz ji vê yekê di tesewifê de halê *sekr* e. Halê sekr di wateya serxweşî û mestbûnê de ye ku ji wî salikî re *salikê sekran* tê gotin. Bi warîdat û tecelliyeke xurt salik ji xwe ve diçe û digihîje zewq û kêfeke rûhî. Halê sekrê, taybetiyeke ehlê mirovên xas e. Salik gava tecelliyata cemalê temaşe dike hingê dikeve wî halê sekrê ku ew hal xurttir e ji halê xeybê (Cebecioğlu, 2014: 424). Dikare weha bê şirovekirin ku şair di vê beytê de îşaretî veguherîna halên cuda yên li navbera zikr, cizbe û sekeratê kiriye.

**Hunerên Edebî**: Zikrê mehal îradeyê hal di *vexurim* de heye. Di qisma herba beytê de qaydeya şert heye. Telmîh ji ayeta jorê re çêbûye.

**Beyt 9**.

هی هی ساقی تو ورین می می……....
کی کی هی هی چلبی قم قم……..…

*…………....hey hey saqî tu werîn mey mey*
*………....key key hey hey çelebî qum qum*

**Werîn**: Bîne. **Mey**: Bade, şerab. **Key**: Heta kengê, kînga.

**Şirove**: Şair her wekî dewama beyta jorê, di vê beyta nîvco de dîsa peyva şerabê bi muteradîfa wê re bi bîr aniye. Bi vê têgehê îşaretî tecelliyata îlahî kiriye û halê xwe yê coşdar ê di nav işqê de bi teşbiheke belîx teswîr kiriye. Bi rastî jî şerab di tesewifê de îfadeyeke rezmdar e ku temsîliyeta şewq, wecd û muhebetê dike. Saqî wek *meygêr* tê zanîn ku di tesewifê de gelek caran wek *feyyazê mutleq* anku çavkaniya hemû feyz û hezkirinan hatiye dîtin ku mebest jê Xwedê Teala ye. Lêbelê gelek caran wateyên wek *murşîdê kamil* û *pîrê terîqetê* jî di xwe de digire.

Şair *meygêr* û *mey* xwestiye bi lêkera "werîn"ê îfade bike ku di edebiyata kurdî ya klasîk de gelek caran em rastî vê yekê tên. Bo nimûne Melayê Cizîrî di beyteke xwe de weha gotiye:

*Dîsa ji nû bêhal e dil saqî werîn cama zucac*
*Muştaqê xemra al e dil lê xweşî anîbit mîzac* (Cizîrî, 2004: 75)

**Hunerên Edebî**: *Saqî* ji murşîdê kamil û *mey* jî ji feyza îlahî kînaye ne. Secî di navbera *hey*, *mey* û *key* de heye. Tenasub di navbera *saqî* û *mey* de saz bûye.

**Beyt 10**.

**ساقی کو تبت او او غم هر ترژن دو دو**
**نسیم قتدن هَو هَو هی هی چلــبی قم قم**

*Saqî ku tibit ew ew xem her tirijin dew dew*
*Nesîm vetidin hew hew hey hey çelebî qum qum*

**Saqî**: Meygêr. **Ew**: Kesê sêyem ê yekjimar, (bi erebî) huwe; (bi mecazî) Xwedê Teala. **Dew**: Mezin, gir, qerase, terikî; dudu dudu, li pey hev, li dû hev; betal, vala, pûç. **Tirijin**: Dirijin, rijîn, robûn. **Nesîm**: Bayekî hênik û sivik e ku kêfa mirovan jê tê; (bi mecazî) qasid, peyamber, ragihîner. **Hew**: Êdî, nema; wisa, wer, wilo.

**Şirove**: Şair di vê beytê de îfade dike ku saqî ye yê ku meyê (anku tecelliyata îlahî û fuyûzatê) di navbera salik û sofiyan de par vedike. Helbet miraz ji saqî di tesewifê de Heq Teala ye. Bi gotineke din, şair dibêje ku eger saqiyê me Heq Teala be hingê êş û jan ji bo me namîne. Anku bi gotina pêşiyên me "Xwedê heye xem tuneye" (Oncu, 2020: 4/1083). Gava tiştekî xirab bi serê yekî de bê yan jî ew kes hêviya xwe wenda bike wê deme ev gotina pêşiyan tê bikaranîn. Bi rastî jî mirov gelek caran dikarin tûşî rewşên xirab bên. Lêbelê divê mirov tu caran li hemberî rewşên xirab, hêvî û baweriya xwe wenda neke û hertim xwe bispêre Xwedê ku şair jî di vir de bi vê gotinê van tiştan aniye bîra me. Helbet têkiliyek di navbera bêhêvîbûna şair û reşbîniya salik de dixuyê. Ji bo salik xetereya herî mezin ew e ku reşbînî di dilê wî de peyda bibe, anku *xewatirê nefsanî* yan jî *xewatirê şeytanî* di wî de bixuyê. Lewma şair ji îhtimala êrişa xewatirê nefsanî, xwe spartiye Xwedê. Ji ber ku Xwedê hebe, li wê derê xem û keser nabe; heta ew xem û kesera heyî jî bi gotina şair, yek bi yek li pey hev dirijin û diçin.

Bayê nesîm di beytê de derbas dibe ku miraz jê *hêvî* ye. Bayê nesîm di tesewifê de ew ba ye ku ji aliyê înayeta îlahî ve diweze, tecelliyateke cemala îlahî ye, rehmeteke sermedî û nefeseke rehmanî ye. Çawa ku di ayetê de derbas dibe "*piştî ku Xwedê bibe yar û alîkar*" ﴿اَنَّ اللّٰهَ مَوْلٰيكُمْۜ نِعْمَ الْمَوْلٰى وَنِعْمَ النَّص۪يرُ﴾ (Enfal, 40) bayê ku diweze tenê dibe rihmeta rehmanî ku ew jî wek dengê hû(we) hû(we) tê guhê salik. Ji bilî vê, mirov bi hatina nesîmê pê dizane ku roj hêdî hêdî dertê û dibe sibeh. Gava ev yek bi peyva *saqî* re bê ba hev, wê demê şeraba ku di serê sibehê de tê vexwarinê tîne hişê mirov ku jê re *şeraba sibehê/subgahî* yan jî bi zimanî farisî *subûhî-zeden* tê gotin. Miraz ji van mezmûnên tesewifî, îbadet û zikr in ku li serê sibê, di wextekî zû de tên kirin. Bi encama wan îbadet û zikran di dilê salik de tecelliyata îlahî xuya dibin. Mezmûnên wekî *şeraba subgahî* yan jî *subûhî-zeden* di edebiyata tesewifê de gelek caran hatine gotin ku li beyta xwarê jî Se'diyê Şîrazî (1386: 443) qesda wê şerabê kiriye:

**برمن که صبوحی زده ام خرقه حــــرامست ای مجلسیـــــــــان راه خرابات کدامست**[6]

Herweha di tesewifê de miraz ji saqî û şerabê *şeraba tewhîd* (wendabûn e di zatê kibriya de û xilasbûn e ji hemû qeyd û bendan), *şeraba puxte* (zewqa razber û saf e ku ji hemû qeyd û bendan xwe xilaskirin e), *şeraba xam* (jiyana têkilhev e bi zewqa maddî û dunyewî), *şerabxane* (alema melekût, batina arifê kamil) û gelek têgehên din e.

**Hunerên Edebî**: Secî û cînasê laheq di navbera *ew*, *dew* û *hew* de heye. *Saqî* îstîare ye ji Xwedê. *Nesîm* kînaye ye ji feyzên îlahî. Tenasub di navbera *saqî* û *nesîm* de saz bûye ku li jorê

[6] "Ez ku subûhî vedixwim [lew] bo min xirqe (lixwekirin) heram e, gelî cimaet ka [xêra xwe] ji min re bêjin li ku ye rêya meyxaneyê?"

me behs kir. Telmîh ji ayetên jorê re çêbûye. Tezad di navbera *xem* û *nesîm* de peyda bûye, çunkî *xem* wateyên huzn, êş û kederê dide lêbelê *nesîm* wateyên hêvî, xweşî û rihma bêdawî ye. Dengên *hew hew* [هو هو] dikarin wek *hû hû* jî bixwînin ku ew jî zikrê *hû*, anku gazîkirina Xwedê tîne hişê mirov. Lewma dikare bê gotin ku di vir de îham çêbûye.

**Beyt 11**.

كونده تبيژت قو قو هدهد خوه تبيژت پو پو
از هر تبيژم هو هو هى هى چــــلبى قم قم

*Kund e tibêjit qû qû hudhud xwe tibêjit pû pû*
*Ez her tibêjim hû hû hey hey çelebî qum qum*

**Kund**: Bûm. **Qû qû**: Dengê xwendina kund. **Hudhud**: Pîpo, hophopk, dîksilêman, silêmanê dunikil. **Pû pû**: Dengê xwendina hudhudê. **Hû hû**: Ew (cînava kesê sêyem-yekjimar); (di zikrê de kurtkirina) huwe; Xwedê Teala.

**Şirove**: Şair di vê beytê de ji teyr û dengê wan sûd wergirtiye û bi vî rengî îfade kiriye ku ew di xelwetê de ketiye halekî zikrê. Di vir de navê teyra ewil wek *kund* derbas dibe. Çawa ku tê zanîn, kund li cihên wêran û kavilbûyî hêlîna xwe çêdikin û ditelin. Herweha li gorî efsane û rîwayetan jî wek nîşaneya bêyomiyê hatiye dîtin (Zumrudî, 1385: 223). Lê di vê beytê de miraz ji kund ew salik in ku xwe ji civatê dûr dixin, dikevine ‘uzletê û di cihên tarî û tenha de tim bi wird, zikr û ta‘etê re mijûl dibin. Helbet ji vê yekê miraz an Şêx Şemsedîn bixwe ye û yan jî sofiyên Xelwetî yên wekî wî ne. Şair di risteya ewil de diyar kiriye ku kund bi dengê *qû qû* di nav lêgerîneke de ye û tim dixwîne. Herçiqas ew dengê kund be jî di zimanên Îranî û herweha di kurdî de nêzîkî dengê *kû kû* ye ku hingê maneya “li ku [derê]?” derdikeve. Ji ber vê yekê, em dikarin bibêjin ku di vir de bi awayekî Mûsa pêxember hatiye sembolîzkirin. Çunkî Mûsa pêxember li serê çiyayê Tûrê, li ser zimanê wî bi zikrê “Heq li ku?” “Heq li ku?” bi armanca dîtina Rebbê xwe gir bi gir geriyabû. Ji ber vê, mebest jê wird û zikrên salik in ku tim dibêjin “Heq li ku? Heq li ku?”.

Vêca piştî kund di qisma herba beytê de navê *hudhud* derbas dibe ku popikek li ser serê wê heye. Di tesewifê de jî ji ber wê popika xwe ya wekî tac û şaşika serî dixuyê, wek *rêber* an jî *murşîd* hatiye dîtin. Têkiliyeke dengî di navbera *hudhud* û *hadî* de jî tê dîtin. Wateya ferhengî ya *hadî*, ew kes e ku hidayetê li mirovan dike, rê li pêş wan dide, wan aresteyî rêya rast dike. Ev têkiliya dengî me dibe qisseya Sulêyman pêxember ku di wir de bi wezîfeya peyamberiyê ketiye bin barekî giran. Piştre ji ber ku bi awayekî serbilind ji bin vî barî dertê, lewma dibe mezherê înayeta Sulêyman pêxember (Bnr. Neml 27/29-30). Bi van tiştan bûye sedem ku hudhud di edebiyata tesewifî de wek murşîdekî bê dîtin. Hudhud di edebiyatê de bûye remz û mezmûna çend tiştên din jî. Ji ber ku ji vê teyrê bêhneke nexweş tê, wekî mirovan hem xwediyê sifetên heywanî û hem jî rehmanî hatiye dîtin. Lewma hudhud, ji alim û arifên ehlê tesewifê ve ji ber vê du-sifetbûna xwe tewecuheke mezin dîtiye (Kedkenî, 1383: 170-171). Çawa ku li beyta jorê, şair bi îfadeya *nesîm*ê qesda bayekî îlahî, hêvî û nefesa rehmanî kiribû, bi heman rengî bi îfadeya *hudhud* jî îşaretî aliyê wî yê mizgînber û peyamnêr kiriye. Ew jî ji aliyê tesewifê ve di dilê salik de mizgîniya peydabûna fuyûzata îlahî ye.

Gava hudhud dixwîne dengê *pû pû* derdixe ku ji ber vê yekê li nav kurdan li hin deveran jê re ji bilî navê *silêmanê dunikil*, *dîksilêman* û *pîpo* jî hatiye gotin. Helbet ji her qewmî insan û her celebeke heywan bi zimanê xwe zikrê Xwedê Teala dike. Lewma xwendina kund bi dengê *qû qû*, ya hudhud bi dengê *pû pû*, ya quling bi dengê *qeb qeb*; yan jî qireqira qirikan, çîlewîla çilûlan, ‘ore‘ora çêlekan, kalekala mihan, maqemaqa bizinan û gelek dengên cuda yên din ji ber vê yekê ye. Şair di risteya duyem de dîsa bi dubarekirina dengê *hû* halê xwe yê di nav wird û zikrê de teswîr kiriye.

**Hunerên Edebî**: *Kund* îstîare ye ji sofiyê zakir ku xwe kêşaye xelwetgahê. *Hudhud* kînaye ye ji murşîdê kamil ku bi mecazî mizgînber e. *Qû qû*, *pû pû* û *hû hû* ji zikrê Xwedê kînaye ne û herweha tekrarê hurûf di van dengan de peyda bûye. Telmîh ji ayetên jorê re heye. Îradê mesel ji qisseya Sulêman pêxember çêbûye.

**Beyt 12**.

هیستر کو تچن شط شط ساکن نتبن قط قط
سیران تکنی بَط بَط هی هی چــــلبی قم قم

*Hêstir ku tiçin şet şet sakin netibin qet qet*
*Seyran tikinê bet bet hey hey çelebî qum qum*

**Hêstir**: Rondik, rondikên girînê, hêstirk. **Şet**: Çem, rûbar. **Qet**: Hîç, tu carî. **Seyran**: Ger. **Bet**: Cureyekî ji qazên avê ne.

**Şirove**: Şair halê xwe yê bi girî yê di zikrê Xwedê de der biriye, ji ber tirsa Xwedê hêstirkbarandina xwe bi awayekî teswîr kiriye. Şair, hêstirk û rondikên xwe şibandiye çemekî ku ev jî vê ayetê tîne hişê mirov û dibêje ﴿وَيَخِرُّونَ لِلْاَذْقَانِ يَبْكُونَ وَيَزِيدُهُمْ خُشُوعًا﴾ “*Ew li ser rûyên xwe diçin sicûdê, didine girîn û tirsa wan a ji Xwedê zêde dike*.” (‘Isra, 109). Herweha wê aramiya ku salik tenê di halê giriyê de dikare peyda bike, di heman demê wê sukûnet û rihetiyê tîne hişê mirov ku di ayetê de weha ye: ﴿اَلَّذِينَ اٰمَنُوا وَتَطْمَئِنُّ قُلُوبُهُمْ بِذِكْرِ اللّٰهِ﴾ “*Wan (rasterêbûy)ên ku bawerî bi Xwedê anîn û dilên wan bi bîranîna (zikrê) Xwedê rihet û aram in*.” (Re‘d, 28). Ev ayet di tesewifê de aramiya li hember Xwedê û rihetiya rûhî ya di bin siya înayeta wî jî îşaret dike.

Di beytê de *seyran* jî derbas dibe ku ji peyva “seyr”ê hatiye dariştin. Seyr(an) di tesewifê de navê wê rêwitiya menewî ye ku salik ji bo gihîştina Heq Teala dikeve wê rêkê. Seyr di tesewifê de bi du awayan çêdibe ku ji wan a ewil *seyra îlahî* (ber bi Heq Teala ve dibe û heta ku salik wî nas dike didome) û ya din jî *seyra fîllah* (birêketina ber bi Heq Teala ve; piştî ku seyra îlahî diqede vêca ew dest pê dike û heta hetayî didome) e. Gelek têgeh û istilah di lîteratura tesewifî de hene ku hinek ji wan weha ne: *Seyrê sulûk, seyra mutleq di seyra muqeyyed de, seyra ‘urûcî/su‘ûdî, seyra nuzûlî* û hwd. (Uludağ, 2016: 315-316; Cebecioğlu, 2014: 433). *Seyran* wek têgeheke tesewifî di edebiyata kurdî ya klasîk de ji aliyê şairên ehlê tesewifê ve gelek caran hatiye bikaranîn ku nimûneyek weha ye:

*Cezbe û seyra sulûkê bê muhebbet nabitin*
*Cehdeya bê ‘işq û hub çendî ku kir bêfeyde bû*

*Salikên ʻişqê yeka yek hewce nînin ez bibêm*
*Cameya pîrê terîqê ser ji nik şehzade bû*

*Reng û reng ehlê meqamatê terîqê çûne seyr*
*Hin celal û hin cemal û sermeyan ev bade bû*

*Ê birî ʻeynê beqayê badenoşê ʻişqê bû*
*Ê bûyî mehwê fenayê ʻaşiqê bêçare bû* (Cizîrî, 2004: 207)

*Bet* wek navê teyrê sêyem di beytê de derbas dibe ku jê re qazên beyanî yan jî qazên çolemê jî dibêjin. Qaz bi rengê xwe yê spî û bedew di asta waswaseyê de zahidên ku gelekî giringiyê didine paqijiya cil û bergan sembolîze dike ku meqsed jê murîd û ehlê zikrê ne. Lewma dikare bê gotin ku şair bi remza *bet*ê wan zakiran qesd kiriye ku gihîştine halê paqijiya rûhî. Dibe ku şair di vir de qesda xwe jî kiribe.

**Hunerên Edebî**: Hunera îxraq/mubalexe di *şet* de heye. Îham û tewriye di *seyran* de tê dîtin. Secî di navbera *şet*, *bet* û *qet* de heye. *Bet* kînaye ye ji zakir. Telmîh ji ayetên jorê re çêbûye. Tezad di navbera *sakin* û *seyran* de peyda bûye.

**Beyt 13**.

دردم ژ ته بت تخ تخ منشّق دلم رخ رخ
دیدار مه تڤی اخ اخ هی هی چلبی قم قم

*Derd im ji te bit tex tex muneşşeq dil im rex rex*
*Dîdar me tivê ex ex hey hey çelebî qum qum*

**Tex**: Qetqetîbûn, tebeqe tebeqebûn; giranbûn(a êş û derdan). **Muneşşeq**: Şeqşeqîbûn, kerkerîbûn, tîştîşîbûn. **Rex rex**: Parçeparçebûn, kerkerîbûn, pirtîpirtîbûn. **Dîdar**: Dîtin, dîtina yarê, gihîştina maşûqê. **Tivê**: Divê, dixwaze. **Ex**: Ax, wax, axîn, nalîn, kalîn, dengê keserên kûr.

**Şirove**: Şair ji ber dûrketina yara îlahî halê xwe yê li nav êş û eleman bi awayekî teswîr kiriye. Lewma aniye zimên, ew êşa dûrketina ji yarê roj bi roj her diçe zêdetir dibe ku dilê wî li hember wê êşa mezin ker kerî bûye. Ji ber vê yekê, dikare bê gotin ku hemû xewn û xeyalên aşiq gihîştina yarê û dîtin/dîdara wê ye. Di risteya duyem de îfadeya *dîdar* derbas dibe. Ev îfade di tesewifê de beramberî temaşekirina bedewî û rindahiya îlahî tê ku ev jî mijara *rûyetullah*ê tîne hişê mirov. Wek tê zanîn li Qur'ana Pîroz di gelek ayetan de hatiye diyarkirin ku mu’mînan dê Xwedê bibînin. Di ayetê kerîmeyê de jî hatiye diyarkirin ku ﴿لَا تُدْرِكُهُ الْاَبْصَارُ وَهُوَ يُدْرِكُ الْاَبْصَارَۚ﴾ “*Çav tênagihîjin (ku li dunyayê Xwedê bibînin), ew bi çavan (û her tiştî) dibîne*.” (En‘am, 103). Lê karê dîtinê dê çawa pêk bê, mijara nîqaşeke kelamî ye. Lêbelê di tesewifê de gelek arifan pirî caran aniye zimên ku mirov dikare bi *çavê dilî* Xwedê bibîne. Bo nimûne Hz. ‘Elî di *Nehcu'l-Belaxe*yê (2012: 44) de gotiye ku { لَا تُدْرِكُهُ العيونَ بمشاهدة العِيان وَلكن تدرِكُهُ القُلوبُ بحقائق الايمان} “*Mirov nikarin bi çavan wî bibînin lê dil dikarin bi rastiyên îmanê wî bibînin*.”

**Hunerên Edebî**: *Muneşşeq* û *rex*, muteradîf in. Tenasub di navbera *dil*, *derd* û *dîdar* de saz bûye. Cînasê laheq û secî di navbera *tex*, *rex* û *ex* de peyda bûye. Telmîh ji ayetên jorê re heye. Îradê mesel ji mijara rûyetullah re çêbûye. Îham di îfadeya *dîdar* de heye ku muxatab yara îlahî ye. Jixwe şair di beyta 14an de muteradîfa vê peyvê bi awayekî eşkere bi kar aniye.

**Beyt 14**.

هر گه کتبی جار جار فریاد تکم از زار زار
دائم تبیژم یار یار هی هی چــــــلبی قم قم

*Her geh ketibî car car feryad tikim ez zar zar*
*Daim tibêjim yar yar hey hey çelebî qum qum*

**Geh**: Dem, gav, wext, zeman. **Feryad**: Qîrîn, qîjîn, hewar. **Zar zar**: Zarezar, nalîn, girîn. **Yar**: Dilber, hebîb, maşûq.

**Şirove**: Şair vê beytê wekî dewama beyta jorê domandiye û ji ber dûrketina yarê rewşa xwe ya perîşanbûyî bi awayekî teswîr kiriye. Dîsa aniye zimên ku ji ber firaqa yarê tim di nav êş û eleman de bi nalîn û zarîn e. Di vir de qesda şair bi vê nalîn û girînê tim bi dubarekirina zikrê “yar, yar, yar” gazîkirina Heq Teala ye ku dibêje ﴿وَقَالَ رَبُّكُمُ ادْعُونِي اَسْتَجِبْ لَكُمْ﴾ “*Xwedayê wê got: Hûn hêvî û dua ji min bikin, ez ê jî bersiva we bidim*.” (Xafir, 60). Di edebiyata tesewifî de şairan gelek caran bi navê *yar* bangî maşûqa îlahî kirine. Wek mînak, Hafizê Şîrazî di destpêka xezeleke xwe de wekî Qutbê Exlatî di xelwetê de weha gazî maşûqê kiriye (Xaliqî, 1400: 381):
خوش است خلوت اگر یار یار من باشد     نه من بسوزم و او شمع انجمن باشد[7]

Şair di risteya duyem de jî herdem bi navê “yar yar yar” feryadkirina xwe îfade kiriye ku ew jî dîsa zikrê Xwedê tîne hişê mirov. Çunkî miraz ji yarê Heq Teala ye ku şair/salik gava ku bi vî navî bangî maşûqê dike, hingê mebesta wî bi navê “Heq, Heq, Heq” wirdkişandin e. Çawa ku tê zanîn di dewrana Xelwetiyan de adaba zikrê ewil bi “Laîlahe-îllah” dest pê dike, piştre bi rêzê “Ellah”, “Hû” û “Heq” dewam dike. Lewma gava em bala xwe didine silsileya zikrê şair, wê demê dibînin ku şair ji zikrê “Hû” derbasî zikrê “Heq” bûye. Di Xelwetiyan de zakir gava ku bigihîje *mulhîmme*yê bi zikrê “Hû”, herweha gava ku bigihîje *mutme'inne*yê bi zikrê “Heq” wirdên xwe dikişîne ku zikrên di beytê de cih girtine bi awayekî îşaretî van hal û miqaman dike. Herweha lêkera *ketin*ê di tesewifê de *înkisara nefsê* anku usûla kokirina nefsa zebûn tîne hişê mirov.

**Hunerên Edebî**: *Geh* û *car* muteradîfê hev in. Tenasub di navbera *ketin*, *feryad* û *zar* de saz bûye. Secî di navbera *car*, *yar* û *zar* de heye. *Yar* kînaye ye ji maşûqa îlahî. *Ketin* îstîare ye ji înqisara nefsê.

**Beyt 15**.

ای دوست بکه لز لز بـــالم فه بیز بز بز
سوهتم ژ غمی از از هی هی چلبی قم قم

---

[7] “Ger yar bibe yara min xelwet xweş e, ger ez nesojim û ew jî bibe şem'a dîwanê xweş e.”

*Ey dost bike lez lez bal im ve bibez bez bez*
*Suhtim ji xemê ez ez hey hey çelebî qum qum*

**Dost:** Hebîb, yar, maşûq. **Lez**: Lezandin, ‘ecelekirin, zûkirin. **Bez**: Bezîn, revîn; bibeze, bireve. **Suhtim**: Sotin, şewitîn; kesirîn, êşkişandin.

**Şirove**: Şair bi îfadeya “Ey dost” dîsa bangî maşûqa îlahî kiriye. Di vê gotinê de lava û nalîn jî heye ku ev jî teweccuhê ayeta ﴿وَكَفٰى بِاللّٰهِ وَلِيًّاۘ وَكَفٰى بِاللّٰهِ نَصٖيرًا﴾ dike ku weha ye: “*Xwedê, bi dost û piştevanî besî we ye û bi arîkarî jî besî we ye*.” (Nîsa, 45). Dema ku arif bi vî şiklî bangî Xwedayê xwe dikin, Xwedê û dostên Xwedê Teala wê gavê li cem wan hazir dibin (Uludağ, 2016: 110). Di wextê wisa de bi wateya “Dost Ellah”, “Dost hû” jî tê gotin. Bi rastî jî Rebbê Jorîn di ayetê kerîmeyê de ferman kiriye ﴿اَلَيْسَ اللّٰهُ بِكَافٍ عَبْدَهُۜ﴾ “*Erê ma Xwedê ne besî bendeyê xwe ye?*” (Zumer, 36).

Di risteya ewil de îfadeya *lez û bez*, nîşan dide ku êdî tebata salik ji ber axîn û gazindeyan nemaye û sebra wî ji gewriyê hevraz e. Bi rastî jî di edebiyata kurdî ya tesewifî de gelek şairan di beytên xwe de cih dane vê îfadeyê ku yek ji wan jî Feqiyê Teyran e. Wî (Teyran, 2022: 40) di menzûmeya xwe ya navdar de van halên tesewifî bi ser avê re bi awayekî remzî der biriye:

*Ji kê ra dikî zikrê bi hal qet gujgujê nakî betal*
*Teşbîhê min reht û ‘emal qet bi şev û rojan xew netê*

*Lew şev û rojan bê xew î ji muhbetê lêk ditewî*
*Şevtariyan qet nahewî ji emrê kê bi lez ketê*

*Ji emrekî tu tê bilez sewdaser î şubhetê ez*
*Ji kê ra dikî çuna bilez vê serqutan û xizmetê*

Şair di serê risteya duyem jî aniye zimên ku ji ber agirê işqê ji serî heya binî sotiye. Bi rastî jî di edebiyata irfanî de lêkera sotin/şewitînê taybetiyeke aîdê aşiqan e ku miraz ji vê yekê di zatê Ellah de fenabûn anku tunebûn e. ‘Ettar (1387: 60) jî li mînaka jêrê weha gotiye:

آتش عشق تو در جان خوشتر است    جان ز عشقت آتش‌افشان خوشتر است[8]

Bi kurtî dikare bê gotin ku di vê beytê de ji ber dûrketina yarê, şair/aşiq aniye zimên ku êş û janeke xedar di dilê wî de peyda bûye û dermanê vê yekê jî bes gihîştina yarê ye.

**Hunerên Edebî**: *Dost* kînaye ye ji yara îlahî. Di îfadeya *bibez bez bez* de tekrara deng û kîteyan heye ku teknîka alîterasyonê bi awayekî îzafeyî hatiye bikaranîn. Herweha di peyva *bike* û *bal* de dengê b-yê tevî vê tekrarê hurûfê bûye. *Xem* bi mecazî derdê dûrketina ji yarê ye û lewre mirov dikare vê peyvê bi êgir re girêbide ku wê demê tenasub di navbera *sotin* û *xem* de saz dibe. Cînasê laheq û secî di navbera *lez*, *bez* û *ez* de peyda bûye.

[8] “Agirê işqa te di can de hebe xweş e, canê ku bi agirê işqa te dagirtî be xweştir e ji ateşfişanê.”

**Beyt 16**.

پسیار تکم از ری ری جادا کو حبیب تی تی
بیکان کو دمک بی بی هی هی چلبی قم قم

*Pisyar tikim ez rê rê cada ku ḥebîb tê tê*
*Peykan ku demek bê bê hey hey çelebî qum qum*

**Pisyar**: Pirs, pirskirin, pirsîn. **Cada**: Cade, rêya mezin û fireh. **Hebîb**: Yar, dilber, maşûq. **Peykan**: Serê tîrê; tîr; tiştên sertûjik û birek; lezgîn, bilez, bisûret.

**Şirove**: Şair di vê beytê de diyar kiriye ku ew di nav lêgerînê de ye, lêgerîna rêyeke wisa ye ku dixwaze bi wê rêyê xwe bigihîne yarê, di vê lêgerînê de dixwaze bizane ka kîjan ji wan rêya rast e. Lê her çi be û çawa be, li gorî şair kîjan rê derkeve hêla yarê, bêguman rêyeke rast e. Lewma divê şair bikeve rêya rast û ji wir re biçe, yan jî maşûq di wê rêyê re derkeve were ber aşiq. Bi rastî jî gava ku mirov li beytê dinêre wê hingê dibîne ku şair bi pirs/sualekê dest pê kiriye. Li tesewifê *pirs/sual* di rêya telebkirina heqîqetê de gava pêşîn e. Sofî gava ku bixwaze heqîqet û mahiyeta tiştekî hîn bibe wê demê bi sualekê dest pê dike ku di tesewifê de jê re *es'ile* hatiye gotin. Lewma şair di vê beytê de bi sualekê dest bi pirsîna yarê (murşîd) kiriye, çunkî hêvî ew e ku yar dê bikeve rêya terîqetê û ber bi wan ve bimeşe. Li gorî şair ew rê, rêyeke bi kendûkosp e û tê de gelek zorî û zehmetî hene. Di vê rêya xeter de gava aşiq, maşûqa xwe digere îhtimal heye ku bibe armanca tîran jî. Gelek mihnet û bela li ser vê rêkê li benda aşiq in. Lê li dawiya dawî gihîştina yarê jî heye. Lewma di vê beytê de şair bi îfadeyên sembolîk aniye zimên ku bi rêya terîqêtê dê xwe bigihîne heqîqetê. Bi rastî jî yek ji şertên gihîştina heqîqetê jî wesilbûna terîqetê ye. Ji ber ku terîqet rêyeke wisa ye ku derdikeve heqîqetê, lê hin şert û mercên vê wesilbûna terîqetê hene. Hem di ser û hem jî binê wê rêyê de merheleyên pir dijwar hene ku bicihanîna şertan û derbasbûna wan merheleyan di tesewifê de wek *seyrê sulûk* hatiye binavkirin. Di beytê de îfadeya *hebîb* jî derbas dibe ku miraz jê yara îlahî ye, lê di heman demê de dibe ku *însanê kamil* be jî. Çunkî şairê ku di rêya terîqetê de ketiye nav lêgerînekê, dixwaze di bin nezer û înayeta murşîdekî de bigihîje menzîlê. Ji ber vê yekê ew salikê ku ketiye li wê rêkê dibe ku li benda hebîb an jî murşîdê xwe be.

Îfadeya *peykan* bi rêya mecazî zorî û zehmetiyên li ser rê ne ku derdikevin pêşiya salik û jê re dibin asteng. Îfadeyên wekî *hebîb*, *rê* û *cade* gava bi hev re bên nirxandin, wê demê di tesewifê de beramberî *nezerkirin*ê tê ku ew jî nezera murşîd e. Li gorî tesewifê ew nihêrîn tesîreke mezin li ruhê salik û sofiyan dike, wan dike şiklekî nû, dilê wan bi feyza îlahî ve dadigire û giyanê wan dikemilîne. Di qisma îbtidaya beytê de îfadeya peykan, eger digel şiroveya murşîd bê nirxandin, wê demê di zimanê kurdî de beramberî *awir û xemze*yê tê ku ew jî tesîra nihêrîna murşîd a li ser murîd û salikan teswîr kiriye ku wekî tîrê bi bandor e. Bi rastî jî di edebiyata kurdî ya tesewifî de gelek şairên sofî li dor wateya *awir*, mezmûnên wek *peykan, tîr, xemze, xedeng; şûr, xencer* û hwd bi kar anîne ku yek ji wan jî beytên xwarê yên Mela 'Emerê Aşiq e ku wî di texmîsa xwe de awirên maşûqê weha şibandiye tîr û peykanan:

*Her gezme û awir ku ji çavên te bi kil hat*
*Min sîne hedef da ber û yek yek ne bi til hat*
*Ahek me nehişt sebr û sukûn bê tehemul hat*
*Derba cegerê bû ku me ev nale ji dil hat*

*Ma ah û fixanan dikirit kes ji xweşî* (Yılmaz, 2019: 192)

Divê bê diyarkirin ku peyva *peykan* di nusxeyê de wek *bîkan* hatiye nivîsîn. *Bîkan* di ferhengan de li bajarê Buxarayê wek navê çemekî derbas dibe (Dêhxuda, “Bîkan”, 1372). Eger em ji bo vî navî ji hunera zikrê cuz îradeyê kul sûd werbigirin wê demê ev îfade dibe *çem*. Ew jî dikare ji bo fuyûzata tesewifî bê şirovekirin ku bi awayekî temsîlî wekî çemekî ji murşîd dertê û ber bi dilê salik ve diherike. Di tesewifê de ji vê re *rabite* tê gotin.

**Hunerên Edebî**: Zikrê cuz îradeyê kul di *peykan* de heye, ji ber ku wateya wê serê tîrê ye lê miraz jê *tîr* bixwe ye. Îhamê tebadur jî di vê peyvê de heye, çunkî îşaretî kendûkospên li ser rêya terîqetê dike. Herweha *peykan* îstîare ye ji awirên murşîd an jî hebîb. Secî di navbera *rê*, *tê* û *bê* de heye.

**Beyt 17**.

ای خلوتی تا چند چند قفلان لته کن بند بند
بت گیرن لته کند کند هی هی چـــلبی قم قم

*Ey **Xelwetî** ta çend çend qiflan li te kin bend bend*
*Bit gêrîn li te kend kend hey hey çelebî qum qum*

**Xelwetî**: Mexlesa şair e. **Ta çend**: Heta kengê. **Qifl**: Kilîd, qilif, zirze; asteng, kendûkosp; perde, hicab. **Bend**: Bendik, ta, werîs; girêdan, bestin. **Gêrîn**: Girê, girêk. **Kend**: xendeq; asteng, kendûkosp, kertûkort; hevraz, pêbejor, serejor.

**Şirove**: Şair di vê beytê de bi mexlesa xwe ya *Xelwetî* bangî xwe kiriye. Herweha gazindeyên xwe yên ji perde û hicaban aniye zimên ku wan ji keşf û mukaşefetan ew bêpar hiştiye. Çunkî di beytê de peyva *qiflan* derbas dibe ku di tesewifê de bi mecazî di wateya perde û hicabê de ye. Li tesewifê, sofiyan *hicab* wek asteng dîtiye li navbera xwe û mirazê xwe (ku ew gihîştina Xwede ye). Ev hicab jî wekî perdeyekê teswîr kiriye ku ketiye li navbera aşiq û maşûqê. Çunkî di tesewifê de wisa tê bawerkirin ku gava dilê salik ji qirêjiyên maddî û nefsanî xwe pak bidêre wê demê dikare di hin xusûsiyetan de wuqûfiyetan bi dest bixe. Helbet ew qirêjiyên maddî û nefsanî ji bo dil, perde û hicab in. Eger li ser dilê yekî perde hebe, ew nikare heqîqetê bibîne, rastiyên îlahî û nirxên menewî bi dest bixe (Uludağ, 2016: 168). Ji ber vê yekê şair bi îfadeya *bend* û *qifl*ê îşaretî hicab û perdeyan kiriye û gazindeyên xwe ji ber perdeyên li ser dilê xwe aniye zimên. Herweha *girê*yên bend û *qifl*ên li ser dil çiqas zêde bibin, di navbera wî dilî û heqîqetê de dûrbûneke ewqas mezin peyda dibe ku *teswiyeya dilî û nefsê* jî hingê zehmetir dibe. Dîsa wek têgeheke tesewifî dilê salik çiqas bi hicab û perdeyan bê wergirtin, salik ewqas ji *keşf* û *mukaşefe*yê mehrûm dimîne.

Çunkî *keşf* di terîqetê de miqamekî wisa ye ku sofî di wî miqamî de “dizane ka li pişt perdeyê yan jî ji eqil wêdetir çi heye”. Herweha keşf di wateya “temaşekirina tecelliyatên îlahî” de hatiye bikaranîn. Di encama rabûna perdeyê de keşf an jî mukaşefe diqewime. Rabûna perdeyê tê vê maneyê ku sofî gihîştiye hin heqîqetan. Helbet hin arifan ev ayet weha şirove kirine ku dibêje: ﴿اَمَّنْ يُجِيبُ الْمُضْطَرَّ اِذَا دَعَاهُ وَيَكْشِفُ السُّوءَ﴾ “*Na! Belkî Ellah Teala çêtir e, ew ê ku dema derddar gazî wî dikin bersiva wan dide, tengiyê ji ser wan radike…*” (Neml, 62). Lewma

Qutbê Exlatî bi vê beyta dawî hizr û ramanên xwe bi awayekî aniye zimên û gazindeyên xwe yên ji kend û kospan kiriye. Di vê beytê de peyva herî muhîm ji ber wateya xwe ya tesewifî *qifl* e. Gelek şairên mutesewif di vê wateyê de cih daye mezmûna qiflê ku ev wekî hicab û perde bi kar aniyee. Bo nimûne Mewlana (Romî, 1335: 373) di xezeleke xwe de weha gotiye:

بازآمدم چون عید نو تا قفل زندان بشکنم     وین چرخ مردم خوار را چنگال و دندان بشکنم[9]

**Hunerên Edebî**: *Qifl* bi mecazî perde û hicab e. Secî û cînasê laheq di navbera *çend*, *bend* û *kend* de heye. Tenasub di navbera *qifl*, *bend*, *gêrîn* û *kend* de saz bûye. *Bend* û *qifl* muteradîf in. Tecrîd di beytê de peyda bûye, ji ber ku şair wek kesekî ji derve bangî xwe kiriye.

## *Encam*

Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî di dîroka kurdan de şair û mutesewifekî giring e ku di sedsala XVII-an de jiyaye û piraniya jiyana xwe li Xelat û Birîfkayê buhurandiye. Îroroj li dû Qutbê Exlatî tenê dîwançeyeke biçûk maye ku tê de mijarên wek zuhd, teqwe, wehdetê wucûd, seyrê sulûk, işqa îlahî, tezkiyeya nefsê û hin usûl û esasên terîqetê cih digirin.

Xezel û qesîdeyên Qutbê Exlatî bi giştî ji aliyê serwaya hundirîn û musîqayê ve balê dikêşîn. Wî di wan xezel û qesîdeyên xwe de bi hostatî tîp, deng û kîteyan dubare kirine ku li gorî şairên hevdemê xwe helwesteke nû ye. Wê helwest û uslûba Qutbê Exlatî ya edebî nîşan dide ku wî çiqas giringî dabûbe helbestê, ewqas jî daye mûsîqaya wê. Lewma em dikarin bibêjin ku di helbestên Qutbê Exlatî de xala yekem a ku balê dikêşe aheng û armonî ye. Ji ber vê yekê di vê xebatê de gava ku me tehlîla qesîdeya "Çelebî" kir, aliyê wî yê tesewifî û mûsîqî derxistine pêş û nemaze têgeh û mezmûnên curbicur bi mînakên edebî, mûsiqî, dînî û tesewifî re rave kirin. Bi kurtî ev xebata han ji bo ravekirina remz û mezmûnên nepen hewldaneke tehlîlî ye.

Gelek milên terîqeta Xelwetiyan di demê re peyda bûne ku yek ji wan jî Gulşenî ye. Wek damezrînerê vê terîqetê Îbrahîm Gulşenî (kd. 1533) tê zanîn ku di nav Xelwetiyan de zêde guhê xwe daye mûsîqayê. Lewma ev giringîpêdan, ji aliyekî din ve têkiliya Qutbê Exlatî ya bi Gulşeniyan re dike mijareke nû ku ew jî li benda lêkolînê ye.

Bi raya me, eger şi'rên Qutbê Exlatî yên di dîwançeya wî de cih digirin, bên analîzkirin û xaseten ji aliyê aheng û mûsîqayê ve bi awayekî hûrgilî bên nirxandin, hingê tevkariyekê erênî li têgihîştina hizr, retorîk, berhem û tesewifa Qutbê Exlatî bike.

[9] "Wekî cejneke nû cardin derketim hatim bo ku kilîda vê zindanê, dev û diranê vê çerxa mirovxwir bişkênim."

***Çavkanî***

Adar, Çağhan (2012), *Halvetilikte Müziğe Karşı İnanç Ve Tutumların İncelenmesi*, Sanatta Yeterlilik Tezi, Afyon Kocatepe Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Müzik Anasanat Dalı, Afyonkarahisar.

Axtepî, Şêx Evdirehman (2002), *Dîwana Rûhî*, Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Aykaç, Yakup (2017), "Şêx Şemsedînê Exlatî û Helbestvanên Malbata Wî", *Süryani Arap ve Kürt Klasikleri Çalıştayı*, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi.

Aynî, Mehmet Ali (1992), *Tasavvuf Tarihi*, (Amd. Hüseyin Rahmi Yanalı), (Çap 1.) İstanbul: Kitabevi.

Azamat, Nihat (2000), "İbrâhim Gülşenî", *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c. XXI, r. 301-304.

Barthold, Wilhelm (1987), "Çelebî", *MEB İslam Ansiklopedisi*, c. III, r. 369-370.

Birîfkanî, Seyid Mahmut (2011), *Bırifkan Seyitleri*, Ankara: Poyraz.

Birîfkanî, Zahid (2001), *Dîdarê Yar Dîwana Şêx Şemseddînê Qutbê Exlâtî yê Birîfkanî*, Stockholm: Roja Nû.

Birîfkanî, Zahid (2004), *Zibanê Kurdî Dîwana Şêx Nûreddînê Birîfkanî*, Stockholm: Roja Nû.

Bitlisi, Şerefhan (2013), *Şerefname Kürt Tarihi*, (Wer. Abdullah Yeğin), İstanbul: Nûbihar.

Cebecioğlu, Ethem (2014), *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Ankara: Otto.

Cizîrî, Mela (2004), *Dîwan*, (Trans. Arif Zêrevan), Stockholm: Nefel.

Çetin, Nuran (2017), "Halvetîk'te Cehrî Zikir Usûlü ve Mûsikî", *Geçmişten Günümüze Uluslararası Dinî Mûsikî Sempozyumu*, Amasya: Amasya Üniversitesi.

Dêhxuda, 'Elî Ekber (1372). *Luxetnameyê Dêhxuda*, *Lovhê Fişordeh*, Tehran: Întişaratê Danişgahê Tehran.

Doskî, Mihemed Emîn (2007), *Lewami'î`ş-Şehb fî Şerhî Dîwanî Şemseddînî`l-Exlatî el-Qutub*, Duhok: Sipîrêz.

Ehmedî-Muderrîs, Ebdulkerîm Mahmud (1389), *Binemâleyê Zanyârân*, (Çap 1.), Tehran: Întişaratê Enna.

Ettar, Ferîduddîn (1387), *Dîwanê Qesaîd we Xezeliyat,* Turbetê Cam: *Saytê Ferhengê Îctimaî.*

Gökbel, Ahmet (2019), *Ansiklopedik Alevi Bektaşi Terimleri Sözlüğü*, Ankara: Atatürk Kültür Merkezi Başkanlığı.

Hazret-i Ali (2012), *Nehc'ül-Belâga*, (Amd. Abdülbâki Gölpınarlı), İstanbul: Derin.

Îsfehanî, Nûr 'Elîşah (1374), *Dîwanê Qutbu'l-'Arifîn we Qudwetu'l-Murşidîn el-'Arifê Billah Hezretî Nûr 'Elîşah,* Tehran: Kitabfirûşiyê Mîr Kemalî.

Karakaya-Stump, Ayfer (2016), *Vefailik, Bektaşilik, Kızılbaşlık* (Çap 2.) İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.

Kedkenî, Muhammed Rıza Şefi'î (1386), *Musiqê Şi'r,* (Çap 10.) Tehran: Agah.

Kedkenî, Muhemmed Riza Şefi'î (1383), *Mantiqu't-Teyrê 'Ettar*, (Çap 1.), Tehran: Suxen.

Mizûrî, 'Ebdurrehman (2022), "Nehêlana Mijê li ser Hozanvaniya Şêx Şemsedînê Exlatî", *Kovara Rûgeh*, jimare 15, Tebax, r. 44-49.

Muwahhîd, M. 'Elî (1396), *Mesnewiyê Me'newî,* cîld I, (Çap. 1.), Tehran: Întişaratê Hermes.

Nikitine, Basil (2008), *Kürtler Sosyolojik-Tarihi İnceleme* (Wer. E. Karahan û yd.) (Çap 1.), İstanbul: Örgün Yayınevi.

Omarkhali, Khanna (2014), *Kürdistan'da Dini Azınlıklar Ana Akım Dışında Kalanlar,* (Wer. İbrahim Bingöl), (Çap 1.), İstanbul: Avesta.

Oncu, Mehmet (2020), *Gotinên Pêşiyan,* Berg 4, (Çapa 1.), Wan: Sîtav.

Rumî, Mewlana Celaleddin (1338), *Xezeliyatê Şemsê Tebrizî*, (Amd. Celaleddînê Humayî- ‘Elî Deştî, Mensûr Muşeffeq), (Çap 3.), Tehran: Sefîalîşah.

Samî, Şemseddin (1317), *Kamus-i Turkî,* Der Saadet: İkdâm.

Suphanî, Tewfîq (1388), "Husameddîn Çelebî ve Çayigahê Û"*, Peşûgişnameyê Ferheng û Edeb,* 5/9, 80-92.

Şemîsa, Sîrûs (1375), *Seyrê Xezel der Şi'rê Farisî*, (Çap 3.), Tehran: Fîrdews.

Şirazî, Sa'di (1386), *Kulliyatê Se'dî,* (Amd. Muhemed Elî Furûxî), (Çap 2.) Tehran: Beyhek.

Şirvanî, Seyyîd Yehya (2014), *Risaleler I-II* (Amd. Mehmet Rıhtım-Feride Aliyeva), Bakü: Qafkaz Üniversitesi Qafkaz Araştırmaları Enstitüsü.

Tanrıkorur, Ş. Barihüda (2004), "Mevleviyye"*, Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c. XXIX, r. 468-475.

Tatcı, Mustafa (2013), *Yunus Emre Divanı*, Ankara: Kültür Bakanlığı.

Tebrizî, Muhammed Xelefê (1342), *Burhanê Qati',* (Amd. Muhammed Mu'in), (Çap 2.), Tehran: Îbnî Sîna.

Uludağ, Süleyman (1997), "Halvetiyye", *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c. XV, r. 393-395.

Uludağ, Süleyman (2016), *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, (Çap 2.), İstanbul: Kabalcı.

Wergera Qur'ana Pîroz bi Zimanê Kurdî, (Wergêr: M. Huseyn Êsî, M. Se'îd Girdarî, M. Muhemmed Bêrkanî), (Çap 2.), Stenbol: Nûbihar.


Xaliqî, Muhammed Rıza Berziger (1400), *Şaxnebatê Hafız*, (Çap 11.) Tehran: Întişaratê Zevvar.

Yılmaz, Bamed Serdar (2015), *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî*, (Çap 1.), İstanbul: Nûbihar.


Yılmaz, Hacı (2019), *Dîwana Laxer/Mela Umerê Aşiq (Metn û Lêkolîn)*, Teza Masterê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mardin: Zanîngeha Mardin Artuklu.

Zumrudî, Humeyra (1385), *Neqdê tetbiqiyê edyan û esatîr*, (Çap 2.), Tehran: Întişaratê Zevvar.

***Pêvek: Destnivîs***



*Dîwana Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî ya bi destnivîsa Şêx Memdûhê Birîfkanî*




وله أيضا

جار جار كه بنت بشب بشب
هى هى چلبى قم قم
خوش خوش بنم أز جب جب
هى هى چلبى قم قم
محبوب كه فنهات جه جه
تدلم كرها ره ره
ديسان خوشتم أز وه وه
هى هى چلبى قم قم
هون ليم دكرن زوقا زوق
يكجار بو بيم اشقة اشق

موج مايه تنى موج موج
هى هى چلبى قم قم
أى دوست بكه زنزن
بالم فه ببز أبز أبز
دى هتم غمى أن أن
هى هى چلبى قم قم
أى خلوق تا جند جند
قفلات لته كى بند بند
بت كيرن لته كند كند
هى هى چلبى قم قم

*Nûsxeya Mela Menafê kurê Mela Qasimê Birîfkî*
*(Çavkanî: Kovara Rûgeh, jimare 15, 2022, r. 48-49.)*



*Qesîdeya Şêx Şemsedînê Exlatî ya bi paşserwaya "Tenenaha ya hû" di nav keşkûla Tuhfetu'l-Xullan a Şêx Muhemed Tahirê Birîfkî*[10].

[10] Ji bo wêneyên destnivîsan (1 û 3) em spasiyên xwe pêşkêşî mamosta Serdar Yılmaz dikin.

Kurdiname Akademik
Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname E-ISSN-2687-5438

# DI ÇARÇOVEYA TEFSÎRA ÇEND AYETÊN QUR'ANA PÎROZ DE KURD

(KURDS IN THE FRAMEWORK OF THE COMMENTARY OF SOME VERSES OF THE HOLY QUR'AN)

Mustafa ÖNCÜ*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 05.10.2022
**Accepted // Pejirandin:** 26.11. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 104-111
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1184650

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Öncü, Mustafa (2022). Kurd Di Çarçoveya Tefsîra Çend Ayetên Qur'an'a Pîroz De, K*urdiname*, no. 7, p.104-111.

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

**Kurte**

Ji bo xebatên ilmî hebûna çavkanîyan pêwist e. Lewra ji bo ku mirov bikaribe derheqê mijarekê de biaxive divê hinek çavkanî hebin. Herweha kesê ku bixwaze ku li ser Kurdan xebateke ilmî çêbike divê haya wî ji çavkanîyên erebî hebe. Lewra çawa ku çavkanîyên mayîn yên derbarê Kurdan de girîng in herweha çavkanîyên erebî jî gelek girîng in. Di nav van çavakanîyan de Qur'ana Kerîm cihekî taybet digire. Lewra piştî ku Xwedê Qur'ana Pîroz şand Qur'an bû wesîleya hîdayeta gelek kesan û neteweyan. Ji her miletî gelek kesan ji bo ku Qur'anê fêm bikin û gorî wê jîyana xwe bidomînin li ser Qur'anê gelek xebat kirin. Di nav van xebatan de kitêbên tefsîrê gelekî girîng in. Di Qur'anê de navê gelên wekî Kurd, Tirk, Îngîlîz, Fars û hwd. cih negirtine. Lê di kitêbên tefsîrê de di şîroveya hinek ayetan de behsa hinek miletan hatîye kirin. Hîn di sedsala yekemîn û duyemîn a hîcrî de di hinek tefsîrên ku li ser Qur'anê hatine çêkirin de navê Kurdan cih girtîye. Hinek ji mufessiran gotine ku "Di filan ayeta Qur'anê de qala Kurdan hatîye kirin.", "Filan ayet behsa Kurdan dike.", "Ev ayeta Kurdan nîşan dide." û hwd. Hinek ji van mufessiran Mucahid, Taberî, Wahidî, Qurtubî, Beydawî û İbn Aşûr in. Hinek ji van ayetên ku mufessiran gotine ku ew ayet behsa Kurdan dike jî ev in: 1-Ayeta çil û çaremîn a sûreyê Hûd. 2- Ayeta bîst û duyemîn a sûreyê Kehf. 3- Ayeta şêst û heştemîn a sûreyê Enbiya. 4- Ayeta şazdemîn a sûreyê Feth. Ji bilî van ayetan, di tefsîrên hinek ayetên din de jî mufessiran bi hinek munesebetan behsa Kurdan kirine. Em ê di vê gotarê de nêrînên hinek mufessiran en derheqê Kurdan de derxînin holê. Em ê binêrin ka Kurd bi çi hawayî bûne mijara van tefsîran, em ê tesbîta wan bikin.

**Peyvên Sereke:** Qur'ana Kerîm, Tefsîr, Kurd, Kurdî, Zimanê Kurdî, Ekrad.

**Abstract**

Availability of resources is necessary for scientific works. Therefore, in order for a person to be able to talk about a subject, there must be some resources. Someone who wants to do a scientific work on the Kurds should be aware of Arabic sources. Therefore, Arabic sources about the Kurds are very important. Among these sources, the Holy Qur'an has a special place. Therefore, after God sent the Holy Qur'an, the Qur'an became a means of guidance for many people and nations. Many people from all nations have done a lot of work on the Qur'an in order to understand the Qur'an and live according to it. Tafsir books are very important among these works. In the Qur'an, the names of people such as Kurds, Turks, English, Persians, etc. have not taken place. But in the books of tafsir, some nations have been mentioned in the commentary of some verses. Even in the first and second centuries of the Hijri, the name of the Kurds was mentioned in some commentaries on the Qur'an. Some

* Doç. Dr., Mamosteyê Fakulteya Zanistên îslamî Ya Zanîngeha Mersînê, mistefaoncu63@hotmail.com, Orcid: 0000-0002-2661-1147

commentators have said that "The Kurds are mentioned in such and such a verse of the Qur'an.", "This verse speaks of the Kurds.", "This verse shows the Kurds." what is up. Some of these commentators are Mujahid, Tabari, Wahidi, Qurtubi, Baydawi and Ibn Ashur. These are some of the verses that commentators have said refer to the Kurds: 1- (Hud, 11/44). 2-(Al-Kahf, 18/22). 3-(Al-Anbiya, 21/68) 4-(Al-Fath, 48/16). In addition to these verses, commentators have mentioned the Kurds in some contexts in the interpretations of some other verses. In this article, we will bring out the opinions of some commentators about the Kurds. We will see how the Kurds became the subject of these interpretations, we will determine them.
**Keywords :** Holy Qur'an, Interpretatıon, Kurds, Kurdish, Kurdish Language

## Destpêk

Ji bo ku însan li dinya û axretê bextewar be Xwedê di nav însanan de ji hinekan re wehy şandîye. Ew însanê ku ji wan re wehy hatîye şandin bi navê pêxemberan tên nasîn. Pêxemberan wehya ku Xwedê ji wan re şandîye ji însanan re teblîx kirine. Digel vê teblîxê Xwedê ji hinek pêxemberan re kitêb jî şandine. Yek ji van kitêban kitêba me ya pîroz Qur'ana Kerîm e ku Xwedê ji pêxemberê me Hz. Muhemmed (s.x.l) re şandîye. Ji bo ku însan Qur'anê fêm bike û gorî wê tevgera xwe bi rêve bibe gelek xebat li ser Qur'anê hatine kirin. Ji destpêka Îslamê de heya îro pir mufessiran gelek tefsîr li ser Qur'anê çêkirine.

Di Qur'anê bi xwe de navê qewm û gelên wekî Kurd, Tirk, Îngîlîz, Fars û hwd. cih negirtine. Lê di tefsîrên ku li ser Qur'anê hatine çêkirin de hinek ji van navan cih girtine. Yek ji van gelên ku di çarçoveya şîrovekirina hinek ayetan de di tefsîrên Qur'ana Kerîm de cih girtine gelê Kurd e. Kurd di hinek pirtûkên tefsîrê de bûne mijara hinek gotin û şîroveyan. Hinek mufessiran, hîn di serdemên zûtirîn di dewra sehabe û tabîînan de gotine ku "filan ayet filan neteweyeyî nîşan dide"; "di filan ayetê de behsa filan qewmî û filan miletî tê kirin". Ji wê serdemê heya îro di gelek tefsîran de navê Kurdan cih girtiye. Hinek ji mufessiran gotine ku "filan ayetê de qala Kurdan tê kirin". "Filan ayet behsa Kurda dike", "ev ayet, Kurdan destnîşan dike". Hinek ji van mufessiran erebin hinek kurdin hinek jî ji gelên mayî ên misilman in. Di van şîroveyan de carna pesnên Kurdan hatine dayîn carna jî rexne li Kurdan hatine kirin. Mirov dikare di van tefsîran de gelek tiştên giranbiha ên Kurdan bibîne û şopa wan bimeşîne. Wek mînak mirov dikare hinek ji dîrok û erdnîgarîya Kurdan, urf û adetên wan, rewşa wan a aborî û civakî, giranîya wan di çand û bajarvanîyê a di serdema Îslamê de bipeyîtîne.

Li gor tesbîtên me, ev ayetên Qur'ana Kerîm ku mufessiran gotine ku mijara wan Kurd in, çar-pênc heb in û weha ne: Ayeta şazdemîn ya sûreyê Fethê, a şêst û heştemîn ya sûreyê Enbiyayê, ayeta çil û çaremîn a sûreyê Hûdê û ayeta bist û duyemîn ya sûreyê Kehfê. Helbet di tefsîrên Qur'ana Pîroz de ji bilî van ayetan jî bi hinek munesabetan behsa Kurdan hatîye kirin. Ji alîkê ev malûmatên ku di derheqê Kurdan de di van pirtukan de cih girtine ne tenê di kitêbên tefsîrê ên klasîk de cih girtine herweha mirov di kitêbên tefsîrê ên nujen de jî rastî van malûmatan tê. Li alîyê din jî mirov dikare van berhemên giranbiha ji bo Kurdan wek arşîvekê bihesibîne. Helbet ji bo vê mijarê nêrîna hemî lîteratura tefsîran gelekî zehmat e û mirov nikare têxe nav çarçoveya gotarekê. Ji ber vê yekê di vê çarçoveyê de me hinek tefsîrên meqbûl û mutedawil hilbijartin. Tefsîrên wek *Tefsîra Mucahîd, Camîu'l-beyan fî tewîlî'l-Qur'ân,*

*et-Tefsîru'l-wesît, el-Câmî' lî ahkami'l-Qurân, Tefsîru'l-beydâwî, Tefsîru'l-Qur'ânî'l-azîm* û *et-Tahrîr ve't-Tenwîr* in.

### 1- Ayeta Çil û Çaremîn A Sureyê Hûd

وَقِيلَ يَا أَرْضُ ابْلَعِي مَاءكِ وَيَا سَمَاء أَقْلِعِي وَغِيضَ الْمَاء وَقُضِيَ الأَمْرُ وَاسْتَوَتْ عَلَى الْجُودِيِّ وَقِيلَ بُعْداً لِّلْقَوْمِ الظَّالِمِينَ

*"(Piştî ku kafir binav bûn ji erd û asîmanan re) hate gotin: Hey erdê! Ava xwe daqurtîne. Ya esmano! Tu jî vekişe. Av kêm bû û çikiyaî ferman bi cih hat, keştî jî li ser Cûdî rawestiya û hate gotin: Bila dûrbûna ji dilovaniya Xwedê ji civata zalim re be!."*[1]

Derbareyê vê ayetê de jî gelek şîroveyên cuda cuda hatine kirin. Nîqaşa herî mezin li ser beşa *"Keştî/Gemî li ser Cûdî rawestiya"* ye. Di nav mufessiran de nîqaş çêbûye ku gelo ka ev çiyayê ku keştiya Nebî Nuh (s.x.l) li ser rawestiyaye kîjan çiya ye? Hinekan ji wan gotine ku ew, Çiyayê Agirî ye. Ev nêrîn, nêrîna Tewratê ye. Hinekan jî gotine Çiyayê Cudî ye. Di tefsîrên kevin yên vê ayetê de behsa Kurdan pir nehatîye kirin. Ji bo ku cihê Çiyayê Cudî destnîşan bikin têgeha "el-Cezîre" bi kar anîne. (Mucahid, 1410/1989: 388) Di hinek tefsîran de jî "Cudî çiyayekî nêzîkî Musilê ye", (Suleyman, ?: 2.283) hinekan gotîye, li Diyarbekirê ye. (El-Hicâzî, 1413: 2,124) Hinekan gotine, Çiyayê Cudî çiyayekî nêzîkî Musilê, an li Şamê an jî li Amîdê ye. (Ankarawî, t.t.: 4.135) Lê di tefsîrên dawî de behsa Kurdan hatîye kirin. Mufessirê bi nav û deng İbn Aşûr di *et-Tehrîr ve't-Tenwîrê* de cihê vî çiyayî nîşan dide û navê Kurdîstanê bi kar tîne. (Îbn 'Aşûr, 1984: 20, 223)

### 2- Ayeta Bist û Duyemîn A Sureyê Kehf

سَيَقُولُونَ ثَلاثَةٌ رَابِعُهُمْ كَلْبُهُمْ وَيَقُولُونَ خَمْسَةٌ سَادِسُهُمْ كَلْبُهُمْ رَجْمًا بِالْغَيْبِ وَيَقُولُونَ سَبْعَةٌ وَثَامِنُهُمْ كَلْبُهُمْ قُلْ رَبِّي أَعْلَمُ بِعِدَّتِهِمْ مَا يَعْلَمُهُمْ إِلا قَلِيلٌ فَلا تُمَارِ فِيهِمْ إِلا مِرَاءً ظَاهِرًا وَلا تَسْتَفْتِ فِيهِمْ مِنْهُمْ أَحَدًا

*"(Hin ji wan bi texmînî) dê bibêjin: Ew sê bûn, çarê wan jî segê wan e. (Hin jî) dê bibêjin: Ew pênc bûn, şeşê wan segê wan e. (Ev) derbarê ya nepenî(xeybê) de texmîn dikin. (Hinek jî dê) Bibêjin: Ew heft bûn, yê heştê wan jî kûçikê wan e. Bibêje: Xwedayê min, bêhtir bi hejmara wan dizane. Ên ku bi wan dizanin pir hindik in. Nexwe derheqê Xelkên Şİkeftê de ji bîlî nîqaşeke diyar(ku ji te re wehyê diyar kiribe) tu munaqeşeyeke din neke û derbarê wan de jî tu kesî(ji yên xwedankîtêb) malûmatan nexwaze."*[2]

Mufessir dema ku tefsîra vê ayetê dikin behsa kuçikê/segê eshabu'l-kehf dikin.[3] Wê demê dibêjin ku ev navê vî kuçikî "Qitmîr" bûye. Ji kuçikên "Qalatî" piçûktir û ji kuçikên "Kurdî" jî mezintir bûye. (es-Sa'lebî, ?: 6,163) Mufessir Wahidî (w.468/1067) jî vê rastiyê tîne ziman. (Wahidî, 1415/1994: 3, 142) Herweha mufessirê mezin Qurtubî (w. 671/1273) jî bi vî awayî dibêje û wê rîwayetê radigihîne. (el-Qurtûbî, ?: 10,384)

Ji van tefsîran mirov fêm dike ku wê demê cinsekî kuçikan ê bi navê "Kurdî" hebûye. Dîsa mirov fêm dike ku ev cins, cinsekî bilind bûye. Lewma mufessiran gotine kuçikê Ashabu'l-kehf ji cinsê Qalatî mezintir ji cinsê Kurdî jî piçûktir bûye.

---

[1] Sureyê Hûd, 11/44.

[2] Sureyê Kehf, 18/22.

[3] Derheqê eshabu'l-kehf de ji bo agahîyên ber firehtir binêrin.

Tiştekî din ê balkêş jî ew e ku li herêma Riha û Semsûrê îro jî ji kuçikê har, mezin û bilind ku dikare guran bifetisîne re dibêjin "gurêx". Dibe têkiliyek di navbera vî cinsê kuçikan (gurêx) û ew cinsê kuçikan ku di tefsîrên Qur'ana Kerîm de bi navê "Kuçikên Kurdî" cih girtîye hebe.

**3- Ayeta Şêst û Heştemîn A Sureyê Enbîya**

قَالُوا حَرِّقُوهُ وَانْصُرُوا آلِهَتَكُمْ إِنْ كُنْتُمْ فَاعِلِينَ قُلْنَا يَا نَارُ كُونِي بَرْدًا وَسَلَامًا عَلَى إِبْرَاهِيمَ

*"(Ji hev re) gotin: Eger hûn dixwazin tiştekî pê bikin, wî bişewitînin û arîkariya îlahê xwe bikin!Me go: Ey agiro! Li ser Îbrahîm bibe hênikahî û selametî."*[4]

Ayeteke din jî yê ku mufessiran di tefsîrên xwe de behsa Kurdan kirine ev ayeta li jor e. Ev, ayeta şêst û heştan a sûreya Enbiyayê ye. Di vê ayetê de Xweda behsa qissa Îbrahîm (s.x.l) û qewmê wî dike. Weke ku tê zanîn, dema ku Îbrahîm (s.x.l) dest bi teblîxê kir û pûtên Nemrûd û qewmê wî şikand, wan got ku "Kê ev putana şikandibin emê jî cezayî wî bidin wî?". Piştî ku biryara xwe dan û gotin Îbrahîm ew şikandin e, li hev civîyan û gotin ku "Emê çi cezayî bidin Îbrahîm?". Gotin ku 'Heger hûn dikin tiştekî bikin, wî bişewitînin û bi vî awayî alîkariya îlahên xwe bikin.

Hinek ji mufessirên Qur'anê wek Qadî Beydawî (w.685/1286) dibêjin ku ew kesê ku fikra şewitandinê da qewmê Îbrahîm û got ku wî bişewitînin zilamekî ji Kurdan bû. Mirov dikare bibêje ku di gelek pirtûkên tefsîrê ên klasîk de vê gotinê cih girtiye. Bi ser de, navê vî kesî jî di gelek tefsîran de derbas dibe. Lê belê ev nav pir hatiye guhertin. Di gelek tefsîran de cuda cuda hatîye nivîsandin. Navê vî kesî wek "Hebûn" "Heyzen", "Hîzîn "Hîrîn", "Hînûn", "Hiyun" û "Hedîr" di çavkanîyan de cih girtiye. (Qadî, 1418: 4,55, İmâdî, ?: 6, 76, el-Maqrizî, 1420/1999: 9, 58)

Ev agahî pêşîyê di Tefsîra Taberî de derbasbûne. (Taberî, 1422/2001: 18/465; 16/305, Qurtubî, 1384/1964: 7/4774) Taberî (w. 310/923), weke ku tê zanîn tefsîreke rîwayetî ye/rawergirtinî ye. Ev rîwayeta ku dibê ev zilam Kurd e ji tabîîyê bi nav û deng Mucahîd (w.103/721) hatîye wergirtin. Mucahîd dibêje ku min ev ayeta ji Abdullahê kurê Umer pirsî. Ji min re got ku, ma tu dizanî ew kesê ku got Îbrahîm bişewitînin kî bû? Min got, na. Bersîva min da û got, ew kesê ku got Îbrahîm bişewitînin yek ji bedewîyên Farisan bû. Min got, ma bedewîyên Farisan jî hene? Got erê, hene û ew Kurd in. Û ew zilamê ku gotiye Îbrahîm bişewitînin, Xweda ew xist bin erdê û heya roja qiyametê jî ew ê di wî halî de be. Ew rîwayeta ji İbn Umer, Mucahîd û hinek sahabe û tabîiyan hatîye ragihandin.(Taberî, 1422/2001: 18/465; 16/305, Mawerdî, t.t.: 3. 453)

Ev rîwayeta bi pir tarîqa/rêçikan di gelek pirtûkan de hatîye rîwayetkirin. Fexruddîn Razî (w.606/1210) di tefsîra vê ayetê de dibêje ku di Qur'anê de behsa wî kesê ku pêşnîyara şewitandinê daye kî ye nehatîyekirin. Di berdewama vê tefsîrê de hinek riwayetên din jî tîne. (Razî, 1420: 22/157)

Mufessir İbn Âşûr (w.1973) jî wek mufessirên klasîk, di tefsîra vê ayetê de heman tiştan dibêje. Lê belê ew vê rîwayetê qels dibîne û xwediyê vê rîwayetê bi nav nake. Dibêje ku ayet delaletî ser istîşarê dike. Ango Nemruz bi qewmê xwe şêwirî û piştî vê şêwrê biryara şewitandinê dan. Dîsa dibêje ku ew kesê ku pêşniyara şewitandinê daye yekî Kurd bûye. Lê hema ê ku gotiye "bişewitînin!" Nemruz bûye (Îbn 'Aşûr, 1984: 17/105).

---

[4] Sureyê Enbîya, 21/68,69.

Mirov dikare derbareyê van rîwayetan de gelek tiştan bibêje. Lê belê bi kurtasî em dikarin wiha bibêjin: Divê berî her tiştî ev riwayet bê teshîhkirin. Lewra mîna ku li jorê jî hatîye diyarkirin, her mufessirek navê vî kesî bi awayekî dibêje. Ev jî delaleta ser qelsbûna vê rîwayetê dike. Ya duyemîn, weke ku İzzet Derweze (w.1984) jî gotîye, gelek rîwayetên ku li derbareyê qiseyên ku di Qur'anê hatine ragihandin, çavkanîyên wan Îsraîlîyatin û keresteyên nivîskî yên Cihûyan ên wê demê ne. (Derweze, 1383: 1383, 5/277)

### 4- Ayeta Şazdemîn A Sureyê Feth

قُلْ لِلْمُخَلَّفِينَ مِنَ الْأَعْرَابِ سَتُدْعَوْنَ إِلَى قَوْمٍ أُولِي بَأْسٍ شَدِيدٍ تُقَاتِلُونَهُمْ أَوْ يُسْلِمُونَ فَإِنْ تُطِيعُوا يُؤْتِكُمُ اللَّهُ أَجْرًا حَسَنًا وَإِنْ تَتَوَلَّوْا كَمَا تَوَلَّيْتُمْ مِنْ قَبْلُ يُعَذِّبْكُمْ عَذَابًا أَلِيمًا

*"Ji bedewiyên ku li paş mane re bibêje: Li hemberî milletekî ku xwedan hêzeke dijware gaziya şer dê li we bê kirin. Hûn ê şerê wan bikin, an jî ew ê(bêşer) misilman bibin. Vêca hûn(çûna şer) qebûl bikin, Xwedê dê perûyeke spehî bide we. Lê belê eger weke cara pêşîn hûn dîsa ji paş ve vegerin, Xwedê dê bi ezabekî dijwar û cansoj we ceza bike.."*[5]

"Di derbarê vê ayetê de gelek tişt hatine gotin. Hin ji mufessiran gotine ku ew qewmê ku di ayetê de derbarê wan de wekî "*qewmekî ku xwediyê hêzeke dijwar in."*hatîye gotin, Kurd in. Rîwayeta ku dibêje ew qewm Kurd in, ji Ebu Hureyre (r.x.l) hatîye ragihandin. Ji wî hatîye pirsîn bê ka ev qewm kî ne. Wî jî gotiye ku "Ew Bariz in ango Kurd in. (Qureşî, 1420/1999: 6/309) "Ji Ebu Hureyre (r.x.l) hatîye pirskirin ku ka gelo ev qewm kîne?" Wî di şerha vê hedîsê de jî, wekî ku di şerha ayetê de gotibû, heman bersîv daye." (Öncü, 2020: 43-51) Di derheqê vê ayetê de di heman mijarê de gotarek serbixwe hatîye nivîsandin.(Suyutî: t.t.: 7/519, Şewkanî, 1414: ?)

### 5- Ayetên Wekî Din Ku Mufessiran Bi Hinek Munesebetan Behsa Kurdan Kirine

Ji bilî wan ayetên ku me li jor yek bi yek nivîsand hinek ayetin din jî hene ku mufessiran di tefsîra wan ayetan de behsa Kurdan kirine. Hinek ji wan ayetan ev in.

وَمِنْ آيَاتِهِ خَلْقُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ وَاخْتِلَافُ أَلْسِنَتِكُمْ وَأَلْوَانِكُمْ إِنَّ فِي ذَلِكَ لَآيَاتٍ لِلْعَالِمِينَ

"*Ji nîşanên (qûdreta) Xwedê yê ku erd û asîmanan afirandine, zimanên we û rengên we ji hev cuda çêkirine. Bêgûman di vê de ji bo mirovên zana ders û îbret hene."*[6]

Li gorî vê ayetê, ji aliyê gelek mufessiran ve tê gotin ku Kurdî jî zimanekî ji zimanê li ser ruyê dinyayê ye û zimanekî gelekî qedîm e. Zimanê Kurdî jî ayeteke ji ayetên Xweda ye. Ji bo vê yekê mirov dikare bibêje ku qirkirina zimanê Kurdî qirkirina ayetek ji ayetên Xweda ye. Di tefsîra vê ayetê de mufessirê mezin İbn Kesîr (w.774/1373) dibêje ku وَاخْتِلَافُ أَلْسِنَتِكُمْ cudabûna zimanan cudabûna ziman û ferhengan e. Ev mufessir digel zimanê Kurdî çardeh zimanan dihejmêre. (Qureşî, 1420/1999: 6/309)

فَإِن طَلَّقَهَا فَلاَ تَحِلُّ لَهُ مِن بَعْدُ حَتَّىَ تَنكِحَ زَوْجًا غَيْرَهُ فَإِن طَلَّقَهَا فَلاَ جُنَاحَ عَلَيْهِمَا أَن يَتَرَاجَعَا إِن ظَنَّا أَن يُقِيمَا حُدُودَ اللّهِ وَتِلْكَ حُدُودُ اللّهِ يُبَيِّنُهَا لِقَوْمٍ يَعْلَمُونَ

*"Vêca eger mêr, jinê berde, êdî li wî ne helal e(ku dîsa wê mehr bike) heyanî ku(ew jin) bi mêrekî din re nezewice. Eger wî(mêrê duyem jî) ew berda, êdî tu guneh li ser herduyan*

---

[5] Sureyê Feth, 48/16.

[6] Sureyê Rûm, 30/22.

*nîn e ku dîsa li hev vegerin, bi şertê wan bawerî anîbe ku ew ê tixûbê Xweda bicih bînin. Ev tixûbên Xweda ne, Xweda ji bo qewmekî ku dizanin û têdihîjin, wan eşkere dike."*[7].

Di vê ayetê de Xweda behsa telaqê yanê jinberdanê dike. Dibêje ku piştî berdanê û ji hev veqetînê, heger jin û mêr bixwazin ku ji nû ve li hev vegerin, bi hinek şert û mercan dikarin li hev vegerin. Dîsa bibin jin û mêrê hevûdin.

Mufessir Qurtubî (w. 671), di tefsîra vê ayetê de behsa telaqê û heq û huquqê jin û mêran dike. Di wê derê de Qurtubî dipirse, gelo ma jin neçar e ku xizmeta malê û xizmeta mêrê xwe bibîne yan na? Nîqaşên heyî tîne zimên. Piştra dibêje ku, di vê mijarê de tiştê ku esas tê girtin çanda milletan an jî kevneşopiya gelan e. Qurtubî di çarçoveya vê mijarê de tabîra gotina "Jinên Kurd" bi kar tîne. Dibêje ku eger ev jin yek ji jinên Kurd, Deylem an jî jinên çiyayî be, ku ji jinên van gelan û van herêman çi tê xwestin, mêrê van deveran jî dikarin ji jinên xwe wan tiştan bixwazin. (Qurtubî, 1384/1964: 3,154, Endelusî, 1420: 2,481, Hanbelî, 1419/1998: 4,151)

أَمْ تَسْأَلُهُمْ خَرْجاً فَخَراجُ رَبِّكَ خَيْرٌ وَهُوَ خَيْرُ الرَّازِقِينَ

*"Yan jî ma tu xeraceke jî wan dixwazî(vêca ew nayêne îmanê)? Êdî dana Xwedayê te(ji ya ku ew bidin) çêtir e û her ew e çêtîrînê riziqdaran."*

Di vê ayetê de Xweda ji Hz. Pêxember (s.x.l) re dibêje, "Ji wan tiştekî nexwaze." Di vê ayetê de li ser cudahiya di navbera bêjeya "xerc" û "xerac"ê hatîye rawestin. Di vê mijarê de, di hinek tefsîran de tabîra **خَرَاجُ الْقَرْيَةِ**derbas dibe. Va gotina ne gotina ereban e, ereb vê gotinê nizanin yani li ba ereban ev gotin nayê zanîn. Ev gotin, gotina kurdan e.(Îbn 'Aşûr, 1984: 18,96)

Mirov gorî van agahîyên ku di van tefsîran de cih girtîye têdigihêje ku Kurd di nav Ereban de di caxên berê de dihatine naskirin. Herweha Kurd miletekî serbixwe û xwedî hêz û quwet dihatine zanîn. Ev tefsîr di derbarê pêkhateya civaka Kurd de jî agahîyan didin. Bi nêrînek e giştî mirov dikare bibêje ku di van tefsîran de bi hawakî erênî behsa Kurdan hatîye kirin.

**Encam**

Çavkanîyên Erebî yên derbarê Kurdan de gelek girîng in. Piştî dînê Îslamê ev çavkanî berfirehtir bûne. Lêkolînên li ser Kurdan pirzimanîyê dixweze. Ji bo ku mirov bigihêje van divê ku bi zimanê Erebî baş bizanibe. Da ku bigihêje van çavkanîyan û daneyan ji wan hilbigre. Di nav van çavkanîyan de tefsîrên ku li ser Qur'an a Pîroz hatine çêkirin gelek in. Di tefsîra çend ayetên Qur'anê de mufessiran behsa Kurdan kirine. Heya ku li dest me hat me jî di vê xebatê de cihê ku mufessiran behsa Kurdan kirine tespît kirin. Em di dawîya vê xebatê de gihiştin hinek encaman. Di encama van agahîyan de mirov dikare van tiştan bibêje:

1- Mirov dikare bibêje ku bêjeyên wek "Kurd", "Ekrad, Zimanê Kurdî" hîn di serdema îslamê de di çavkanîyan de cih girtine.
2- Ji van kitêbên tefsîrê tê fêmkirin ku Kurd bi sedsalan e ku li welatê xwe bi heman navî dijîn. Ax a ku a niha Kurd li ser niştecihin wan demana jî li ser heman axê niştecih bûne. Coğrafya Kurdan ji wê demê heya îro pir neguherîye.

[7] Sureyê Baqara, 2/230.

3- Di tefsîra van ayetan de gelek caran Kurd, Tirk û Faris bi hev re hatine zikirkirin. Ev jî encama nêrîna Ereban e ku gelan wekî “Ecem” û “Ereb” dabeş dikin.
4- Kurd ji aliyê aborî û civakî ve, di demên kevin de jî pêşketî bûne.
5- Ji rîwayetên ku di kitêbên tefsîrê de cih girtine tê fêmkirin ku di ilmê tefsîrê de gelek zane û rawîyên mezin ên Kurd hene.
6- Li van agahîyan tê fêmkirin ku hinek berên Kurdan bi cengawerî û şervanîye xwe hatine naskirin.
7- Ji navê seh/kuçikên ku wek cînsekî “kuçikê kurdî” tê zanîn ku hinek berên Kurdan koçer û xwedî bez û dewar bûne.
8- Agahîyên ku derheqê Kurdan de di tefsîran de cih girtine gelek ji wan erênîne lê hinek ji wan jî neyînî ne.

Piştî van encaman mirov dikare ji bo xebatên nûh hinek tiştan pêşnîyaz bike. Wek mînak mirov dikare li ser bêjeye “Cûdî” raweste. Gelo têkilîya wê bi bêjeyê “Gutî” ve heye an na? Divêt li ser Tewrat û le ser şerhê wê jî derheqê Kurdan de xebat bên çêkirin. Lewra dibe ku hinek agahîyên di vî warî de ku di kitêbên tefsîrê de cih girtîne çavkanîyên wan Îsraîlîyat bin. Divê di akademîyan de gelek tezên mastir û doktorayê, gotar û teblîxên zanistî li ser çavkanîyên Erebî ên derheqê Kurdan de werin çêkirin. Ev ne tiştekî zehmet e jî. Lewre li gorî qenaeta min, îro di alema îslamê de ew kesên ku wek zanyarên Kurdan têne pênasekirin ku ji van çavkanîyan fêm bikin ne kêm in. Gelek alim û lêkolînerên Kurd, bi Erebî baş dizanin û dikarin bi rihetî bigihêjin van çavkanîyan. Lewra neteweyeke ku haya xwe li dîrokê hebe dikare ders û îbretan lê bigre û pêşerojek e roniktir ava bike.

**Çavkanî**

Ankarawî, İsmail (t.t.). Rûhu’l-beyân. Dâru’l-fikr. Beyrût.
Ba’lî,Muhammed (1422). el-Menhecu’l-qewîm. thk., Muhammed k. Îmrân. Dâru alem. Mekke.
Derweze, İzzet (1383). et-Tefsîru’l-hadîs. Daru ihyai’l-kutubi’l Erebiyee.
el-Hicâzî, Muhammed (1413). et-Tefsîru’l-wadih. Daru’l-cîl el-cedîd. Beyrut.
el-Maqrizî, Takîyuddîn (1420/1999). Îmtaû’l-esma’. Dâru’l-kutubi’l-ilmiyye.
El-Qurtûbî (1420/1999). el-Cami li ahkamî’l-Qur’ân.
Endelusî, Ebu Hayyan (1420). el-Bahru’l-muhît. Daru’l-fikr. Beyrut.
Êsî, M. Huseyn, M. Se'îd Girdarî, M. Muhemmed Bêrkevanî (2014). Wergera Maneya Qur'ana Pîroz Ser Zimanê Kurdî. Tehqîq û Teshîh, Haşim Özdaş. Şura Yayınları. İstanbul.
Hanbelî, İbn Adil (1419/1998). el-Lubab fî ‘ulûmî’l-kîtab. Daru’l-kutubi’l-ilmiyye. Beyrut.
Hicâzî, Muhammed (1413). et-Tefsîru’l-wadih. Darul-cîl el-cedîd. Beyrut.
Îbn ‘Aşûr, Muhammed (1984). et-Tahrîr ve’t-Tenwîr. Daru’t-Tunusiyye. Tunus.
İmâdî, Ebussuud Efendî (t.t.). İrşâdu ‘aqli’s-selîm. Dâru ihyâi’t-turasi’l-Erebî. Beyrut

İsfehanî, er-Rağıb (1420). Muhadaratu'l-udeba. Şîrketu dari'l-erqâm.
Mawerdî, Ebu Hasan (t.t.), Tefsîru'l-Mawerdî, Dâru'l-kutubi'l-ilmiyye. Beyrut.
Mucahid(1410/1989). Tefsîra Mucahîd thq, Muhammed Abdusselam Ebu'n-nîl. Daru'l-fikr el-İslamî el-hadîs. Mısr.
Mukatîl b. Suleyman, Tefsîra Muqatil b. Suleyman.
Nîsaburî, Nizamuddin (1416). Xeraibu'l-Qur'an. Daru'l-kutubi'l-îlmiyye. Beyrut.
Öncü, M. (2020). Kurd Di Çarçoveya Tefsîra Ayeta Şazdemîn A Sureyê Fethê. Kurdiname, (3), 43-51.
Qadî, Beydawî (1418). Tefsîru'l-beydâwî. Dâru ihyâi't-turasi'l-Erebî. Beyrut.
Qureşî, İbn Kesîr (1420/1999). Tefsîru'l-Qur'anî'l-azîm. tahqîq: Samî b. Muhammed Selame, Çap. 2. Daru taybe.
Qurtubî, Şemsuddîn (1384/1964). el-Câmî' lî ahkamî'l-Qurân. Dâru'l-kitabi'l-Misriyye. Misr.
Razî, Faxruddîn (1420). Mefâtîhu'l-xayb. Dâru ihyai't-turasi'lErebî. Beyrut.
Reşît Riza(1990). Tefsîru'l-menâr el-Hey'etu'-Misriyye. Mısr.
Suyutî (t.t.). ed-Durru'l-mensûr Dâru'l-fikr. Beyrût.
Şewkanî, Muhammed (1414). Fethu'l-qadîr. Dâru'l-kelimi't-tayyîb. Dimaşq-Beyrût.
Taberî, İbn Cerîr (1422/2001). Camîu'l-beyan fî tewîlî'l-Qur'an. Dâru hicr.
Wahidî, Ebu'l-Hasan (1415/1994). et-Tefsîru'l-wesît. Daru'l-kutubi'l-ilmiyye. Beyrut.
Zuhaylî, Wehbe (1418). et-Tefsîru'l-munîr. Daru'l-fikr el-mausir. Dimaşq.

Kurdiname Akademik
Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

# ORF Û EDETÊN DAWETAN LI FARQîNÊ YÊN DI NAVBERA SALÊN 1980 Û 2000î DE

## 1980 ve 2000 YILLARI ARASINDA SİLVANDAKİ DÜĞÜN ÖRF VE ADETLERİ

(MARRIAGE CUSTOMS AND USAGES IN FARQÎN BETWEEN 1980-2000)

Abdulhalim EKEN*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 12.10.2022
**Accepted // Pejirandin:** 27.11. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 112-127
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1188228

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Eken Abdulhalim (2022). Orf Û Edetên Dawetan Li Farqînê Yên Di Navbera Salên 1980 Û 2000î De, *Kurdiname*, no. 7, p. 112-127

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

**Kurte**

Dawet, şahîya zewacê ye. Di heman demê de ji bo zewacê merasîmeke şahidîyê ye. Dawet edetên cuda ne, di temamê civakan de. Di nav salan de ev edet tên guhertin. Dawet di nav kurdan de beşeke gelek giring e ji çanda wan. Ji ber vê ye ku neyê parastin dê winda dibe. Ji bo parastinê gelek tedbîr hene. Ji wan tedbîran yek jî qeydkirina zanyarî ye. Farqîn ji alî çandê ve dewlemend e. Dawet beşên gelek giring in di çandê de. Ji ber tesîrên dîrokî û civakî edetên dawetan tim tên guhertin. Hin jî di salên 1980î de hatin guhertin. Guhertin û edetên ku nû çêbûn nêzî bîst salan dewam kir. Ji ber teknolojîyê gelek regez hatin terkkirin. Edetên ku mane bi guhertinên nû ve berdewam in.

**Peyvên Sereke:** Farqîn, edetên zewacê, pîrozbahîyên zewacê.

**Özet**

Dügün evlilik için kutlamadır. Evliliğe şahitliktir. Bütün toplumlarda değişik şekilde icra edilen âdetlerdir. Son yıllarda bu âdetlerde değişim- dönüşüm oldu. Düğün, Kürtler'de kültürlerinin çok önemli bir parçasıdır. Dolayısıyla bu adetlerin korunması gerekir. Korunması için birçok tedbir mevcuttur. Bu tedbirlerden bir onları kayıt altına almaktır. Silvan kültür bakımından zengindir. Düğün, kültürün önemli bir parçasıdır. Tarihi ve sosyal amillerden düğün adetleri değişime uğradı. Seksenli yıllarda düğünlerin bazı adetleri değişime uğradı. Bu değişimler ve yeni âdetler takriben yirmi yıl sürdü. Teknolojik gelişmelerden dolayı birçok uygulama terk edildi. İcra edilen âdetler devam etmekteler

**Abstract**

Wedding is the celebration of marriage. It is a witnessing ceremony for marriage. Weddings are different customs in all societies. They change over the years. Wedding is an important part of Kurdish culture. When wedding customs are not preserved, they change. There are many measures for their protection. One of these measures is scientific recording. Farqîn (Silvan) has a rich oral culture. Weddings are also the most important part of this culture. Depending on historical and social changes, weddings have constantly changed. Some of the very old wedding customs changed in the early 1980s. Some survived unchanged. During this period, which lasted for about 20 years, significant changes and transformations took place. Many cultural elements have been

* Xwendekarê lîsansa Bilind, ekemhalim@gmail.com, ORCID: https://orcid.org./0000-0002-4674-9004

abandoned due to technological developments. Those who managed to survive continue their existence with new customs.
**Keywords:** Farqîn, marriage customs, wedding celebrations.

**Destpêk**

Mirov di civakê de dijî. Ji ber wî awayî pêwist e însan normên civakê bi cih bîne. Ev normên civakî hin jê orf û edet in. Bêyî wan jiyîn zehmet e. Mirov bi girêdana civakê xwe dide qebulkirin(Çeliker-Genç, 2019: XII/2). Esasê civakê malbat e. Di malbatê de demên jîyanê hene. Demên giring sê heb in. Ji wan deman re dibêjin "demên derbasî"(Örnek, 2018: 182): Zayîn, zewac, hene, sinet, çûna leşkerîyê û mirin. Ew jî di nav xwe de dibin hin demên piçûk. Her dem bi serê xwe pêvajoyek e. Her çiqas bi navekî bên gotin jî demên derbasî şeklên wan li gorî her civakê cuda ne. Û her dem li gorî tebîeta xwe xwedîyê gewşînan e.

Zayîn ji bo zêdebûna însan tiştekî pêwîst e. Di vê demê de kêf û xweşî heye. Gava ku sebî tenduristîya wî baş be malbat û eqreba bi kêf dibin. Berî zayînê gelek amedekarî çêdibin. Kinc û berg tên çêkirin. Pêçek, belîfok û lihêfok tên çêkirin. Dergûş tê kirîn an çêkirin. Roja tengîyê gazî pîrikekê dikin. Pîrik dikeve ber pişta nexweşê. Jê re dibe alîkar. Navoka sebîyê dibirin. Di demên dawîn de wextê tengîyê êdî serî li nexweşxaneyan dixin. Lêbelê hin pîrek hene ku zarî ji wan re çênabin. Wê çaxê ev jin diçin ser zîyaretan. Diçin bal şêxan. Nivîştan çêdikin. Jinên weha mêr hewî tînin ser wan.

Wextê çêbûna sebî sîleh tê berdan. Der û cînar malbatê pîroz dikin. Li sebî navekî mêrxas an jî yekî qenç datînin. Qurban tê dayîn. Heta çilê dayikê neqede wê bi tene nahêlin. Xwedêgiravî dibêjin "Cin digîhêjinê." Ji ber wî awayî şûjinekê dikin ber belîfokê sebîyê ku di dergûşê de ye. Nezerokan bi filketê bi ber dilê sebîyan ve vedikin. Hin pîrek çarika xwe ji ber devê xwe nadin alî ji ber ku cin nekevin devê wan.

Sebî wextê diranên wan yên şîr cara ewil diavêje nokan bi serê wan dadikin. Beroşek nokên kelandî çêdikin. Gazî der û cîranan dikin. Sebîyên wan tev tên. Meqes, şe, eynik, qelem, Kur'an, defter didin ber sebîyê ku diranê wî derketîye.

**Zewac:** Zewac, di jîyana însan de dema duyem e. Ji ber ku di zewacê de esasê malbatê çêdibe zewac gelek giring e. Ji alîyê civakî de jî gelek nirxên wê hene. Rêya ku diçe zewacê pêvajoyeke dirêj e. Ji bo zewacê dawet çêdibin. Kevneşopî, orf, edet û rîtûel di dawetan de gelek in(Çalışkan Erol, 2019: 2). Her civak, li gorî xwe orf û edetên xwe, zewacên wan hene(Örnek, 2018: 255).

**Mirin**: Mirin di demên derbazî de dema sêyem e. Jîyan pê bi dawî dibe. Lêbelê hêj ku mirin nehatî ji bo wê hin orf, edet û rîtûel hene. Bi wan tê emelkirin. Wextê mirinê û pişt wê de jî hin edetên cûrbicûr hene. Fena ku li ser mirî Kur'an tê xwendin, di pey mirî de her rojên perşemê şîva wî tê dayîn.

Mijara me orf û edetên dawetên Farqînê ye. Ev edet li nava Farqînê û li gundên wê yek in. Hin edetên xerîb hene. Lêbelê ew di heremê de hindik in. Em hinekî behsa edetên berî mijarê û piştî wê dikin ji ber ku mijar zelal bibe. Em wextê mijarê, weka bîst salî fireh digirin. Ji ber ku mijar di vê demê de di rengekî de ye. Farqîn heremeke dîrokî ye. Heta îro ji gelek welat û şaristanîyan re bûye war. Rêçên mîrata wan şaristanîyan li her derê Farqînê hene(Savran, 2004: 511-512). Ew rêçên dîrokî heta îro tên. Çand li wê heremê dewlemend e. Mînak, pirtûkxaneya ku di dema mervanîyan de dewlemend dibe tê de 1.040.000 cîldên

pirtûkan hene[1]. Ev mînak dide nîşandan ku ji berê de Farqîn ji alî çandê ve devlemend e. Çanda bidevkî, bi jîyana gelen heremê hebûna xwe didomîne. Tomarkirina çandê giring e. Lêbelê tiştên komkirî roj bi roj tên guhertin an jî winda dibin.

Heta îro li ser Farqînê çend pirtûk hatine nivîsandin.[2] Piranîya wan li ser alîyê dîrokî sekinîne lewra berhemên dîrokî ne. Derheqê çanda devkî de kêm tişt di wan de hene. Ji alîyê çanda devkî de berhemên têr û tije nînin. Lêbelê di demên dawî de bala kesan ketîye ser hewildanê zanyarî. Mînak, tezên akademîk êdî dest pê kirine[3]. Ji ber ku çavkanî kêm in me di xebata xwe de hevdîtinên taybet pêk anîn. Me û şahid û yên ku ew edet pêk anîne bi hev re gotûbêj li dar xistin.

Me xebata xwe kir 3 be. ji ber ku em wê baş ronî bikin: Dema berî 1980, dema navbera 1980 û 2000î û dema piştî 2000î. Edetên wan deman herçiqas bi heman navî bin jî şekil û naverokên wan cuda ne. Hin ji wan hatine terkkirin, hin ji wan hatine guhertin û hin ji wan berdewam in. Bi rastî di carekê de nivîsandina ferqa her sê deman dijwar e. Bo min hinekî zor bû ku bi hûrgilî binivîsim. Ji b ber wê min xalên herî giring berhev kirin. Di vê xebatê de em behsa kevneşopîyên nû dikin. Bi taybetî pir behsa prosesa piştî 2000î nakin. Ji xwe edetên dawetan piştî 2000î tên qeydkirin. Pirsgirêkên windabûna wan tunene. Ku winda nebin pirsgirêk çênabin di wî warî de. Lêbelê orf û edetên her du demên berê ku qeyd nebin ew dê winda bibin. Astenga windabûna wan qeydkirina bi hewildanên zanyarî ye. Xebat û hewldanên di wî warî de zêde dibin.

Em ê niha li ser van sê beşan bisekinin û bibînin ka çi adet li ser van beşan hebûne:

## 2. Pêvajoya Berî Dawetê

Li gorî her du pêvajoyên din ev pêvajo giringtir e. Ji ber vî awayî qîmeta vê pêvajoyê gelek e. Li Farqînê mirov dikare pêvajoya berîya dawetê weha bike beş: emrê zewacê, ecibandina qîzê, xelatkirin, xwestina qîzê, qelen, nîşan û cihêz.

### 2.1. Emrê Zewacê (Emrê ber Zewacê)

Li gor hevdîtina bi çavkanîyên devkî li Farqînê qîz û xort di salên 1980î de zû dizewicîn. Sedema vê yeke ya bingehîn_pergala feodalîyê ye. Ji xeynî vê yekê ew kewneşopîyên çandan ku tesîr didin çanda kurdan. Mînak “zewaca dergûşê” û pirjinanî/mêran (polîgamî) hene. Carinan jî qîz û xort ser bîst salî jî dizewicîn. Ji ber sebebên nexweşîyê, nexweşikbûnê û pirsgirêkên bejnê, yan qet nezewicîne yan jî dereng zewicîne hene. Malbatên xerab, kes qîza xwe nade wan. Qîzên ku leke li wan hebûye kes wan naxwaze. Leke ew e ku navê wan bi hin xortên din re derkeve. Yan jî ku destavêtin hebe. Xort, ku tebîetên wî yên nebaş hebin zewaca wan ne hêsan e. “*Ji bo ku qismetê keç û xortan vebe li bal mela nivişt çêdikirin. Melayekî meşhûr hebû, nivişt çêdikirin li Farqînê. Mala wî li Kanîya Mezin bû. Nivişên wî cîyê xwe digirtin.*” (H. Eken, hevdîtin, 67 salî, Farqîn, 12.9.2022) “*Ji bo ku qîz herên ser qismetê xwe diçûn ser zîyaretan.*” (F. Eken, hevdîtin, 90 salî, Farqînê, 9.10.2022). Du heb ji ziyaretên kevnecar û navdar yên li Farqînê Darêka Xiznaxiyê û Ser Hivde ne.

---

[1] http://kovarabir.com/seid-veroj-mervaniler-doneminde-gelistirilen-meyafarkin-ve-diyarbekir-kutuphanesinde-bir-milyon-kirk-bin-1-040-000-cilt-kitap-mevcuttu,dîroka gihîştinê: 15 Mart 2022.

[2] Minak: 1-Barnas, Rojen, Sîlvan Silîvan Farqîn, Weşanên Nûbiharê, 2013 2- Ayhan, Cennet, Silvan’da Ağıt, Peri Yayınları, 2013. 3- Parlak, Yaşar, Alkan, Adnan, Silvan İlçesi’nin Beşeri ve İktisadi Coğrafyasi, Kriter Basım Yayın Dağıtım, 2018. 4- Ahmet bin Yusuf, Tarix-i Meyafarqîn, Nûnihar, 2014.

[3] Matyar Berivan, Pêvajo û Kevneşopîyên Dawetên Gundê Çîçikayê (Teza Lîsansa Bilind), Diyarbekir, 2021.

Li Farqînê di nav salên 1980-2000î de emrê zewacê zêde dibe. Keç û xort di emrê nava 18 û 30yî de dizewicin. Li vir bandora teknolojîyê heye. Televîzyon dikeve her malê wê çaxê. Li ser bandora telewîzyonê and medyayê gelek tişt hatine nivîsandin (Sanders, 2019: 48-59). Fîlm û rêzefîlm evîn, berdan, xelîlî, têkilîyên nav mêr û jin de bi rêya ekranan li ber çavan radixin. Herwisa guhertin pir an jî zêde li ser çandê çêdibe. Li Farqînê xortên ezeb ji bo xebatê diçin bajarên mezin. Bandora bajarên mezin li ser wan çêdibe. Ji ber wî awayî dereng dizewicin. Wekî din di wan salan de siyasetên nû li heremê rû didin. Fikrên îdeolojîk bandor didin ser xortan. Lewma zewac dibe hewcedarîyeke duyem ji bo wan. Dibistan zêde dibin. Derfetên perwerdeyîyê xeta li her gundî çêdibin. Xortên ezeb wan rêyên çandên cuda nas dikin. Di salên 1990î de hin dibistan tên girtin. Hin xort li gorî derfetên xwe diçin şehr an bajaran ji bo perwerdehîyê. Xortekî li Farqînê dixwend ji ber zehmetîya sîyaseta qirêj li ser wê mijarê weha dibêje: "*Min ji ber bûyerên sîyasetên ku li Farqînê diqewimîn Lîseya Farqînê terk kir. Bavê min, ez şandim Edeneyê. Min li wir li perwerdehîya xwe dewam kir.*" (O. Eken, hevdîtin, 48 salî, Farqîn, 2.10.2022)

Tiştên ku me li jor behs kir bandora wan li ser zewacê çêdibe. Lewma emrê zewacê di wan salan de hinekî bi paş dikeve.

Di salên 2000î de ciwanên heremê dest davêjin perwerdehîyê, wê giring dibînin. Li her malekê xwendekarekî zanîngehê heye. Xeta perwerdehî neqede xwendekar nazewicin. Ji ber pîşeyên ciwanan yên nû wekî memurtîyê bandora rûspîyan li ser ciwanan kêm dibe. Edetên berê tên guhertin. Qerar dikeve destê dilxwazîyên zewacê. Di wê pivajoyê de yekî, bûyera derheqê zewacê de ku di serê wî de derbas dibe bi vî awayî dida zanîn: "*Birayek min hebû xwend. Bu mielim, ji tirkan bi yekê re zewicî. Terka me kir, çû li gundê hevjîna xwe dest bi jîyanê kir. Me jî ji ber ku zaroyên me yê din me terk nekin, em çûn bîst û pênc heb ji mekteban kişand.*" (S. Fidan, hevdîtin, 75 salî, Farqîn, 2.10.2022)

### 2.2. Dîtina Qîzê (Ecibandina Qîzê)

Berî 1980yî li Farqînê keç û xortên 12-13 salî di çavên malbata xwe de ji bo zewacê amade ne. Piranîya dê û bav li gorî xwe zarokên xwe dizewicînin. Qet haya zarokên wan tunebe jî diçin ji wan re qîz dixwazin. An jî bêyî qîzê xwe wan dizewicînin. Ev kevneşopî li heremên din jî hene. Mînak heremek ji Bartin e(Çalışkan Erol, 2019: 419). Di wê çaxê de yekî li Farqînê bê xebera wî ku wî zewicandine weha divê: "*Ez ji çolê hatim malê. Ji min re gotin "Here oda xwe." Wextê ku min derê odê vekir qîzke ku cilê wê nûbûn runiştî bû. Min nizanibû ku ez çi bibêjim. Serçokê min qul bûn. Min fedî kir. Wisa min destê xwe dida ser çoka xwe. Bala bûkê kişand. Hate min şakir. Êdî şerma min jî çû.*" (M. Erdağ, hevdîtin, 70 salî, Farqîn, 20.9.2022)

Berî 1980yî di destê keç û xortê ku dizewicin de pir tişt tune ne. Qerarê dê û bav giring e. Carinan qîz û xort di dawîyê de hîn dibin ku hatine zewicandin. Dê û bav mirovên xwe dixwazin. Dibêjin "Ku em extîyar bibin bila li me binêrin." Mesrefa xizman hindik e û anîna wan hêsan e. Lêbelê her malbat ji maleke ku li gorî wan be qîz dixwazin(Altınboğa, 1999: 91). Û qîz gerekî ji heqê malê derkeve. Yanî malê hilîne û dayne. Xweşikbûna qîzê jî giring e[4]. Ê ku wan şertan diyar dikin rûspîyên malan in. Carinan qîz û xort bê navbeynçîtî jî hev diecibînin. "*Dîtina qîza li gezmaxîyê, li şahîya, li şînê, li daweta, li ziyareta an jî li ser*

[4] Di wî warî de gotinên pêş hene: Avê weynên ji mesîla, qîzê weynên ji 'esîla.

*kanîya pêk dihat. Şuxo ê ku sebîyê wan tê zewacê tim çewê xwe digerandin."* (M. Arslan, hevdîtin, 50 salî, Farqîn, 29.9.2022) Di malbatê de yê ku qîzê diecibîne xeberê dide xortî. Xort ku qîzê biecibîne xeberê dide malbata xwe[5]. Xort xeberê dide dêya xwe. Daxwazên weha naçin cem bav. Dê daxwazê ji bav re dibêje.

Wekî ku me li jorê got dîtina qîzê ji bo zewacê di nav kurdan de gelek kevnar e. Ew ji berê de tên zanîn. "*Xort û qîz rê da dizîkava hev mukur tên, gilîyê xwe dizîkava hevra dikin. Xort paya didine xwe, çewa qewil dane hevdu, wekî ew dilketîyêd xwe hevdu bistînin. Hinek xort jî yê ku soz dan hevdu, wekî xûşkê xwe hevra têne berdêlî. Cahîl hevra dibên, çewa havînê li zozana wanra pak li dihat, eşq derbas dikir. Tê bîra wan, ber tumê soyê yan tûme qulîlkan çewa ew û dilketîyê xweva cem hev runiştîbun, çewali cîkî ava kanîya sar dixwarin. Pak tê bîra wan, çewa wana xwe ji ber çavê dê û bavê xwe vedişartin, diketne ken, henek û laqirdîya, çewa deste hevda sond dixwarin, wekî din jî hevdu kesekî nestînin. Xort cêvê xwe derdizistin dezmalê ser desta neqîşandî dest, zendik, berstu û telîqê neqîşandî, yê ku dilketîyê wan ji wanra dirubun, neqîşandîbun û dabune wana, wekî hevdu bîr nekin*(Şemo, 2016: 67-68)." Di hin berhemê din de jî edetên zewacê derbas dibe. "Keç û xortên ciwan xwe dixemilînin û diçin şêniyê Newroza Mîr." (Xanî, 2015: 69)

Berî salên 1980yî "zewaca dergûşê" û "sozdayîn" di heremê de hene. Lêbelê kêm in. Edeta "sozdayîn"ê wekî zewaca dergûşê ye. Cudatîya wan sozdanîn, zarok mezin dibin, hêj sozdayîn tê holê. Ev edet piştî 1980yî jî devam dike. Lêbelê ev dibe pirsgirêk di nav malbatan de. Ji ber ku hin hene li sozê xwe vedigerin. Loma bê huzurî çêdibe. Piştî 2000î de ev her du edet tên hilanîn. Êdî zewac pêgirtîya evîna beramberî hev e.

Berî sala 1980 de edeta berdêlîyê heye. Ev pêkhatin ji zewaca dergûşê û sozdayînê cuda ye. Ev pêkanîn piştî 1980yî û heta îro berdewam e. Lêbelê tehlîkeya wan pir e (Altın, 2008: 30).

Piştî salên heştêyî ji ber sebebên ku me li jor got derheqê zewaca keç û xortan de sermiyanî ji destê dê û bavê dertê. Ciwan herî pir li derve bê wan dijîn. Ê dilxwaz rewşê ji malbata xwe re dibêje. Malbat jî eger ku bi dilê wan be diçin dixwazin.

Piştî salên 2000î, hebandina keç û xortan ji bin bandora dê û bavê derdikeve. Ji ber pêşketina teknolojîyê keç û xort bi rêya torên civakî hev nas dikin. Li vir ji tiştê ku diqewime haya dê û bav jê çênabe. Helbet zewac tiştekî giring e. Ku riza dê û bavê tune be pirsgirêkên mezin çêdibin.

### 2.3. Sozdayîn û Xwestina Qîzê

Piştî ku qîza xwestinê diyar dibe ji alî malbata xortî ve yeka navsere bi ber guhê mala bavê keçikê dixe ku dile wan ê mirovatîyê heye. Eger malbata xort nas bikin û dilê wan hebe dibêjin "Erê.". Ku wan nas nekin qewlekî ji wan dixwazin ji ber ku malbatê nas bikin. Di wê navberê de malbata qîzê derheqê xortî de lêkolînê dikin. Wextê ku bi erênî qerar bidin destûrê didin ku werin bixwazin.

Sermîyanên malbata xortî diçin xwestina keçikê. Berî çûnê xeber didin wan. Êvarê bavê keçikê an jî ê ku di şûna wî de ye ji mêwanan re dibêje: Hûn bi xêr hatin! Hûn bi çi tên û bi çi diçin? Ev pirsa ku daxuyanî pê diyar dibe dipirse. Ê ku sereke ye dibêje: Nav xêrê de

bin. Bi emrê Xwedê dilê me bi mirovatîyê we re heye. Em dixwazin ku bibin mirovên hev. Bi vî awayî pêvajo dest pê dike. Eger ku bibêjin "Erê.", Fatiha tê xwendin. Malbat hev hembêz dikin. Û dibêjin "Xwedê miradê wan bi hev bike." Berî salên 1980yî xwestina qîzê bi erênî diqedîya şerbetê li yên ku di odê de ne belav dikin. Şerbet li gorî derfetan çêdibe. Li gundên çiyê şerbeta dimsê çêdibe. Lê li gundên deştê şerbeta şekirê çayê çêdibe.

Heta sala 2000î xwestina keça berdewam e. Lêbelê hin tiştên cuda hene. Eskerî û xebat giring in. Ku ev her du bi cih bin malbata qîzê daha dilxwaztir e. Pêşeroj giring e ji bo malbatan.

**2.4. Qelen**

Qerar ji bo mesrefê didin. Qelen, zêr, cil û hinek hewceyîyên din wextê xwestinê de dîyar dibin. Qerar di lîsteyekî de tê nivisandin. Wextê ku mala bavê qîzê pir dilxwaz nebin listeyê dirêj dikin ji bo mala lawik vekişin. Lêbelê gelek malbat dibêjin "Hûn û şerefa xwe, qerar di destê we de ye." Ku mesref jî qebûl bibe gustîlka ku bi xwe re anîne, an jî roja din distînin tînin, dixin tilîya bûkê. Piştî gustîlkê ji qîzê re êdî dibêjin "bûk" û ji lawik re jî dibêjin "zava".

Berî sala 1980yî di xwestina qîzê de mesref tê meydanê. Mesrefê li gorî aborîya mala lawik dibirin. Pir caran sê heb "zêrên reşadî" tên xwestin. Berê bazin pir tûne ne. Gustîlk û guhar pir hene. Carinan jî malbata qîzê perçeyekî 'erd, çêlekek, çend mêşin, çend bizin dixwazin. Ev tev ji bo wê ne ku di pêşerojê de bûk îdareya xwe pê bike.

Qelen berî 1980yî di nav gel de normal e. Lêbelê piştî wan salan qelen hino hino kêm dibe. Êdî eyb e di nav gel de. Di salên 1990î de qelen dibe qedexe[6]. Bi temamî tê hilanîn. Di wan salan de bi çavekî nebaş li qelen dinêrin. Dibêjin "Qîza xwe difiroşe." Ji ber wî hawayî kes qelen nastîne.

Berî 1980yî qelen bi peretî distînin. "*Qelen du panot an jî sê panot bu.*" (A. Noyan, hevdîtin, 75 salî, Dîyarbekir, 25.10.2022). Bi vî pereyî ezeb hebin wan dizewicînin an jî ji bo hewceyîyên din xerc dikin. Carinan jî tiving tê xwestin. Wê çaxê cûreyên tivingan hene. Bi navê "Tivinga Alman", "Tivinga Selebî", "Tivinga Şazîberno"… hene. Ku bixwestina teqez ew tiving tînin. Piştî salên heştêyî sîlahên otomatîk derketin pîyaseyê. G1 û keleş pir di rewacê de ne. Demançeyên çardexwer jî dixwazin ji bo qelen. Heta salên 2000î qelen kêm dibe. Di şûna qelen de ji bo mesrefê hinek malbat pere dixwazin.

Qelen ji berê de di nav kurdên heremê de heye. Qelen di kilaman gelek caran hatine gotin. Mînak kilama "Selîmo" ku qelen û berdêlî tê de derbas dibin.

Hab serwêlî serwêlî(2)
Selîmo lavo serwêlî(2)
Xwedayo tu ayikê min nehêlî(2)
Rebîyo tu ayikê min nehêlî(2)
Ya bi qelen ya bi berdêlî(2)
…………………………

**2.5. Nîşan (Rûvekirin)**

[6] Hinek partîyên sîyasî ku di heremê de bandora wan li ser gel heye stendina qelen baş nabinin. Gel jî fikrên wan di'ecibîne.

Ku qîz dihat xwestin çend roj an ji meh bi şûn de roja nîşanê dîyar dibe. Ev wext pir dirêj nabe. Ji her du alîyan jî xizm diçin mala bavê bûkê. Di dest xwe de xelat dibin. Êvarê şîv çêdibe. Mala zavê bi xwe re goşt, birinc û rûn dibin. Melzemeyên şîvê ji mala bavê zavê ne. Piştî salên 2000î êdî melzeme nabin. Mala bavê bûkê şîvê çêdikin. Piştî şîvê her kes xelata xwe bi bûkê ve datîne. Xelat li ber çavê her kesî tê dayîn. Kî çi anîbe yek, bi dengekî el dibêje. Xelat şemsîye, qumaş, qondere, pêjgîr... in. Piştî pêşkêşa xelatan bûke datînin ser kursî. Temezîka sor davêjin serçavê wê. Hinê hevîr dikin. Di wê arê de mûzîk hebe lê dixin. Kilamên rûvekirinê tên gotin. Tepsîyên bimumik digerînin. Kilama "Her Hine Her Hine" tê gotin. Tilîlî diavêjin. Dawîyê de destê bûke hine dikin. Lêbelê bûk destê xwe venake. Pere dikin destê wê, hêj destê xwe vedike. Ku li der û dor şîn hebe xelat bêdeng derbas dibin, ji ber der û cîrantîyê.

Pêvajoya nîşantîyê di nava şeş meh û salekê de ye. Carinan jî ji ber aborî an jî eskerîyê ev pêvajo dirêj dibe. Carinan jî nîşanê gerî difetilînin. Lê ev tişt kêm diqewime. Di nav gel de tiştekî nexweş e. Qeyba wî pir e. Her zîyaretîya bûkê de xelatan ji bûkê re dibin. Bûk xelatan dike nava boxçeyekê. Xelat bi piranî melzemeyên paqijîyê ne. Sabûna bibîn, şe, eynik, pêjgîr, gore, qolonya, kok, nîk, gilokên tayan, morîk û yazme ne. Ku qerar dabin ji kirîna zêran re, tên kirîn. Bi taybetî di îdan de ku neçin serdana bûkê ew tê wê watê ku pirsgirêk hene. Di pêvajoya nîşantîyê de ku hebe qelen tê stendin.

### 2.6. Cihêz

Di pêvajoya nîşantîyê de bûk cihêz çêdike. Li gorî aborîya malbatê cihêz tê çêkirin. Carinan qîz ji piçûkî de cihêz ji wan re çêdibe. Dêya wan çêdike. Hazirkirina cihêz bi salan dewam dike. Ev ji ber ku wextê nîşantîyê de rehet be. Hinek qîz ji ber ku di wextê xwe de nedizewicîn cihêzê xwe dubare dikin. Ji ber ku cihêz kêm dibe. *"Di cihêz de şelikên limêjê, qilifê Quranê, perdê dîwaran, qilifê belîfa ê binexş, melzemê mitbaxê, cilên sebîyan hene."* (R. Eser, hevdîtin, 82 salî, Mêrdîn, 12. 9. 2022)



Foto 1: Dîmenên hin cihêzan ji sala 2000î.

Berî 1980yî cihêz belîf, lihêf, doşek û nexşên bidestan in. Bûkên gundan ji bo wan diçin Farqînê an jî sûkên Diyarbekir rexel distînin. Li gorî derfetan cihêz tê kirîn. Cihêz di mal de bi taybetî tê mihafezekirin. Sindoqên cihêz hene. Di wan de cihêz li ser hev bi keys dibe. Piştî 1980yî xardirob dertên. Ew dibin moda. Ji her bûkê re tê standin. Piştî sala 1980yî dolabên atolyeyê derdikevin. Di wan de ref hene. Bûk bi eşyayê xwe wan refan dixemilînin. Çekmeceyên binî jî ji bo cihêz tên bikaranîn.

## 3. Pêvajoya Dawetê

Dawet demeka bipêvajo ye. Her wextê wê giring in. Mirov dikare pêvajoya dawetê bi ser van beşan dabeş bike: Îzna dawetê, belawkirina qomçeyan, çûna wî serî, pîrozbahî li

mala zavê, hina zavê, siwarkirina bûkê, tiraşa zavê, darika zavê, nanê dawetê, kirîvatî û hin pirsgirêkên piştî dawetê.

**3.1. Îzna Dawetê**

Wextê ku mala bavê zavê ji bo dawetê amade dibin nîyeta xwe ya çêkirina dawetê ji mala bavê bûkê re dişînin. Ji bo îzna dawetê yek diçe mala bavê bûkê. Ji wan re nîyetê dibêje. Ku bibêjin “Erê.” êdî malbat dest bi dawetê dikin. Dawet havînê yan jî payîzê li dar dikevin. Gelê herêmê pir jê cotyar in. Ber û bêderê xwe havînê didin hev. Destê wan fireh dibe. Ber xwe dibînin. Loma dawetan di vî zemanî de li dar dixin.

**3.2. Belawkirina Qomçeyan**

*“Piştî îznê dawetê qomçe beladibûn. Qomçe herî pir mendîlkî, pêjgîra desta an jî gorekekî bû.”*(Ş. Eken, hevdîtina tayber, 57 salî, Farqîn, 28.9.2022) Qomçe bi mehan, berî dawetê dişînin. Xizmên nêz in zû tên. Kesên nêz ku ji wan re qomçe neçe tê wê wateyê ku hisumet heye. Yê ku qomçe digire tê dawetê. Dawet li nava navçeyê be jî qomçe tên şandin. Pîrozbahîya dawetê ji her kesî re vekirî ye. Yê nenas jî dikare were beşdarî pîrozbahîyê bibe. Îzzet û îkram ji bo her kesî heye.

Piştî sala 2000î belawkirina qomçeyên dawetê tê guhertin. Berê gore û mendîl dişandin niha qertên dawetê dişînin.

**3.3. Çûna Wî Serî**

Dawet roja înê tê lidarxistin. Roja yekşemê piştî peyakirina bûkê dawet difelişe. Berbûrî roja şemîyê êvarê diçin wî serî. Bi çend erebeyan diçin. Xwarin çêdibe li wir. Malbata bûkê gazî nasê xwe dikin ji bo pîozbahîya êvarê. Ev dawet bi tenê bi dev e. Qomçe naşînin. Lêbelê hinek ji wan xelatên xwe tînin. Wextê pîrozbahîyê bi bûkê ve datînin. “*Şeva desthinê li orta odê bûkê datînin ser kursiyekî. Bêjingek bi ser serê wê de digerandin. Sabûn, lûfik û xelatên din diavitnê.”*(A. Özkaya, hevdîtin, 68 salî, Merdîn, 2.10.2022) Destê bûkê hine dibe. Pêşî destê bûkê hine dibe. Bûk ji bo pereyan an jî zêr destê xwe venake. Hinek pere dikin kefa destê wê, hêj destê xwe vedike. Piştî desthineyê hinek kes vedigerin. Yan jî yê ku diçûn tev li wir dimînin. Cîran wan dawetî mala xwe dikin. Mêvanan dibin mala xwe. Ev edet ji berê de xeta sala 2000î heye.

Piştî sala 2000î dawet li salonên dawetan çêdibin. Dawet çend seet dewam dikin. Kengê salon vala be ew roj dawet li dar dikeve. Roj ji bo dawetê êdî ne giring e.

**3.4. Pîrozbahî Li Mala Zavê**

Pîrozbahî li mala zavê jî çêdibe. Li her dawetê amûrê mûzîkê hene. Berî 1980yî def û zirne heye. Piştî 1980yî bilûr û erbane ketin dewrê. Ku mela li dawetê hebe nahêle ku li bilûrê bixin. Bi tenê li erbaneyê dixin. Xwedîyê malê daxwaza mela tîne cih. Ji mela re hurmet zaf e. Carinan jî di dawetan de li amûrê mûzîkê naxin. Dibêjin “daweta bêdeng”. Ê ku serê dawetê dikişîne mahir e. Ku dawet bê amûrê mûzîkê be govendgêrî îcar kilamên dawetan divê. Bi çepikan re kilam tên vegerandin. Govendgêrî yê ku di govendê de bûna wan dianî kêfê; dawetê bi kêf dikir. Di nava salên 1980 û 2000î de di zikê Farqînê de orkestra heye. Sazbend ê wek Salih Dalgin, Mehmet Esmer, Celal in. Lêxistina wan cuda ye. Dengê saza wan ji dûr ve diyar e. “*Celal (Şîyar) dengê wî xwoş bû. Lêbelê kilama nedigot. Cûmbûş bi tenê lêdixisit. Bedrettin Coşkun kilama bi tenê digot.”* (Y. Parlatir, bihevdîtin, 47 salî, Diyarbekir, 8.10.2022)



Foto 2: Di salên heştêyî de Salih Dalgin û hevalbendên wî(Aktarlı, r. 66)

Ji xeynî sazbendan ê ku bilûr û erbaneyê dixin hene. Bilûrvan Mehmet Şah[7], Şîrîn, Besrî… û erbanecî Nûrîyê erbanecî (Nurullah), Kutbettin, Berfo… ne.

Defçî hene. Ew berî sazbendan e. Defçî Nadir û zirnecî Suphan[8] hene.

Govendên delîlo (giranî), govend (halay), dizo, şêrizdîn… hene. A ku pir dileyizin delîlo ye. Lîstika wê hêsan e. Her kes dikare bilîze. Ji ber ku her kes bilîze ew tim lê dikeve. Ji xeynî govendê oyin hene. Gur û Pez[9] oyineke giring e. Ev oyin di temamê dawetan de tunin. Di govendê de govendgêrî carinan derdikeve direqise. Pere pêva datînin. Ev pere yê sazbendan e. Berî salên heştêyî yê ku amûra mûzîkê lê dixe hinekan di çavê xwe de diecibîne û diçe bal wan, dibêje "Şabaş!". Ew jî cêba xwe hinek pere derdixe, şabaşa wî dide. Piştî salên heştêyî ev edet terk dibe. Bi dilxwazî pere tê avêtin. Ê ku bixwaze pere biavêje bi destê xwe diavêje ser govendgêran. An jî pere dike devê yê ku direqise. Ê ku li orteyê direqise jê ra li çepikan dixin.



Foto 3: 1980yî de li Farqînê govendek(Aktarlı, r. 66)

**3.5. Desthineya Zavê**

Roja şemîyê êvarê destê zavê hine dikin. Wextê hine tê, kilama "zava zava" tê gotin. Kilama "Wer hine wer hine" jî tê gotin. Ji xeynî wan pir kilam tên gotin. Yên din kilaman li hev vedigerînin. Li çepikan dixin. Yê ku bixwaze destê xwe hine dike. Teştek hine çêdibe. Ji bo vê pot amade dibin. Gore dixin destên zarokan.[10] Hineya mayî belav dikin. Tepsîyên mumikan pir in. Li dora zavê li pey hev digerin. Kilama " yek mumik du mumik" tê gotin. Heta ku temamê mumikan nehelin tepsî digerin. Zarok jî di pîrozbahîyê de bicoş in.

---

[7] Wan hunermandan her kes, nas dike. Ji ber wî awayî bi paşnavên wan emel nabe.

[8] Ew her du mirtib in.

[9] Ji bo agahîyên derbarî lîstikê bnr. Altınboğa, rp. 81.

[10] Ji ber ku nivîn qirêjî nebin.



Foto 4: Desthineya Zavayekî (28.07.2000).

### 3.6. Siwarkirina Bûkê

Roja yekşemê pir qelebalix e. Karê dewetê serê sibê zû dest pê dike. Taştê tê xwarin. Ku mala bavê bûkê nêz be bi çend erebayan diçin wî serî ku ji bo bûkê bînin. Ku mal dûr be jixwe rojek berê diçin. Ê roja şemîyê çûbin nayên. Tev bi bûkê re tên. Berî ku bûkê derxin bi temamî amadekarî dibin. Cilên bûkê lê dikin. Zêrên wê pê ve datînin. Li nava bûkê qolankî ji alîyê birê wê ve an jî xizmên wê ve tê girêdan. Bi ser serê wê de kilama "Oy oy li min xerîbê" tê gotin. Dê, xwişk û pîrekên din digirîn. Hîzarek bistêrk lê dikin. Poşîka sor diavêjin serçavê wê. Kaxizekî bi tîpên erebî bîsmîllah nivîsandî bi fîlketê li ser anîya wê bi hîzarê ve datînin. "*Temezîka zer davin dora sûtîyê wê. "Ha Fatmayê Fatmayê/Qîza ronîya çahvayê" kilam tê gotin.* (A. Özkaya, hevdîtin, 68 salî, Mêrdîn, 2.10. 2022*)* Êdî wextê xatiran tê. Ji birayên bûkê yek ji dikeve pişt derî, piştderî dixwaze. Pereyekî ku pê razî bibe didinê. Di pey danîna piştderî de derî vedike. Ev edet normal tê dîtin. Carinan jî ji xeynî pere tiştên din dixwazin.[11] Di vî warî de mala zavê bi hazirî ne. Ku demançe bê xwestin teqez bi ber goyê mala zavê dikeve. Xezûrê bûkê dikeve milê wê û wê ji mal derdixe. Ku xezûr tûnebe yekî pir nêz dikeve şûna wî û bûkê derdixe ji mal. Di vî wextî de bavê bûkê ku ji mezhebê şafiî be wekaleta mêran qîza xwe dide mela. Hin malbat destûr didin ku zava were mala wan. Piştî salên heştêyî "mehra melayan" û a fermî bi hev re dibin. Piştî sala 2000î mehra fermî pir giring e.

Wextê derxistina bûkê av di pey de direşînin. Ew tê wê wateyê ku bi sax û selamet here.

Dîsa wextê derketina bûkê zarok pêşîya erebeya bûkê digirin ku erebe nikaribe here. Pere dixwazin zarok. Di wê rewşê de dilê zarokan xweş dikin. Ku kemîn pir bin zerfan diavêjin. Hin di wan de pere hene, hin jî di wan de pere tunene. Ku zarok bi zerfan tên xapandin, xaz didin erebeyan û diçin.

### 3.7. Tiraşa Zavê

Hevalên zavê serê sibê wî dibin serşoyê. Lêbelê ku dawet li gund be serşûştin li malê pê tê. Zava heta roja dawî rûyê xwe çênake. Serê sibeya yekşemê bi coş zava tiraş dikin. Wekî serhineyê kilam tên gotin û li çepikan didin. "*Pere bi zava ve datînin. Ev pere yê berber e. Dawîya tiraşê de zava li ser milan bilind dikin hewayê. Herî dawîyê de berber potê xwe top*

[11] Ev xelat tê gotin ku bi pirî demançe ye.

*dike û perê xwe dike çentê xwe. Ji xeynî vî perî ji xweyê dawetê perê xwe distend.”*(M. Eskilidir, hevdîtin, 72 salî, Diyarbekir, 8.10.2022)

Piştî tiraşê destê cilên zavê li dikin. Ev qatê cilan wextê nîşanê de bavê bûkê ji zava re dide dirûtin. Piştî dirûtinê ev kat mihafeze dibe xeta dawetê. Reng û modela qatê cilan giring e. Bi piranî ya spî ye an jî rengê şîntarî ye. Yên ku kirewat dikirin stûyê xwe hene. Ku cilên zavê ne qat be hinekî eyb çêdibe.



Foto 5 û 6: Li Farqînê di sala 1980yî de zavayek tiraş dibe û paşê wî didin ser milê xwe (Aktarlı, 64-65).

**3.8. Darika Zavê**

Piştî cilên zavê lê dikin li hêvîya hatina erebeya bûkê disekinin. Durbîstê cêban tune. Ji ber wî awayî hinek zemetî heye. Yek li rêya erebeya bûkê miqate dibe. Ku serê karwanê erebeyan derdikeve hema bi zû zava dibin ser xanî binê darika zavatîyê. Dara zavê edeteke kevn e. Dareke saxlem gûlîkê wê yê mezin dibirin. Li serê xanî diçiqilînin. Li dora wê keviran datînin, saxlem dikin û wê dixemilînin. “*Bastêq, gûz, behîv, mewîj, meşlûr, hikê kelandî piva datînin. Di mal de çi hebûya bi darê ve datînin*.” (Y. Parlatır, hevdîtin, 47 salî, Diyarbekir, 8.10.2022) Wextê zava tînin xwarê ev tiştên daleqandî ji zarokan re dimîne. Kevneşopîya darika zavê di salên 2000î de bi dawî dibe. Di salên dawîyên de balona jî bi darê ve dadileqînin. Dîkekî şerjê dikin û wî jî bi darikê ve dadileqînin. Ev dîk ji bo xwarina ezeban e. “*Bi rastî dîk tê wê watî ku teklîfa kîrvetîyê ye. Ez biçûk bûm ketim nav hewildana ku dîk bi revînim. Ji min re gotin ku birina wî wata kîrvetîyê ye*.”(Y. Parlatır, hevdîtin, 47 salî, Diyarbekir, 8.10.2022)



Foto 7: Zavayek li bin darika zavatîyê ye (29.07.2000).

Bi tenê hevalbendê zavê û zarok diçin serê xanî. Kilama “zava zava” tê gotin. Li çepikan didin. Coşa herî mezin li vir dibe. Û taybetîya vê derê tiştekî din e jî. Zavê ku li binê darika zavatîyê rûne tê wê wateyê ku digihîje miradê xwe. Loma ev pêkanîn dikeve dia û nifiran jî. “Ez darika te ya zavatîyê bibînim.” Wateya wî yanî ku tu bibî zava. Di nifiran de “Tu li binê darika zavatîyê rûnenî!” Wateya wî yanî tu nebî zava.




Foto 8 û 9: Bûkekî peya dikin û şekiran li serê wê dikin. (29.07.2000).

Darika zavê li ser derîyê ku bûk tê de dikeve malê ye. Erebeya bûkê heta ku dikaribe nêzî derî dibe. Di wê navberê de sîleh ber didin. Xwesûya bûkê an jî yeke navsere dikeve milê bûkê wê ji erebeyê peya dike. Tilîlî tên avêtin. Cêrekî binexş û di zik de perê hûr û şekir tê de didin destê bûkê. Bûk cêr bilind dike û li kevir dixe. Zarok hicumî tiştê ku belav dibin dikin. Cêr tê wateya bereketê. Lêbelê ku cêr neşikê tê wateya bêoxirîyê. Cêr hin carinan naşikê. Careke din didin destê bûkê. Bi dû de şekir û perê hûr li serê bûkê wer dikin. Ev tev ê zarokan e. Di nav zarokan de tekoşîneke şîrîn derbas dibe. Zava tiştê ku diqewime ji xwe re, temaşe dike. Sêvekê didin destê zavê. Zava sêvê diavêje bûkê. Hin zava sêvê bi hindaze diavêjin. Hin jî sêvê bi hovîtî diavêjin. Kes tiştekî nabêje lêbelê wî eybdar dikin.



Foto 10: Di salên 80yî da zavayek di destê wî de şiva wî û li hêvîya bûkê ye.[12]

Berbûr ji mala bavê bûkê şûşeyan, teyfikên camî û porselen, kevçîyên darîn, heskan, kavanozan tînin. Wan diavêjin ber pêyê zavayê li ber darikê. Jin weha dikin. Mêr tiştê

[12] Zava ji bo ku bûkê bitirsîne şivikek daye dest xwe. Ev tişt bi ḥenekan e. Ji bo natirse nîne. Ji bo kêfxweşîyê ye.

weha nakin. Bi rastî xweşik nayê dîtin. Tiştên ku pîrek diavêjin serê xanî xort digirin û didin ber pêyê zavê. Zava van bi kapika sola xwe yek bi yek dişikîne. Tiştên ku naşikin jî dertên. Wekî heskê; hesk zû bi zû naşikê. Ji bo şikandinê zava dikeve nav hewildanan. Du car, sê car kapika xwe lê dixe. Xortên li dora zavê li çepikan didin. Ev dem demeke taybet e. Ciwanên li vir pir ji wan ezeb in. Avêtina eşyayan ku diqede bûkê dibin hundir. Wê dibin odeya wê ya ku ewê di vê malê tê de bijî.

Ku bûkê dibin hundir zava pêyê xwe li darikê dixe. Zarok tiştan dikin berîkên xwe û ber dilên xwe. Paşî dikevin mile zavê û wî ji serê xanî tînin xwarê. Dîk tê hilanîn. Darik bi zarokan dimîne.

**3.9. Nanê Dawetê**

*"Dema ku zava li ber darikê ye hinek mirtiv tên ber derî. Tin mala dawetê. Ku dikaribin ji kî pere bistînin wan hîndikin. Ji xizmên zavê yên nêz geştê dixwazin. Wextê geşt xwestinê peznê wan kesa pir didan. Digotin "Axayê min! Tu geştekî bide me ku bi navê te bikeve. Navê te li deşt û çîyayê Farqînê bela biye. Tu comerdê comerdan î... " Lêbelê ku daxwaza wan nata cî nawan, qemçikan bi wan va datanîn. Ji ber vî hawayî pere didan wan. Ku pere an geşta din hindik bîya pir dixwestin. Dihatin li ser nanê dawetê rûdiniştin. Ew bi malbatî dihatin. Zarokên xwe jî tanîn. Ku dawet bi qedîya îja diçûn dawetek din. Pirê wan pîrek bûn. Bi wan re mêr kêm bûn."*(M. Eken, hevdîtinî, 83 salî, Farqîn, 30.9.2022)

Hin kes ji bo ku pereyan nede mirtiban wextê hatina wan xwe vedişêrin. Ê ku weha dikin tima ne. Hejmara wan kêm e. Lêbelê bala mirovan dikişîne.

Dema zava tê xwarê xwarin hazir e[13]. Nan bi pirî li ser xanî an jî li hewşê tê danîn. Sifre tê raxistin. Ku ev der ne bi keys bin di odeya mêvanan de sifre tê danîn. Ji bo xwarina dawetê her kes tê vexwendin. Ji ber ku cilê zavê pîs nebin li cihekî bikeystir bi hevalên xwe re nan dixwe. Carinan jî zava bi her kesî re nan dixwe.




Foto 11 û 12: Farqîn du dîmenên dawetan.

Wekî ku me berê gotibû, dawetan dawîya havînê an jî payîzê dikin. Firingî pir in. Tirşik çêdibe. Birinc û qelî çêdibe. Di şûna tirşikê de carinan tirşika kartola çêdibe. Tirşik giring e di

[13] Nanê dawetê kesên diyar çêdikin. Pere naxwazin, bê pere ye. Serê sibê zû dest pê dikin. Çend alîkarê kebanîyên/yan hene. Xwarin bi agirê êzingan çêdibe.

nanê dawetê de. Wextê ku dibêjin “tirşik” dawet dikeve bîra mirov. Ji yekî re mirov bibêje “Em dê kengê tirşika te bixwin?” tê wê wateyê ku “Daweta te kengê ye?”.

Nanê dawetê jin û mêr hevûdin cuda dixwin. Piştî xwarina mezinan zarok tên ser sifreyê. Tebeqên wan nû dikin (avrî naxwin). Nanê zêde dişînin malê cîranan an jî didin kesê hewce.

Piştî nanê dawetê yê ku ji dûr ve hatine xatir dixwazin û diçin. “*Mele gazî zava dike wî dibe odeyeka xalî (vala). Lêbelê ku zava bixwaze çend heb kes hene. Mele fatiha zava rast dike. Çend heb sualan jê pirs dike. Kelime Şadetê bi zava dide gotin. Kêmasî hebe bi keys dike. Û dibêje “Min mehra qîza filan kesî li kurê filan kesî kir. Xwedê miradê wan bi hev bike.” Tiştê ku dibêje di kaxizkî de dinivisîne. Wî kaxizî bi salan li ba xwe dihêle*. (M. Baran, hevdîtin, 58 salî, Farqîn, 24.9.2022)

**3.10. Kirîvatî (Çûna Zavê ya Mala Cîranekî)**

Piştî xwarinê ciwanên ezeb pere ji xizmên zavê dixwazin. Ji vê xelatê re dibêjin “perîya ‘ezepçerya”. Pê dendikan, şîranî û xwarinên din distînin. Wan dibin mala kirîvan. Ev tişt li wir tên xwarin.

Dema ku zava dianîn xwarê yek teklîfa kirîvatîyê dike. Yanî zava dawetî mala xwe dike. Ji wê edetê re dibêjin “kirîvatî”. Kirîvatî tiştekî giring e. Kirîvatî mirovan nêzî hev dike. Dibin dostên hev. Bi salan berdewam dibe kirîvatî. Ev şev pir ji ezeb diçin dora zavê, bi hev re pîrozbahîyan dikin. Listêkên cuda tê lîstin. Ev lîstik mirovên din dikenandin. Yê herî navdar ev in: qayîş, moz, gustîlk, belîf, xêra dêya paşê, tîrtevan.

Di wan lîstikan de xort bi hev re dikevin pêşbirkê. Pêşbirk xweş û bi kêf derbas dibe. Her kes qîmet didin hev. Çi dibe tev ji bo kêf û dilxweşîya zavê ye.

Seet nêzî nehan xort ji zava xatir dixwazin wî hembêz dikin. Ji mala kirîvan belav dibin. Li dora zava çend hevalên nêz dimînin. Di nav wan de pismam, kurê xaltîyê û xizmên herî nêz hene. Herî dawî ew jî ji xwedîyê malê destûrê dixwazin û derdikevin. Herî pir mala kirîvan nêzî mala zavê ye. Loma zava bi peyatî dibin mala wî. Li ber derî xatir ji hev dixwazin û her kes diçe mala xwe.

**4. Pêvajoya Piştî Dawetê**

Bûk û zava sê rojan ji odeya xwe dernakevin. Ev kevneşopîyek e. Xwarin û vexwarin di odeya xwe de dixwin û vedixwin. Sê roj bi şûn de zava ku karê wî hebe dest pê dike. Bûk derdikeve derve. Karê metbexê dike. Paqijî hebe dike. Lêbelê bûk naçe çol û pesaran. “*Hin bûk li ba xezûrê xwe serçavên xwe nîşan nadin. Carinan ev edet kin berdevam bû, Carinan jî heta pir dereng berdewam dikir. Ev şiklekî hurmetê bû. Ji wî edetî re digotin”xêlî”. Bûk ku xezûrê xwe bidîtîya çerêka xwe dikişand serçavên xwe. Pê rûyê xwe vedişart*.” (A. Özkaya, hevdîtin, 68 salî, Mêrdîn, 2. 9. 2022)

Du sê meh bi şûn de ji alîyê mala bavê bûkê yek tê izn dixwaze ji bo ku wê bibe zeyî. Li gorî kar û îş destûr didin an jî nadin. Bi piranî ewilî bûk diçû zeyî. Izna bûkê mehek e. Zava yan jî xezûrê bûkê mehek bi şûn de diçin şevekê dimînin û bûkê tînin tên.

**4.1. Hin Pirsgirêkên Piştî Dawetê**

Carinan pirsgirêkên bûkê ji “sêroj”ê ve dest pê dikin. Hin xwesû bi çavê koletîyê li bûkê dinêrin. Wê wekî qewraşan dibînin. Li gorî wan pêwîst e ku bûk biqisûr be. Xwesû qisûrên bûkê efû nake. Ku tiştekî tê de bibîne ji xezûr re dibêje. Xwesû qisûran yek bi yek dide rûyê

bûkê. "*Di vê mijarê de bûyereke awa di serê min de derbas bû: Hê ez nozdeh salî bûm. Ez bûka sêrojî bûm. Xezûrê min "Meriv gazî nekê ji berê xwa fehm nake rabe." ji min ra got. Lef avite min. Rojek dîsa hê ez bûka heft mehî bûm xesîya min hate odeyê. Ji ber ku ez ji ber ranebûm bi por û gijika min girt porê min kaş kir. Êvarê zilamê min hat malê. Wî sîr kir bera min de. Zilamê min, min bi dar kir feleqê. Ev ne buyerek bû. Ev tişt waka kevneşopîyek diqewûmî. Paraztina me tunebû."* (A. Özkaya, hevdîtin, 68 salî, Mêrdîn, 2.10.2022)

Ku piştî dawetê îş di rê de nîn be "mal cihêtî" çêdibe. Bûk û zava diçin maleke din. Ji xwe re cihekî dibînin. Di dema mal cihêtîyê de hin hûr mûr didin wan. Hewceyîyên lezgînî temîn dikin. Carinan jî qet mal cihêtî çênabe. Hin bûk ji bo mal cihêtîyê bêhizurîyê derdixin. Mînak bi tenê odeyên xwe paqij dikin. Karê malê ji dil nakin. Êdî ku hizûr nemîne mal cihêtî çêdibe.

**Encam**

Zewac, di nav civakê de hem ji bo kes hem jî bo civakê gelek giring e. Ji bo zewacê gelek orf û edet hene. Wan orf û edetan bi beşdarbûna eqrebayên malbatê di pêvajoya dawetê de tên bi cih. Lêbelê pêkanîn li gorî civakan cuda ye. Her çand xweyê orf û edetên cuda ne.

Orf û edet di nav salan de guhertina wan an jî terkkirina wan mumkin e. Li Farqînê di nav salên 1980 û 2000î de edetên gelek kevnecar ji ber derfetên nû hatin guhertin. Mînak, berê bûk bi hespan tînin lêbelê ku erebe derketin êdî hesp hatin terkkirin. Mînaka din, salonên dawetê derketin êdî dawet gelek li salona çêdibin. Salên navbera 1980 û 2000î dema terkkirina wan e.

Çand neynka civakê ye. Her qewm bi çanda xwe heye. Ku çand tune be qewm winda dibe. Cudatîya wî namîne. Ji ber wê em dibêjin çanda dewlemend heye li herêma Farqînê. Xeta îro hatîye nivîsandin lêbelê em wê xebatê têr nabînin. Loma me li gorî derfetên xwe tiştên li cem me nivîsandin. Em bawer in ku dewlemendîya çanda kurdan li Farqînê bi hewildanên zanyarî û bi qeydkirinê dê pêş de here. Di vê xebatê de me hewl da ku hinek edet, rê û resmên dawetên li Farqînê bidin naskirin ku di navbera 1980-2000î salan de hebûne…"

**Çavkanî**


Aktarlı, Mehmet(Yıl?), "*Silvan Güneşin Tarihle Dans Ettiği Kent"*, Diyarbakır: A Grafik.

Altın, Berivan(2008), *"Töreye Dayalı Evlilik Türleri ve Berdel Geleneği*", Diyarbakır: Dicle Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Orta Öğretim Sosyal Alanlar Eğitimi Anabilim Dalı Başkanlığı Türk Edebiyatı Eğitimi Proğramı, Yayınlanmış Yüksek Lisans Tezi.

Altınboğa, A. Bilal(1999), "*Diyarbakır Folklorundan Kesitler",* İstanbul: Diyarbakır Büyükşehir Kültür Yayınları, NO: 1.

Çalışkan Erol, Seher Şerife(2019), "*Bartın'da Düğün Geleneklerinin Dünü ve Bugünü*" Uluslararası Türkçe Edebiyat Eğitim Dergisi, Cilt 8, Sayı 1.

Çeliker, Deniz û Genç, Mustafa(2019), "*İsparta Evlenme Âdetleri*", SDÜ ART-E Güzel Sanatlar Fakültesi Sanat Dergisi, Cilt:12 Özel Sayısı.

Matyar, Berivan(2021), "*Pêvajo û Kevneşopîyên Dawetên Gundê Çîçikayê*", Dîyarbakir: Dicle Üniversitesi, Zanîngeha Dîcleyê Enstîtuya Zanistên Civakî Makezanista Çand û Zimanê Kurdî, Teza neçapkirî ya Lîsansa Bilind.

Örnek, Sedat Veyis(2018), "*Türk Halkbilimi*", Ankara: BilgiSu.

Şemo, Ereb(2016), "*Şivanê Kurmanca*", amedekar: Mustafa Aydoğan, Dîyarbakir: Lis Yayınları.

Sanders, Barry(2019), "*Öküzün A'sı*", werger: Şehnaz Tahir, amedekar: Can kurultay, İstanbol: Ayrıntı Yayınları.

Savran, Ahmet(2004), "*Meyyâfâriqîn*", Ankara: TDV İslâm Ansiklopedisi, Cild 29.

Xanî, Ehmedê(2015), "*Mem û Zîn*", werger: Mehmet Kaplan, Îstanbol: Şemal Medya.

**Dîjîtal**

http://kovarabir.com/seid-veroj-mervaniler-doneminde-gelistirilen-meyafarkin-ve-diyarbekir-kutuphanesinde-bir-milyon-kirk-bin-1-040-000-cilt-kitap-mevcuttu/

**Hevdîtin**

Arslan M., hevdîtin, 54 salî, Farqîn, 29.9. 2022

Baran, M., 58 salî, hevdîtin, Farqîn, 24.9. 2002

Eken, F. , 90 salî, hevdîtin, Farqîn, 9.10.2022

Eken, H., 67 salî, hevdîtin, Farqîn, 12.9.2022

Eken M., 83 salî, hevdîtin, Farqîn, 30.9.2022

Eken, O., hevdîtin, 48 salî, Farqîn, 2.10.2022

Eken Ş., 57 salî, hevdîtin, Farqîn, 28.9. 2022

Erdağ, M., hevdîtin, 70 salî, Farqîn, 20.9.2022

Eser Rabia, hevdîtin, 82 salî, Mêrdîn, 12.9.2022

Eskilidir, M., 72 salî, hevdîtin, Diyarbekir, 08.10.2022

Fidan, S., hevdîtin, 75 salî, Farqîn, 2.10.2022

Noyan, A. , hevdîtin, 75 salî, Farqîn, 25.10.2022

Özkaya A. , hevdîtin, 68 salî , Mêrdîn, 2.10. 2022

Parlatır, Y. , hevdîtin, 47 salî , Diyarbekir, 8.10.2022

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

# LÊKOLÎNEK LI SER ROJNAMEGERÎYA KURDÎ YA LI BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

(GÜNEY KÜRDİSTAN GAZETECİLİĞİ ÜZERİNE BİR ARAŞTIRMA)
(A STUDY ON THE KURDISH PRESS IN SOUTH KURDISTAN)

Rabeea Ismael Khalid ZEBARI*
Bafreen Rasheed HUSEEIN**
Luqman Muhammed ABDULRAHMAN***
Shahwan Taher Mohemed AMEEN****

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 04.09.2022
**Accepted // Pejirandin:** 04.10. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 128- 138
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1170694

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Zebari, Rabeea Ismael Khalid; Huseein, Bafreen Rasheed û Abdulrahman, Luqman Muhammed (2022). Li Başûrê Kurdistanê Lêkolînek Li Ser Rojnamegerîya Kurdî, K*urdiname*, no. 7, p.128-138

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

## Kurte

Dîroka rojnamegerîya Kurdî bi awayekê giştî ji rojnameya Kurdstanê (1898-1902) ku li Qahîreyê sala 1898an derçû, dest pê dike. Li Başûrê Kurdstanê jî vê yekê wek despêka dîroka rojnamegerîya li Başûrê Kurdistanê dihesibînin û her sal vê dîrokê li Başûrê Kurdstanê bi awayê curbicur bi bîr dîînin.

Li piştî 1991ê de, Kovara Peyvê yek ji wan kovaran bû ku rolekê baş hebû ji bo pêşxistina edebiyata Kurdî bi awyekê giştî û dema em li naveroka vê kovarê binêrin, ev yek xuya dibe ku kovara Peyvê ji du beşan pêk dihê. Beşek bi Kurdîya tîpên Erebî bi devoka Badînî dihê nivîsandin beşa dîtîr jî bi Kurmancî û bi tîpên Latînî dihê nivîsandin.

Kovara Peyvê li kîve dihê weşandin? Cihê Kovarê di edebiyata Kûrrmancî da çawa ye? Li Başûrê Kurdstanê Kovara Peyvê yekemîn kovar e ku bi tîpên Erebî û Latînî hatîye weşandin. Mekanê kovarê di edebyata Kûrmancî da xuya ye. Nivîskarên hemû perçên Kûrdstanê nivîsên xwe di vê kovarê da diweşînin. Ev dibe eger ku piranîya nivîskar û xwendevanê kurd bi rêya kovara Peyvê agehdarî edebiyata Kûrmancî bibin. Bi awayekê din anku em dikarîn bibêjîn kovara Peyvê bû rêyek ku hevnîzîkbûnekê di navbera edebiyata hemû perçeyên Kurdistanê da dirust dike ku bikarin nivîsên xwe di nav da biweşînin.

**Peyvên Sereke**: Kurdistan, Başûrê Kurdistanê, Rojnamegerî, Rojnamegerîya Kurmancî li Başûr, Kovara Peyvê.

## Özet

Kürt gazeteciliğinin tarihi Kürdistan gazetesinin 1898'de Kahire'de çıkmasıyla başlar. Güney Kürdistan'da bu olay Güney Kürdistan gazeteciliğinin de başlangıcı olarak kabul edilir ve her yıl bu tarihi olay Güney Kürdistan'da çeşitli şekillerde hatırlanır.

Peyv dergisi, kendisi gibi başka akademik dergilerin de çıktığı 1991 sonrası zamanda ortaya çıkmıştır. Genel olarak Kürt edebiyatının gelişmesinde önemli bir rol oynamıştır. Peyv dergisinin içeriğine baktığımızda,

*Department of Computer Science, Faculty of Science, Knowledge University, Erbil-Iraq, rabeea.zebary@knu.edu.iq
** Department of Kurdish Language, Duhok University, Kurdistan-Iraq, bafreen.huseen@uod.ac
*** Researcher, Duhok, Kurdistan-Iraq, luqman_muhammed@yahoo.com
**** Researcher, Duhok, Kurdistan-Iraq, shahwanzebari2018@gmail.com

derginin iki bölümden oluştuğunu görüyoruz: Bir bölüm Arap alfabesiyle yazılmış Kürtçe'den oluşurken, diğer bölüm Latin alfabesiyle yazılmış Kürtçe'den oluşmaktadır.

Peyv dergisi Güney'de Kürtçe'yi Latin ve Arap alfabelerini birlikte kullanarak yayınlanan ilk dergidir. Peyv dergisinin Kürt edebiyatındaki konumu açık bir şekilde ortadadır. Kürdistan'ın her dört parçasından yazarların yazılarına yer vermektedir. Bir diğer tabirle Kürdistan'ın dört parçasından yazarları kendi bünyesinde bir araya getirmiştir. Bu durum Kürt yazar ve okurların Peyv dergisi aracılığıyla Kürt edebiyatından haberdar olmalarını sağlamaktadır. Bir başka deyişle şöyle denebilir: Peyv dergisi dört parça Kürdistan'da icra edilen edebiyat eserlerinin dolaşıma girmesine bir yol temin etmek kaydıyla bir tür yakınlaşma imkânı sağlamıştır.
**Anahtar Kelimeler**: Kürdistan, Güney Kürdistan, Gazetecilik, Güney'de Kurmancî, Peyv Dergisi.

**Abstract**

In general, the history of Kurdish journalism starts with the Kurdistan newspaper, which was first published in Cairo in 1898. In South Kurdistan, this is also regarded as the beginning of the history of Kurdish journalism, and this event is commemorated in various ways every year. Peyv is one of the academic magazines that began publication after 1991. Peyv magazine has had a considerable impact on the overall development of Kurdish literature. It is evident that Peyv magazine consists of sections. The first section is written in the Arabic alphabet Kurdish, while the second section is written in the Latin alphabet Kurdish.

Peyv magazine is the first Kurdish publication of its kind to appear in both the Arabic and the Kurdish alphabets in southern Kurdistan. There is no question about the significance of Peyv magazine to the Kurdish literary world. This magazine is where writers from all four regions of Kurdistan contribute their work for publication. In other words, the magazine compiles the writings of authors from all four regions of Kurdistan. This may be how the majority of Kurdish authors and readers learn about Kurdish literature through the word magazine. Or, we might argue that the Peyv magazine was a means of unifying the literary works of the four regions authors of Kurdistan so that their works could be disseminated to a wider audience.
**Keywords***:* Kurdistan, Southern Kurdistan, Journalism, Kurdish Journalism in Southern Kurdistan, Peyv Kovar

## Destpêk

Ev lêkolîne li bin navê “Li Başûrê Kurdistanê Lêkolînek li ser Rojnamegerîya Kurmancî “merem ji vê yekê destnîşankirina dîroka rojnamegerîya Kurdî li Başûrê Kurdstanê ye. Paşan me lêkolîn li ser kovara peyv kirîye.

Kovara Peyvê yekem kovar e li Başûrê Kurdstanê herêma Badînan ji bal Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Duhok (YNK-Duhok) li bajarê Duhokê bi awayekê akademîk di sala 1993yan da derketî ye holê. Dema em li naveroka kovara Peyvê dinêrin, ev yek eşkere dibe ku kovara Peyvê ji du beşan pêk dihê. Beşek bi Kurdîya tîpên erebî bi devoka Badînî dihê nivîsandin û beşa din bi kurdîya kurmancî, bi tîpên latînî dihê nivîsandin.

Herwekî me ew yek eşkere kiribû; kovara Peyvê bi latînî jî tê nivîsandin. Kovara Peyvê sînorên di navbera perçeyên Kurdistanê da rakiriye û deriyê xwe ji wêjevanên perçeyên din ra jî vekiriye. Îcar nivîskarên parçeyên din ên Kurdstanê jî bi rêya vê kovarê mijarên xwe belav dikin. Ji ber vê yekê nivîskarên parçên din ên Kurdistanê, li Başûrê Kurdistanê jî bi nav û deng bûne; weke *Berken Bereh, Arjen Arî, Dilawer Zeraq û hwd*.

Nivîskarên Başûrê Kurdistanê bi rêya vê kovarê nivîsên xwe bi latînî dinivîsandin û belav dikirin. Ev bû eger ku nivîskarên Başûrê Kurdistanê li parçên din ên Kurdistanê bihên

nasîn. Anku bi awayekê din kovara Peyvê roleke baş heye, ji bo nasandina nivîskarên Başûrê Kurdistanê bo parçên din ên Kurdistanê, nemaze li Bakûrê Kurdistanê.

Herweha vê kovarê roleke baş heye, ji bo pêşxistina edebiyata kurdî bi awayekê giştî û bi hemû cureyên xwe ve weke; helbest, çîrok, roman, kurteçîrok, şano û hwd. Herweha rola kovarê çêbûye bo komvekirin û lêkolîn li ser edebê folklorî kurdî bêne kirin.

## 1. Kurtîyek li ser Rojnamegerîya Kûrdî li Başûrê Kurdstanê:

Wekî tê zanîn rojnamegerîya kurdî bi ***Rojnameya Kurdistanê*** ku di sala 1898an da derketîye, dest pê dike. Ev rojname di 22yê Nîsanê da dest bi weşanê kirîye. 22yê Nîsanê lewma wekî salvegera rojnamegerîya kurdî tê pîroz kirin û li Kurdistana Başûr jî ev roj bi awayekî fermî wekî roja “***Rojnamegerîya Kurdî***” tê qebûl kirin. Ev rojname di sirgûnê da derket holê ango mêjûya rojnamegerîya kurdî bi sirgûnê derdikeve holê. Rojnameya Kurdistanê ji alîyê Mîqdad Mîdhet Bedirxan ve li Qahîreyê hatîye derxistin. Di dîroka me da gelek tişt "cara pêşîn" ji alîye malbata Bedîxanan ve hatine pêkanîn. Rojnamegerîya kurdî jî wisa bûye. Piştî Mîqdad Mîdhet Bedirxan birayê wî Ebdurrehman Bedirxan dest bi weşandina wê kir. Rojnameya Kurdistanê piştî Qahîreyê li Swîsre û Londonê jî hatîye derxistin. Hejmara dawîn ya Rojnameya Kurdistanê (no: 30-31) 14ê Nîsanê, di sala 1902yê da derket. Destpêbûna rojnamegerîya kurdî li gorî ciranên me pir dereng nîne. Lê ji ber astengiyan bi qasê cîranên me pêşveneçûye (Tewfîq, 2006. r. 32).

### 1.1. Rojnamegerîya Kurdî li Başûrê Kurdstanê di 1900-1950yan da:

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem dewleteke bi navê Iraqê di bin kontrola Îngilîzan da hat damezirandin. Piştî vê qismekî kurdan di bin desthilata Tirkiyê da man qismekî wan jî ketin bin desthilata mêtinger a Iraqê. Ji ber vê li Iraqa nû xebatên kurdî yên rewşenbîrî û çapxane û çapemeniya kurdî li Başûrê Kurdstanê cara ewil di sala 1920an da li Silêmanîyê di bin kontrola desthilata mêtinger a Îngilîzan da dest pê kir. Xebatên kurdî carinan di bin kontrola hikûmeta navendî da dimeşiya û carinan jî ji aliyê birêvebiriyên xweser, otonom û herî dawî federal ên kurdan ve dihatin pêkanîn. Ji ber guherîna desthilatan cih û warên xebatan jî wek Bexda, Mûsil, Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr, Duhok diguherîn (Zebari û Babayiğit, 2022, r.18 ).

Piştî Rojnameya Kurdistanê di sala 1918an da ji alîyê rewşenbîrên me yên li perçeyên dinê Kurdistanê ve bi taybetî Kurdistana Başûr, ji Şoreşa Şêx Mehmudê Hefîd heta 1950, ev rojname û kovar hatin weşandin wekî "Rojnameya Umêdî istiqlal, Suleymanî, 1923", "Rojnameya Bangî Heq, Suleymanî, 1923", "Rojnameya Pêşkewtin, Suleymanî, 1920", "Kovara Peyje Bexdad" 1927, "Rojnameya Rojî Kurdistan, Suleymanî, 1922", "Kovara Rûnakî, Hewlêr, 1935", "Kovar û Rojnameya Rojanû, 1943", "Rojnameya Rêga li rojhilatê Kurdistanê jî Mehabad, 1948", "Rojnameya Rawêj, Mehabad" hatibûn derxistin. Salên çilan di dîroka Başûrê Kurdistanê da, bi xwe re geşbûn û pêşketinê di jiyana siyasî û çandî ya wê perçeyê da tînin. Ew salên xurtbûna tevgera kurd ya neteweyî bûn û salên damezirandina partiyên siyasî bi taybetî PDK ku programên wan yên pêşketî di warê guhertinkariyên civakî da hebûn. Di gel vê yekê bi heman rihê gelek kovar derdiketin. Gelawêj kovarekê wê demê bû ku roleke mezin di belavkirina bîrûbaweriyên peşketinxwaz û çandî da lîst. Kovara Gêlawêj bi rastî jî stêra geşa rojnamegerîya kurdî bû. Di 1949ê da jî kovara serbixwe ya sîyasî bi navê "Nizar" derket (Tewfîq, 2006, r. 26)

### 1.2. Rojnamegerîya Kurdî li Başûrê Kurdstanê di 1950-1980yan da:

Li Kurdistana Başûr di navbera salên 1950-1980yan da bi girêdayê têkoşîna rizgariyê ve bi rêberiya Nemir Mistefa Barzanî çapameniya kurdî jî bi pêş ve diçû. Di vê konaxê da, rojnameya "Xebat"ê ya ku di salên 1950yan da wekî organa Partî Demokratî Kurdistanê (PDK) derdiket, berê navê vê rojnameyê "Rizgarî" bû, di 1953yê kongireya PDK da navê wê kirin Xebat. Di wê demê da rojnameyekê din jî li Kerkukê bi navê Azadî dihate derxistin. Her wiha kovar û rojnameyên wekî "Dengî Das, Suleymanî "1950, "Peyam" 1952 (Zebarî û Babayiğit, 2021, r. 69).

Piştî 14ê Temûza 1958an û gohartina sîstema piwîtîkî li Iraqê ji Paşayetî bo Komarî, ev yeke di dîroka Iraqê da qonaxeka pir giring dihê hesibandin û rojnamegerîya Kurdî di vî çaxî da diçe qonaxeka nû weke rojnameyên partîyan bi awayekê eşkere derçûn weke rojnameyên " ***Xebat û Azadî*** ". Herweha her di vî çaxî da hin rojname û kovarên din jî hatin weşandin weke Newroz, Hiway Kurdstan, Dengî Qutabîyan, Ray Gel, Edeb, Gezeng, Beyan û hwd derçûn. Herweha "Kestin" 1958, "Kovara Çareserkirdinî Kiştukal" 1959, "Dengê qutabîyan, Bexdad" 1960, "Afret"1960, "Rojnameya Çiray Kurdistan, Suleymanî" 1962, "Tûtun" 1964(Tewfîq, 2006, r. 39).

Rêkeftinameya di 11ê Adara 1970yan da, bi egerê gohartinên rewşa piwêtîka Kurdan ra Otonomî ji Kurdan ra hat dan û rojnamegerîya Kurdan ber bi pêş ve çû. Piştî morkirina peymana otonomiya Kurdistanê di rojnamegerîya kurdî da peşkeftinek berbiçav çêbû. Di wê demê da rojnameya "Hewkarî" 1970, kovara "Beyan" 1970, kovara Rojî Kurdistan 1971, kovara Roşinbîrî Niwê 1973, rojnameya Xebatî Kurdistan derket. Di wê konaxê da tenê rojnameya Birayetî ku organa PDKê bû bi dirustî rojane derdiket. "Asoy zankoy" 1977, "Estêre" 1974, "Bîrî nuwê" 1973, "Bilawkirawey Berew ronakî", "Çiya" hewlêr 1970, "Dengî mamosta" 1970, "Dengî Cotyar" 1971, "Estêre" 1971, Nûserî Nwê 1972, "Amanc"1973, "Huşyarî Kirêkaran" 1973, "Korî Zanyarî Kurd", 1973, "Baba Gurgur" 1973, "Bo Pêşewe" 1973, "Gizing, Kerkûk" 1973, "Rêbazî nû" 1975. Herweha Li Başûrê Kurdstanê herêma Badînan heta salên 1970yan tu rojname û kovarek dernecû. Belavoka " Hîvî li Duhokê 1970 " derket holê, eve dibe destpêka rojnamegerîya Kurdî li herêma Badînan(Tewfîq, 2006, R.73).

Herweha piştî ji navçûna peymana Otonomîyê rewşa Kurdan li Başûr cardin têkçû û vê yekê bandora xwe li ser rojnamegerî û çapemenîya Kurdan li Başûr hebû weke "Hewalnamey Şoreş" 1978 jî hin kovar û rojnameyên wê demê bûn. Di salên 1976-1984an da şerê birakujiyê, yê di navbera hêzên kurdî da, di rojnamegerîya wan da jî cihê xwe girt û ew şerê gotinan di radyo û rojnameyên wan da bû egera dilsariya gelê kurd û şervanên wan û devberdana gelek kesan ji endamtiya xwe di wan partiyan da. Paşê ew hemû partî di Bereyê Kurdistanî da gihane hev û şerê birakujî rawestiya " (Zebarî û Babayiğit, 2022, r. 8).

### 1.3. Rojnamegeriya Kurdî li Başûrê Kurdstanê, di 1980-2000an da:

Di salên 1980an da rojnamegeriya kurdî, li Başûrê Kurdistanê bi hêzbûna şoreşê ra gelek rojname û kovarên kurdî jî bo weşandina ramana neteweyî dihatin weşandin. "Riwangey azad" 1980, "Rêbazî pêşmerge" 1980, "Bilawkirawey Dengî lawan" 1981, "Kovara Alay surî kurdayetî" 1981, "Nûserî Kurdistan" 1981, "Estêre" 1982, "Raperîn" 1982,

"Xebatî mamosta" 1982, "Kovara Kurdistan" 1982, "Kariwan" 1982, "Bilawkirawey Edebî bêgane" 1982, "Dengî Pêşmerge, Şoreşa başûr" 1983, " Rêya serkeftinê" 1983, "Rojnama Serbexoî" 1983, "Kurdayetî" 1983, "Rêbazî lawan" 1983 "Dengî xwêndekaranî Kurdistan" 1983, "Bilawkirawey Asos" 1984, "Bilawkirawey Edebî mindalan", "Rojnama Behdînan" 1982, "Kovara Pîrozî islam" 1982, "Bilawkirawey Hawdeng" 1983, "Peyamî şoreşî Kurdistanî Başûr" 1984, "Bilawkirawey Nîrgiz" 1984, "Pala" 1984, "Roşinbîrî pêşmerge" 1984, "Rizgarî" 1985, "Dengê me" 1985, " Peyamî birayetî" 1986, "Peyamî kirêkaran" 1986, "Tendirustî û komel" 1987, "Qendîl" 1987, "Rojnama Berey Kurdistanî (Organa Berey Kurdistanî)" (1988), "Helwêstî Edebî" (1988), "Terazû"(1989), û " pir kovar û rojnameyên din jî di wê demê da li Başûrê Kurdistanê li bajarên wek Hewlêr, Silêmanî, Kerkûk û Duhok dihatin derxistin. Derbarê rojname û kovarên han da agahiyên berfirehtir -wekî navên berpirsyarên wan û bi giştî serpehatiya wan bi çi rengîye- tune ye ku bidim" (Zebarî û Babayiğit, 2022, R.9).

"Salên 90î di mêjûya Kurdistanê da werçerxanek girîng e. Bizûtneweya rizgariya Kurdistanê di her beşê Kurdistanê da geştir bû. (Tewfîq, 2006, r. 65) Di Başurê Kurdistanê da piştî îlankirina Dewleta Federal A Kurdistanê (DFK) di wê perçeya Kurdistanê da her çiqas ne fermî be jî dewletek serbixwe hat avakirin. Parlemena Kurdistanê, Hikûmeta Kurdistanê, Wezaretên Kurdistanê hemû dezgeh, sazî, komele, sendîka, yekîtî, partî bi nasnameya xwe ya Kurdeyatî li gor rêzikên Hikûmeta Kurdistanê li ser karê bûn. Ev azadî tesîra xwe ser çapamenîya kurdî jî kir. Di destpêka DFKê da ji ber astengiyên polîtîk û aborî dezgehên medyayî tune bûn. 2-3 katjimêr televîzyonên PDK Û YNKê weşan dikirin. Organên fermî yên Hikûmeta Kurdistanê tune bûn, tenê organa Hikûmetê rojnameya "Herêm" hebû. Belam Başûrê Kurdistanê her roj berew pêşkewtin û dewlemend bûyînê ve diçû. Di vê pêvajoyê da şerê "birakujî"yê derbeyek mezin li moral û baweriya gelê kurd û pêşketina Kurdistana azad xist. Ji ber ku li Kurdistana azad wekî Bakurê Kurdistanê "girtin" tune bû lewma jî rewşa rojnamegerîya Başûrê Kurdistanê wekî bakur bi girtin, kuştin û ji nû ve vebûnên ra ne tijîye "(Tewfîq, 2006, r. 65 ). Herweha li Başûrê Kurdstanê piştî serhildana 1991ê qonaxek giring bû di dîroka Başûrê Kurdstanê da û vê yekê bandora xwe li ser rojnamegerîya Kurdî hebû û hin rojname û kovar derketin holê. Di vê qonaxê da xwendin li xwendingehan û Zanîngehan bo zimanê Kurdî û li zanîngeh û peymangehan beşên Ragihandinê vebûn. Ev bû eger ku ragehandin û rojnamegerî li Başûrê Kurdstanê bi awayekê giştî pêşbikeve. " Li Başûrê Kurdistanê, di weşanvanîyê da profesyonelî pêşket û kovar û rojnameyên curbicur hatin derxistin: Kovarên tendirustî, siruştî, wêjeyî, muzîkî, çandî, hunerî, wênegirî, erdnîgarî, zanistî, nûçeyî, werzişî û hwd. Piştî azadiya beşeke Kurdistanê, li Başûr rojname û kovarên wekî "Alay şoreş", "Baban", "Bûn", "Demokrasî", "Êsta", "Gazî", "Gelawejî Nwê", "Gulan", "Karwan, "Serab", "Serboxoî (oragana Partî Serboxoî Dîmukratî Kurdistan), "Wêran", "Raman", "Rûnakî" dest bi weşanê kiribûn. Piştre roj bi roj kovar û rojnameyên nû dest bi weşanê kirin. Ji ber ku hejmarên wan gelek in ez ê tenê nav û salên wan bidim. Her yek bi serê xwe di pêşxistina çand, huner, muzîk, edebîyat, hestên neteweyî, modernîzasyona Kurdistanê, dîplomasî û pêşxistina civaka kurdî da cihêkî girîng girtine(Tewfîq, 2006, r. 23).

### 1.4. Rojnamegerî û medyaya kurdî ya îroyîn

Piştî destpêka salên 2000î wekî hemî Cîhan, Kurdistan jî xwe guhert. Belê Kurdistan hin jî ne serbixwe ye, hin jî ne yekbûyî ye. Lê gelê kurd li gel hemû şaşitî û xeteyên xwe, niha di asta geşepêdanê da ye. " Tevgera neteweyî ya kurd hêdî hêdî fêrî xwe helsengandinê dibe. Teknolojî di leha xalkê kurd da bi pêş dikeve, kurd nêzî hev dibin. Bûyeraka li Hewlêr an Qamişloyê, Amed an jî Mehabadê dikare kurdên hemû perçeyan rake ser pîyan. Di vî tiştî da bandora herî mezin bi pêşketina teknolojîyê ra li ser livdarbûna hişmendiya neteweyî ya gelê Kurd e. Jixwe ji ber ne serbixwebûyîna welatê Kurdan bi %100 rêkûpek bûyîna medyaya kurdî ne gengaz e. Kêşeya zaravayan jî mîna berê ne mijareke ku di nava gelê kurd da bibe egera sar bûyînê. Tenê hin pirsgirêkên teknîkî derdixe holê. Bi bikaranîna yek alfabeyê dibe ku ev problem jî ji holê rabe. Êsta bi dehan rojname, bi dehan tv û radyo, bi sedan kovar, bi hezaran jî malper hene. Û heta niha ji duhezarî (2000) zêdetir kovar, belawok û rojnameyên kurdî derketîne. Li Kurdistana Azad wekî Gulan, Xak, Serdem, Resen, Duhok grubên medya jî mewcûd in " (Tewfîq, 2006, r. 66).

## 2. Kovara Peyvê

### 2.1. Dîroka Kovara Peyvê

Peyv kovareka Kurmancî ya rewşenbirî ye ku bi tîpên latînî û erebî dihê weşandin. Ev Kovar Ji bal Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Duhok (YNK-Duhok) li bajêrê Duhokê, ku dibe paytexta devera Badînan∗ bi awayekê werzî derdikeve. Nivîskarên hemû parçeyên Kurdistanê nivîsên xwe di vê kovarê da diweşînin. “Dîroka damezrandina kovarê diçe salên 1993yan. Çunku desteyeka nivîskarên wî çaxî; *Hesen Silêvanî, Xidirê Silêman, Mihsin Qoçan, Ebdilkerîm Findî, Fazil Omer, Mehemed Emîn Mehemed Salih, Remezan Îza* yekemîn hejmara kovara Peyvê weşand. Lê belê berîya vî çaxî bizavên bi vî awayî li bal YNK- Duhokê hebûn weke damezrandina kovareke bi navê “Peyv”ê," (Rabeea Ismael Khalid Zebari, Mehmet Veysi Babayiğit, 2022, R.20). ku weke pertûkekê derket holê û li ser navê “*Ehmed Ebdulla Zero* ” belav bû. Îcar ji bo vê yekê Ehmed Ebdulla Zero dibêje:

*"Piştî kongireya 5an a YNKê ku li bajêrê Hevlêrê di sala 1987an da hatî kirin. Ez wek serokê YNK-Duhokê hatim helbijartin û Mela Tihayê Mayî wek cêgir hat helbijartin û grûpa nivîskaran ev bûn: Misediq Tovî, Xelîl Duhokî, ‘Ebdilrehman Muzurî, Enwer Mihemed Tahir û hwd bûn. Berhemên nivîskarên devera Badînan nedihatin belavkirin. Çunku valahîyeka rojname û kovaran li deverê hebû. Egerê din hin kovar li bajêrê Bexda û Hewlêr dihatin weşandin weke Beyan, Rewşenbîrî niwê, Karwan û hwd ji bal Wezareta Rewşenbîrî a Iraqê ve dihatin weşandin. Îcar ev kovar bi devoka soranî dihatin nivîsandin. Kurmancî di nav da*

∗"Devera Badînan yek ji deverên bi nav û deng ên li Başûrê Kurdistanê ye. Ev dever dikeve Bakurojavayê Devleta Iraqê. Başûrê Kurdistanê ji alîyê nîva rojavaya Başûrê Kurdistanê bi xwe ve digire. Ev dever ji sinorê Zêy Mezin û Kêleşînê li ser sinorê Îranê ji alîyê Rojhelatê ve û Rûbarê Hîzil û sinorê Surya ji alîyê rojavayê ve û Çiyayê Meqlub li “*Mûsil* “ê ji alîyê Başûr ve heta sinorê Tirkîya ji alîyê bakur ve bi sînor e. Pêwîste wê yekê eşkere bikin, ku pêşî navê wê devera “*Badînan*” bi navê **“***Welatê Hekarî”* dihat nasandin. Îcar Başûrê Kurdistanê ê ji devera Soran û Badînan pêkdihê. Îcar devera Badînan ji Başûrê Kurdistanê ji bajarê Duhok, Amêdî, Zaxo, Akrê, Berdereş, Şêxan, Şingal û Sêmêl, bi xwe ve digire" (Zebarî û Babayiğit, 2022, r.17).

*tûnebû. Anku soranîya wî çaxî desthelat li ser rojname û kovarên kurdî kiribû. Lewre me weke YNK-Duhokê dixwest kovarekê derbixin ji bo wê yekê nivîskarên me bikarin berhemên xwe di nav da belav bikin. Me hizir di wê yekê da kir ku navê kovarê bikin Peyv. Çunku peyv peyveka kurmancî ye. Grupa YNK-Duhokê ev boçûna min pejrand. Min ev kovar di 1979an da bir Bexda ji bo weşandinê. Lê belê di 1980an da weşandin. Em dibêjin ya dirust kengî hatî weşandin dîroka wê ji wir despêdike. Ev kovar weke pertûkekê amadekir û navê hejmarê li ser nenivîsand. Çunku weşandina kovar û rojnameyan di wî çaxî da li bal devleta Iraqê yasax bû. Heta Rêveberîya Zêrevanî a Weşandinê hebû. Karê wan çavdêrîkirina karê weşandinê bû. Hin caran hin mijar di pertûkan da red dikirin û hin caran pertûk bi tevahî dihatin redkirin. Îcar ji bal wan weşandina kovar û rojnameyan bi zimanê kurdî yasax bû. Belku bi tenê ji bo wan kovar û rojnama tamam bû ew ên ji bal Wezareta Rewşenbîrî Devleta Iraqê derketin weke Karwan, Rewşenbîrî niwê, Beyan.. û hwd. Helbet ev meseleka siyasî bû. Îcar ev yek bû eger ku YNK-Duhokê nekarin bi awayekê eşkere kovarê biweşînin. Belku me weke pertûk weşand. Çunku eger ji wan ra bogotana ev kovar e, nediweşand çunku yasax bû. Lewre navê min "Ehmed Ebdulla Zero" li ser nivîsand. Çunku wî çaxî ez serokê YNK-Duhokê bûm. Ev bû eger ku li ser kovarê navê min bihê nivîsandin. Lê belê di pêşgotinê da îşaret bi vê yekê kirî ye, ku ev ne mulkê min e. Belku mulkê YNK-Duhokê ye. Herweha me hejmara diduyan ji heman sîstemê cara pêşîn navê min "Ehmed Ebdulla Zero" li ser nivîsand û bir Bexda ji bo weşandina wê. Lê belê mixabin ji wê yekê zanî ku ev kovar e, nek pertûk e".* (Zero, Hevpeyvîna Neçapkirî, 2017 )

Helbet piştî me lêkolîn li ser dîroka kovara Peyvê kirî, ev bizava YNK- Duhok ewa li 1980 bi navê "*Peyv*"ê weke belavok dihesibînîn, nek weke kovar. Çunku di pêşgotinê da ev yek ji me ra eşkirekirî ye yan pênasekirî ye, ku Peyv belavok e, nek kovar e.

*"Peyv, ev belavoke berhemê ji nû gehiştî ji dara baxê.. Hêjayan eve bizava yekê ye tayê me pê radibît, dur nîne kêm û kasî di vê hijmara yekê ser xo rakin... Heta hijmareka dî û qefteka nû ya ji berhem û verêjêt gulistana tûrê kurmancî "* (Zero;1980, r,5)

Peyv weke kovar bi rengekê akademîk di sala 1993yan da derketî ye holê. Lê belê ewa 1980 weke belavok dihê hejmartin. Çunku di pêşgotinê da bi vî awayî hatîye pênasekirin: "*Peyv, ev belavok e......*" Lê belê em dikarin bibêjîn ev belavoke bo esasek ji bo kovara peyv li piştî serhildanê. Çunku navê wê her ji wê belavoka Peyvê hatîye. Fazil Omer yek ji avakerên kovara Peyvê bû bi vî awayî dibêje:

*" Eger em bi awayek ekademîk xeber bideyîn, YNK-Duhok, du kovarên Peyv hebûne; Peyvek li salên 80yan weke komeka gotaran, bê navkirin a coreyê berhemî hatîye weşandin. Ev Peyve bi tinê yek hejmare jêre derdikeve û bi navê Mamostayê hêja Ehmed Ebdula Zero hatîye belavkirin. Kovara Peyv a din, piştî serhildana Başûrê Kurdistanê hatîye weşandin û navê kovar jê re hatîye kirin ku heta niha didome "* (Omer; Hevpeyvîna Neçapkirî, 2017)

Heta sala 2017an ev kovar didome û 74 hejmar derketine. Berpirsiyarên kar û barê kovarê ev in: Xwedîyê Îmtîyazê*: Hesen Silêvanî,* Sernivîskar: *Şukirî Şehbaz,* Sekreterê

nivîsînê*: Hekîm 'Ebdulla,* Rêveberê Hûnerî*: Sitar*. Herweha Desteya nivîskaran ev in: *Remezan Hacî, Xalid Salih, Aştî Germavî, Guknar Elî.*

### 2.2. Egerên Damezrandina Kovara Peyvê

Peydabûna her rojname û kovarekê ji encamê çend egeran bû. Nemaze devera Badînan ji alîyê rewşenbîrî û rojnamevanî ve devereka paşvemayî bû ku heta salên 1990an zimanê Kurdî di dibistan û zanîngehan da qedexe bû (Rabeea Ismael Khalid Zebari, Mehmet Veysi Babayiğit, 2022, R.28 ). Hin kovar û rojname hebûn ku bi zimanê Erebî derdiketin. Lê belê van rojname û kovaran ne didomand. Ji ber rewşa siyasî û aborî dihatin sekinandin; weke Kovara Hîvî, 7 hejmar derketin (1970). Herweha Kovara Deng, 4 hejmar (1980) û hwd. Ev hemû bûne eger ku li piştî serhildanê gelê Kurd azad bû û ji bin zilim û sîtema devleta Iraqê derketin. Îcar eve bû eger çendîn kovar û rojname derkevin holê yek ji wan kovaran, Peyv bû, ku yekem hejmara xwe 1993yan da weşand. Herweha Hesen Silêvanî yek ji avakerê kovarê bû. Hesen Silêvanî di vê babetê da wiha dibêje:

*"Hebûna kovarek ji bo YNK-Duhokê yek ji karên herî pêwîst bû. Çunku nivîskarên me nedikarîn berhemên xwe belav bikin yan mane dihelgirtî. Îcar ev yeke ji karên pêwîst bû ku nivîskarên me bikarin berhemên xwe belav bikin, herweha bibe nasnameya xebatên YNK-D "* (Silêvaneyî; 2017)

Dr. Arif Hîto ku yek ji endamên kovara Peyvê bû, ji bo egerên damezrandina kovara Peyvê wiha dibêje:

*"Herdem Devera Badînan pêwîstî bi kovareka rewşenbîrî-edebî hebû. Da ku berhemên nivîskarên deverê tê da belav bibin. Çunku kovarên senterî çi ji Bexde yan Hevlêrê, pitir giringî bi devoka Soranî didan û herdem berhemên nivîskarên deverê dimane helgirtî, anku nedikarîn belav bikin. Îcar weke pêwîstiyeka devera Badînan bi kovareka rewşenbîrî-edebî, desteka kargîrî ya ÊNK-Duhok (piştî serhildanê- piştî kongirê serheldanê), biryara damezrandina vê kovarê da û bi xwîngermî û bi dil xweşî ve hat pêşwazîkirin"* (Hîto; 2017)

Pîr Xidrê Silêmanî ku yek ji avakerên kovara Peyvê bû li ser derxstina kovara Peyvê wiha dibêje:

*"Armanca me ji damezrandina kovara Peyvê ew e, ku bibe zimanhalê nivîskarên devera Badînan û nîvîskarên me dem hebe berhemên xwe tê da biweşînin "* (Silêmanî; 2017)

Hebûna valahîya rojname û kovaran li devera Badînan, ku nivîskarên deverê nedikarîn nivîsên xwe tê da belav bikin, bû eger ku kovara Peyvê bê avakirin.

### 2.3. Naveroka Kovara Peyvê

Dema em li naveroka kovara Peyvê dinêrîn, ev yek eşkere dibe ku kovara Peyvê ji du beşan pêk dihê. Beşek bi Kurdîya tîpên erebî dihê nivîsandin û beşa din bi kurdî ya latînî dihê nivîsandin. Ji bo vê yekê nivîskar Hesen Silêvaneyî, ku yek ji avakerê kovara Peyvê ye wiha dibêje:

*“ Armanca me ji beşa latînî ew e ku nivîskarên parçeyên din ên kurdistanê û ên derve dijîn bikarin mijarên xwe di vê kovara Peyvê da belav bikin. Eve ji bo wê yekê ye ku peywendî û agehdarî di navbera edebiyat û nivîskarên her çar parçeyên Kurdistanê da hebe”* (Silêvaneyî, 2017)

Kovara Peyvê bi xwe kovareka rewşenbîrî ye. Her ji destpêkê were bi vî awayî bûye. Eger di nava rûpelên kovarê da binêrîn wê mijarên rewşenbîrî bibînin. (Rabeea Ismael Khalid Zebari, Mehmet Veysi Babayiğit, 2022, 5) Lê belê piştî komeka kovarên taybet yên dîrokê, hizirî, rojnamevanî derketin holê, kovara Peyvê pitir xwe li mijarên edebî kire xwedan. Ji alîyek dî ve, Peyv kovara ÊNK-Duhokê ye û piranîya endamên Duhokê nivîskar in û wêjevan in lewre kovar ber bi alîyê edebî ve çû ye. Lê belê çi mijarên rewşenbîrî jî red nake di qada rewşenbîrî ya herêmê da ye, hêşta navê wê maye kovareka rewşenbîrî.

Beşa kurdî ya erebî ji sê beşên sereke pêkdihê. Du beş ji bo têkistên edebî ên dahênanê weke çîrok, helbest, têkistên şanoyê ye. Beşa din ji bo lêkolîn û bîr û boçûnên hemî cure weke hûner, dîrok, felsefe û hwd. ne. Ji bilî van mijaran, lekolînên derbarê têkistên edebî û rexneya edebî da jî hene. Îcar ji bilî van her sê beşan hinek alîyên din ji xwe ra digire weke hevpeyvîn ku her car digel nivîskarek yan rewşenbîrek dihê kirin. Herweha cildê kovarê ku her car mijareka edebî û rewşenbîrî, bizav û çalakî û weşanên ÊNK-Duhokê ji xwe ra digire heye.

Di beşa latînî ya kovarê da mijarên lêkolîn, çîrok, helbest û mijarên hemî curên rewşenbîrîyê hene. Bi awayekê giştî kovara Peyvê bi her du şêwazên nivîsîna bi tîpên kurdî ya erebî û latînî dihê weşandin, ku xwendevan û nivîskarên bakur û rojavayê Kurdistanê ji vê kovarê bê behir nebin.

## 2.4. Cihê Kovara Peyvê di Edebyata Kurdî da

Kovara Peyvê dibe yekemîn kovar li devera Badînan ku bi Kurdîya erebî û latînî hatîye weşandin. Cihê kovara Peyvê di edebyata kurdî da eşkere ye. Nivîskarên her çar perçeyên Kurdistanê nivîsên xwe di vê kovarê da belav dikin. Anku bi watayeka din kovara Peyvê nivîskarên her çar perçeyên Kurdistanê li xwe kom dike. Ev dibe eger ku piranîya nivîskar û xwendevanê kurd bi rêya kovara Peyvê agehdarî edebiyata kurdî bibin. Anku em dikarîn bibêjîn kovara Peyvê bû rêyek ku hevnîzîkbûnekê di nava edebîyata her çar perçeyên Kurdistanê da dirust dike ku bikarin berhemên xwe di nav da belav bikin.

Herwekî me ew yek eşkere kir bû; kovara Peyvê bi latînî jî tê nivîsandin. Kovara Peyvê sînorên di navbera parçeyên Kurdistanê da rakiriye û deriyê xwe ji wêjevanên parçeyên din ra vekiriye. Îcar nivîskarên parçeyên din ên Kurdstanê bi rêya vê kovarê mijarên xwe belav dikin. Ji ber vê yekê nivîskarên parçên din ên Kurdistanê, li Başûrê Kurdistanê jî bi nav û deng bûne; weke *Berken Bereh, Arjen Arî, Dilawer Zeraq û hwd.*

Nivîskarên Başûrê Kurdistanê bi rêya vê kovarê nivîsên xwe bi latînî dinivîsandin û belav dikirin. Ev bû eger ku nivîskarên Başûrê Kurdistanê li parçeyên din ên Kurdistanê bihên nasîn. Anku bi awayekê din kovara Peyvê roleke baş heye, ji bo nasandina nivîskarên Başûrê Kurdistanê bo parçeyên din ên Kurdistanê, nemaze li Bakurê Kurdistanê.

Herweha vê kovarê roleke baş heye, ji bo pêşxistina edebiyata kurdî bi awayekê giştî û bi hemû cureyên xwe ve weke; helbest, çîrok, roman, kurteçîrok, şano û hwd. Herweha rola kovarê çêbûye bo komvekirin û lêkolîn li ser edebê folklorî kurdî bêne kirin.

Di warê pêşxistina rexneya edebî û wergêranê da jî bandoreke baş ya kovarê çêbûye. Çunku çend rûpelên vê kovarê ji bo lêkolînên edebî hatine terxankirin. Îcar ev bû eger ku bi awayeke baş lêkolîna li ser edeba kurdî bê kirin. Hin caran wergera mijarên edebî ji zimanê biyanî bo zimanê kurdî hatiye kirin. Xwendevanên kovarê bi rêya van metinan agahdarê edebiyata cîhanê bûne.

**Encam**

Li Başûrê Kurdstanê dîroka rojnamegerîya Kurdî bi *Rojnameya Kurdistanê* ku di sala 1898an da li Qahîre derketîye, dest pê dike. Rojnameya Kurdistanê ji alîyê Mîqdad Mîdhet Bedirxan ve li Qahîreyê hatîye derxistin Ev rojname di 22yê Nîsanê da dest bi weşanê kirîye. 22yê Nîsanê lewma wekî salvegera rojnamegerîya kurdî tê pîroz kirin û li Başûrê Kurdistanê jî ev roj bi awayekî fermî wekî roja “Rojnamegerîya Kurdî” tê qebûl kirin. .

Herweha li Başûrê Kurdstanê Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem xebatên kurdî yên rewşenbîrî û çapxane û çapemenîya kurdî li Başûrê Kurdstanê cara ewil di sala 1920an da li Silêmanîyê di bin kontrola desthilata mêtinger a Îngilîzan da dest pê kir. Xebatên kurdî carinan di bin kontrola hikûmeta navendî da dimeşiya û carinan jî ji aliyê birêvebiriyên xweser.

Li Başûrê Kurdstanê Herêma Badînan Peyv kovareka rewşenbirî ya Kurmancî ye ku bi tîpên latînî û erebî dihê weşandin. Ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Duhok (YNK-Duhok) li bajêrê Duhokê. Peyv weke kovar bi awayekê akademîk di sala 1993yan da derketî ye holê. Lê belê ewa 1980 weke belavok dihê hesibandin. Çunku di pêşgotinê da bi vî awayî hatîye pênasekirin: “*Peyv, ev belavok e......*” Lê belê em dikarin bibêjîn ev belavoke bû esasek ji bo kovara Peyvê li piştî serhildanê. Çunku navê wê her ji wê belavoka Peyvê hatîye.

Dema em li naveroka kovara Peyvê dinêrin, ev yek eşkere dibe ku kovara Peyvê ji du beşan pêk dihê. Beşek bi Kurdîya tîpên erebî dihê nivîsandin û beşa din bi kurdîya latînî dihê nivîsandin.

Beşa kurdî ya erebî ji sê beşên sereke pêkdihê. Du beş ji bo têkistên edebî ên dahênanê weke çîrok, helbest, têkistên şanoyê ye. Beşa din ji bo lêkolîn û bîr û boçûnên hemî cûre weke hûner, dîrok, felsefe û hwd. ne. Ji bilî van mijaran, lekolînên derbarê têkistên edebî û rexneya edebî da jî hene. Îcar ji bilî van her sê beşan hinek alîyên din ji xwe re digire weke hevpeyvîn ku her car digel nivîskarek yan rewşenbîrek dihê kirin. Herweha cildê kovarê ku her car mijareka edebî û rewşenbîrî, bizav û çalakî û weşanên ÊNK-Duhokê ji xwe re digire heye.

Di beşa latînî ya kovarê da mijarên lêkolîn, çîrok, helbest û mijarên hemî curên rewşenbîrîyê hene. Bi awayekê giştî kovara Peyvê bi her du şêwazên nivîsîna bi tîpên kurdîya erebî û latînî dihê weşandin, ku xwendevan û nivîskarên bakur û rojavayê Kurdistanê ji vê kovarê bê behir nebin.

**Çavkanî**

Rabeea Ismael, K. Z. & Babayiğit, D. M. V., 2021. Kürt Gazeteciliğinin Edebiyat Eleştirisi Üzerine Etkisi: 1991-2003 Güney Irak Örneği. Mezopotamya Disiplinlerarası Çalışmalar Dergisi, Issue 1.

Rabeea Ismael, K. Z. & Babayiğit, M. V., 2022. Dîroka Rexneya Edebî ya Kurdî Li Başûr. Kadim Hikmet Uluslararasi Bilimler Dergisi, Volume 6.

Rabeea Ismael, K. Z. & Babayiğit, M. V., 2022. Lêkolîna Rexneya Edebî Di Metnên Cuda yên"Peyv"ê de. Cihanşümul Akademi Sosyal Bilimler Dergisi, 2(3).

Tewfîq, H. T., n.d. Rolê Rojnamegerîya Kurdî di pêşvebirina hizra neteweî ya Kurdî da, Weş. Spîrêz.

Tewfîq, H. T., n.d. Rolê Rojnamegerîya Kurdî di pêşvebirina hizra neteweî ya Kurdî da, Weş. Spîrêz.

Zero, Ehmed Ebdullah, *Hevpeyvîna Neçapkirî*, 07-05-2017, Duhok

Zero, Ehmed Ebdullah, *Kovara Peyv*, Weş. El- Hewadis, 1980, Bexda

**Hevpeyvîn**

Hîto, Arif, *Hevpeyvîna Neçapkirî*, 20-2-2017- Duhok

Omer, Fazil, *Hevpeyvîna Neçapkirî*, 21-1-2017, Duhok

Silêmanî, Pîr Xidirê, *Hevpeyvîna Neçapkirî*, 20-2-2017- Duhok

Silêvaneyî, Hesen, *Hevpeyvîna Neçapkirî*, 16-1-2017, Duhok

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

# A STUDY ON ADJUSTMENT STRATEGIES OF THE KURDISH INTERNATIONAL STUDENTS EXPERIENCED CULTURE SHOCK IN THE UK

(لێکۆڵینەوەیەک لە ڕێگاکانی خۆگونجاندنی خوێندکارانی کورد کە ڕووبەڕوی شۆکی کلتوریی لە وڵاتی بەڕیتانیا بونەتەوە)

(LÊKOLÎNEKE LI SER STRATEJIYA ADAPTASYONA XWENDEKARÊN KURD ÊN NAVNETEWÎ LI BRÎTANYAYÊ YÊN KU ŞOKA ÇANDÊ JİYAYE)

Beway Mahmood SAHEB*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 26.10.2022
**Accepted // Pejirandin:** 21.11. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 139- 146
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1195189

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Saheb, Beway Mahmood (2022). A Study On Adjustment Strategies Of The Kurdish International Students Experienced Culture Shock In The Uk, K*urdiname*, no. 7, p.139-146

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

**کورتە**

ئەم توێژینەوەیە لە ئەزمونی شۆکی کلتوری و ڕێگاکانی خۆگونجاندنی خوێندکارانی کوردی کوردستانی عێراق لە وڵاتی بەڕیتانیا دەکۆڵێتەوە. ئامانجی توێژینەوەکە بریتیە لە خستنەڕوی لایەنێکی ژیانی ئەم خوێندکارانە کە هەستیان بە شۆکی کلتوری کردوە بەهۆی جیاوازی نێوان کلتوری کوردستانی عێراق و وڵاتی بەڕیتانیا، هەروەها دەستنیشانکردنی ئەو ڕێگایانەی کە بۆ ڕاهاتن لە ژینگەی نوێی ئەکادیمی بەکاریان هێناوە. میتۆدی توێژینەوەکە چۆنێتی ئەزمون و خاڵی هاوبەشی ژیانی خوێندکارەکان لە زاڵبون بەسەر شۆکی کلتوری دا وەک کەرەستەی سەرەکی، لە ڕێگای هەندێ پرسیاری پەیوەندیدارەوە، شیدەکاتەوە. ئەنجامەکان دەریدەخەن خوێندکارەکان بە زمان و کلتور و خەڵک و سیستەمی خوێندنی زانکۆ لە بەڕیتانیا ئاشنایەتیان لە ئاستی پیویست دا نیە کاتێک دەگەنە ئەو وڵاتە، بەڵام ئامادەیی تەواویان نیشان داوە کە تێکەڵی خەڵکی بەڕیتانیا و کلتور و زمانەکەیان ببن. هەروەها خوێندکارەکان ڕازین لە سیستەم و خزمەتگوزاریەکانی زانکۆ، ئەمەش هەلی سەرکەوتن و زاڵبون بەسەر کێشەکان دا دەڕەخسێنێت.

**وشە کلیلیەکان:** خوێندکارانی کورد، شۆکی کلتوری، ڕێگاکانی خۆگونجاندن، خوێندکارانی نێودەوڵەتی لە بەڕیتانیا

**Abstract**

The present study investigates the experience of Culture Shock by Kurdish international students in the UK and the main adjustment strategies the students take to become familiar with the new culture and education system. The aim of the paper is to explore the life of these students in terms of culture shock and the ways the students mostly use to adapt to the new academic environment. The qualitative approach of the study identifies major themes and topics shared by all five participants who were interviewed on the basis of some relevant questions. The findings indicate that unfamiliarity with the English language, culture, people and education system is the major problems; however, the Kurdish international students were ready to interact with British people and expose to the language and the culture. The students were also satisfied with the UK university teaching and service.

**Keywords:** Kurdish students, culture shock, adjustment strategies, international students in the UK

**Kurte**

Armanca vê xebatê lêkolînkirina çanda xwendekarên Kurd yên navneteweyî ku li Brîtanyayê tecrûbekirine ye. Ev xebat, stratejiyên ku xwendekarên kurd ji bo adaptasyona çanda nû û pergala perwerdehiyê

* Mamoste, University of Halabja, Kurdistan Region-Iraq, Email: beway.saheb@uoh.edu.iq, Orcid: 0000-0002-6896-0986

bikaranîne kîjan e lêkolin dike. Yek jî armanca vê xebatê keşf kirina teşeya jiyanê ya di bin bandora şoka çandî de mane û keşf kirina entegrasyona nîvenga akademik a nû ye. Nêzîkatiya nitel ya vê xebatê ev e, di bin bingeha hin pirsan de bi riya hevdîtinê bi pênc kesan re tema û mijar hatiye parvekirin. Encama xebatê nîşanê me dide ku ger mirov aşiyanê ziman, çand, mirov û pergala perwerdehiya îngilizan nebe ev tişt dibin sedemên pirsgirêkên xwendekaran. Lê belê xwendekarên kurd yên navneteweyî bi îngilizan re rola ragihanderî girtine ser xwe û çand û zimanê van naskirine. Di heman demê de xwendekar, ji xizmeta û perwerdehiya zaningehên Brîtanyayê xweşhal mane.
**Kilîtbêje:** xwendekarên kurd, şoka çandî, stratejiyên adaptasyonê, xwendekarên navneteweyî li Brîtanyayê

## 1. Introduction

It is common for people who sojourn to another culture or country to experience culture shock. International students contribute greatly to the number of individuals who spend a certain period of time in a different culture. The numbers of Kurdish international students in the UK have increased recently. The problems that arise from living in a new culture sometimes give people, the students in the current study, a feeling of shock. Therefore, the aim of this paper is to examine the experience with regard to cultural adjustment of the Kurdish students in the UK and particularly what their problems are and which strategies they use to cope with culture shock. It seems relevant and significant to pinpoint the areas of concern of the participants and their way of addressing them. The present study is about the culture shock experience of a handful of Kurdish international students living in the UK for educational purposes. This is going to uncover some aspects of the topic and it can be considered as the first study focused directly on the strategies of overcoming the cultural shock.

## 2. Understanding Culture Shock

When people move from their home country to a new country or to a new culture, they feel culture shock. They take all the relevant scripts, habits, conversational routines of the home country with them. As a result, it is predictable to have unintentional clashes with the new or host culture.

Ting-Toomey and Chung (2005: 115) state that culture shock is about ‘the stress and the feeling of disorientation’ individuals undergo when they ‘move from a familiar environment into unfamiliar one’. It is ‘an emotional experience’ that becomes ‘intense emotions’. Then it changes to ‘behavioural confusion’ as a result of disorienting the patterns of thinking. Thus, the individual’s identity seems to be ‘stripped of all protection’. It becomes difficult to function in the ‘new cultural setting’. Today more than any other time seems to be considerably important to tackle the issue of culture shock and the way it can be overcome because the connection among the countries around the world has become extremely strong.

The term cultural shock was coined by an anthropologist ‘Oberg’ (1960). There have been many researches in this area since then. This implies that there is no consensus what the concept of culture shock exactly is. Furnham (1988) points out that this disoriented period have a negative impact such as psychological stressful time, refusal by the host culture and the loss of identity. The latter appears in various form and ways; people in the host culture feel deprived from their values as a general concept, become confused and live a powerless life.

Moreover, there is another view which categorises this shock in terms of its affective, behavioural and cognitive impacts (Ward et al, 2001). To be specific, the initial bewilderment and anxiety which everyone in a new culture is highly likely to experience refer to the affective dimension of culture shock. Furthermore, the behavioural disorientation results from the confusion that is the outcome of the mix of the rules and norms of two different cultures. In addition, individuals in this sense cannot hold the appropriate communication. Specifically, they seek to find a proper way to maintain the conversation. If they could not, they try to end it at any cost. This might happen mostly when there is a necessity to use nonverbal language in the interaction which is not easily controlled by some of the people who are suffered these difficulties (Bochner, 1986: 48).

It is important to remember if this is the case, how individuals can cope with or manage it. This is really fundamental because if we are able to manipulate this shock, it could change from unpleasant period of time into positively productive experience. So, there is at least a general agreement that the cultural shock have disadvantages as well as advantages (Ting-Toomey and Chung, 2005). The benefit of this shock is seen when it is managed successfully. As a result, sojourners feel comfortable in the new culture and become competent in their everyday interaction. They tolerate ambiguity and experiment new opportunities in the new culture. These all positively force these individuals to become a better person.

There are also several factors which influence this experience and differ on the level of individuals. The followings have been found: sojourner’s directional motivation, the individual’s expected future, the degree of difference between the two cultures, psychological adaptation, sociological familiarity and individual characteristics.

Ward (1996) points out that the intentions to travel and live in another country are various, and this has profound effect on the way the new culture is being viewed. Taking two examples helps us to understand it better. International students and immigrants both go through culture shock. The international students have dreamt to be in a new culture and they move to another country based on an educational purpose. They have prior general knowledge and may have at least limited ability to use the main language of the host culture. This makes cultural adjustment easier. On the other hand, although most of the immigrants suffer too much so as to get to safety, most of them usually become isolated as they are undocumented and unable to follow their dreams upon arrival to the new country. It means the more difficulties immigrants have, the worst their culture shock is going to be and take a long period of time to overcome it.

Furnham and Bochner (1982) note that sociocultural dimension of the adjustment can be considered as a major factor and this refers to the ability that newcomers need to interact and befriend with host nationals. The appropriateness of this interaction is essential because if something goes wrong, it impacts the whole life of newcomers for a very long period of time. The newcomers realise the need to respect values of the host culture; at the meantime, they socialise successfully as much as they can if they keep a balance between the values of the two cultures. Additionally, international students are also easily able to build friendship with citizens of diverse background in cities that are considered a cosmopolitan such as London.

Ward *et al* (2001) address the psychological issues such as stress, low self-esteem and intrapersonal confusions and confirm that these issues affect the well-being of newcomers. Therefore, cultural adjustment strategies are necessary and they can be divided into two types: primary and secondary. The primary strategies can be described as avoiding intrusive and stressful environment. This is more behavioural-driven actions which act like managing some hostile situations and buying some time to be prepared cognitively. Hence, cognitive changes are required to happen, secondary but essential in nature, in order to support already taken strategies. The outcome of these processes is the change that occurs in the perception of the newcomers towards culture shock; from mere optimism into an enhanced optimism about self, others, and the everyday surrounding. The feeling of stress or loss in the host culture is definitely replaced by appraisal of the new environment (Chang *et al*, 1997 and Cross, 1995).

## 3. Methods

### 3.1 Participants

There are five main participants taking part in this study. They are all male Kurdish, from Iraqi Kurdistan region, international students and study master degree at the University of Nottingham. The participants are introduced by numbers (e.g. participant 1, 2…) so as to keep their identity anonymous. They belong to different fields of study, participant 1 is studying engineering; three participants (2, 3 and 4) in linguistics and participant 5 is majoring in advanced computer science. All the subjects are granted a scholarship, funded by Iraqi Kurdistan regional government, to study in the UK. Their age ranges from 25 to 33 years old (mean= 29). Their stay in the UK is different from each other, and it is between 10 to 16 months living in the UK.

### 3.2 Materials

After reading and reviewing several articles about the cultural adjustment related to international students (Ward *et al*, 2001; Constantine, 2005, and Fritz *et al*, 2008), a brief guideline for the interview, as the main tool of this qualitative study, was developed. This is done with the great help of an interview conducted prior the actual interviews. This secondary interview was done with another Kurdish student who is named participant 6. He describes his experience of culture shock in general and adaptation to the UK in particular. This interview takes 12 minutes and it was beneficial in some ways such as showing that there is a match between what he said as an example of a Kurdish student about different stages of culture shock he has been through and what Ting-Toomey and Chung (2005) have presented in their model.

### 3.3 Procedures

The participants for this study were chosen based only on their ethnicity and they took part in this study voluntarily, meaning that there was not any inducement in return to their involvement. In addition, their English language proficiency was taken into consideration and these participants can be seen as an able speaker to express what the questions might require to say in a specific period of time.

Their interviews were recorded by a smartphone which guaranteed the clearness of the voice. On average, each participant was interviewed for 4.23 minutes. After this, the recordings were fully transcribed. Furthermore, the qualitative analysis was carried out, starting with finding out about the common topics or domains which the participants share.

The final list of the areas of concern was as the following: (1) language and culture learning; (2) lack of friendship and (3) studying in a new academic environment. Moreover, the guide framed by Hill *et al* (1997) has been taken into account to a certain extent in analysing the data.

It appears that Kurdish international students in Nottingham city have adjusted culturally. There are three shared problems given above. These are inadequate familiarity with culture and language, feeling of alienation and novelty of academic system.

**4. Results and Discussion**

**4.1 The problems**

The first problem is the lack of knowledge about language and culture. These two components were mentioned together because all participants show a tight connection between these two. Second participant expresses the importance of knowing the language of the host country at the beginning of the interview and he describes his situation when he arrived at the airport:

> There were lots of problems; the first one is the language. When you land at the airport, you don't know where to go? How to get a taxi? Where to live? Where is the hotel? .... Another thing which is related to the language is culture.

This participant illustrates very well how someone feels when you arrive at the host country. He clearly states that language was his first problem and then he describes the state that newcomers face firstly. This is supported by other participants' comments on the same issue. For example, the fifth participant says language 'definitely' facilitates understanding culture. This is the time that you have many questions. Their answers do not help you very much because each question is rooted deeply in the host culture. Thus, it appears that there is a consistency between what he claims and the result of some studies that have been done on the case of international students. Fritz *et al* (2008) list language as the first problem, and then other issues such as making new friends. Moreover, Mori (2000) gives language the first position of unique problems that are significant barriers to the intercultural adjustment. Furthermore, Cadieux *et al* (1986) adds more to the emphasis of the role of language in this phenomenon and they point to the direct connection between language and performance of students in academic context and outside the university campuses. Therefore, language is needed to be 'hand in hand' with the culture, the fifth participant adds.

Social life; moreover, comes as a second matter that the participants were concerned about. These students feel the lack of friendship. They all comment that it was 'difficult to get British friends'. They add that if you have British friends, it 'makes you to get information about English language as well as English culture', the fifth participant notes. Additionally, one of the participant, the third one, views 'nearly impossible to make British friends'. Therefore, they feel isolated especially when they had started their studies. This is hard because when you come overseas, you miss the family and friends. So to compensate that, you try to fill the gap, but it is not easy to find new friends (Williams, 2005: 367). The main reason why they thought it is relatively impossible to have British friends refer to the big difference that can be seen

between the British culture and the Kurdish one. The third participant uses an expression ‘totally different’ when he compares the two cultures.

Furthermore, Another major thing which makes the experience of Kurdish international students complex is that they came to the UK, not only the culture is quite new, but also the academic system is more advanced compared to the one at the Iraqi Kurdistan Universities. The second participant views the uniqueness of the UK teaching system in terms of who is the centre of teaching. He labelled the education system in Iraq as a teacher-centred; whereas, the British one a student-centred. This is likely an anecdotal classification, but the fifth participant also makes a similar comment when he states ‘the students here are at the centre of an intensive study program’. In addition, Participant 4 defines this move to study in a new academic system as ‘tectonic shift’. Fritz *et al* (2008) and Mori (2000) mention this involvement in a new academic culture as one of the sources of stress, and this contributes to the escalation of the level of culture shock.

### 4.2 The Strategies

Empirical evidence has proposed some regulations that help people to manage cultural differences which cause culture shock in most of the cases. Matsumoto *et al* (2007: 82) identified four effective ingredients, related to people in a foreign culture, to overcome such differences. These are ‘emotion regulations, critical thinking, openness, and flexibility’. These are all helpful in terms of empowering individuals in a host culture. In particular, controlling emotions, which include keeping the negative emotions towards the new culture under control, is the key to become a flexible and open-minded person in viewing both our and host cultures critically. However, no matter how many strategies and regulations are available to people or students, it does matter how they are going to manipulate them. There have been a number of models with regard to strategies (e.g. Carver *et al*, 1989). It is noted that individuals pick up the strategies based on their psychological well-being. The more negative a student’s construal of a new culture would be, the more difficult it is to take an adjustment strategy. Cross (1995) adds that the cross-cultural unfamiliarity is the source of stress, and sojourners select and adopt a strategy successfully when they are likely familiar with the host culture.

In the previous section, it appeared that the problems that Kurdish international students faced were related to language and culture, lack of friends and studying in the UK academic system. Therefore, they needed to do an action or take certain strategies to lessen the impact of the culture shock. They thought it is a matter of fact that communication with the host nationals accelerates the rate of familiarity with the language and culture. The fourth Participant ‘went to city centre and began to interact with people’. This male participant initiated the most effective step towards embracing the new culture. His determination to succeed in cultural adjustment paves the way to lessen cross-cultural unfamiliarity. During the interactions with local people, he knew that it is important not to disturb people by speaking to them randomly; at the same time, exposing to local people and their culture to a certain extent. However, it was mentioned earlier that these students could not get British friends, and it was somehow

difficult to find English people to talk to. As a result, they state that watching TV and videos from YouTube are the two main sources they depend on to overcome lack of English friends. The second participant prioritises this strategy as he comments ‘the best way to learn and improve English language is to watch TV programs’. Furthermore, the students also tried to become friends with other nationalities living in the UK such as Arab, Chinese, Pakistani, Indian, and Turkish students. One of the participants ‘had the only, but golden chance to make friends with other nationalities’. This has two fold; in one hand, it is useful to have friends, get socialised, and exchange ideas about the host culture; on the other hand, it sometimes harms the English language proficiency of the international students because they do not get English language input from British people. Moreover, it seems that sharing the same religion helps to find friends as two participants asserts this importance of this topic. One of them points out that ‘he began to contact Muslim students. This helps in filling the gap of having English or British native friends’. The chance that they may have met British Muslim students is highly likely as the university has an active Islamic society whose members are from diverse ethnic backgrounds.

As far as the education system is concerned, the students come to the UK to earn a degree and go home that is why they study ‘day and night’. The service to ask the university staff whenever they feel uneasy with the academic system is available most of the time. One of the participants praised his lecturers who provided excellent teaching and academic advice. The participants become more engaged by asking questions and getting responses from their teachers. The fourth participant ‘began to be more interactive in terms of questioning and asking the lecturers for providing information about the education system’.

## 5. Conclusion

The problems and strategies have been discussed in reference to the culture shock experienced by Kurdish international students in the UK. It appears that these students have managed to cope with learning English language and have tried their best to familiarise with the British culture. The lack of British friends came as the second source of problems, but the students were creative in interacting with many people. The participants also benefit from the university services and resources and they enjoyed the excellent teaching environment. International Kurdish students are advised to do research better before coming to the UK so as to quickly become familiar with the new culture.

## References

Bochner, S. (1986). *Coping with Unfamiliar Culture: Adjustment or Culture Learning?* Australian Journal of Psychology, 38, 347-358.

Cadieux, R. A. J., & Wehrly, B. (1986). *Advising and Counselling the International Student*. New Directions for Student Services, 36, 51–63.

Carver, C. S., Scheier, M. F. and Weintraub, J. K. (1989). *Assessing Coping Strategies: A theoretically Based Approach*. Journal of Personality and Social Psychology, 56 (2): 267–83.

Chang, W.C., Chua, W.L. and Toh, Y. (1997). ‘The concept of psychological control in the Asian context’. In K.Leung, U.Kim, S.Yamaguchi and Y.Kashima (Eds), *Progress in Asian Social Psychology* (Vol. 1, pp. 95–117). New York: John Wiley.

Constantine, M. G., Anderson, G. M., Berkel, L. A., Caldwell, L. D. & Utsey, Sh. O. (2005). *Examining the Cultural Adjustment Experiences of African International College Students: A Qualitative Analysis*. Journal of counselling psychology, 52: 57-66.

Cross, S. (1995). *Self-construals, Coping, and Stress in Cross-cultural Adaptation*. Journal of Cross-cultural Psychology, 26, 673–697.

Fritz, M. V., Chin, D., DeMarinis, V., (2008). *Stressors, Anxiety, Acculturation and Adjustment among International and North American Students*. International Journal of Intercultural Relations, 32: 244-259.

Furnham, A. (1988). ‘The adjustment of sojourners’. In Y.Y.Kim & W.B.Gudykunst (Eds.), *Cross-cultural Adaptation: Current Approaches*, (pp. 42-61).Newbury Park, CA: Sage.

Furnham, A. and Bochner, S. (1982). ‘Social difficulty in a foreign culture: An empirical analysis of culture shock’. In S. Bochner (Ed.), *Cultures in Contact: Studies in Cross-cultural Interactions*. Oxford: Pergamon, pp. 161–198.

Hill, C. E., Thompson, B. J., & Williams, E. N. (1997). *A Guide to Conducting Consensual Qualitative Research*. The Counselling Psychologist, 25: 517–572.

Matsumoto, D., Yoo, S. H. and LeRoux, J. A. (2007). ‘Emotion and intercultural adjustment’. In H. Kotthoff and H. Spencer-Oatey (eds), *Handbook of Intercultural Communication*, pp. 77–97. Berlin: Mouton de Gruyter.

Mori, S. (2000). *Addressing the Mental Health Concerns of International Students*. Journal of Counselling & Development, 78(2), 137–145.

Oberg, K. (1960). *Culture Shock & the Problem of Adjustment to New Cultural Environments*. Practical Anthropologist, 7: 170-179.

Ting-Toomey, S. & Chung, Leeva C. (Eds.) (2005). *Understanding Intercultural Communication*. Oxford University Press, New York.

Ward, C. (1996). ‘Acculturation’. In D.Landis and R.S.Bhagat (Eds), Handbook of intercultural training (2nd edn, pp. 124–147). Thousand Oaks, CA: Sage.

Ward, C., Bochner, S., & Furnham, A. (2001). *The Psychology of Culture shock*. London: Routledge.

Williams, T. R. (2005). *Exploring the Impact of Study Abroad on Students' Intercultural Communication Skills: Adaptability and Sensitivity*. Journal of Studies in International Education, 9, 356-371.

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

*Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî*
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN**-2687-5438

# MEDHÎYEYEKE ŞÊX ŞEHABEDDÎNÊ TÎLÎ
(ŞEYH ŞAHABEDDÎN TÎLÎ'NİN BİR METHİYESİ)
(A EULOGY OF SHEIKH SHAHABEDDIN TÎLÎ)

M. Zana KARAK*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 01.11.2022
**Accepted // Pejirandin:** 19.11. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 147- 160
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1198118

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Karak, M. Zana (2022). Medhîyeyeke Şêx Şehabeddînê Tîlî, K*urdiname*, no. 7, p. 147-160

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

**Kurte**

Şêx Şehabeddînê Tîlî alim, mitesewif û miderisekî serdema xwe bûye. Di sedsala 19em de di heyama dawî ya Osmanî de jîyaye. Şêx Şehabeddîn li Tîla navçeya Mûşê hatiye dunyayê.

Malbata Şêx Şehabeddîn pêşî Qadîrî bûye û paşê bi malbatî derbasî Terîqeta Neqşebendîyê bûne. Şêx Şehabeddîn piştî wefata bavê xwe dev ji wezîfeya qadîtîyê berdaye û çûye Norşînê û bûye pêgirîyê Şêx Ebdurrehmanê Taxî. Şêx Şehabeddîn heta Hezret seyr û silûka xwe qedandiye, li medreseya Norşînê jî miderisî kiriye.

Şêx Şehabeddîn li ba Şêx Ebdirrehmanê Taxî dest bi seyr û silûkê kiriye, lê piştî wefata Taxî întîsabî kurê wî Hezret kiriye û xelîfetî jî ji wî wergirtiye. Lewra Şêx Şehabeddîn bûye xelîfeyê ewil ê Hezret.

Şêx Şehabeddîn piştî bidestxistina xîlafeta terîqeta Neqşebendîyê li Tîl û derdora Mûşê wezîfeya îrşadê kiriye. Şêx Şehabeddîn li pey xwe tenê xelîfeyek hiştiye û di sala 1326/1908an de rehmet kiriye û qebra wî li Tîla Mûşê ye.

Li gorî zanîn û çavkanîyên li heyî ti berhemên Şêx Şehabeddîn tune ye an jî li ser navê wî ti berhem nehatiye weşandin. Di vê xebatê de em ê li ser helbesta wî ku hêj nehatiye çapkirin rawestin. Bi vê xebatê dê helbestnûsîya wî bê zanîn û ev medhîyeya wî jî dê di lîteratûrê de cihê xwe bigire. Em ê di vê gotarê de vê medhîyeyê ji alîyê şeklî û naverokî ve binirxînin û metna transkirîbekirî ligel destxetên wê bidin. Piştî vê lêkolînê alîyê Şêx Şehabeddînê Tîlî yê tesewifî û edebî dê di perspektîfa Neqşebendîtîya Xalidîtîyê de bê zelalkirin.

**Peyvên Sereke:** Şêx Şehabeddînê Tîlî, Neqşebendî, Tekyaya Norşînê, Hezret, Medhîye

**Özet**

Şeyh Şahabeddin Tîlî, devrinin âlim, mutasavvıf ve müderrislerindendir. Şeyh Şahabeddin Muş'un Korkut (Til) ilçesinde doğdu ve 19. yüzyılda Osmanlının son döneminde yaşamıştır.

Şeyh Şahabeddin'in ailesi önce Kadiri tarikatına mensup idi, ardından Nakşibendi tarikatı'na geçmiştir. Babasının ölümünden sonra Şeyh Şahabeddin, kadılık görevinden ayrılıp Norşin'e giderek Şeyh Abdurrahman Tahi'nin müridi olmuştur. Şeyh Şahabeddin, Hazret'ten önce Norşin Medresesi'nde müderrislik yapmıştır.

Şeyh Şahabeddin, Şeyh Abdürrahman Tahi'nin yanında seyr ve sülüke başlamış, ancak Tahi'nin vefatından sonra Tahi'nin oğlu Hazret'e bağlanmıştır. Bu nedenle Şeyh Şahabeddin, Hazret'in ilk halifesi olmuştur.

* Lîsansa Bilind a Kurdî, Lêkolerê Serbixwe, / e-mail: m.zana47@gmail.com, ORCID: 0000-0003-1681-4917

Şeyh Şahabeddin, Nakşibendi halifeliğini elde ettikten sonra Korkut ve Muş çevresinde irşat vazifesini yerine getirmiştir. Tek halifesi olan Şeyh Şahabeddin 1326/1908 yılında vefat etmiş ve mezarı Muş Korkut'tadır.

Elimizdeki bilgilere göre Şeyh Şahabeddin'in herhangi bir eseri bulunmamaktadır veya adına herhangi bir eser yayımlanmamıştır. Bu çalışmamızda Şeyh Şehabeddin'in henüz günyüzüne çıkmamış bir şiiri üzerinde durulacaktır. Bununla onun edebi yönü tanınacak ve bu methiyesi edebiyattaki yerini alacaktır. Bu çalışmada söz konusu şiir şekil ve içerik yönünden ele alınıp, transkripsiyonlu metni yanında el yazmaları da sunulacaktır. Bu çalışma ile Nakşibendi-Halidilik çerçevesinde Tilî'nin tasavvufi yönüyle beraber edebi yönü de açıklığa kavuşturulacaktır.

**Anahtar Kelimeler:** Şeyh Şahabeddini Tilî, Nakşibendi, Norşin Tekyası, Hazret, Methiye

**Abstract**

Sheikh Shahabeddin Tîlî is one of the scholars, mystics and professors of his time. Sheikh Shahabeddin was born in town of Korkut (Til) of Muş and lived in the last period of the Ottoman Empire in the 19th century.

Sheikh Shahabeddin's family first belonged to the Qadiri sect, and then moved to the Naqshbandi sect. After the death of his father, Sheikh Shahabeddin left his duty as a judge and went to Norshin and became a disciple of Sheikh Abdurrahman Tahi. Sheikh Shahabeddin was a teacher at the Norshin Madrasa before the Hazret.

Sheikh Shahabeddin became a salik next to the Sheikh Abdurrahman Tahi, but after Tahi's death, he became a follower of Tahi's son, Hazret. For this reason, Sheikh Shahabeddin became the first caliphate of the Hazret.

Sheikh Shahabeddin started his work as a religious guidance around Korkut and Muş after being caliphate. Sheikh Shahabeddin who has only one caliphate, died in 1326/1908 and his grave is in Muş Korkut.

According to the information we have, Sheikh Shahabeddin has no work or any work has been published with his name. In this study, we will focus on an unpublished poem of his. With this work, his literary aspect will be recognized and this eulogy will take its place in literature. In this study, the poem in question will be evaluated in terms of form and content, and manuscripts will be presented together with its transcripted text. With this study, in the framework of Naqshbandi-Khalidism, Tili's literary aspect will be clarified along with his mystical aspect.

**Keywords:** Sheikh Shahabeddinê Tîlî, Naqshbandi, Dervish Lodge of Norshin, Hezret, eulogy

## Destpêk

Bi dîtina berhem û materyalên nû sehaya edebîyata Kurdî jî roj bi roj firehtir dibe û ev yek jî îmkana tesbît û xebatên nû pêşkêşî lêkoleran dike. Şêx Şehabeddînê Tîlî yek ji wan kesayetan e ku heta niha helbestnûsîya wî nehatiye zanîn û alîyê wî yê edebî nehatiye nirxandin. Di vê xebatê de ji bo aliyê Tîlî yê edebî bê zanîn dê helbesteke wî ligel analîza wê bê pêşkêşkirin.

Şêx Şehabeddîn di heyama dawî ya Osmanî de emrê xwe derbas kiriye û ev serdem jî rastî heyama Xalîdîtîya Neqşebendîyê tê. Piştî qonaxa mîrektîyên Kurd, Neqşebendîtîya Xalîdîtîyê jî rengê xwe yê cuda û tesewifî daye edebîyata Kurdî û bi xisûsî jî tesîr li edebîyata Kurdî ya klasîk kiriye. Em dikarin bibêjin Xalidîtîyê piştî mîrektîyên Kurd ligel alîyê xwe yê dînî û siyasî, di edebîyata Kurdî de bizaveke edebî jî ava kiriye û heyameke bihêz û cuda temsîl dike. Şêx Şehabeddîn jî yek ji şêx û endamên terîqeta Neqşebendîtîya Xalidîtîyê ye û mirîdê

Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî[1] (w.1924) ye ku ew jî li Norşînê miderisekî mezin û mirîdê Şêx Fethullahê Werqanisî (1899) bûye.

Li derdora Tekyaya Norşînê gelek alim û şair derketine û ev tekya ligel ilmên dînî-tesewifî, di pêşketina edebîyata Kurdî de jî roleke mezin pêk anîye. Di dergaha Norşînê de alim û edîbên weke Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî (w.1924), Şêx Fethullahê Werqanisî (1899) û gelek kesên mîna wan derketine. Ev kes di dergahên neqşebendîya Xalidîtîyê de hem mirîdî hem murşîdî hem jî edîbî kirine. Şêx Şehabeddîn jî ji ber ku mideris, mirîd û xelîfeyekî vê tekyayê ye ew jî weke mehsûlekî ango alimekî vê tekyayê tê hesibandin. Lewra ev helbesta wî jî mehsûleke Edebîyata Tekyayê ye.

Şêx Şehabeddînê Tîlî bi vê helbesta ku nû hatiye peydakirin dê bi minasebeta heyama ku tê de jîyaye û mensûbîyeta wî ya ekola Xalîdîtîyê ve ji bo edebîyata tekyayyê û edebîyata Kurdî ya klasîk jî bibe dane û nimûneyeke girîng. Çarçoveya vê xebatê dê tenê bi vê helbesta berdest a Tîlî sînordar be. Çunkî heta niha haya me ji bilî vê helbestê ji berhemên wî yên dinê çênebûne û hebin jî heta niha nehatine dîtin. Berîya nirxandina helbestê em ê li vir derbarê jîyana Şêx Şehabeddînê Tîlî de kurteagahîyekê bidin.

### 1. Şêx Şehabeddînê Tîlî û Helbesta Wî

#### 1.1. Kurtejîyana Şêx Şehabeddînê Tîlî

Derbarê Şêx Şehabeddînê Tîlî de agahîyên ku me bi dest xistine me ji nevîyê malbatê Mela Galîp Özkan[2] wergirtin. Herweha me agahîyên ku M. Şefik Korkusuz ku di pirtûka xwe ya çapkirî de dane jî bi Mela Galîb da piştrastkirin. Ji bilî van çavkanîyan derbarê Şêx Şehabeddîn de di destê me de zêde agahî tune ne.

Em dizanin ku Şêx Şehabeddînê Tîlî li Tîla (Korkut) navçeya Mûşê hatiye dunyayê. Li gorî malbatê, Şêx Şehabeddîn di 82-85 salîya xwe de wefat kiriye. Gava em vê agahîyê li ber çavan digirin derdikeve holê ku çêbûna wî jî li derdora sala 1825an e.[3] Leqebê wî "Efendîyê Tîlî" ye û ev leqeb ji aliyê ustadê wî ve lê hatiye dayîn. Şêx Şehabeddîn ji nesla Hz. Ebûbekîr bûye. Navê diya wî Humeyra, navê bavê wî jî Hecî Xelîl Efendî ye.

Şecereya malbata wî bi vî şeklî ye. Şehabeddîn kurê Hecî Xelîl e, Hecî Xelîl (ê biçûk) kurê Îbrahîm e, ew jî kurê Xelîl (ê mezin) e, ew jî kurê Huseyîn e, ew jî kurê Îbrahîm Hafiz e, ew jî kurê Suleyman e, ew jî kurê Şêx Hesenê Banûkî ye, ew jî kurê Suleyman e, ew jî kurê Şêx Ebdullahzadeyê Mekkî ye. Niha di malbatê de paşnavên weke Özkan, Akpolat û Alataş tên bikaranîn (Karak, 2022).

Gava Tîl gundekî Mûşê bû tê de medreseyeke fermî jî hebûye û ev medrese di destê bavê Şêx Şehabeddîn, Mela Xelîl[4] de bûye. Şêx Ebdurrehmanê Taxî (w. 1886) û kurê xwe Şêx Muhemmed Ziyaeddîn (Hezret) jî demekê di vê medreseyê de li ba vî zatî ders xwendine (Korkusuz, 2010: 261).

---

[1] Ji bo agahîyên derbarê Şêx Mihemed Ziyaeddînê Norşînî bnr. ; (Karak, 2022; 185-204).

[2] Galip Özkan (ç. 1956) kurê Mela M. Zekî ye, ew jî kurê Cuneyd e, ew jî kurê Şêx Şehabeddînê Tîlî ye.

[3] Ji hevpeyvîna bi Mela Galîb Özkan (ç. 1956), (12.11.2022, 18.11.2022).

[4] Mela Xelîl jî di terîqeta Qadirîyê de pêgirîyê Şêx Mistefayê Tîlîyê kurê Huseyîn bûye ku ev şexs jî dîsa endamê heman malbatê ye (Karak, 2022).

Malbata Şêx Şehabbeddîn jî pêşî pêgirîyê terîqeta Qadîrî bûye û paşê bi malbatî derbasî terîqeta Neqşebendîyê bûne. Berîya Qadirîyê jî kalê wan Şêx Hesenê Banûkî (1444-1535) jî li Tîlê şêxê Xelwetîyê bûye. Şêx Şehabbeddîn li deverên weke Motkî, Warto û Melezgirtê qadîtî kiriye. Piştî wefata bavê xwe bi daxwaza Şêx Ebdurrehmanê Taxî dev ji wezîfeya qadîtîya fermî berdaye û çûye Norşînê bûye pêgirîyê Şêx Ebdurrehmanê Taxî (Karak, 2022).

Li gorî rîwayetan Şêx Şehabeddîn li ser daxwaza Seydayê Taxî ku wesîyet kiribû piştî wefata wî heta kurê wî Şêx Mihemed Ziyaeddînê Norşînî seyr û silûka xwe li ba Şêx Fethullahê Werqanisî biqedîne Şêx Şehabeddîn li medreseya Norşînê miderisîyê bike. Şehabeddîn jî ev emrê ustadê xwe bi cî anîye û muderîsîya medreseya Norşînê kiriye (Korkusuz, 2010: 260).

Gava Seydayê Taxî wefat dike Şêx Şehabeddîn ji ber ku seyr û silûka xwe hêj temam nekiribû xelîfetî wernegirtiye. Li ser vê yekê gava Hezret xilafetê bi dest dixe û li tekyaya Norşînê rûdinê, Şêx Şehabeddîn jî întîsabî kurê ustadê xwe Hezret dike. Hezret ji bo dayîna xilafetê ya ji bo Şêx Şehabeddîn bi Şêx Fethullah re dişêwire û Şêx Fethullah jî bersiveke erênî dide Hezret (Oxînî, 2017: 149). Bi vî awayî Şêx Şehabeddîn dibe xelîfeyê ewil ê Hezret.

Em dizanin ku Şêx Şehabeddîn zimanê Osmanî baş zanibûye, lewra li Norşînê di navbera Hezret û waliyê Bedlîsê de tercumanî jî kiriye. Piştî xilafetê Şêx Şehabeddîn vedigere gundê xwe Tîlê, li alîyekî dest bi tedrîsê kiriye û li alîyekî jî irşad kiriye (Korkusuz, 2010: 261-62). Dergaha Tîlê ya Neqşebendîyê jî ji aliyê Şêx Şehabeddîn ve hatiye avakirin (Kavak, 2017: 389). Bi vî awayî dergaha Tîlê bi Şêx Şehabeddîn derbasî Neqşebendîyê bûye.

Şêx Şehabeddîn hêj di saxiya Hezret de dest bi irşadê kiriye û demeke dirêj li gundê Zorava (Yedi pınar) yê bi ser Tîlê ve maye. Em ji nameyên ku Hezret ji Şêx Şehabeddîn re nivîsînê fahm dikin ku heskirina her duyan ji hev re hebûye û ji hev re name şandine (Ziyâeddîn, 1977).

Şêx Şehabeddîn di Sibata 1326ê hicrî (m. 1908) de wefat kiriye û li navenda Tîlê medfûn e. Şêx Şehabeddîn li pey xwe xelîfeyek hiştiye, ew jî Şêx Fethullahê kurê birê wî Mihemed Emîn e.

Şêx Şehabeddîn sê caran zewicîye navê jina wî ya ewil nayê zanîn, lê xanima wî ya duyem Gewher e û ya Sêyem jî Amîne (w. 1952) ye Amîne û jina Hezret xwehên hev in û herweha Şêx Şehabeddîn û Hezret jî hevlingên hev in (Korkusuz, 2010: 262).

Ji her du jinên Şêx Şehabeddîn 4 kur çêbûne. Ji Gewher Xanimê Mela Ubeydullah[5] (1850-1345/1925) û Mela Ebdurrezzaq[6] (1853-1925) û ji Amîneyê jî Mela Nîzameddîn[7] (1855-1964) û Cuneyd Axa (1891-1937) çêbûne (Karak, 2022; Korkusuz, 2010: 263).

[5] Şêx Mela Ubeydullah li Tîlê hatiye dunyayê û perwerdeya ewil di medreseya bavê xwe de ji bavê xwe wergirtiye. Mela Ubeydullah îcaze jî ji bavê xwe wergirtiye û herweha piştî îcazeyê jî di saxîya bavê xwe de mîna bavê xwe întîsabî Hezret kiriye û li ba Hezret dest bi seyr û silûkê kiriye. di 1345ê hicrî (m. 1925/6) de wefat dike (Korkusuz, 2010: 264).

[6] Li gorî agahiyên malbatê daye me ev şexs di Alayên Hemîdîyeyê de fermandarê hezar leşkerî bûye (Karak, 2022).

[7] Ev şexs jî dîsa di Alayên Hemîdîyeyê de weke serpel fermandarîya leşkeran kiriye (Karak, 2022).

Ji bo ku Ebdurrezaqê kurê Şêx Şehabeddîn di Şerê Cîhanê yê Yekem de li Tîla Mûşê serkeftin bi dest xistiye ji alîyê Sûltan Reşad Paşa (w. 1918) yê Osmanî ve di 16ê Remezana 1333yan (m. 28.07.1915) de madalyayeke zîv û berata wê hatiye dayîn (Pêvek: 3).

### 1.2. Berhemên Şêx Şehabeddînê Tîlî

Bi qasî agahîyên di destên me de ji bilî vê helbesta wî ku em ê behs bikin ti berhemên wî yên din tune ye an jî hêj derneketine holê. Di encama xebatan de helbestek ket destê me ku ev helbest li ser navê Şêx Şehabeddînê Tîlî hatiye tomarkirin. Ev helbesta şair di “mecmûeyeke helbestên muxtelîf”[8] de mewcûd e. Li gorî agahî û çavkanîyên li ber destê me ji bilî vê helbesta wî ti helbestên wî yên din neketine lîteraturê.

Di vê xebata ber dest de dê li ser vê helbesta Tîlî bê sekinîn û dê helbest ji alîyê ruxsarî û naverokî ve bê nirxandin û herweha dê tevî du destxetên wê metna transkirîbekirî ya helbestê jî bê dayîn.

## 2. Vekolîna Helbestê

Şêx Şehabeddînê Tîlî ev helbesta xwe bi teşeya çarîneyê ango weke murebbe‘ê û bi cûreya medhîyeyê hûnandiye. Divê em pêşî li vir bi kurtasî danasîna terma çarîneyê bidin.

Di vê teşeya nezmê de ku têgeheke edebîyatê ye û jê re “çarîne” (murebbe῾) tê gotin, di her bendeke wê de çar risteyên hemkêş hene (Saraç, 2013:111). Bi îfadeyeke din menzûmeyên ku yekeya wan bend e û hemû bendên wan ji çar risteyan pêk tên û ji alîyê şairekî ve bi heman kêşê û bi awayekî pirserwa hatibin nivîsîn, ew menzûme weke “murebbe‘” (çarîne) tê binavkirin. Di edebîyata klasîk a Rojhilatî de bi awayekî giştî serwaya murebbe‘ê bi du şêweyan çê dibe: Şêweya 1.: “aaab, cccb, dddb…” e şêweya 2. jî: “aaaa, bbba, ccca…” ye. Ger çarîne tenê bi serwayên risteyên dawî bi hev ve hatibin girêdan, jê re “murebbe‘a muzdewic” û ger digel hevbeşîya serwayê bi tekrara risteyên dawî bi hev ve hatibin girêdan ji vê re jî “murebbe‘a mutekkerir” tê gotin (Adak, 2019: 371).

Di edebîyata Kurdî ya klasîk de hem ji alîyê şairên heyama mîrektîyan hem jî ji alîyê şairên heyama Xalîdîtîyê çarîne, medhîye û mersîye hatine nivîsîn. Di tekyayên Neqşebendîya Xalidîyê de jî alim û şairên weke Şêx Ebdilqadirê Hezanî (w. 1908), Seydayê M. Hadîyê Licî (w. 1912), Şêx M. Ziyaeddînê Norşînî, Şêx M. Selîmê Hezanî (w.1936), Şêx Fethullahê Hezroyî (w. 1975), Şêx Mela Îsmetullahê Karazî (w. 1996), Seydayê Ehmedê Xasî (w. 1951) û bi dehan şairên din medhîye an mersîye (şînname) nivîsîne.

Helbestên ku mijara wan pesn û sîtayîş e di edebiyata klasîk a Îslamî de wek “medhîye” tên binavkirin. Bi piranî di medhîyeyan de pesnê mirovên xwedîerk û payebilind tên dayîn. Ev şexs jî zêdetir ji desthilatdarên siyasî (emîr, sultan, şah, û endamên malbatên wan ên wek xwuşk, bira, dê û zarokên wan), burokratên dewletê (qadî, wezîr, serleşker û hwd.) şexsîyetên muhîm ên civakê (pehlewan, dewlemend û hwd.) û şexsîyet û fîgurên dînî (Xweda, Pêxember, ehlê beyta Pêxember, sehabe, şêx, mela û hwd.) pêk tên (Adak, 2019: 135).

[8] Li gorî agahiyên ber dest ev mecmû‘e ji alîyê Mela Ehmedê Cewzî (w. 2010) ve hatiye îstinsaxkirin û mecmû‘e weke ya Mela Seîd Ergin jî tê zanîn. Xebatên me yên li ser mecmûeyê didomin.

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de ji bo mîrên mirektîyan helbestên bi cûreya medhîyeyê hatine nivîsin. Piştî bi dawîbûna van mîrektîyan ew valahî bi terîqetan hatine tijekirin û vê carê bi dehan medhîye û mersîye ji bo şêx û postnişînên dergahên terîqetan hatine nivîsîn. Gava em bala xwe didin vê helbesta Şêx Şehabeddîn ev yek bi zelalî li ba wî jî tê dîtîn. Lewra Şêx Şehabeddîn jî şêxekî tekyayê û pêgirê terîqeta Neqşebendîtîyê bûye û ev tişt xwe di helbesta wî de jî dide der. Şêx Şehabeddîn jî helbesta xwe bi cûreya medhîye nivîsîye û helbest li ser pesnê Şêx Mihemed Zîyaeddîn e.

Em ê vê helbesta Şêx Şehabeddîn hem ji alîyê şeklî (ruxsarî) ve hem jî ji alîyê mûhtevayê (naverokî) ve binirxînin û tesbîtên xwe yên berbiçav pêşkêş bikin.

### 2.1. Ji Alîyê Ruxsarî ve

Em ê di vê beşê de li ser teşe, kêş, serwabendî û mexlesê rawestin û bi vî awayî em ê ji alîyê ruxsarî ve lêkolîna xwe pêk bînin.

#### 2.1.1. Teşe, Kêş û Serwabendîya Helbestê

Şêx Şehabeddînê Tîlî ev helbesta xwe bi teşeya murebbe‘ê (çarîne) nivîsîye û helbest ji 11 çarîneyan pêk tê. Dibe ku tevahîya helbestê ji 11 çarîneyan zêdetir be, lewra em rastî mexlesekê nehatin û mexles bi piranî di dawîya helbestan de têne bicîkirin. Bendên helbestê bi 8 kiteyan hatiye sazkirin û kêşa vê jî ji behra recezê mustef‘ilun / mustef‘ilun e.

1. Bedra temam bû aşikar
   Mecrûḥ kirim necmê Żiya
   Zuhra li şerqê bû diyar
   Xweş bû li min ismê Żiya

Şêweya vê çarîneyê di nav şêweyên standart de şêweya “Murebbe‘a Muzdewica Digel Benda Yekem a Mutenawib” e. Di vê şêweyê de serwaya benda yekem çepûrast (mutenawib) e, ango di benda yekem de risteyên yekem û sêyem di nav xwe de risteyên duyem û çarem jî di nav xwe de hemserwa ne. Di bendên piştî vê benda ewil de jî her sê risteyên pêşî di nav xwe de hemserwa ne û risteyên çarem jî bi risteya dawîn a benda yekem re hemserwa ne. Şemaya vê şêweya murebbe‘ê abab, cccb, dddb ... ye (Adak, 2019: 377).

Em dibînin ku şair di vê helbestê de serwaya bingehîn bi kar neanîye, lê paşserwa di hemû bendên helbestê de heye û ew jî ji bêjeya “Ziya” hatiye sazkirin. Di sê risteyên serî yên bendên helbestê de serwa jî heye. Di her bendekê de cûreya serwayê cuda ye. Tê dîtin ku di vê helbestê de bend bi paşserwayê ve bi hev ve hatine girêdan.

### 2.2. Ji Alîyê Naverokê ve

Em ê di vê beşê de jî helbestê ji alîyê ziman, uslûb, tema, ciwankarî (hunerên edebî) û ji alîyê kevneşopî û mûhîmîyeta wê ya di edebîyata Kurdî de veçirînin.

#### 2.2.1. Mijar û Cûreya Helbestê

Ji naveroka helbestê tê fahmkirin ku cûreya vê çarîneyê medhîye ye. Me li jor jî dabû zanîn ku ew helbestên ji bo pesn û medhê kesekî têne nivîsîn ji wan re medhîye tê gotin. Ev helbesta Şêx Şehabeddîn jî bi vê mebestê bi cûreya medhîyeyê û bi teşeya çarîneyê hatiye nivîsîn.

Divê li vê derê em ji bo vê cûreya çarîneyê jî şerhekê deynin. Divê bê zanîn ku li derdora tekya ango dergahan li gorî xisûsîyetên van navendan bi teşeyên cuda li ser şêx, murşîd û postnişînan di mijarên medh û şînê de gelek helbest hatine nivîsîn. Gava ev helbestên bi teşeya çarîneyê li dora tekyayan bi fikr û hizra tesewifê li ser hesret, eşq û veqetîna ji şêx û murşîdan hatibin nivîsîn, em van helbestan dikarin weke "çarîneya tekyayê" ango murebbe'a tekyayê jî bi nav bikin.

Di vê helbesta Şêx Şehabeddîn de mezmûnên tesewifî jî hene. Çunkî ev helbesta wî jî mehsûleke edebîyata tekyayê ye.

10. Ez̠kar û luṭfa şariq e
Husn û cemala lamiʿ e
Şemsa semaʾê rabiʿ e
Xweş cewher î z̠atê Żiya

Ev medh ji bo şêxê terîqetê hatiye kirin û di çarçoveya ekola Neqşebendîya Xalidîyê de dikare bê nirxandin. Şêx Şehabeddînê Tîlî jî di vê helbesta bi cûreya medhîyeyê de pesn û medhê şêxê xwe Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî daye û bi aşkereyî navê wî bi kar anîye.

2. Xweş bû li min navê şerîf
Durdaneya qamet-elîf
Leb-x̂onceya ṭebʿet-z̠erîf
Ya Reb nemînim bê Żiya

4. Cismê ku fexrê me bi an
Ya Reb nekî dûr her zeman
Efzûn koned abê rewan
Ber x̂onceʾê bax̂ê Żiya

5. X̂once li bax̂an zeyînîn
Reyhan û sinbil kemilîn
Ey bilbilê gulzar-nişîn
Her dem bibê medḥê Żiya

Ev medh û pesnê li vir jî di çarçoveya têkilîya mirîd û murşîdîyê de ye. Mirîd murşîdê xwe mîna dilberek, me'şûqek û evîndarekê dibîne, lê ev eşq û hezkirin divê di çarçoveya tesewifê de bê nirxandin û ev ne weke wê eşq û evîna di navbera xort û keçekê de be.

### 2.2.2. Ziman û Uslûba Helbestkar

Gava li helbesta şair bê nihêrin tê dîtin ku zimanê wî ne girîft e, sade û zelal e. Feqet di helbestê de bêje û terkîbên biyanî jî xuya dibin. Em dibînin ku şair hay ji Erebî û Farisî jî heye û bandora zimanê Erebî û Farisî hindik be jî di vê helbesta şair de tê dîtin.

Di hin qismên helbestê de bêje û terkîbên Erebî û Farisî bi vî şeklî ne: "Efzûn koned abê rewan", "quṭbu'l-ʿarifîn" û hwd.

Uslûba helbestkar di vê helbestê de herikbar e û unsûrên ahengê jî tê de mûsîqîyeke xweş ava kiriye. Lewra qelema şair xurt dixuye û risteyên wî jî edebî û têr û tîje ne. Herweha di qada ciwankarîyê de jî helbesteke ne lawaz e û gelek cûreyên hunerên edebî hatine bikaranîn.

9. Şemʿ û şemala dewletê
Wesfê kemala qudretê
Bêtin meqamê ẋayetê
Ez̠kar û ezmanê Żiya

### 2.2.3. Ciwankarîya di Helbestê de

Şair bi uslûba xwe ya herikbar û bi hunerên edebî yên weke îstîʻare, teşbîh, telmîh, nîda, tenasub, telmîʻ, alîterasyon û hwd. ve helbest neqişandiye, xemilandiye û pirmane kiriye. Di vê helbestê de ji hunerên edebî gelek cûre hatine bikaranîn, em ê li vir ji vê ciwankariyê çend nimûneyan dest nîşan bikin.

5. Ẋonce li baẋan zeyînîn
Reyhan û sinbil kemilîn
Ey bilbilê gulzar-nişîn
Her dem bibê medḥê Żiya

Di vê bendê de ji bo çîroka "Gul û Bilbil"ê atif heye û hunera telmîhê pêk hatiye. Dîsa di vê bendê de bi bêjeyên "reyhan, sinbil, bilbil û gulzar"ê jî hunera tenasubê pêk hatiye.

9. Şemʿ û şemala dewletê
Wesfê kemala qudretê
Bêtin meqamê ẋayetê
Ez̠kar û ezmanê Żiya

Di vê benda 9em de jî bi tekrara herfên "m" û "t"yê alîterasyon û dîsa bi tekrara herfên "a" û "e"yê jî asonans derketiye holê.

1. Bedra temam bû aşikar
Mecrûḥ kirim necmê Ziya
Zuhra li şerqê bû diyar
Xweş bû li min ismê Żiya

Di benda yekem de jî şibandina bi bedr (heyva tam) û zuhreyê (stêrka şivanan)[9] heye, lêbelê kesê hatiye şibandî nehatiye aşkerekirin û bi vî awayî îstîareya vekirî pêk hatiye.

4. Cismê ku fexrê me bi an
Ya Reb nekî dûr her zeman
Efzûn koned abê rewan
Ber **ẋonce**ʾê baẋê Żiya

5. **Ẋonce** li baẋan zeyînîn
Reyhan û sinbil kemilîn
Ey bilbilê gulzar-nişîn
Her dem bibê medḥê Żiya

[9] Ev stêrk weke venus, stêrka qurixê, stêrka gelawêj û stêrka şivanan jî tê naskirin.

Di navbera van bendan de jî hunera îadeyê çêbûye. Çunkî bêje û îfadeyên ku bendek pê qediyaye, dîsa ew bêje an jî îfade di serê benda piştî wê de jî cihê xwe girtine û bi vî şeklî heman îfade hatine dubarekirin.

11. Xweş cewher î ẕatê munîr

Rûḥ û rewanê ez esîr

Bû bende’ê quṭbê şehîr

Derya bibî qelbê Żiya

Bêjeyên “rûh” û “rewan” di heman bend û maneyê de ne û hunera teradufê derketiye holê.

**2.2.4. Kevneşopîya Helbestê**

Helbesta Şêx Şehabeddînê Tîlî bi teşeya çarîneyê ye û bi kevneşopîya têkilîya di navbera mirîd-murşîdîyê de hatiye nivîsîn. Di qonaxa ekola Neqşebendîya Xalidîyê de têkilîyeke bi hêz di navbera mirîd û murşîdan de tê dîtin. Pîr ango murşîdê terîqetê ji mirîdê xwe re weke meşûq û dildarekê ye. Ev yek di vê helbesta helbestkar de jî bi zelalî tê dîtin. Piranîya şairên ku li derdora dergahan mezin bûne bi vî rengî çarîne û qesîdeyên şîn û medhê nivîsîne. Ev helbest jî nimûneyeke vê kevneşopîyê ye ku li derdora tekyaya Norşînê hatiye nivîsîn û em vê helbestê jî di kategorîya helbesta terîqî-tesewifî de dinirxînin.

**2.2.5. Girîngîya Helbestê**

Ev helbesta medhîye ya Şêx Şehabeddînê Tîlî heta niha di nav lîteratura Kurdî de cî negirtibû û nebûbû mijara lêkolînekê. Bi saya vê helbestê alîyê wî yê terîqetê yê di nav ekola Neqşebendîya Xalidîyê de jî zelaltir tê dîtin. Herweha bi vê yekê derketiye holê ku wî jî bi heman kevneşopîyê ve ji bo şêxê xwe medhîye nivîsîye û bi vê helbestê şairtîya wî jî kifş bûye.

Şêx Şehabeddîn jî weke gelek alim û şairên serdemê tevgerîyaye û wî jî ev helbesta tesewifî-terîqî di çarçoveya kevneşopîya ekola Neqşebendîya Xalidîyê de nivîsîye. Herweha ev helbest jî delîlê vê yekê ye. Helbest ji alîyê edebî û zimanê xwe jî helbesteke herikbar û serkeftî ye. Di helbestê de hem unsûrên edebîyata klasîk berbiçav in hem jî xisûsîyetên çanda kevneşopîya tekyayê têne dîtin.

**3. Metna Veguheztî ya Helbestê**

Me vê helbesta Şêx Şehabeddînê Tîlî ji du nusxeyên destxet weke metneke rexneyî bi elîfbêya transkirîbsîyona navneteweyî amade kir. Me ligel elîfbêya veguheztî hin îzah, tesbît û ferqên nusxeyan jî di jêrnîşeyan de destnîşan kirin.

Şêx Şehabeddînê Tîlî ‘alî Ḥeżret (quddîsesirruh)

Mustefʿilun / Mustefʿilun

(- - + - / - - + - )

1. Bedra temam bû aşikar

Mecrûḥ kirim necmê Żiya

Zuhra li şerqê bû diyar[10]
Xweş bû li min ismê Żiya

2. Xweş bû li min navê[11] şerîf
Durdaneya qamet-elîf
Leb-ẋonceya ṭebʿet-ẓerîf
Ya Reb nemînim bê Żiya

3. Ya Reb bi iḥsana xwe kî
ʿAmê ji kamê dûr nekî
ʿUmrê ʻezîz lê zêde kî[12]
Meḥfûẓ bikî[13] cismê Żiya

4. Cismê ku fexrê me bi an[14]
Ya Reb nekî dûr her zeman
Efzûn koned abê rewan
Ber ẋonceʾê baẋê Żiya

5. Ẋonce li baẋan zeyînîn[15]
Reyhan û sinbil kemilîn
Ey bilbilê gulzar-nişîn
Her dem bibê[16] medḥê Żiya

6. Medḥê ciwana leb-şeker
Istebreq û sundus di ber
Mecrûḥ dikir qelb û ciger
Yek awirê çeşmê Żiya[17]

---

[10] Nusxeya Cewzî: Ziya
[11] Cewzî: ismê
[12] Cewzî: ʻUmrê ʻezîz dirêj bikî.
[13] Kinikarî: Meḥfûẓ bibî.
[14] Cewzî: Cismê ku fexra me bi an.
[15] Kinikarî: zeyînî
[16] Cewzî: Her dem bidim.
[17] Cewzî: Yek awur û ẋemzê Ziya.

7. Yek awurê çehvê siyah
Dêm xawerê manendê mah
Tîne ji min efẍan û ah
Ji an leʿlê şîrîn Żiya

8. Ji wan leʿl û lêvê şirîn
Inʿam ji padşahê zemîn
Himmet ji quṭbu’l-ʿarifîn
Şuʿle didet[18] şemʿa Żiya

9. Şemʿ û şemala dewletê
Wesfê kemala qudretê[19]
Bêtin meqamê ẋayetê[20]
Ez̠kar[21] û ezmanê Żiya

10. Ez̠kar û luṭfa şariq e[22]
Husn û cemala lamiʿ e
Şemsa semaʾê rabiʿ e
Xweş cewher î z̠atê Żiya

11. Xweş cewher î z̠atê munîr
Rûḥ û rewanê ez esîr
Bû bende’ê quṭbê şehîr
Derya bibî qelbê Żiya

[18] Cewzî: Şu‘le dida.
[19] Kinikarî: Wesf û kemala qudretê.
[20] Cewzî: Bêtin Meqam û ẋayetê.
[21] Kinikarî: Erkan.
[22] Kinikarî: Erkanu’l-tibqa şariʿ e.

## ENCAM

Şêx Şehabeddînê Tîlî mideris û alimekî ku di dawîya Dewleta Osmanî de jîyaye. Wî jî di çarçoveya têkiliya di navbera mirîd û murşîdîyê de helbest li ser postnişînê terîqetê nivîsîye. Heta niha em li ti derê rastî ti berhem an jî helbesteke Şêx Şehabeddîn nehatibûn. Ji bilî vê medhîyeya wî ya ku li ser Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî (Hezret) ye, ti helbestên din jî bi destên me neketine. Şêx Şehabeddînê Tîlî di vê helbesta xwe de pesn û methê şêxê xwe Hezret kiriye.

Bi vê helbestê Şêx Şehabeddîn jî mîna gelek helbestkaran di nav lîteratura Kurdî de cihê xwe girt ku wî jî bi vê şêweya klasîk helbesta terîqî nivîsîye.

Helbesta wî li ser 11 bendan e û bi teşeya çarîneyê ango murebbeʻê hatiye nivîsîn û cûreya wê jî medhîye ye ku em dikarin wê weke murebbeʻa tekyayê jî bi nav bikin. Çunkî di vê helbestê de unsûrên xisûsîyetên Edebîyata Tekyayê berbiçav in.

Dema em helbestên li derdora tekyayan hatine nivîsîn li ber çavan digirin; tê dîtin ku şeklê wan her çiqas ji hev cuda bin jî mijarên wan pir zêde dişibin hev û em dikarin bibêjin piranîya wan helbestan jî tekrarên hev in. Belkî di van helbestan de tenê tiştên cuda û diguherin navên mirîd û murşîdan e.

Di çarîneyên Kurdî yên qonaxa Edebîyata Tekyayê de bi piranî zimanekî sivik hatiye bikaranîn. Ji van nimûneyan jî tê fahmkirin ku di qonaxa Xalidîyê de çarîne wek teşeyeke nezmê derketiye pêş. Di çarîneyên vê qonaxê de bi piranî li ser mijarên ku bi tekyayê ve girêdayî hatiye rawestîn. Bi vî awayî li derdora terîqetên Qadirî û Neqşebendîyê jî Edebîyata Tekyayê bi helbestên mirîd û murşîdan roj bi roj geştir bûye.

## ÇAVKANÎ


Adak, A. (2019). Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Berata Lîyaqat û Madalyaya Zîv a Mûharebeyê (Di arşîva malbata Şêx Şehabeddîn de parastiye).

Cewzî, M. E. (?). Nusxeya Helbesta Şêx Şehabeddînê Tîlî, Fotokopîya Destxeta Mecmûʻeya Cewzî, r. 237.

Karak, M. Z. (2022). Hevpeyvîna bi Mela Galip Özkan re (12.11.2022 û 18.11.2022).

Karak, M. Z. (2022). Şairtîya Şêx Zîyaeddînê Norşînî (Hezret) . The Journal of Mesopotamian Studies, 7 (2) , 185-204.

Kavak, A. (2017). Mevlânâ Hâlid-i Nakşibendî ve Hâlidîlk, İstanbul: Nizamiye Akademi Yayınları.

Kinikarî, Ş. E. (?). Nusxeya Helbesta Şêx Şehabeddînê Tîlî, Fotokopîya Destxeta Mecmûʻeya Kinikarî.


Korkusuz, M. Ş. (2010). Nehri'den Hazne'ye Meşayihi Nakşibendi, İstanbul: Pak Ajans.

Oxînî, Ş. M. A. (2017). Birket'l-Kelimat Menkıbeler Havuzu, (Çev.: Kadri Yıldırım), İstanbul: Avesta Yayınları.


Saraç, Y. (2013). Klâsik Edebiyat Bilgisi; Biçim-Ölçü-Kafiye, İstanbul: Gökkubbe Yayınları.
Ziyâeddîn, Ş. M. (1977). Mektûbat, (Trc. Hasib Seven), İstanbul: Yaylacık Matbaası.

**PÊVEK**

**Pêvek 1:** Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî.



**Pêvek 2:** Nusxeya Şêx Ebdulkerîmê Kinikarî.



**Pêvek 3:** Berata Lîyaqat û Madalyaya Zîv a Mûharebeyê.[23]



[23] Ev berat ji alîyê Mehmed Reşadê kurê Ebdulmecîd Han ve ji bo Mela Ebdurrezaqê kurê Şêx Şehabeddînê Tîlî ve hatiye dayîn. Belge di arşîva malbata Tîlî de parastîye.

Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

# SÊ KLASÎKÊN ME YÊN NENAS: MELA HESEN Û QASIM Û MELA ŞEMS

OUR THREE UNKNOWN CLASSICS: MOLA HASAN, QASEM, MOLA SHAMS

Tehsîn Îbrahîm DOSKÎ*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 17.11.2022
**Accepted // Pejirandin:** 26.11. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 161- 174

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Doski, Tahsin İbrahim (2022). Sê Klasîkên Me Yên Nenas: Mela Hesen Û Qasim Û Mela Şems, K*urdiname*, no. 7, p. 161-174

**Kurte**

Ev xebat, li dor sê klasîkên me yên nenas dizivrit û armanc jê ew e ku xwendevan bi van her sê şa'iran agehdar bit. Ew jî ev in: Mela Hesen û Qasim û Mela Şems. Dîroka wan her sêyan bo berî nîva yekê ji sedsala hijdeh dizivire. Ji ber ku şi'rên wan di destnivîsekê da hatîne dîtin di nav kitêbxaneya Mela Xelîlê Sêrtî da hebûye û aşkera ye ku Mela Xelîl li nîva du yê ji sedsala hijdeh û nîva yekê ji sedsala nozdeh jiyaye. Heta evro jî çu zanînên berfireh derbareya jiyan û serhatîya van her sê şa'rên me yên klasîk di destê me da nîn in. Em nizanin ew ji kîj deverê ne û bi durustî li çi dem jiyane. Belê şi'rên wan bi kirmancîyeka zelal in û mijarên wan xweş û aşkera ne û zimanê wan yê şi'rî, bi hêz e. Li ber çavan e ku ew hindek şa'irên jêhatî bûne.

**Kilîtbêje:** Kurdî, Klasîk, Molla Hesen, Molla Qasim, Molla Şems

**Abstract**

This study mediates among three of our unknown classic poets, and its purpose is to inform the readers about these three poets who are Hassan, Qasim and Shams Mullahs. The history of all three dates back to the first half of the eighteenth century. Since their poems were available in a manuscript derived from library of Mela Khalil Serti, it is clear that Mela Khalil lived in the second half of the eighteenth century and the first half of the nineteenth century. Even now, we do not hold extensive knowledge about the life and achievements of these three classical poets; hence, it is not clearly known where they are from and when exactly they lived. However, their poems are clear, their themes are flamboyant and obvious, and their poetic language is significant. In sum, It is obvious that they were some talented poets.

**Keywords:** Kurdish, Classic, Mola Hasan, Mola Qasem, Mola Shams.

## Destpêk

Di dîroka edebîyata Kurdî da hêşta gelek nav û berhem mayne em pê agehdar nebuwîne, ji ber ku ew di nav berperên destnivîsên kevn da mayne veşartî, û hêşta wan ronahî nedîtîye, û di kitêba xo da ya bi navê (Baxê Îrem) hatîye çapkirin, me behsê komeka klasîkên Kirmanc kirîye, ji wan yên li serdemê Osmanîyan jiyane û hindek ji berhemê wan gihiştîye me û aşkera ye ku ji bilî wan klasîkên me navên wan di kitêba xwe ya jêgotî da înayn, gelek edîb û şa'irên dî jî hene hêşta em bi jîn û berhemê wan agehdar nebuwîn û li vêrê dubare dê bêjim: Karekê fer û giring li ser vekolerên me evro heye ew jî gerîyana li dûv niviştok û destnivîs û perkên kevn e yên li kitêbxaneyên cuda cuda heyn, bo hindê da ew bi ser wan dur û mirarîyan helbibin yên zana û edîbên me li paş xo hêlayn. Guman tê da nîn e evî karî

* Lêkolîner, tahsin.doski92@gmail.com, Kurdistan-Iraq.

westîyan û zehmeteka zêde pê divêt, ji ber ku destnivîs û berhemê zana û edîbên me di kitêbxaneyên giştî û yên taybet da dibelavin û hemî li cihekî yan çend cihan nehatîne komkirin.

Di gotara xwe ya vê carê da ez dixwazim navê sê klasîkên dî yên Kirmanc li ser wê lîsteyê zêde bikem ya ku me di (Baxê Îrem) da çêkirî, ev her sê şa'ire jî li serdemê Osmanîyan jiyabûn û dîroka wan her çu nebit bo berî pitir ji dused salan vedgerîyêt û mixabin çu zanîn di der heqa wan da di dest me da nînin.

**Jêdera Me bo Wergirtina Şi'ra Mela Hesen û Qasim**

Di seredana xo da bo bajarê Sêrtê li meha Tebaxa sala 2021 demê em bûyîne mêvan li mala hevalê xo mamosta D. Macid Sevgîlî me destnivîseka hêja di kitêbxaneya wî da dît ku ji paşmayên kitêbxaneya bapîrê mezinê malbata wan zana û şa'irê navdar Mela Xelîlê Sêrtî bû. Dîroka nivîsîna vê destxetê çend salekên kêm ji dîroka bûna Mela Xelîl kevintir e, ji ber ku ew wekî ji çend cihekan aşkera dibit di navbera salên 1161 heta 1163 mişextî (beranber 1748-1750 z.) hatibû nivîsîn û aşkera ye ku bûna Mela Xelîl li sala 1164 yan 1167 mişextî bû.

Çar kitêb di vê destxetê da hene û her çar bi 'Erebî ne, ew jî eve ne:

1- Şerha Qesîdeya Burdeyê ya Îmamê Biweysîrî, li dûmahîyê hatîye nivîsîn ku ew li sala 1161 bi destê Yasînê kurê Mihemedî hatîye nivîsîn û li perê di dûv da şi'reka Kirmancî ya Mela Hesen di gel hindekê ji şi'ra Ehmedê Xanî ya bi çar zimanan heye.

2- Şerha Qesîdeya Emalîyê ya Xelîlê kurê 'Elaê Buxarî, li dûmahîyê hatîye ku ew li sala 1163 li Mizgefta Şêxan li Hîzanê hatîye nivîsîn û li perê piştî wê du haşîye bi xetê Mela Xelîlê Sêrtî hene li dûmahîya ya yekê hatîye: Xelîlê kurê Huseynî ew li Miksê nivîsîye (ah- ji derdê mirinê û haletên wê û ah- ji derdê 'işqê), li dûmahîya haşîya duwê hatîye: Xelîlî ew li Westanê nivîsîye û ji vê diête zanîn ku Mela Xelîl (belkî bo feqiyatîyê) demekî çûbû Miksê û demekî çûbite Westanê jî.

3- Kitêba (Simre alfoad lima fîh min lize qilub al'ibad alraiqe 'en alxil wal'inad) û ew şerheka 'Erebîye li ser hindek gotinên Îmam 'Elî -Xudê jê razî bit- û li dehmena berperan gotinên îmamî bi şi'r û bi zimanê Farsî yên hatîne wergêran û li dûmahîyê hatîye nivîsîn: Ev kitêbe bi destê Yasînê kurê Mihemedî li Hîzanê li Medresa Dawûdîyê hatîye nivîsîn li sala 1163 û haşîyek li ser vî perî heye tê da hatîye: Mela Feyzullahê Xoşebî bo Mewlana Mela Yasînê Miksî nivîsîye. Ji vê diête wergirtin ku nivîserê vê desxetê Mela Yasînê Miksî ye û piştî hingî fetwayek li dor kirina nivêjê li goristanê heye li dûmahîyê hatîye: Xelîlê kurê Huseynî li Hîzanê ew nivîsîye.

4- Kitêba (Nisir alllî min kilam Emîr Elmomnîn 'ilî 'ilî tirtîb hiruf althcî), di dehmena vê kitêbê da hijmareka haşîyeyên 'ilmî hene bi xetê Mela Melîlê Sêrtî ne jê diête zanîn ku wî ew li van cihan nivîsîne: Hîzan, Miks, Westan. Belê mixabin Mela Xelîlî çû dîrok li bin haşîyeyên xo nedanayne.

Li dûmahîya vê destxetê şi'ra Qasimî ya Kirmancî bi destê Mela Xelîl hatîye, wekî dê behs jê keyn.

**Mela Hesen û Şi'ra Wî**

Yekem şa'irê me divêt behs jê bikeyn navê wî (Mela Hesen e) ew ê dîroka wî bo berî pitir ji sêsed salan dizivirit û me got: Pitir ji sêsed salan ji ber ku şi'reka wî ya Kirmancî di desxeta Mela Yasînê Miksî da hatîye ewa dîroka wê -wekî me gotî- bo sala 1161 mişextî (beranber 1748 z.) dizivirit. Piştî Mela Yasîn ji nivîsîna kitêba Şerha Qesîdeya Burdeyê xilasbûyî, wî şi'reka Kirmancî nivîsîye û li serî dîyar kirîye ku ev şi're ya Mela Hesen e.

Hêjayî gotinê ye ku eve ne cara yekê ye ev şi're diête belavkirin û behsê vî şa'irî diête kirin, belkî berî nuke du mamostayan ev şi're weşandîye:

Yê yekê: D. Mes'ûd Kitanî bû, dema wî li sala 1998 ev şi're di hejmara (28) da ji kovara (Peyv) li Dihokê weşandî.

Yê duwê: Se'îd Dêreşî bû, demê ev şi're di kitêba xwe (Kelhên Ava)[1] da belavkirî.

Van her du mamostayan aşkera kirîye ku ev şi're ya kesekê bi navê (Hesen e), belê wan jî nezanîye kanê ev Hesene kî ye û kengî jiyaye lê tiştê nû yê di vê nusxeya me da heyî -ji bilî hindek cudahîyan di naveroka şi'rê bi xo da- ew e ev nusxe bo me aşkera diket ku ev Hesene Mela bûye û dîroka wî her çu nebit bo berî sala 1748 z. dizivirit.

Hêşta çu zanîn li dor jiyan û serhatîya vî şa'irî di dest me da nîn in, û em nizanîn kanê ew xelkê çi derverê bûye û Kirmancîya wî gelek ya xoş û zelal e û wî ev şi'ra xo li ser wezna behra (remelê) danaye û di mijara evîndarîyê da vehandîye, behsê 'işqa xo bo dilberê diket û wê nexoşîya wî ji hecr û fîraqê dîtî.

Mela Hesen di vê şi'rê da dibêjit:

'Aşiqê sergeşte hal im dil reva canan ji min
Lew mudam ez her dinalim tên hizar efxan ji min
Sebr û 'eql û hoş û taqet têk kirin talan ji min
Ew perî herdem ji bê rehmî dibît pinhan ji min
Yarebî canan tu bîne yane bistîn can ji min
Yarebî rûhan tu bîne yane bistîn rûh ji min

Remz û naz û awiran 'alem seraser kir xerab
Min ji ber daxa evînê cerg û mêlak bûn kebab
Têt ji derdê dûrîyê min xûn ji çavan bê hesab
Çûbû seyranê direngî bû şehê 'alî cenab
Yarebî canan tu bîne yane bistîn can ji min
Yarebî rûhan tu bîne yane bistîn rûh ji min

Agirê narê fîraqê têk wicûda min bihat
Yar bi halê min nizanî lew qe naket iltîfat
Her nezer daye reqîban dilbera şêrîn sîfat
Em qe nayêne xîyalê lew direngî bû nehat
Yarebî canan tu bîne yane bistîn can ji min
Yarebî rûhan tu bîne yane bistîn rûh ji min

Bê qirar im ez ji şewqa gerdena teşbîhî 'ac

[1] Kelhên Ava, Weşanxaneya Sipîrêz, Dihok, 2005, rp. 234-236.

Min birîn xoş nabin er luqman bi xwe lê ket 'îlac
Xatra canan 'ecaib nazika mislî zucac
Bê sebeb terka me kir çû da bi exyaran rewac
Yarebî canan tu bîne yane bistîn can ji min
Yarebî rûhan tu bîne yane bistîn rûh ji min

Dil ji min bir nagehan wê dilbera nazik beden
Lew di milkê xurbetê dana me ez naçim weten
Ey seba weqtê seher her bêje wê serwa çemen
Her dinalît û diket zarî dibêjî ha Hesen!
Yarebî canan tu bîne yane bistîn can ji min
Yarebî rûhan tu bîne yane bistîn rûh ji min

**Qasim û Zêmara Wî**

Duyemîn şa'irê me navê wî (Qasim e), ew ê heta evro şi'reka wî ya bi tinê bi ber çavên me keftî. Bi rastî çu zanîn li dor jiyana wî di dest me da nîn in. Ev şi'ra wî li dûmahîya destnivîsa Mela Yasînê Miksî hatîye belê ew bi xetê Mela Xelîlê Sêrtî ye wekî li dûmahîyê hatîye nivîsîn, em nizanîn kanê Mela Xelîl ev şi're li sala çendê bo xo nivîsîye, belê wî li dûmahîya şi'rê ev 'îbarete danaye: (nimqih Xilîl fî qisbe Kifrî) ye'nî demê ew li devera Kufrayê wî ev şi're nivîsîye û aşkeraye ku (Kufra) devera Şêrwan e ewa nuke ser bi wîlayeta Sêrtê ve.

Ji vê çendê diête zanîn ku şa'irê me Qasim yan divêt berî Mela Xelîlê Sêrtî jiya bit yan her çu nebit divêt ew hevçaxê wî bit û eve hindê digehînit ku dibit Qasim ji kurên sedsala hejdeyê zayînî bit.

Qasimî ev şi'ra xwe di rûdaneka nexweş da çêkirîye ew jî mirina du kesan bûye navê yekî 'Ebdillahe û yê dî Ehmed e, yek kurê wî ye û yê dî birayê wî ye. Egera mirina wan ji vê şi'rê naête zanîn, belê aşkera ye ku ew pêkve yan li demekê nêzîk mirîn û ji ber karesata mirina wan şa'irî hest bi êş û nalînê kirîye û dinya di çavan da tarî bûye lew li dûmahîya her beytekê ew vê gotinê dubare diket: (Wey dilê min wey dilo) û belkî wî di vê şi'ra xo da ji layê ruxsarî ve çav li şi'reka Feqîyê Teyran kir bit ewa li dûmahîya her beytekê ew dibêjit: (Ay dilê min ay dilo).

Li hindek cihên kêm ji vê şi'rê xet yê xweş nîne û ez ji rakirinê yê piştrast nebûyme û belkî beyta yekê jî ji vê şi'rê ya bi nîvî bit.

Di vê şi'rê da Qasim dibêjit:

Ketme ber jana fîraqê
Wey dilê min wey dilo

Ketme ber wec'a birînan
Melhem û derman neînan
Ez ji kû bînim hekîman
Wey dilê min wey dilo

Hingî hekîm bên vî demî
Luqman bi xwe kit melhemî
Nabît dewayî elemî
Wey dilê min wey dilo

Dilkul im mame ferîde
Ho li min têşin werîde
Min beden bûyî qedîde
Wey dilê min wey dilo

Dilkul im mame (bi) xwîn e
Her li min têşin birîn e
Çi bikerim derman tu nîne
Wey dilê min wey dilo

Çi bikerim derman nemaye
Ev birîn bû ji nik Xuda ye
Wî li min kirbû qezaye
Wey dilê min wey dilo

Ev birîn bû di pê qezayê
Ma dibî xweş bi dewayê
Baqî ye hetta lîqayê
Wey dilê min wey dilo

Ev birîn bû li ser fuadê
Ma dibî xweş bi kîtabê
Baqî ye hetta turabê
Wey dilê min wey dilo

Ev birîn qewîn bi dom e
Hestîyêd min kirne kome
Qet dibî li mislê min lome
Wey dilê min wey dilo

Min birîn jê ne li karin
Pir bi êş û her dijwan
Hîstirêd min xûn dibarin
Wey dilê min wey dilo

Hêstirêd min pir bi kel tên
Min ji dil ah û xezel tên
Nalînêd min sed 'emel tên

Wey dilê min wey dilo

Hêstirêd min tên di gavê
Mislê cobarê di avê
Bê kuran dunya min navê
Wey dilê min wey dilo

Ruhnîya dîtir bira bû
Ew di qelbê min çira bû
Ya rebî ev xem te dabû
Wey dilê min wey dilo

Heta qiyam nakem ji bîr e
Min ji kû têtin beşîre
Bişareta qelbê kesîr e
Wey dilê min wey dilo

Qismetê min kir melûlî
Hîstrêd min tên ...
Min ji qelbê kul diforî
Wey dilê min wey dilo

Min ji qelbê kul diforin
Wec' û êşê min dizor in
Hîvî û ommêd didûr in
Wey dilê min wey dilo

Hîvî û ommêd wiha ye
'Emûdê min êk …
Quwet û taqet nemaye
Wey dilê min wey dilo

Quwet û taqet cuda bû
Rahet û sebr nemabû
Ruhnîya min 'Ebdila bû
Wey dilê min wey dilo

Ev fîraqe bê hedd e
Suht li min qelb ...
Fehkê dilê min bo Ehmed e
Wey dilê min wey dilo

Hingî dikem fikr û mitale

Sûreta dîtinê 'ewale
Ya rebî xêr key meale
Wey dilê min wey dilo

Qasimî qismet di xeman da
Vê birînê ew kewan da
Guhtina wî di dil kulan da
Wey dilê min wey dilo

Qasimî xem bûne qismet
Daîma bi hicran û furqet
Qet nedî asan û rahet
Wey dilê min wey dilo

Tu binêr çerxê çi lê kir
Tehlîya dî jî ku lê kir
Ruhnîya qelbê xwe rêkir
Wey dilê min wey dilo

Ez diçim dewrê dixwînim
Her dema kêlan dibînim
Sed hizar daxan diçînim
Wey dilê min wey dilo

**Mela Şems û Şi'reka Wî**

Dîsa ji paşmayê kitêbxaneya Mela Xelîlê Sêrtî keşkoleka hêja heye, komeka mezin ya şi'ran bi Kurdî û 'Erebî û Farsî tê da hatîne qeydkirin û hindek ji wan şi'ran yên çend şa'irekên me yên klasîk in. Wekî: Melayê Cizîrî û Melayê Bateyî û Ehmedê Xanî û Mela Xelîlî bi xwe û hindek jî şa'irên nenas in ku bo cara êkê ye navên wan bi ber çavên me dikevin.

Di kitêba xo (Baxê Îrem) da me behsê vê keşkolê bi firehî kirîye û hindek şi'r jî me jê veguhastîne[2] û di vê gotara xo da şi'ra şa'irekê me yê dî yê nenyas dê li ber destê xwandevanan danim ew jî Mela (Şems e).

Mela Şems (belkî Şemsî jî bit) klasîkekê dî yê Kirmanc e yê em çu ji jîn û serhatîya wî nizanîn lê divêt ew berî Mela Xelîlê Sêrtî jiya bit ji ber ku şi'reka wî di keşkola Mela Xelîlî da hatîye.

Ev şi're li ser wezna behra (hezeca heşt tef'îleyî) ya hatîye çêkirin û dibit ew ya kêm bit ji ber ku nasnavê şa'rî li dûmahîyê nehatîye û tiştê berçav di vê şi'rê da ew e: Şa'ir peyva (nêv) û (av) bi şêweyê (nêw) û (aw) nivîsîye, lew dibit ew xelkê wê deverê bit ewa dikefte navbera Kirmanc û Soran da.

Li destpêka wê nasxî nivîsîye: (Mela Şems Rast) paşî deqê vê şi'rê hatîye:

Du'aya me selama heq ji nûra lutfê rehmanî

[2] Orjînala vê keşkolê niha di destê mamosta Dr. Macid Sevgili da ye.

Muzeyyen bî muresse' bî li tac û textê sultanî

Ela ey şahê mehmûdî mebîne bî li qelbê we
Ke ommîde ji feyza we eme geşta zimistanî

Nezer kin hûn û teqsîme ti nêwa seyyd û 'ebdan
Ku da geştî li cebheynê bi coşê şewqê hasanî

Ji te badam û hem filfil ji goşt û roxen û kişmiş
'Esel ba sifre ew pêşkêr dused kefçik di şîlanî

Bixûr û fiştik û şem' û kilabê saz hem mutrib
Reşîş û hem şemaldan û bixûrdankê şahanî


Ji te qeysî û paloz û birnc û atmik qehwe
Titûn û şerbet û finde xuşab û hebbê rummanî


Di kelafe aş hîzm be xisûsa tebsîyê mencel
Libasê meclisê bînin ji behra cûd û ihsanî

Di we xidmetkar kuştî bîn bi fincan û bi qeylûnê
Ji te şewq û sefa bîtin bi teb'ê xanê xaqanî

Ji me nar û pif û awe bi dest û kefçikan xwarin
Dikêşîn em cefaya xo ji naçarî bi nadanî

(1) Kelhên Ava, Weşanxaneya Sipîrêz li Dihokê, sala 2005, bip 234-236.






لا ايمان لمن لا امان له • لا غنى لمن لا فضل له حرف الياء يأتيك ما قُدِّر لك
• يعمل النمام في ساعة فتنة اشهر • يزيد الصدق في العمر • يطلبك الرزق كما
تطلبه • يا من الخائف اذا وصل الى ما خافه • يصير امر الصبو الى مراده • يبلغ
المرء بالصدق منازل الكبار • يسود المرء قومه بالاحسان اليهم • يأسى
القلب راحة النفس • يسعد الرجل
بمصاحبة السعيد • تمت
النسخة المسماة بنثر اللآلى
من كلام علي كرم الله وجهه

متروكات النبي صلى الله عليه وسلم مصحف سجاده تسبيح قبا سواك
مشط عصى حصير ابريق نعلين واذا كتب هذه ووضع في البيت
زيد في المال والبركة والامن


قال ابو هريرة البيت الذي يتلى فيه كتاب الله اتسع باهله وكثر خيره وحضرته الملائكة وخرجت منه الشياطين وان البيت الذي لا يتلى فيه كتاب الله ضاق باهله وقل خيره وخرجت منه الملائكة وحضرته الشياطين من احياء العلوم مما من المدون


قال علي كرم الله وجهه ثلاثة تزيدن في الحفظ ويذهبن البلغم السواك والصوم وتلاوة القرآن من احياء العلوم مع المدون

قوله تعالى الم تر تعجيب وتقرير لمن يسمع بقصتهم من اهل الكتاب واصحاب التواريخ وقد خاطب
من لم يرو ولم يسمع فانه صار مثلا في التعجب الى الذين خرجوا من ديارهم كانت قرية اسمها داوردان
وقيل واسط وقع بها الطاعون فخرجت طائفة فهلك اكثر من بقي في القرية وسلم الذين خرجوا فلما ارتفع
الطاعون رجعوا سالمين فقال الذين بقوا كان اصحابنا احزم منا ولئن وقع الطاعون ثانيا لنخرجن الى ارض
لا وباء فيها فوقع الطاعون من قابل فهربت عامة اهلها حتى نزلوا واديا يبتغون فيه النجاة وهم الوف
حذر الموت فناداهم ملك من اسفل الوادي وآخر من اعلاه ان موتوا فماتوا جميعا كانوا ثلاثة آلاف او اربعة آلاف
او ثلاثون او سبعون الفا فقال لهم الله موتوا فماتوا جميعا ثم احياهم الله ليعلموا ان الحزم من الموت لا ينفع بلا
يمكن اينما تكونوا يدرككم الموت ولو كنتم في بروج مشيدة واعلم ان الطاعون اما اسم لورم حاد يسمى حاصل من
امر سماوي مهلك على سبيل الاكثر واسم لحمى حارة لانهم لهذا الهدم الحادث من طعن ارماح او املاك يطعنون الخلق
بالرماح او غيرها يشاهدونهم اكثر الخلق سيما العلماء واما الوباء فهو عبارة عن فساد الهواء



طائفة من النباتات وطائفة من الحيوانات الى ما هو كمال وخير
بالنسبة اليهما واعتياد اهل تلك الديار برقية الابل وتلك الا
شجار وتعداد لطائف الكلام فى هذا المدائح كتعداد شرائف الكمال
فى ذات الممدوح مما يكل دونه الاقدام ويعجز الاحلام والاوهام يفرق
بالاعياء فصحاء ارباب البراعة فكيف يصر بالاثناء مقول من هو
قائل بقلة البضاعة ولا اطيق ثناء قدر حاصله لانه فوق ما يحكى
بآيات ام كيف يحصى رمال او قطار حيا ولم يتهيا ذاكم
بعد آنات والحمد لمن بيده التوفيق والتيسير
بعونه التلفيق والتحرير والصلوة على
حبيبه خير المرسلين وآله وصحبه
الطاهرين اجمعين
يا ارحم الراحمين تم
قد وقع الفراغ من تسويد هذا الكتاب بحمد الملك الوهاب الغافر لمن
ندم وتاب ويطمئن بلاغم الاياب على يدي العبد الضعيف
ذى الجسم النحيف والجرم الكثيف يس ابن المتيم بالم سيد الثقلين سنة ١١٤١
خدايا بيامرز كناهى من والدين نصفى بجسى بخش ونصفى بجسى
قابلت بالتمام شرح مديح خير الانام بعون الملك العلام


اما الطول حبسها في موضع كالماء الراكد المتعفن او الجاري على الارض الردية او الآجام والنبات السمية او الجيف
المنتنة المتعفنة او لاختلاط بالابخرة والادخنة كما انتشر في الصحاري العميقة والبراري العميقة وينتقل بالرياح
العاصفة الى المواضع الرطبة القابلة للتعفن وربما يتولد في باطن الارض ابخرة ردية سمية وتخرج الى الظاهر وتفسد
به الهواء والماء وفساد الهواء يتعفن الروح الحيواني وبفساده [illegible] الهواء فرار الحيوانات الزكية كا
[illegible] القلق والغراب فاذا احدث ثم [illegible] الهواء فقروا الى البراري وقلل الجبال والصحاري طبعا وعقلا
وشرعا اما طبعا فلا [illegible] طبعا من القلق [illegible] الغراب اما عقلا وشرعا فلا تلقوا بايديكم الى التهلكة روي عن النبي
صلعم اذا رأيتم طاعونا في موضع ففروا في قلل الجبال ولا يدخلونها لكونها سارية فما ذكرناه طريقة الحكماء الطبيعية
واما على قانون الشرع فهو علة سماوية مشروطة بعادة ارضية وهي نطف الزنا فاذا كثر الزنا كثر تعفن النطفة
على وجه الارض تعلق بها ارواح خبيثة سماوية بما يوافق كيفية مزاج نوع الانسان بل كل الحيوانات وبايديهم رماح و
سيوف ويضربون من تعفن اخلاطه بامر الله واذنه ومنهم من لم يظهر اثر الطعن في الظاهر بل يبقى في الباطن
وهذا الصنف قل ما يخلص الا ما شاء الله هذا بحسب الخاصية كما ان قلة المطر من خاصية منع الزكاة بيت
ابر نايد از منع زكوة * وز زنا افتد وبا اندر جهان * فاذا اراد الله حلول سخطه ونزول قهره وغضبه في قطر من
اقطار الارض او تخريب موضع او اهلاك طائفة او جماعة امر الله هذه الارواح لاهلاك قرية او بلدة او ناحية
فبدل الذين ظلموا قولا غير الذي قيل لهم فانزلنا على الذين ظلموا رجزا من السماء بما كانوا يفسقون و
هذه الارواح جنود الله وعساكره اذا اراد اهلاك طائفة ارسلها اليهم مساكن هذه الارواح في عالم البرزخ والمثال
وتصرفهم في عالم الملك واعيانه واصحاب النفوس الزكية كالصبيان والرجال والنساء من اهل الصفاء قد
يشاهدون بصور مختلفة وغيرهم في المجلس الذي يشغلهم فيه لا يرون منهم قطا وهذا دليل صريح على كونهم
في عالم المثال اذ مقتضى الحس التسليم لا يشك اصلا فاذا تفطنت نزول غضب الله وحلول قهره فعليك
بالخروج واياك والدخول فيها والا فانت متجبر على الله ومتكبر على امره لعدم المبالات بقوة بطشه
ووفور قهره والفرار مما لا يطاق من سنن الانبياء والمرسلين والاولياء المرشدين المكملين اما اذا
هجمت العلة وعمت البلية فلا يجوز الخروج عنها لئلا تتعدى هذه البلية الى غيرها من البلاد والا
بنية [illegible] تفسير حسام الدين منا مدون [illegible] المذنب الحقير خليل عبد ملك الجليل في قصبة وطان


ملا کمسی رست

دعا بامه سلاما حق ژ نور لعـ لطف رحمانی
مزین بی مرصع بی لتاج و تخت سلطانی

الا ای شاه محمودی مبین بی لقلبی وه
کو امید ژ فیضا ته اعه غناز مستانی

نظر کن هون و تقسیم تشو السید و عیدان
کو واکشتی بجهینی نجوشی شعوق باسانی

ژ ته بادام و هم فلفل ژ گوشت روغنی کشمش
عسل با سفره او پیشکش دو صد گنجک دشبلانی

بخور و فستک و شمع گلاب ساز هم مطرب
ژ بشی و هم سنمال دان بخور دانک شا یانی

ژ ته قیسی و بالوز برنج و انک قهوه
ثنون و شربت و فنده خوشاب جب رماش

دکلا فرآشی بهرزم دا به خصوصا نبی منجل
لباسی مجلسی بینی ژ بجرا جود و احسانی

دوه خدمت کار کشتی بهن بغنیان و بقیلون
ژ ته شعوق صفا بینی بطبعی خان خاطی قانی

ژ مه نار و بیغ آوه بدست و شمعکی حوارن
دکشینی ام جفا یا خو ژ نا چاری نبادانی



Kurdiname Akademik
Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

# NÊRÎTA NIVÎSANDINA FERHENGÊN PEYVAN JI BO ZAROKAN: -JI *"NISAB'US-SIBYAN"*A EBÛ NESRÊ FERAHÎ HETA *NÛBIHARA BIÇÛKAN* A EHMEDÊ XANIYÎ-[1]

THE TRADITION OF WRITING DICTIONARIES FOR CHILDREN:
-FROM *"NISAB AL-SIBYAN"* BY ABU NASR AL-FARAHI TO *"NÛBIHARA BIÇÛKAN"* BY AHMAD AL-KHANI

Cebbar ŞAFIÎ-ZADE
Wergera ji Farsî: Barat GHAVI-ANDAM[*]

**Article Type:** Research Article // Gotara Wergerî
**Received // Hatin:** 15.08.2022
**Accepted // Pejirandin:** 27.10. 2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 175- 184

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Şafiî-Zade, Cebbar (2021). Nêrîta Nivîsandina Ferhengên Peyvan Ji Bo Zarokan: -Ji "Nisab'us-Sibyan"A Ebû Nesrê Ferahî Heta "Nûbihara Biçûkan" A Ehmedê Xaniyî, Wergera ji farsî: Ghavi-Andam, Barat, K*urdiname*, no. 7, p.175-184

**Kurte:**

Di serdema şaristaniya îslamî da zimanê hevpar ê civakên misilman zimanê erebî bû; lewra fêrkirina zimanê erebî hê di zaroktiyê da dest pê dikir, ji bo wan materyalên perwerdehiyê dihatin amadekirin û ji wan materyalan yek jî ferhengên duzimanî bûn. Di vê gotarê da du ferhengên duzimanî ji gelek aliyan va hatine berawirdkirin: *"Nisab'us-Sibyan"*a Ebû Nesrê Ferahî û *"Nûbihara Biçûkan"*a Ehmedê Xaniyî. Divê bê gotin ku *"Nisab'us-Sibyan"* ji bo farsîaxivan hatiye nivîsandin û *"Nûbihara Biçûkan"* jî ji bo kurdîaxivan hatiye berhevkirin; lêbelê armanca her du ferhengan jî fêrkirina zimanê erebî ji bo zarokan e.

**Kilîtbêje:** Nisab'us-Sibyan, Ebû Nesrê Ferahî, Nûbihara Biçûkan, Ehmedê Xanî, Ferheng.

**Abstract:**

During the period of Islamic civilization, the common language of the Muslim communities was the Arabic language; for that reason, the Arabic language started in childhood, and educational materials were prepared for them, so one of those materials was bilingual dictionaries. In this article, two bilingual dictionaries are compared in many aspects: *"Nisab'us-Sibyan"* by Abu Nasr Al-Farahi and *"Nubihara Biçûkan"* by Ahmad Al-Khani. It should be said that while *"Nisab'us-Sibyan"* was written for Farsi speakers, *"Nûbihara Biçûkan"* was compiled for Kurdish speakers; however, the purpose of writing both dictionaries is to teach the Arabic language for children.

**Keywords:** Nisab'us-Sibyan, Ebû Nesrê Ferahî, Nûbihara Biçûkan, Ahmad Al-Khani, Dictionary.

## Pêşek:

Nivîsandina ferhengên peyvan ji bo mezinan li cîhanê xwedan raboriyeke berbiçav e; lê nivîsandina ferhengên ji bo zarokan, ji ber nebûna têgeha zarokatiyê û pê ra jî nebûna çanda zarokatiyê li civakên cûrbicûr, zêde berbelav nebûye. Lêvegera dîrokî bi xurtî vê îdiayê diselimîne.

[1] Ev gotara ku ji aliyê Cebar Şafi'îzade ve hatiye nivîsandin û bi destî Mesûd Mîr 'Elayî hatiye sererastkirin, cara yekem roja 09.03.1400 koçî hetavî bi farsî hatiye weşandin. (https://ketabak.org/1v3pg)

[*] Derçûyê Mastirê, bqewiendam@gmail.com.

Em dikarin bibêjin ku mîrateyeke zengîn a serdema şaristaniya îslamî hebûye; amadekirin û nivîsandina peyvname, ferheng û qamûsên cûrbicûr bi zimanên berbelav ên wekî erebî, tirkî, farisî, hindî, urdû û kurdî bandoreke mezin li fêrkirina zimanan kiriye û kariye valahiya danûstandinên çandî yên navbera zimanan tijî bike. Di vî warî da hin pirtûkên bi navê *"nisab"* hatine nivîsandin ku ji hêla tevn û nijyara xwe va, pirranî menzûm anku helbestkî bûn da ku fêrxwazên zimên bikarin bilez naveroka wan jiber bikin û zimanê têkildar bihêvosin, fêr bibin. Loma ev celebê pirtûkan wekî rêzehelbestên ji 200 malikî pêkhatî hatine vehûnan û naveroka wan a sereke bi peyv û têgehên zimanê zikmakî yê fêrxwazan hatine dagirtin.

Di warê nivîsandina ferhengên peyvan de ji bo zarokan û fêrxwazên seretayî yên zimên, pirtûka *"Nisab'us-Sibyan"* di sedsala heftem a koça heyvî (k.h) da (sedsala sêzdehem a mîladî) ji aliyê Ebû Nesrê Ferahî va bi zimanê farisî hatiye nivîsandin.

Ebû Nesrê Ferahîyê (an jî Ebû Nesr Bedredîn Mesûd b. Ebîbekrê Ferahî) ku sala 640î k.h. (1243ê mîladî) koça dawî kiriye, helbestvan û nivîskarê ferhenga farisî yê li Efxanistana niha bûye. Ew li bajarê Ferahê yê Efxanistanê ji dayîk bûye. Dihê gotin ku ew bi awayê zikmakî kor ji dayîk bûye û li dezgehê *"Behramşah b. Tacedîn Herb"*, paşayê Sîstanê yê ku ser bi paşayên Xûrê bû, dixebitî û dijiya. Pirtûka *"Nisab'us-Sibyan"* hema wisa ku ji navê wê xuyaye, di rastiyê da ji bo fêrkirina zarokan hatiye nivîsandin; lê ev berhem ji bo her kesekî ku dixwaze zimanê erebî hîn bibe, sûdmend e.

*"Nisab'us-Sibyan"* yekem ferhenga helbestkî ya fêrkirina erebî bi riya zimanê farisî ye ku ji ber girîngiya wê ya fêrkariyê di serdemên borî da û girîngiya wê ya fêrkirina peyvên erebî ji bo fêrxwazên zimên, pirtûkeke naskirî bûye û bikaranîna wê di asteke mezin da berbelav bûye. Ev pirtûk bi qasî 700 salî, ji destpêka sedsala heftem heta destpêka sedsala çardehem a k.h. li welatine mîna Îran, Efxanistan, Tacîkistan, Pakistan, Hind û Tirkiyayê wekî peyvnameyeke klasîk ji bo fêrkirina zimanê erebî dihat bikaranîn; her çiqas ji bo roja îroyîn neguncayî be jî, ji hêla dîrokî va ferhengeke girîng a erebî bi zimanê farisî tê zanîn.

Ebû Nesrê Ferahî bi hûnandina 200 malikan ku jiberkirina wan ji bo zarokan û fêrxwazên zimên karekî hêsan bû, hin peyv û têgeh ku ji bo fêrbûna zanistên mezhebî, wêjeyî, dîrokî û heta bîrkarî, stêrknasî û xwezayî yên serdema wî pêwîst bûn, daniye ber destê fêrxwazên îranî yên ku zimanê farisî dizanîn. Ji ber ku peyvên erebî hem ji hêla hejmara tîpan (sulasî, ruba'î, xumasî, sudasî) û hem ji hêla herekeyan va kêşên wan ên cûrbicûr hene û komkirina tevahiya wan di behrekê da helbestê dijwar û bedewiya wê kêm dike, Ferahî berhema helbestkî ya *"Nisab'us-Sibyan"*ê li ser bend (37 bend) û behr[2] û kêşên ciyawaz (9 behr) hûnandiye.

Zarokên civakên faris û kurd rewşeke weke zarokên gelên din ên cîhanê hebûye. Ew ji ber têgeha serdest ku têgeheke li dor gotina mezinan bûye, heta heyameke dirêj li qiraxê hatine hiştin û wan nekariye ku derbasî nav civakê bibin.

Mezinên civakên kurd û faris -weke piraniya civakan- hemî hewcetiyên zarokan ên dema niha û bê tê derdixistin û rêyên dabînkirina van hewcetiyan diyar dikirin. Yek ji van hewcetiyan, fêrbûna zimanê erebî bûye ku ji ber aliyê wî yê pîrozwerî û bi armanca hînbûna Quranê, li nav van civakan xwedan girîngiyeke taybet bûye. Mezinan zarok neçar dikirin ku biçin hucre û mektebxaneyê da ku li wir li ba mamoste û mektebdarî, zimanê erebî hîn bibin û bi vî awayî di warê xwendina herikbar û têgihîştina ayetên Quranê da serdest bibin.

Di wê serdemê da, hînbûna zimanê erebî ji ber egerên sereke li zarokan dijwar hatiye û ew westandine: Ya yekem, mektebdar şêwazên durist ên elimandin û perwerdekirina zarokan nedizanî û reftareke neguncayî di gel zarokan dimeşand; ya duyem, zimanê erebî ji bo zarokên ku zimanê wan ê zikmakî ciyawaz di gel erebî bû, biyanî û nenas xuya dikir.

---

[2]Behr**:** her qalibekî kêşa 'erûzê ye ku helbestvanên ereban bi kar aniye û piştre derbasî nava misilmanên din bûye. Di wezna erûzê de helbest li gorî pergaleke diyarkirî tê hûnan û "efaîl" tên bikaranîn; li gorî rîtm û ahenga helbestê nav li van behran hatine danîn. Wekî mînak: *"mustef'ilun-mustef'ilun-mustef'ilun-mustef'ilun"*

Di mewqiyeke wiha ya dîrokî û civakî da ye ku Ehmedê Xanî (1651-1707 / 1030-1086 k.r.), helbestvanê navdar ê kurd ku zimanên kurdî, farisî û erebî (û tirkî) dizanîn, dest bi xebateke mezin kir û bi nivîsandina ferhenga herî kevn a naskirî ya kurdî heta roja îroyîn, yanî bi ferhenga erebî-kurdî ya bi navê *"Nûbihara Biçûkan"* (Nûbihara Zarokan) di sala 1683an da, gihîşte hawara zarokên fêrxwaz ên zimanê erebî.

Girîngiya elimandin û perwerdekirina bingehîn a zarokan ji bo Ehmedê Xanî heta wê radeyê bûye ku wî bi xwe bi armanca fêrkirin û perwerdekirina bingehîn a zarokan li devera Bazîdê, dibistanek ji bo zarokan damezirandiye û li wir zanistên dînî hînî wan kirine. Wî girîngiya fêrkirin û perwerdekirina zarokan çend ruba'iyan nîşan daye; li gorî wî *"zarok hêvî û ayîna cîhanê ne, divê kiryarên mezinan wekî hîç bên hesibandin; her dema ku dixwazî gotinekê fêrî wan bikî, divê qencî û hêvî û rindiyê ji bîr nekî"*.[3]

Di rastiyê da, Ehmedê Xanî bi hûnandina *Nûbihara Biçûkan* di çarçoveyeke helbestkî da û bi zimanê gelê xwe anku zimanê kurdî, hem kariye alîkariyeke guncayî bide fêrxwazên zimên, hem jî zimanê kurdî derbasî qada fêrkarî û perwerdehiyê bike û vî zimanî vejîne.

Ehmedê Xanî wek nivîskar, helbestvan û feylesofê kurd, ji bilî komkirin û hûnandina ferhenga *"Nûbihara Biçûkan"*, cîgeheke wî ya bilind jî di edebiyata kurdî da heye; ji ber ku wî hûnera xwe di berhema *"Mem û Zîn"*ê da nîşan daye, bi vê berhemê destaneke herî nasyar a evîndariyê ya kurdan hûnandiye, naverok û têgehên neteweyî di helbestên xwe da bi kar anîne. Xanî di pêşeka ferhenga "*Nûbihara Biçûkan"* da bi aşkerayî nivîsandiye ku wî ev pirtûk ne ji bo kesên temenmezin, lê belê ji bo zarokên kurmanc nivîsandiye.

*"Nûbihara Biçûkan"* di qalibê helbestê da ye û ji pêşekekê û sêzdeh beşan pêk hatiye. Destpêk û dawiya vê ferhengê di qalibê *"mesnewî"*yê da û yazdeh beşên din *"xezel"* in. Ehmedê Xanî di vê berhemê da nozdeh behrên 'erûzî yên ciyawaz bi kar anîne ku ji bo helbesta kurdî ya klasîk guncayî bûne; wekî mînak *"recez", "hezec", "remel", "besît", "muteqarib"* û hwd bi kar anîne.

Xanî ferhenga *"Nûbihara Biçûkan"* bi du rêbazên erebî-kurdî û kurdî-erebî hûnandiye; lê di pirtûkê da zimanê wî yê sereke kurdî ye.

Ev pirtûk sala 1989an da ji aliyê weşana Selahedînê Eyûbî va li Îranê hatiye weşandin; bi pêşeka Perwîz Cîhanî û bi qasî 3000 hebî hatiye çapkirin.

Egerên herî sereke yên girîngiya ferhenga *"Nûbihara Biçûkan"* di edebiyata kurdî da:

**-Tabûşikênî û raçavî:** Di warê nivîsandina pirtûkên ji bo zarokên çîn û qatên serdest ên civakê da vê berhemê tabûyên heyî şikandine û ji bo cara yekem hemî zarokên civakê li ber çavan girtine. Heta beriya Ehmedê Xanî tenê zarokên paşa û desthilatdaran di warê perwerdehiyê da hatine berçavgirtin. Ehmedê Xanî bi aşkerayî li pêşeka *"Nûbihara Biçûkan"* nivîsandiye ku wî ev pirtûk ne

---

[3] Nivîskarî ev ruba'iyên Ehmedê Xaniyî bi awayekî wateyî wergerandine farsî:
*"Da bi van çend reşbelekan,*
*Li wan tebî'et-melekan.*

*Derê zihnê vebîtin,*
*Her çî bixûnit zehmetî nebîtin.*

*Umîda me ji tifalan,*
*Ku me 'emel betalan.*

*Di weqtê dewr û dersan,*
*Bikin în'am û îhsan.*

*Bi du'an me bîr bînin,*
*Fatîha ji me ra bixûnin!"* (wergêr)

tenê ji bo zarokên kesên xwedî hêz û desthilat (sahib-rewac), belkî ji bo hemî zarokên kurmanc nivîsandiye:

*"Ji paş hemd û selewatan,*
*Ev çend kelîme ne ji luxatan*

*Vêk êxistin Ehmedê Xanî,*
*Navê «Nûbihara Biçûkan» lê danî*

*Ne ji bo sahibrewacan,*
*Belkî ji bo biçûkêt kurmancan"*

-Yekem ferhenga fêrkirina peyvan ji bo zarokan;
-Yekem ferhenga kurdî-erebî ji bo zarokan;
-Yekem pirtûka ku bi hûrgilî bala xwe daye ser wezna 'erûzê;
-Di vê ferhengê da şêwaza fêrkirina peyvan: fêrkirin ji peyvên hêsan ber bi yên dijwar û ji yên naskirî ber bi yên nenas e;
-Ji bo zarokan *"rêbaza pedagojîk"* hatiye hilbijartin.

**Destpêka ferhenga *"Nûbihara Biçûkan"*:**
*"Hemd û sena û şukiranî,*
*Ji bo wî xalqê rehmanî*

*Ku fesahet û beyan daye lîsanî,*
*Lîsan daye insanî*

*Hindê selewatin hemî,*
*Li resûlê me yê ummî*

*Ku bûne peyrewê di wî,*
*'Ereb û 'ecem û kurmanc û rûmî*

*Ji paş hemd û selewatan,*
*Ev çend kelîme ne ji luxatan*

*Vêk êxistin Ehmedê Xanî,*
*Navê «Nûbihara Biçûkan» lê danî*

*Ne ji bo sahibrewacan,*
*Belkî ji bo biçûkêt kurmancan.*

*Wekî ji Quranê xilas bin,*
*Lazim e li sewadê çavnas bin.*

*Da bi van çend reşbelekan,*
*Li wan tebî'etmelekan.*

*Derê zihnê vebîtin,*
*Her çî bixûnit zehmetî nebîtin.*

*Umîda me ji tifalan,*
*Ku me ’emel betalan.*

*Di weqtê dewr û dersan,*
*Bikin în’am û îhsan.*

*Bi du’an me bîr bînin,*
*Fatîha ji me ra bixûnin!”*

Mînakek ji rêbaza hûnadina peyvan di *“Nûbihara Biçûkan”* da:

*“Şab” ciwan e, “herem” pîr e*
*“Qews” kevan e, “sehm” tîr e*

*“Mexat” çilm e, “lu’ab” lîk e*
*(Loqme) parû, (lebene) tîke*

*(Selat) niwêj e, (ezan) bang e*
*(Sene) sal e, (şehr) mang e*

*(Nehar) roj e, (leyl) şev e*
*(Newm) nivistin e, (ru’ya) xew e* (r.18)

**Hevrûkirina her du ferhengan: *“Nûbihara Biçûkan”* û *“Nisab’us-Sibyan”***

**1. Armancan nivîsandina her du pirtûkan**

Ebû Nesrê Ferahî di destpêka pirtûka xwe da nivîsandiye: *“Zarok beriya fêrbûna peyvan, hez dikin ku helbestên farisî bixwînin, ji ber ku kêfa ji helbestê û teb’ên mewzûn tiştekî surიştî ye û fêrkirina peyvan kilîta hemî zanistan e. Loma min beşek ji peyvan kir helbest da ku bi hêsanî hîn bibin û …”*

Ehmedê Xanî armanca xwe ya nivîsandina ferhenga *“Nûbihara Biçûkan”* wekî alîkariya zarokan ji bo hînbûna Quranê bi şêwazeke xwerû û hêsan destnîşan kiriye ku di vê riyê da tûşî renc û zehmetiyê nebin û bêhna wan teng nebe. Xanî hêvîdar bûye ku ev ferheng rêya teorîk a zanista dînî ji bo zarokan xweş bike û rola xwe wek rêberekî manewî ji bo zarokan bilîze da ku ew bi hînbûna zanistên dînî di dema niha da, jiyaneke bextewer di paşerojê da derbas bikin.

**2. Egerên navlêkirina her du pirtûkan**

Ferahî di destpêka pirtûka xwe da nivîsandiye: *“Ji ber ku du sed malik hatin, me navê Nisab’us-Sibyanê lê kir.”*

Xanî li ser vê bawerê bûye ku bihar, destpêka jiyana xwezayê ye û zarokatî jî destpêka jiyana mirovî ye. Wî navê *“Nûbihar”*ê ji ber vê yekê li pirtûka xwe kiriye ku ji bilî tekeziya li ser girîngiya heyama zarokatiyê, vê hizr û ramanê berbelav bike ku nivîsandina pirtûkan ji bo zarokan û xwendina zarokan bi zimanê zikmakî, destpêka jiyana dubare ya zarokan e.

**3. Çawaniya diyarbûna her du pirtûkan**

Nivîskarê *"Nûbihara Biçûkan"* Ehmedê Xanî bi têgihîştina pêwîstiya hebûna ferhenga erebî-kurdî, bêyî pêşniyar û destûra desthilatdariyê ev berhem nivîsandiye; lê Ebû Nesrê Ferahî li ser fermana Nizam'ul-Mulkê Hesen, wezîrê Behram Şah, ferhenga *"Nisab'us-Sibyan"*ê nivîsandiye.

**4. Mewqiya dîrokî û siyasî ya nivîsandina her du pirtûkan**

Ebû Nesrê Ferahî di serdemeke wisa da *"Nisab'us-Sibyan"* bi zimanê farisî nivîsandiye ku ev ziman, zimanê fermî yê welêt bûye û atmosfera çandî û siyasî-civakî ya heyî rê li ber berfirehbûna vî zimanî xweş kiriye; li hemberî vê yekê, Ehmedê Xaniyî di qonaxeke wisa da *"Nûbihara Biçûkan"* bi kurmancî nivîsandiye ku kurd wekî miletekî ji aliyê desthilatdariya siyasî ya qiraltiya Osmaniyan va dihatin înkarkirin û wan hebûna zimanê kurdî nedipejirand. Xanî bi nivîsandina vê ferhengê, ji bilî aliyê wê yê fêrkirina zarokan, cureyekî xwebaweriya neteweyî û neteweperwerî jî destnîşan kiriye.

**5. Mijarên hilêxistî di her du pirtûkan da**

Di pirtûka *"Nisab'us-Sibyan"*ê da ji bo her peyveke erebî yan jî çend peyvên hevwate yên erebî, peyveke farisî yan jî hemwateya wê hatiye. Nivîskarî her wiha navê mehên erebî, îranî, rûmî û tirkî û hin agahî derbarê mijarine weke jinên Pêxemberê Îslamê û zarên wî, diwazdeh îmam û wekî van babetan jî di dawiya pirtûka xwe da helbestkî hûnandine. Di *"Nûbihara Biçûkan"* da jî ji bilî raberkirina wateya kurmancî ji bo her peyveke erebî, li beşa yekem a pirtûkê, hin agahî li ser Xwedê, pêxember, xelîfeyên raşidîn, sehabe (eshab) û binemala Pêxemberê Îslamê hatine hilêxistin.

**6. Bereya xwîner û berpeyvên her du pirtûkan**

Xanî di destpêka pirtûka *"Nûbihara Biçûkan"* da bi zelalî destnîşan kiriye ku wî ev pirtûk ne ji bo mezinan, lê belê ji bo zarokên kurmancan nivîsandiye û ji wan xwestiye ku bi alîkariya vê ferhengê, Quranê bi başî û bêyî zehmetiyê hîn bibin û piştî hînbûna Quranê, li giyana wî dua bikin û fatiheyê bo ruhê wî bixwînin. Lê di pirtûka *"Nisab'us-Sibyan"*ê da ev tekezî li ser mixatebên zarok nayê xuyakirin. Hema ev tekezî û baldariya Ehmedê Xaniyî li ser zarokan e ku di dîroka wêjeya Kurdistanê da cîgeheke taybet wekî yekemîn ramanwerê kurd jê ra ava kiriye.

**7. Nivîsandina şiroveyan li ser her du pirtûkan**

Gelek şirove li ser *"Nisab'us-Sibyan"*ê hatine nivîsandin; ji wan em dikarin amaje bi Şerha *"Riyad'ul-Fityan"* a Ibni Hisam a di nîveka sedsala heştem a k.h., Şerha *"Rafi'un-Nisab"*a Ehmed b. El-Feqîh (818) û *"Kenzul Funûn"*a zayanekî hindî ya di sedsala yazdehem a k.h. da bikin.

Li ser *"Nûbihara Biçûkan"* jî çend şirove û danasînên kurt hatine nivîsandin ku ji wan em dikarin amaje bi danasîna Perwîz Cîhanî (pêşeka vê pirtûkê ya sala 1989an) û danasîna Qedrî Yildirim (pêşeka vê pirtûkê ya weşana Avestayê, 2015) bikin.

**8. Raborî**

Beriya pirtûka *"Nisab'us-Sibyan"*ê, pirtûkine din bi navê *"nisab"* hebûne; wekî mînak, *"Nisab'ul-Feqîh"*a Tahir b. Ehmedê Buxariyî (sala ???) û *"Nisab'ul-Exbar"*a ku ji aliyê Imam'ul-Heremeyn Siracedîn (1301 k.h) va hatine nivîsandin. Lê beriya pirtûka *"Nûbihara Biçûkan"* tu ferhengeke din a peyvan di vî warî da tunebûye; lewra Ehmedê Xanî pêşengê nivîsandina ferhenga taybetî zarokên kurd bûye.

**9. Belavbûna her du pirtûkan**

Pirtûka *"Nisab'us-Sibyan"*ê ji dema ku hatiye nivîsîn, rastî pêşwaziyê hatiye û di heyama 650 salî da, yanî ji nîveka sedsala heftem heta destpêka sedsala çardehem a k.h da, di kewşena bandor û

rewaca zimanê farisî da bûye pirtûka dersî, ji Îranê heta Hindistanê û Asyaya Biçûk hatiye bikaranîn. Lê pirtûka *"Nûbihara Biçûkan"* tevî ku taybetmendiyên wê yên ciyawaz hebûne, ji ber qedexetiya zimanê kurdî û belavbûna kurdan li çend welat û kewşenan, tu wextî nekariye di mewqiyeke wiha da berbelav bibe û bi awayekî fermî were pêşwazîkirin.

**10. Hejmara malikên her du pirtûkan**

Hejmara malikên (beytên) *"Nisab'us-Sibyan"*ê bi awayên cûr bi cûr hatiye destnîşankirin, lê ji ber egerên jêrîn, ev berhem ji 200 malikan pêk hatiye:

a. Katib Çelebî di *"Keşf'uz-Zunûn"*ê da hejmara malikên wê 200 daye zanîn.

b. Di pêşeka deqa destnivîs a herî kevn a *"Nisab"*ê da, hejmara malikên wê wekî 200 hatiye zanîn.

c. Xwediyê *"Kenz'ul-Funûn"*ê ya ku şerheke qedîmî li ser *"Nisab'us-Sibyan"*ê ye, di dîbaçeya wê da nivîsandiye:

| | |
|---|---|
| Eger tu mucmela (kurteya) malikên wê dixwazî<br>Di rûpela ferd (ne-cot) da tenê (r) bixwîne | گر طلبي مُجمل ابيات آن<br>در ورق فرد فقط (ر) بخوان |

Hejmara malikên *Nûbihara Biçûkan*, ji bilî 14 malikên ku di pêşekê da hatiye, 201 e.

**11. Şêwaza nivîskaran di her du pirtûkan da**

Rêbaza Ferahî di hûnandina *"Nisab'us-Sibyan"*ê da wiha bûye:

a. Eger peyv û wateyên wan li pey hev, di kêşê (wezn) da bûbin, bêyî tu peyveke zêde, ew kirine helbest: *"Fexz"*: ran, *"eqeb"*: paşine (panî), *"ricl"*: pa (pê).

b. Helbestvên carinan ji bo temamkirina kêşê, gihanek, lêgerên alîkar, baneşan û hwd bi kar anîne:

| | |
|---|---|
| *"Seqr"* dozex o *"nar"* ateş velî kê<br>*"Cennet"* bêhêşt *"axiret"* an seray<br>*"Êlah"* est o Ellah o Rehman Xoday | سقر دوزخ و نار آتش ولى كه<br>جنت بهشت آخرت آنسراي<br>اله است والله و رحمان خداى |

c. Carinan peyv û wateya wê bi awayê pirs û bersivê hatiye:

| | |
|---|---|
| *"Eqreb"* çê? Kejdem est<br>Ve hemê zehreş, *"ibre"* nîş | عقرب چه؟ كژدم است<br>و حمه زهرش، ابره نيش |

d. Helbestvên çend peyvên hemwate li pey hev anîne, piştra wateya wan vegotiye:

| | |
|---|---|
| *"Yed"* û *"carihe"*: dest.<br>Ya *"xezeb"* û *"sarim"*: tîx | .يد و جارحه: دست<br>يا عضب و صارم: تيغ |

e. Carinan peyv û wateya wê bi awayê *"lef û neşr"*a birêkûpêk[4] hatiye:

[4] **lef û neşr:** *"Lef"* lihevalandin û *"neşr"* jî vekirin û berfirehkirin e. Îcar *"lef û neşr"* ew e ku nivîskar an jî helbestvan du yan jî çend peyvan di beşeke gotina xwe da (piranî di misra yan jî malikeke helbestê da) bîne û di beşa din da jî peyvine din ku bi awayekî têkildarî peyvên pêşîn bin, bi kar bîne.

| | |
|---|---|
| *"Nuhas"* û *"sifr"*: mês û rûy | نحاس و صفر: مس و روى |

f. Carinan ji bo peyvekê du wate anîne:

| | |
|---|---|
| *"Rehm"*: qerabet o zêhdan (zehdan) boved | رحم: قرابت و زهدان بود |

g. Carinan têgeha peyvê bi hevokekê hatiye vegotin:

| | |
|---|---|
| *"Siwar"* dest o rencin ço pay ra *"xelxal"* | سوار دست و رنجن چو پاي را خلخال |

h. Di dawiya berhema *"Nisab'us-Sibyan"*ê da hin agahiyên dîrokî, stêrnasî, dînî û bijîşkî wekî helbest hatine. Mînak: Navê hevjîn û zarokên Pêxemberê Îslamê (silavên Xwedê lê bin), navên *"eşereyê mubeşere"*[5], navên kelehên Xeyberê, navên mehên farisî û rûmî, navên hin êşan û hwd.

Her çi ku Ehmedê Xanî ye, wî jî di ferhenga *"Nûbihara Biçûkan"* da ev şêwaza han bi kar aniye:

a. Di destpêka her beşekê da, kêş û behra wê beşê bi awayekî aşkera destnîşan kiriye. Wekî mînak:

Mefa'îlun - fe'ûlûn, mefa'îlun - fe'ûlûn
Çi xweş wezn e bibîtin *"hezecê mekfûf û mehzûf"*

b. Eger peyv û wateyên wan li pey hev di kêşê da hatibin, bêyî tu peyveke zêdetir, ew kirine helbest:

Hatim *"eteytu"*, *"eetî"* têm, wî hat *"eta"*, *"îytî"* were
*"E'teytu"* min da, *"xuz"* bigir, *"irci'"* veger, *"izheb"* here

c. Carinan ji bo temamkirina kêşê, gihanek, lêkerên alîkar, baneşan û hwd bi kar anîne:

*"Şeml"* belavbûn e hem vêkketin e, *"şeml"* e ber
*"Zirbîy"* mafûr e, hem *"tenfis"* e ey baxeber

d. Carinan peyv û wateya wê wekî pirs û bersivê hatiye:

*"Ibn"* kur e, *"bint"* keç e, *"sihr"* xezûr e, mam e "'em"
*"'Emet"* met e, *"imame"* şaş, *"ceddeh"* çi ye? Xwe pîreda

e. Carinan çend peyvên hemwate li pey hev anîne û piştra wateya wan raber kiriye:

*"Zewc"* û *"recul"* çi mêr; û jin *"mer'et"* û *"zewcet"* û *"nisa"*
*"Walid"* bab e, *"walide"* da ye; *"şeqîq"* û *"ex"* bira

5 ***"Eşereyê mubeşere"***: têgiheke erebî-îslamî ye ku tê wateya *"deh kesên bi bihuştê mizgînkirî"*.

f. Carinan peyv û wateya wê bi awayê *“lef û neşr”*ê hatiye:

*“Esfar”* û *“ziber”* her du cem’ê di kitêban in
*“Merqûm”* wekî *“mektûb”*, *“mezbûr”* e nivîsayî

g. Carinan ji bo peyvekê du yan jî çend wate anîne:

*“Casiye”* tirs û *“sa’iqe”* deng û birûsk û bêhişî

h. Carinan ji bo du yan jî çend peyvên erebî, wateyek di zimanê kurdî da aniye:

*“Tawd”* û *“cebel”*, *“tûr”* her sê çiya ne

Em dikarin bi awayekî giştî vê encamê wergirin ku Ferahî û Xaniyî hema hema şêwazekî hevpar bi kar aniye.

**12. Teqlîdên ji her du berheman**

Piştî *“Nisab’us-Sibyan”*ê gelek teqlîdên wê derketine holê ku ya herî nasyar *“Zehret’ul-Edeb”* a di zimanê erebî bo farisî da ye. Ji *“Nûbihara Biçûkan”* jî gelek teqlîdkarî pêk hatine ku ya herî naskirî *“Ferhenga Luxeta ‘Erebî-Kurdî ya Ehmedî”* ye ku Şêx Merûfê Nûdehî 100 salî piştî Xaniyî ew nivîsandiye.

Piştî mirina Ehmedê Xaniyî ya sala 1707an li bajarê Bazîdê, kesine din hewl dane ku bi şopandina riya wî, ferhengeke din binivîsînin. Şêx Merûfê Nûdehî (1753-1838) ji wan kesan e ku piştî Xaniyî, ferhengeke luxeta erebî-kurdî ji bo kurê xwe Şêx Ehmed Silêmanî, zarok û fêrwazên din nivîsandiye. Armanca Nûdehî ji nivîsandina vê pirtûkê, fêrkirina hêsan a zimanê erebî bo axiverên kurmanciya navîn (soranî) ye ku hewl didin zimanê erebî fêr bibin.

Nûdehî jî wekî Xaniyî, pirtûka *“Ferhenga Ehmedî”* bi şêwazê helbestkî hûnandiye û heta niha wekî çavkaniyeke pêbawer û naskirî ya hînbûn û xwendina zimanê erebî ye ku ji bo kurdan nemaze ji bo feqiyan e.

Ev ferhenga 70 rûpelî sala 2000î ji aliyê *“Weşana Kurdistanê”* va li bajarê Sineyê bi çapeke nû hatiye weşandin:

| | |
|---|---|
| Min bi vê risaleyê kurdî-ziman | در این رساله به کُردی زبان |
| Zimanê erebî kiriye beyan | زبان عرب را کردهام بیان |
| Da ku kurê min Ehmed, bê westan | تا که فرزندم احمد بی تعب |
| Bibe zanayê peyvên ereban | شود دانای لغات عرب |

Li Tirkiyeya îroyîn a ku kurd wekî kêmneteweyekê tên hesibandin jî, ji bo fêrkirina zimanê tirkî li zarokan ferhengeke tirkî-kurdî ya kevn tê bikaranîn ku nivîskarê wê berhema alîkar heta niha nehatiye diyarkirin. Mînakek ji rêbaza fêrkirina zimên di ferhenga tirkî-kurdî da ev e:

*“Gel gel”* were, *“gît gît”* here
*“Qapi”* der e, *“eşek”* ker e
*“Saman”* ka ye, *“ot”* giya ye
*“Koyûn”* mîh e, *“okuz”* ga ye
*“Kûrût”* keşk e, *“tûlûx”* meşk e

*“Siçan”* mişk e, *“kûrû”* hişk e

Nivîskarekî din ê ku di vî warî da xebitiye, Mela Xidirê Rêwarî (1734-1795) ye ku pirtûka *“Role Bizanî”* (Kurê min bizane) wekî bersivên hin pirsan hatiye amadekirin; di warê dîn û irfanê da û bi armanca fêrkirina usûl û furû'ên dîn, bi navê *“Risaleya menzûm a kurdî ya irfanî di baweriyên dînî da”*, bi kurdiya hewramî hatiye nivîsandin. Ev pirtûk jî sala 1989an ji aliyê *“Weşana Husêynî-neseb”* va hatiye weşandin. Mînakek ji vê pirtûkê:

| | |
|---|---|
| Role bizanî role bizanî | روله بزانی روله بزانی |
| Ferzen wer ce gişt mebu bizanî | فەرزەن وەر جە گشت مەبو بزانی |
| Esl û fer’ dîn çenî erkanî | ئەسل و فەرع دین چەنی ئەرکانی |
| Çenî ehkaman pey musilmanî | چەنی ئەحکامان پەی موسلمانی |
| Mebu bizanî her yu pencenî | مەبو بزانی هەر یو پەنجەنی |
| Erçe pencenî emma gencenî | ئەرچە پەنجەنی ئەمما گەنجەنی |

“Kurê min bizane kurê min bizane
Lawo beriya her tiştî divê bizanî

Esl û fer’ên dîn çend erkan in
Bi çend ehkaman dibe misilmanî

Hemû pênc heb in divê bizanî
Lê gencîne ne, ger çi pênc heb bin jî”

Sipasî ji bo dostê min *“Arman Ekberî”* ku di wergera nivîsa kurmancî ya *“Nûbihara Biçûkan”* a bi kurdiya soranî da gelekî alîkariya min kir.

**Çavkanî:**

Ferahî, Ebû Nesr, *Nisab’us-Sibyan*, deqa destnivîs a Lêkolîngeha Navenda Lêkolînên Îslamî.
Xanî, Ehmed (1367 k.h.), *Ferhenga Nûbiharê*, bi pêşeka Perwîz Cîhanî, Ûrmiye: Selahedînê Eyûbî.
---------------- (1960), *Mem û Zîn*, wergera kurdiya soranî: Ebdulrehman Şerefkendî, Bexda: Necah.
---------------- (2015), *Nûbehara Biçûkan*, amadekariya çapê: Kadri Yildirim, Stenbol: Avesta.
Rêwarî, Mela Xidir (1369), *Role Bizanî*, Sine: Husêynî-neseb.
Çerxî, Mewlana Yeqûb (1398 k.h.), *Şerha Nisab’us-Sibyanê*, Têhran: Ermexanê Tarîx.
Nûdehî, Şêx Merûf (1379 k.h.), *Ferhenga Ehmedî*, amadekariya çapê: Ebdulrehîm Mehmûdî, Sine: Kurdistan.

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 7 Mijdar 2022

International Journal of Kurdiname
Issue: 7 November 2022

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

# ZAZAKÎYA (DIMILKÎ) BAŞÛRÎ SER O NOTÎ*

(NOTES ON SOUTHERN ZAZA (DIMILÎ)

David N. MACKENZIE
Îngilîzkî ra açarnayox: Esat ŞANLI**

**Article Type:** Translation Article // Gotara Wergerî
**Received // Hatin:** 10.08.2022
**Accepted // Pejirandin:** 10.09.2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 185-198

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Mackenzie, David N., (1995). Zazakîya (Dimilkî) Başûrî Ser O Notî, Îngilîzkî ra açarnayox: Esat Şanlı, K*urdiname*, no. 7, p.185-198

**Xulasa**

Xebatê wareyê gramerê Zazakî resenê Oskar Mannî ke sereyê 1900an de xebatî kerdê û dima ra nê xebatê ci hetê Karl Hadankî ra ameyê weşanayene. Dima çend ziwannasanê ziwananê Îrankîyan ê bînan zî nê wareyî de xebatî kerde ke înan ra yew David Neil MacKenzie yo. Xebatanê ê ra qismêkê ci bitaybetî xusûsîyetanê bikarkardişê îzafeyî yê hetê Sêwregi û Çêrmûgî ser o vindenê, ameyê weşanîyayene. Seba ke xebatê ke gramerê Zazakî ser o ameyê kerdene tay ê, açarnayîşê xebatanê ke nê wareyî de ziwananê bînan de ameyê kerdene bi Zazakî, yeno bawerkerdene ke do zanayîşê derheqê gramerê nê ziwanê yan dîyalektê Kurdkî hîna zaf biresno qiseykerdoxan û cigêrayoxanê Zazakî. Na xebata açarnayîşî ya MacKenzie ke Îngilîzkî ra açarîyaya, bitaybetî kesê ke wazenê Zazakî ser a xebata têvernayîşê xusûsîyetanê gramerê ci teqîb bikerê, yeno pawitene ke xebatanê înan rê faydedar bibo.

**Çekuyê Kilîdî:** Zazakîya Başûrî, Îzafe, Têvernayîş, Formê îzafeyî

**Abstract**

Studies on the Zazaki grammar dates back to the Oskar Mann who studied it in the early 1900s and his studies were published by Karl Hadank afterwards. Then few other linguists of Iranian languages studied in that field as well, one of them is David Neil MacKenzie. Some of his studies are especially focuses on the ezafe features of Sêwregi and Çêrmûg districts, which were published. Due to lack of studies on the Zazaki grammar, translating studies of that field which were done in foreign languages to Zazaki, it is believed that the knowledge on this Kurdish language or dialect will reach to the speakers and researchers of Zazaki more. This work of MacKenzie which was translated from English, it is hoped that will be helpful for Works of those who seek for studying on comparison of features of its grammar.

**Keywords:** Southern Zazaki, Ezafe, Comparison, Ezafe forms

Arêdayîşê materyalanê Oskar Mannî yê Zazakî, ke Asyaya Qijkeke de, cayanê cîyayan ê ke Zazayî qisey kenê ra arê dayîbî, ê demî ser a 85 serrî ravêrtî û viraştişê edîsyonêkê hîrayî yê materyalanê hetê Karl Hadankî[1] ser ra zî nizdê 60 serrî ravêrtî. Ey ra dima nêm seserrêk de derheqê nê ziwanî de çîyêko newe nêame şinawtine. Dima 1983 de Enstîtuya Kurdî ya Parîsî,

* No nûşte bi Îngilîzkî hetê ziwannas David N. MacKenzie ra nûsîyayo û "Proceedings of the second European Conference of Iranian Studies, Rome, 1995, pp. 401-14" de weşanîyayo. Na xebate ê metnê ey yê Îngilîzkî ra ameya açarnayene.

** Wendekarê PhD, Beşê Ziwan û Kulturê Kurdî de, Zanîngehê Dîcle, ORCID: https://orcid.org/0000-0002-3130-1143

[1] Oskar Mann: Mundarten der Zâzâ, hauptsächlich aus Siwerek und Kor. Bearbeitet von Karl Hadank (Kurdisch-Persische Forschungen. Abt. III, Bd. IV). Berlin 1932. Nimûneyê Sêwregi bi cumleyanê bi hûmara (rîpel 173-182) yan zî bi hûmara tekst û paragrafê (rîpel 195-216) ameyê neqilkerdene.

kovara ke bi nameyê Hêvî bîye bi Kurdkîya Vakûrî (Kurmanckî) û Kurdkîya Merkezî (Sorankî) vete, ke tede beşêk dîyabi bi Zazakî zî. Heman wextî de Amerîkayijêko ciwan, Terry Lynn Todd, Gastarbeiterê Rojawanê Almanya de ziwanî ser o dest bi xebate kerde. A Grammar of Dimilî[2] (Gramerêkê Dimilkî) ke serra 1985 de Michigan de tezê ey yê doktora bi, wextêkê 50 serrî ra vêşêr ra dima bi weşano ewilên o muhîm. Xebata Toddî eslê xo de tena yew dîyalektê (yan zî hîna raştê ci îdîolektê) Dimilkî ser o ya ke herêma başûr-rojawanê Sêwregi ra ameya kerdene, ancax rind o ke, na dîyalekte hema vajê heman dîyalekte ya ke xebata Mannî de tewr rind ameya qeydkerdene, bi nê hawayî ma rê îmkan dana ke ma bieşkê bivînê na seserre de no ziwan senî aver şiyo.

Na dessera peyêne de Ewropaya Rojawanî de hûmara weşananê Dimilkî de vêşîbîyayîşêko tedrîcî virazîya, temamê înan zî balkêş bîyî, ez ney ra zî bawer a ke înan ra çend heban mi nêeşka bala xo bidî. Ney ra zî guman çin o ke, rixmê na raştî, Dimilkî rayîrê ziwano edebî bîyayîşî ser o ya. Di weşanê muhîmî (labelê hetê polîtîkî ra reqîbê yewbînan), ke her di zî Swêd de vejîyayî, nê wextanê peyênan de vejîyayî werte. Nînan ra o yo tewr xurt tîya ra hîrê serrî verî 1988 de kitabêko 200 rîpelî yo ke Uppsala de amebi weşanayene û arêdayîşêkê estanikanê folklorî bi, heman wextî de o zî dîyalektê Sêwregi de bi. Arêdayox û sereraştkerdoxê ci bi mexlesê Koyo Berz‘ (High mountain) nûseno. Ey kitabê xo sey *Na Xumxum a*[3] name kerdo, ey no namekerdiş goreyê estanikêka tewr derge ya zereyê ci kerdo, ke biteqrîbî manaya ci , no hewna çîyêko qijkek o‘ ya ... beno ke no ramojneno wextêko nêzdî de do hîna zafê ci binûsîyê.  Muhîmîya nê kitabî bi serreyê xo reyêk de eşkera ya. Gama kes na xebate 3.700 yan zî nêzdîyê na hûmare çekuyanê ke Oskar Mannî de ravêrenê dir, ke materyalê Mannî yê Sêwregi de ca dîyayo înan, û înanê ke 2.200 çekuyî hetê Toddî ra ameyî weşanayene dir bido têver - pêro pîya kenê 6.000 çekuyan ra kemêr — nê arêdayîşî de, ke hetê kesêk o ke no ziwanê maya ci yo ra bipêameyî nûsîyayo, hema hema vajê bi raştnûştişêko fonemîk o mukemel nûsîyayo, ey de nêzdîyê 50.000 çekuyî estê. Na yewe ra derheqê dîyalektê Sêwregi de înanê verênan ra vêşêr hayîdarîyan dano.

Serçimeyo bîn o ke ez wazena bîyarî ziwan kovarêk a, a zî Swêd de weşanîyaya, ke bi sernameyê *Ayre* (The mill) dest bi weşanî kerdo û 1988 de bîya *Pîya* (Together). Seredîtorê ci Ebubekir Pamukçu[4] bi, welatperwerêko Dimilî, ke rîpelê ci nûşteyanê dîyalektanê cîyayan rê akerde bîyî, labelê ey tewr zaf seba ya Çermûge[5] cehd kerd, ke no ca nêzdîyê 50 km Vakûrê Rojhilatî yê Sêwregi de yo. Na yewe ra reya ewilên a ke ma dest de kulîyatêkê tekstan o muhîm ê nê dîyalektî est o, ke tena hetêk ra Sêwregi ra dûr o. Çermûge dîyalektê-S ya bingeyên a, mesela, tede vengê frîkatîvî yê bêvengî yî asmênê fekkîyî tadîyenê bi venganê didankîyan, ke no zî eksê dîyalektê-Ş yê Sêwregi de yo.

---

[2] Terry Lynn Todd: A Grammar of Dimili (also known as Zaza). Ph.D. University of Michigan, 1985. Tîya ra tepîya bi rîpel ameyê neqilkerdene yan zî bi tekstanê hûmare û paragrafî.

[3] Koyo Berz, arêkerdox: Na xumxum a ... Weşanên Jina Nu 13 Uppsala 1988. Sey Siv. ameyo neqilkerdene.

[4] Ebubekir Pamukçu, tarîxê mergê ci 18/7/1991.

[5] Sey „Çer." yeno neqilkerdene.

| Siv. | Çer. | |
|---|---|---|
| *šaw* | *saw* | ‘night’ |
| *šimā* | *simā* | ‘you’ |
| *mašk* | *mask* | ‘skin bag’ |
| *žaw, žū* | *zaw, zū* | ‘one (m./f.)’ |
| *lāǰ* (Mann), *lāž* | *lāz* | ‘son’ |

Pîya bi nê yewî, tekstî de nisbetêko muhîm ê têmîyankerdişê dîyalektan yan zî bêserûberîyî estê. Her di serçimeyî zî, bitesadufî, seba nûştişê Dimilkî modîfîkasyonanê alfabeya Tirkî ke tayê cîya yê şuxulnenê, labelê no seba ke hemeyê fonemanê ziwanî yewbînan ra cîyakerdiş de serkewte nêyo û seba nûştişê herfanê sey c, ç, j, ş beno sebebê heştêroginayîşî, mi hemeyê nimûneyanê xo de herfê xo tadayî bi transkrîpsîyonê Îranîstîkî yê standardî. Seke nimûneyanê kilmekan yê cêrênan de zî aseno, cîyatîya bingeyêne ya mabênê di şemayan ramotişê i yê derg û kilmekî de xo ramojneno:

Sêw. Padîşah, ez o to ana nezdîdê cennetî. Wexto ki ez to rê çiçî vana ti jî ey biki!
Çer. Padişah, ez o to ana nezdidê cenneti. Wexto kı ez to rê çıçi vana tı zi ey bıkı!
Pādīšāh, az ō tō ānā nazdīdē ǰannatī. Waxtō ki az tō-rē čičī vānā ti žī ay biki!

Kitabo hîrêyin ke ganî ez behsê ci bikerî yê pawitoxêkê namdarî yê Zazakî yo ke mexlesê Malmîsanijî bikar ano, no Zazaca-Turkçe Sozluk (Ferhengê Dımılki-Tırki)[6] o ke 1987 de ameyo weşanayene. Her çend tede formê Pîran, Sêwregi û Çewlîgî estê, no berhem tekane berhem o ke ma pê bieşkê çekuyanê ke nênê zanayene açarnê. Çîyo ke kes ewilî tîya de ferq bikero no yo ke tayê formê ke hetê Mannî ra ameyê qeydkerdene, nê wextî de bîyê vinî yan zî şuxulnayîşê înan qedîyayo. Nê yê peyênî dir gama bêro têvernayene ê yê tewr eşkerayî:

1. Formê makîyî yê îzafeyî -ay, -day ke tekstanê Mannî de sey -a, -da vûrîyaye ameyê dayene, ke tekstanê modernan de qe nêasenê; û
2. Sûfîkso nedîyar (indefinite suffix) ê -ê(n) yo ke hemeyê tekstanê modernan de tay-zaf aseno, zafane zî bi formê temamî yê zinckîyî (nasal).

Têvernayîş Mann III, 1 merdimên *ju way-ên-day xo bena ‘a man, there is one sister of (his) own’ (yanî ‘merdimêk wayîrê wayêk o’)
Çer. ju wây-êdâ nînâ esta ‘they have a sister’
Mann III, 6 şino dewday xu – Sêw. şino dewda xo – Çer. sino dewda xo ‘He goes to his village’

[6] Malmîsanij: Zazaca-Türkçe sözlük - Ferhengê Dımılki-Tırki. Jina Nû. Uppsala 1987.

Toddî (69) rew ra ferq kerdo ke zemîrê şexsê 3yin ê zayendî yê anaforîkî yê bi „cey“ (nerî, yewhûmar), cay (makî, yewhûmar) ameyê caverdayene bi oblîkê pêroyî yê „ci“yî.

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Têvernayîş | Mann III, 10 | wayay cey | : | Çer. | waya ci | ‘his sister’ |
| | Mann III, 12 | birayê cay | : | Sêw. | birayê ci | ‘her brother’ |

Formê ci yê sifetkîyî ke teqabulê ci keno bitemamî ameyo caverdayene. Bi mi, cîyatîyêka bîne ya mabênê materyalê Mannî û tekstanê modernan de xapxapok o. Mannî hemeyê dîyalektanê xo de kokê îndîkatîvî yê mewcûdî sey -(a)nn- qedênayê, yanî bi di „n“ yan: "kenno", "şinno" ûsn. Tena gama ke yewna biveng yan zî dîftongêk verê ci ameyo ey yew „n“ şuxulnayo, sey "dano", "kewno", "gêno" ûsn. Labelê tekstanê modernan de tu nîşanêkê na cîyatîye çin o; No, ne çend rîpelanê çimdarîkerdoxan ê Albert von Le Coqî ke sereyê seserre de Şam de bi fekê Çermûge[7] nûsîyaybîyî de qeydkerde yo, ne zî materyalê Peter Lerchî ke pancas serrî verê ey kampêka esîranê şerî yê Rûsî yê Roslavlî de amade kerdibi de qeydkerde yo.[8] Bi vatişêna, îhtîmalêko pîl nûştişê di „n“ yê Mannî formanê raştekînan ra vêşêr refleksê ey yê ortografîya (sîstemê nûştişî) Almane yo.

Toddî zî tewangê nomînalî yê Dimilkî bixulasayî îzeh kerdo: (49) “Dimilkî de di halê serekeyî yê formalî estê ke fonksîyonanê sentaktîk û semantaîkanê cîyayan bica anê. Halo nenîşankerde yo morfolojîk raşteraşt o. Halo nîşankerde yo morfolojîk oblîk o. Kîşta nê de di halî estê ke ge-ge tayê nameyan de yewbînan ra yenê cîyakerdene, yê bicakerdoxî (locative) û yê vengkerdoxî (vocative). Formê oblîkî tena gama ke name xusûsî yo formanê raşteraştan ra benê cîya. Û ney ra wetêr (53); „Tayê termê nizdbîyayîşî îstîsna yê ke ê bi îlawekerdişê /-r/ yî bê ke zayendê ci muhîm bo, ê halê raşteraştî ra halê oblîkî virazenê.“ O na tabloya têvernayîşê xusûsîyetanê lînguîstîkan dano:

(Todd, 54) XulasayaTewanganê Halî

[Todd, 54] Summary of Case inflections

| | Masculine | Feminine | Plural |
|---|---|---|---|
| Direct | 0 | 0 | -ī |
| Oblique | -ī | (-ar) | -'ān |
| Kinship Obl. | -r | -r | -'rān |
| Locative | 0 | -i | 0 |

[7] A. v. Le Coq, ges. und hrsg.: Kurdische Texte. Berlin 1903. 2 vols.

[8] Peter LERCH: Forschungen über die Kurden und die iranischen Nordchaldäer. St. Petersburg 1857. Lerchî hemeyê yew ‚n‘yan ê îndîkatîvanê demanê nikayênan de vîrgulêka qelebnayîye şuxulnaya. Goreyê alfabeya standarde ya Lepsiusî ke ê şuxulnaya, no ganî bêro manaya vindarnayîşêkê glotalî yê, labelê meqsedê ê bi şuxulnayîşê ê ra çi bîyo bewlî nêyo. Her halûkarî de, materyalê ê de di rey pêser o şuxulnayîşê venganê bêvengan çin o û kes ecêb maneno senî merdimêk ke ziwanê ci yê maye Rûskî bo ke tede partîsîpê demê vîyarteyî binîzamî sey -annyj‘î bo,û cotê n‘yî yê biawazî îhmal bikero.

Eslê „-ar“ ê makî yê yewhûmarî yê oblîkî yê peynîameyoxî xeylî şefaf o. Tu eleqeyê ney bi „ra“ yê Fariskî çin o ke Zazakî de sey edatê „rê“ ca gêno û yeno manaya 'ver bi çîyêk‘. Çar çekuyê nizdbîyayîşî yê „ma“, „pî“, „bira“ û „wa“ wayîrê formanê cîyayan ê sey „mar“, „pêr“, „birar“ û „war“î yê, no Fariskîya Mîyanêne de zî est o û çend dîyalektanê Fariskîya moderne de zî esto, mesela Tatkîya Rojhilatî.[9] Nê çar çekuyan ra peynîameyoxo „-er“ sere de bi cinî / cinîyer, cinêr (Todd cenî / cenêr) û keyna / keyner şekil gêno. Dima, seba ke nê her di neologîzmî makî bîyî, netîce de bimecbûrî hemeyê nameyanê makîyan rê ameyo dewirkerdene.

Todd heman wextî de keso ewilên bi ke bimirdî şuxulnayîşê morfemanê îzafeyî yê cîyayan îzeh kerdibi, bixusûsî êyê ke bi -d-‘yê destpêkî yê, ke no tena dîyalektanê başûrî yê Dimilkî de qewimîyeno, sey nimûneyê Sêwregi, Çêrmûge û Pîran (Dîcle) de. (61) „Dimilkî de morfemê îzafeyî goreyê zayendî û hûmara nameyî yê ke pêwa girêdayeyê, vûrênê û hîrê tewirê înan estê: destkrîptîv (teswîrkerdox), cenîtîv û subordînat ... Îzafeyo teswîrkerdox, nameyî bi sifeto ke dimayê ci ra yeno wa girê dano. Îzafeyo cenîtîv têkilîya cenîtîve de nameyî bi name yan zî zemîro ke dimayê ci ra yeno wa girê dano. Îzafeyo teswîrkerdox gama hemeyê perçeyê cumleyî hetê awanîyêka (structure) teberkîye ra bêro wesifnayene, formanê xusûsîyan de yeno şuxulnayene, yan seba îzafeyanê teswîrkerdoxan yan zî yê cenîtîvan“.[10] Ey dima ferq kerd ke (143) „Nameyo ke artîkelo nedîyar */-ên/ tede ameyo şuxulnayene, timî formanê îzafeyî yê pêwagirêdayeyan gêno.”

(Todd, 61) Morfemê Îzafeyî

[Todd, 61] Ezafe morphemes

| | Descriptive | Genitive | Subordinated |
|---|---|---|---|
| Masculine | | | |
| cons. stem | *-ō* | *-ē* | *-dē* |
| vowel stem | *-yō* | *-y* | *-dē* |
| Feminine | | | |
| cons. stem | *-ā* | *-ā* | *-dā* |
| vowel stem | *-yā* | *-y(ā)* | *-dā* |
| Plural | | | |
| cons. stem | *-ē* | *-ē* | *-dē* |
| vowel stem | *-y* | *-y* | *-dē* |

Bi hawayêko ecêb, ey tabloyê xo de ca nêdayo pêwagirêdaye yan zî wesifnayeyê formê teswîrkerdoxî yê nerî yê yewhûmarî ‚-do‘yî (61), her çend ê di nimûneyê ey dayê zî, înan ra yew rîpelo verên de yo:

[9] Hetê E. Y. Arshaterî ra ameyo îzehkerdene: A grammar of Southern Tati dialects. The Hague 1969, 86

[10] Îtalîkê mi.

(60) o merdim merdim-ên-do rind o ‘that man is a good man’
(143) o îsot îsot-ên-do tûn o ‘that pepper is a hot one’

Netîce de o viraştişê cîyatîya mabênê formanê deskrîptîvanê pêwagirêdayeyan (yan zî „atrîbutîvan, ke ez tercîh kena înan wina name bikerî) û yê cenîtîvanê pêwagirêdayeyan de nêserkewte beno. Biraştî o nuqteyêk de hende aver şino ke cîyatî înkar keno, bi nûştişê (142) „Na yewe ra îzafeyê pêwagirêdayeyî de mabênê deskrîptîv û cenîtîvî de cîyatî çin a.“ Bi nê hawayî, ey çende tewirî virazîyayîşê muhtemelanê bînan yê formanê pêwagirêdayeyan nêkerdê hesabî mîyan. Biraştî, materyalo newe yo ke Sêwregi û Çermûge ra ameyo arêdayene, ke heta nisbetêk malûmatê ci yê Toddî ra cîya yê, derheqê kombînasyonanê cîyayan ê formanê cîyayan ê oblîk û îzafeyan de resimêko hîna bidetay û hîra dano. Çîyo ke ez wazena zelal bikerî no yo. Sere de çend nimûneyî do cîyatîya tetbîqkerdişê mabênê objeyanê raşteraştan ê nedîyar yan zî dîyaran (yan zî „xusûsîyan“) ramojnê.

Nedîyar (nexusûsî):

| | |
|---|---|
| Nerî | Çer. Miletê xo rê bol zûlim keno ‘He makes much tyranny to his own people’ |
| Zafhûmar | Sêw. çend altûnî dano 'eskerî rê 'He gives some gold (altûn) to the soldier’ |

Dîyar (xusûsî):

| | | |
|---|---|---|
| Nerî | Çer. | padîşa zî lazekî gêno ‘The king also takes the boy (lazek)’ |
| | Sêw. | çiwî xo-rê gêno ‚He takes the stick (çiwa) for himself’ |
| Makî | Todd 12,2 | nê a mîrçikeri tepişenê ‚They catch that bird (mirîçik)’ |
| | Çer. | bewraner gêno ‚He seizes the dove (bewran)’ |
| | Sêw. | meseleri ... ci-rê vano ‚He tells him the story (mesel)’ |

Labelê heman wextî de bê -er‘î:

| | | |
|---|---|---|
| | Sêw. | lajek mirîçiki dano înan dest ‘The boy gives the bird into their hands’ |
| | Sêw. | dûrî-ra çadiri çim keno ‘From afar he eyes the tent’ |
| Zafhûmar | Sêw. | ê birakosan teqîb keno ‚He follows those trickster-brothers (birakose)‘ |
| | Çer. | kam nê şertan bîyaro ca-se ‚Whoever may fulfil these conditions’ |

Nê yê ke cêr de yê nimûneyê formanê îzafeyanê sadeyan ê:

| | | |
|---|---|---|
| Nerî | Sêw. | tay girweyê mi esto ‚There is a little business of mine’ |
| | Mann 230 | girweyo ki kesî nêdî ‚The thing which nobody saw ...’ |
| | Çer. | ez birayê toyo qiz ‚I (am) your small brother’ |
| | Çer. | şertê mayo hîrin ‚Our third condition’ |
| Makî | Çer. | waya ma ‚Our sister’ |
| | Sêw. | keyneka zey to xaseki ‚A girl as pretty as you (like you pretty)’ |

Nînan formanê pêwagirêdayeyanê ke sûfîksê nedîyarî ra dima virazênê dir bidê têver:

| | | |
|---|---|---|
| Nerî | Sêw. | jew laj-ê-dê jî beno ‚There is one son of her’ |

Sêw. lajek-ê-do bol xasek bî ‚It was a very handsome youth'
Mann 169 ti merdim-ên-do xînt î ‚You are a madman'
Makî Çer. zu wa-yê-da nîna esta ‚There is one sister of them'
Todd 12,1 gem-ên-da bê-kes a ‚It is an uninhabited wilderness'
Sêw. erdîş-ê-da sipe keno xo-ya ‚He puts on a white beard'
Sêw. devan-rê faq-ê-da weşi ro-nanê ‚They set a fine trap for the camels'
Zafhûmar Sêw. hendê bar-ê-dê herî kolî arê-kena ‚She gathers some ass-loads of kindling'

Na „nedîyarî“, bitesadufî, teqabulê „yew“ ê hûmarkîyî ke sey zemîr yeno şuxulnayene zî kena:

Sêw. jewdê ci vano ... ‚One of them says'

Zafhûmar de qey cenîtîvê sadeyî no est o:

Zafhûmar. Mann 192 nê postalê min teng î ‚These my shoes (postal n.) are tight'
Toddd 63 say min ‚my apples (sa m.)'

Sifetêk ke nameyêkê zafhûmarî wesifneno ci rê peynîameyoxo zafhûmar yeno ke cayê ci hetê îzafeyê (atrîbutîvî) ra yeno vûrnayene:

Todd 62 gilê dergî ‚long branches (gil n.)'
Todd 62 tûyê şîrinî ‚sweet mulberries (tû m.)'
Sêw. qeçekê werdî arwêşî-ra tersenê ‚Small children are afraid of rabbits'
Sêw. nê mizirayê bînî ‚these other harmfulnesses'

hetta gama ke o hetê ci ra bi perçeyêkê cumleyî yê cenîtîvî yeno cêrakerdene zî:

Todd 5,2 lingê (istorda ciyê) verînî ‚The forelegs (of his mare)'

Key îzafeyêko cenîtîv objeyêkê raşteraşt ê dîyarî de qewimîyeno, o nerîyî de cayê morfemê oblîkî gêno, her çend cenîtîvo ke dima yeno hetê formê ey yê oblîkî ra bêro îşaretkerdene zî:

Nerî Sêw. ganê to bigîra ‚that I may take your life'
Sêw. çiwayê xo gêno ‚He takes his stick'
Çer. nê wezîrê xo tim dîqet keno ‚He always watches this his vizier'
Çer. çînay siwanî dano xo-ra ‚He puts on the shepherd's clothing'

hetta bi nameyanê merdimatî (nêzdbîyayîşî)
Sêw. birayê xo berê wija ‚Take your borther there'
Sêw. lajek pîyê xo bivîno ‚that the boy should see his father'

Hetêna ra, makîyan û zafhûmaran de o morfemê oblîkî ra dima yeno:

| | | |
|---|---|---|
| Makî | Sêw. | mirîçikera xo gêno ‚He takes his (own) bird’ |
| | Sêw. | e do keynera xo jî bida ey ‚I shall even give him my daughter’ |
| | Mann III, 1 | ez waray xo nêdana bi kesî ‚I do not give my sister to anyone’ |
| | Çer. | şima wara xo danê ... . ‘You give your sister to ...’ |
| Zafhûmar | Sêw., Çer. | altûnanê xo gêno ‚He takes his gold‘ |
| | Çer. | şertanê xo vazê ‚Say your conditions’ |

Exlebê nimûneyanê îzafeyê atrîbutîvî yê ke objeyê raşteraştî de virazênê nedîyar ê:

| | | |
|---|---|---|
| Nerî | Sêw. | porê xo boyayo sipe keno ‚He puts white colour on his hair’ |

Ser de zî, ê zafane sûfîksê -ê(n)’î ra dima yenê, bi heman hawayî formê pêwagirêdayeyî virazênê:

| | | |
|---|---|---|
| Nerî | Sêw. | Sûk-di ban-ê-do weş herîneno ‚He buys a fine house in (Siverek) town’ |
| Makî | Sêw. | aw-ê-da vengi birijna ‚that I pour an empty water’ (yanî ‚xo rehet kerî’) |

Bixozayî tu morfemêkê oblîkî nê nimûneyan de nêvirazêno. Hetêna ra, key obje dîyar o formêko diyin ê îzafeyêkê atrîbutîvî yê cîyayî nerî de virazêno, bi ‚o‘ nê labelê bi ‚ê‘yî. Bi vatişêna, o îzafeyê cenîtîvî dir beno mutabiq û sifeto atrîbutîv peynîameyoxê halê oblîkî yê ‚-î‘yî gêno.

| | | |
|---|---|---|
| Nerî | Sêw. | sereyê bînî jî kena xo dest ‚And the other end she puts her own hand‘ |
| | Çer. | o ewza ê lazekê bînî vîneno ‚There he sees that other boy‘ |

Nê heme nimûneyanê corênan ra eşkera yo ke „pêwagirêdayebîyayîş“, yan zî „wesifnayebîyayîş“ bi „oblîkîye“ dir hemmana nêyê. Hetta agentê (kerdoxo gramatîk ê karan) oblîkî de, awanîya ergatîve de, formê sadeyî yê îzafeyî yenê şuxulnayene.

| | | |
|---|---|---|
| Nerî | Mann I, 14 | pêrê lacekî ... va ‚The boy‘s father said ....‘ |
| | Mann II, 8 | mêrdey cinêker va ... ‚The husman of the woman said ...‘ |
| | Sêw. | lajê mi deveyê ard, ci-kerd ‚My son brought a camel, cut (its throat)‘ |
| Makî | Mann II, 6 | cinêray mêrdekî dî ki ... ‚The wife of the man saw that ...‘ |

Xêrcê sûfîksê nedîyarî ra dima, formê îzafeyî yê pêwagirêdayeyî tena gama ke frazê (phrase) nameyî bi xusûsîyetê hetê manaya termkîye ra formanê cenîtîv, datîv yan zî bicakerdoxî de bê û yan zî hetê edatêk yan zî çekuya ke têkilîya nameyî yan zî zemîrî çekuyanê bînan ê cumle dir ramojnena ra bêro îdarekerdene, yenê şuxulnayene, ke şuxulnayîşê nê yê peyênî hîna vila yo. Nê halan de formê îzafeyê pêwagirêdayeyî hem yewhûmarê nerî û hem zî yê makî de cayê morfemanê oblîkan vurnenê, xêrcê şeş nameyanê

merdimatî, ke formanê r-oblîkî de xo ramojnenê. Hetêna ra, halê zafhûmarî de ê morfemê oblîkî yê ‚-an'î gênê.

Cenîtîv + cenîtîv:

Nerî Sêw. padîşayê welatdê lajekî ‚The king of the country of the boy'
Çer. cinîya brardê to ya ‚She is your brother's wife'
Makî Sêw. wextê qeçek-ardenda keynarda padîşay ‚The time of giving birth (child-bringing) of the daughter of the king'

Zafhûmar Todd 10, 5 goştê dindanandê ey pêro rişyeno ‚The flesh of his teeth all wastes away'

Datîv (bicakerdox) + cenîtîv:

Nerî Mann 49 ti keynera xo lacdê min nêdanê ‚Won't you give your daughter to my son?'
Mann III, 15 o rûan ver-a-da fekdê lacekî ‚He poured that fat into the boy's mouth'
Çer. veyn dano serwezîrdê xo ‚He calls (to) his chief vizier'
Makî Todd 5, 1 Nemrut nişeno istorda xu ‚Nimrod mounts (sits on) his mare'
Sêw. kewno rayda xo ‚He sets out (falls) on his way'
Sêw. şino sûkda Dîyarbekirî ‚He goes to the town of Diarbekir' Zafhûmar
Zafhûmar Sêw. dano embazandê xo ‚He gives it to his companions'
Çer. nê nisenê istorandê xo wû sinê ‚They mount their horses and go'

Edat/çekuya ke têkilîya nameyî yan zî zemîrî çekuyanê bînan ê cumle dir ramojnena + cenîtîv:

Nerî Mann I, 14 pêrê lacekî laj(!)dê xo-rê va ... .. ‚The boy's father said to his son ...' ..
Sêw. rojê lajdê xo-rê vana ... ‚One day she says to her son ...'
Çer. gandê ci-ya pûrtî vizyena ‚On his body feathers emerge'
Sêw. birardê ci-ra veng-o nêvijêno ‚From their brother no sound is emerging'
Çer. ti dê herunda pêrdê xo-di ro-şê ‚You will sit in the place of your father'
Makî Mann II, 12 dewên rayday ey sero bî ‚There was a village on his way'
Mann III, 11 warday xo-rê va ... ‚He said to his sister ...'
Çer. warda xo-rê vanê ... ‚They say to their sister ...'
Çer. gûnîda a bewran-di miloqneno ‚He *steeps it in the blood of that pigeon'
Sêw. beno zey keynekta pancês-sera ‚He becomes like a girl of 15 years'

Zafhûmar Sêw. mi ... çimandê xo-ya nêdî ‚I did not see (them) with my own eyes'

Nadiren îzafeyo pêwagirêdaye cayo ke ci ra yeno pawitene bêro şuxulnayene de nêno şuxulnayene, nimûne:

Makî Sêw. namey keyneka begî Xezal beno ‚The name of the Beg's daughter is Khezal'
Sêw. şitê cinîya begî çinêbeno ‚Milk of the Beg's wife, there is none'

Seke ma rewra dî, formê îzafeyî yê atrîbutîvî yê pêwagirêdayeyî zafê reyan sûfîksê -ê(n) ê nedîyarî ra dima virazênê, labelê gama wina nêbo nê formî zafane frazanê nameyanê ke hetê prepozîsyonan ra yenê îdarekerdene de, ca gênê. Xêrcê halê zafhûmarî de sifet tu morfemê oblîkî nêgêno.

Edat/çekuya ke têkilîya nameyî yan zî zemîrî çekuyanê bînan ê cumle dir ramojnena + atrîbute:

Nerî Sêw. o koşedo bîn-di vindarneno ‚He sets it up in that other corner'
Sêw. vengdo qalin-a vano ... 'With a deep voice he says ...'
Sêw. cado germ-di ‚In a hot place'
Makî Todd 12, 4 şina darda wişkî sero ‚It goes on top of the dry tree'
Zafhûmar. Sêw. jew leyr zey leyrandê bînan nîyo 'One cub is not like the other cubs'

Labelê bê formê pêwagirêdayeyî:

Nerî Sêw. herkesî meydanê gird-di arê-ki pê ser 'Gather everybody in the great square'
Makî Sêw. a kişta bîn-di ci-keno 'On that other side he takes it off (her çend beno ke no xo de *a kişta bîn-di bihewêno zî)'

(A) gama atrîbut cenitîv de nameyêk wesifneno mesela hîna zaf bena komplîkeye, seke 'the old man's house' (keyeyê merdimê extîyarî) de, yan zî (b) gama cenitîv yan atrîbutêk halê oblîkî de yenê têver, nimûne 'in the man's old house' (keyeyê kanî yê merdimî de). Todd bi formanê îzafeyanê pêwagirêdayeyan hîrê nimûneyanê beşê ewilênî dano ke înan de pîya bi -dê yê îdentîkî yê nerî yê yewhûmarî cenitîvo pêwagirêdaye yo cewabdayox est o:

Nerî Todd 142 aqilê merdimdê pîlî 'the wisdom of older people'
Makî Todd 142 boya vilikda sûri 'the fragrance of the red flower'
Zafhûmar Todd 143 boya vilikandê sûran 'the fragrance of the red flowers'

Pîya bi nê yewî, tekstê Sêwregi bi heman formanê -ê , -y yê atrîbutîvan nimûneyanê nerîyan pêşkêş kenê, ke ma ê xora objeyanê raşteraştan ê dîyaran de dîbî, labelê sey îzafeyê pêwagirêdayeyî:

Nerî Sêw. welatê padîşayê bînî yo ‘It is the country of the other king’

Sêw. namey biray girdî N. beno ‘The name of the elder (big) brother is N.’

Tena sûfîksê nedîyarî yê -ê(n)‘î yo cêrên beno sebeb ke formê -dê virazîyo:

Sêw. raştê merdim-ê-dê xerîbî yena ‘(The tribe) comes face to face with a strange man

Halê makî de, rixmê nê de, ma pêwagirêdayeyêkê cenitîvî ra dima formê -da‘yî vînenê:

Makî Sêw. meydandê camîda sîya ver-ra ‘across the Square of the Black Mosque’

Seba beşê dîyinî o Mann o ke nimûneyêkê îzafeyê atrîbutîvî yê pêwagirêdaye yê -dê‘yî dano:

Nerî Mann III, 3 bi birardê madê pîlî di ‘Give her to our elder brother’

Hetêna ra, tekstanê Sêwregi û Çêrmûge de, îzafeyo atrîbutîv û pêwagirêdaye her di zayendan de û halê zafhûmarî de bê qewimîyayîşê -d-‘yî virazêno, bê ke hesabîmîyankerdişê fonksîyonî. Na yewe ra sey objeyê raşteraştî,

Nerî Çer. nê brayê xoyê qizî rişenê ‘They send their young brother’

halê datîvî de,

Sêw. veyn dana lajdê xoyê girdî. ‘She calls (to) her eldest son’

key hetê edatêk ra bêro îdarekerdene,

Makî Sêw. bê tasda doya vengi ‘except for the empty bowl of buttermilk’

yan zî çekuya ke têkilîya nameyî yan zî zemîrî çekuyanê bînan ê cumle dir ramojnena,

Zafhûmar Çer. may û pêrdê xoyê bînan het ‘to his other (step-)parents’

Pêroyê nê tewirî yew tabloyê basîtî ser o ramotiş mumkun nêyo. Herinda ney de ez yewa kompozîte teklîf kena, ke tede hemeyê formê modernî yê Toddî, Sêwregi û yê Çêrmûgî estê, no zî ma mecbûr keno ke nê tewirî bidetay bêrê îzehkerdene.

| Ezafe forms | Plain | | | Dependent | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | Attributive | | Genitive | Attributive | | Genitive |
| | 1$^{ary}$ | 2$^{ary}$ | | 1$^{ary}$ | 2$^{ary}$ | |
| **Masculine** | | | | | | |
| cons. stem | -ō | -ē | -ē | -dō | -dē ~ -ē | -dē |
| vowel stem | -yō | -yē, -y | -yē, -y | -dō | -dē ~ -y(ē) | -dē |

| Ezafe forms | Plain | | | Dependent | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | Attributive | | Genitive | Attributive | | Genitive |
| | 1$^{ary}$ | 2$^{ary}$ | | 1$^{ary}$ | 2$^{ary}$ | |
| **Feminine** | | | | | | |
| cons. stem | -ā | | -ā | -dā | -dā ~ -ā | -dā |
| vowel stem | -yā | | -yā, -y | -dā | -dā ~ -yā | -dā |
| **Plural** | | | | | | |
| cons. stem | -ē | | -ē | -dē | -dē ~ -ē | -dē |
| vowel stem | -yē, -y | | -yē, -y | -dē | -dē ~ -y(ē) | -dē |

Qey bingeyê nê elementanê cîyayan, formanê sadeyan de no zelal o, -ê‘yo nerî yo cenitîv, -a‘yo makî û -ê‘yo zafhûmar, seypêyê formanê îzafeyî yê Kurmanckîya cîrane yê, dîyalektanê vakûran ê Kurdkî, nê bi hawayêko zaf eşkera zemîrê têkildarîye yê Îrankîya kane ra ameyê, nerî *yeh, makî ya, zafhûmar *yaî.[11] Hetêna ra, formê atrîbutîvî o, a, ê hewna zî eşkenê zemîrê nîşanî yê dûrîyî de zî bêrê dîyene û bêguman eslê înan bidorkî *hau, ha, *haî yê zemîrê nîşanî yê kanî ra yenê. No balkêş o ke ganî kes bîyaro ziwan, Gorankî de bitemamî beşkerdişêko eksî yê fonksîyonan virazîyayo: ê de o yo ke îhtîmalêko pîl kokê nîşanî ra yeno -û‘yê îzafeyê cenitîvî yo (ke bi yewna fonksîyonî nê ziwanî de nêno şuxulnayene) û -ê‘yê atrîbutîvî yo ke relatîvê kanî ra yeno. Heman wextî de no zî balkêş o û ma ravêrtiş de bîyarê ziwan ke Dimilkî de heman zemîrê nîşanî, yê nerî o, yê makî a, xo sey kopulaya ‚is‘ (ê îngilîzkî) awan kerdo. Ma heman fenomenî çende ziwananê cîyayan ê Iranîyan de vînenê, nimûne Sogdkîya Bûdîstan de, ke tede *xo* > *hau ge-ge hem sey nîşanî (demonstrative) yan zî artîkelî xo awan keno û hem zî sey kopula, û heta nuqteyêk Osetkî de zî no wina yo:

**uy** mexœy nel **u** ‘He is no longer one of us’

[11] Seba formê makî yê -ay‘î hetê Mannî ra îzehetêk ameyo dayene, ez tersena ke ez do nêeşkî bidî.

û bi kokêkê pronomînalê cîyayî, Peştûkî de:

**dey** zma wror **dey** ‘He is my brother’
**da** sta xor **de** ‘This is your sister’

Pîya bi nê yewî, Dimilkî cumleyanê winakîyan de wayîrê nê qeydeyan a

***o** lajeko bîn **o** ’That / He is the other boy’
***a** dewa gird **a** ‚That is the big village’

ke nînan de demonstratîv (nîşankerdox) fonksîyonanê cîyayan de xo ramojneno.

Problem îzehkerdişê formanê d- yan ê Dimilkî yo. Tu ziwananê qedîman ê Îranîyan de -t- yo ke tede ca bigêro, xo pêşkêş bikero çin o. No çî hema hema nemumkun o, mesela, partîkelê wayîrbîyayîşî yê da (‚of‘ ê îngilîzkî) yê Peştûkî, ganî tîya xo ramojno ke Morgenstierne no çî formêkê proklîtîk ê tar‘î ra“ vetibi meydan. Seba ke nê formî hemeyê dîyalektanê Dimilkî de çin ê labelê tena înan ê ke başûr de yê, înan de estê, ez agêrena teorîya xo ser ke vana d- partîkelê cenitîvî yê d?? Yê dîyalektanê Aramkîyan ê Tûr Abîdînî ra kewto nê ziwanî. Mi tim na îdîa de israr kerd ke heman partîkel bi rayîrê yewna fonksîyonî kewto dîyalektanê Kurdkîya Kurmanckîya-rojhilatî ya Badînan, Çolemêrg, ûsn., yanî bi rayîrê cîyabîyayîşê îzafeyê -ê di > -êd, -êt ke -ê‘yê nerî yê yewhûmarî ra yeno. Pîya bi nê yewî, tîya xîlafêk çin o. Her di ziwananê Îranîyan wesîteyêkê notralî ra îstîfade kerdo, ke no seba her diyan zî musaîd o, seba sîstemanê xo yê îzafeyî modîfîye bikerê û înan hîna zaf bikerê eşkera, seke hergû halî rê no lazim o ameyo fikirîyayene.

Yewna formê îzafeyî, ke heta nika Dimilkî de[12] nêameyo ferqkerdene, seba ke bêro ziwanardene, paweno. No o yo ke mi formanê dayîşnaskerdişê Kurdkî de[13] sey „îzafeyo nîşankerdox“ (demonstrative ezafe) name kerdibi. Pîya bi nê yewî, Dimilkî de, no hal hîna tay virazêno û nimûneyê ke tekstan de yê xeylî nadir ê. Pîya bi name û zemîran no posesîvan (wayîrbîyayox) virazeno û sifetan rê zî manayêka musteqîle (substantive) dano. Her çend Kurdkî de nê formê xoserî yê îzafeyî zafê reyan bi fonemê sereyênî yê îlaweyî formanê enklîtîkan ra bibê cîya zî (mesela hemverê ‚ê‘ de ‚yê‘ yan zî ‚wê‘) ziwanê Sêwregi de form de enklîtîkan dir bi heman hawayî yê, tena înan ra hetê cayê xo yê xoserî û stresî ra cîya yê. Formê nerîyî û yê zafhûmarî, her di ê‘yî, û hem zî a‘ya makî cenitîvê sadeyî de û îzafeyê atrîbutîvî yê dîyinî de manenê yewbînan.

Bi zemîrêk yan nameyêk:

Nerî Sêw. no lajek bi-xo ê begî nîyo „This boy is not actually the Beg‘s (own son)'

[12] Bêguman, xêrcê, yê Malmîsanijî neql., 113: „ê: (no seba wayîrbîyayîşî yeno şuxulnayene û çekuyanê ke yewbînan dir têkîldar ê ra verî yeno) -nin, -ki”; 416: „yê: zemîro wayîrbîyayox (yê dey: his; yê min o: it is mine)”.
[13] D. N. MacKenzie: Kurdish dialect studies, I. London 1961, §§ 188, 266.

Sêw. wa perê pîyazî ê to bo, no ki 'erdî bin de maneno wa ê mi bo ‚Let the leaf of the onion be yours, that which remains under the earth be mine'

Sêw. ê Şeytanî ... pêro helisêno ‚The Devil's (portion) is all spoilt'
Zafhûmar Mann III, 15 hîris û di dindanî, ê lacekî, rijîay lebdê 'erebî ‚32 teeth, the boy's poured into the Arab's hand'[14]

Bi sifetêk:

Makî Sêw. ti a sîyay nişa ‚If you sit on the black one (sheep)'
Zafhûmar Mann 193 to çirê ê tengî girotî ‚Why did you buy tight ones?'

[14] Seba ke ne Mann û ne zî Hadankî awanîya cumle zanaya, açarnayîşê înan yewbînan ra cîya yo.

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

| Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî<br>Jimar: 7 Mijdar 2022 | International Journal of Kurdiname<br>Issue: 7 November 2022 |
| --- | --- |

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

**BOOK REVIEW / NIRXANDINA PIRTÛKAN**

HOPO

Erebê ŞEMO, Weşanên Lîs, Stenbol, 2007, 264 rûpel, ISBN: 9789756179352

Ebubekir GÖREN[*]

**Article Type:** Book Review // Nirxandina Pirtûkan
**Received // Hatin:** 15.10.2021
**Accepted // Pejirandin:** 05.11.2022
**Published // Weşandin:** 30.11.2022
**Pages // Rûpel:** 199-201

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Gören, Ebubekir (2022). Nirxandina Pirtûkan: Hopo, K*urdiname*, no. 7, p.199-201

## HOPO

Hopo, romana Erebê Şemo ya dawîyê ye. Erebê Şemo, pêşîya Hopo sê romanên bi navê “Şivanê Kurmanca, “Dimdim” û Jîyana Bextewar” nivîsîne. Romana wî ya bi navê “Hopo” ku mijara vê xebatê ye, di sala 1969an de hatîye weşandin. Di sala 1990î de Weşanên Roja Nûyê ew li Stokholmê çap kirîye. Weşanên Lîsê jî di sala 2007an de li Amedê çap kirîye. Çapa Lîsê ji 264 rûpelan pêk tê.[1]

Erebê Şemo, bi çar romanên xwe, yek ji berhemdartirîn romanûsên Kurd e. Taybetîya wî ya sereke ya weke “nivîskarê yekemîn romana Kurdî” wî ji yên din cihê dike. Şemo, bi çar romanên xwe, dîmenên zindî ji serdemên vegotî datîne ber çavên xwendevanan. Di damezrandina “dinyaya romanê” de serkeftî ye. Bi taybetî Dimdim ji vî alî ve berhema wî ya herî li pêş e. Ew, bi awayekî serkeftî bajar-keleyekê, gundên dora wê, jiyana wê herêmê hevok bi hevok xêz dike. Her wiha têkoşîna li hemberî dagirkerîya Farisan jî gelek serkeftî vedibêje. Romana wî ya bi navê Hopo jî ji alîyê teknîka romanê ve serkeftî ye. Lehengên wê baş hatine teswîr kirin. Di vê romanê de, ji her sê romanên din zêdetir dîyalog hene û Şemo ev dîyalog gelek serkeftî di rûpelên romanê de bi cî kirine. Xwendevan carinan xwe weke ku pirtûkekê dixwîne hîs nake, xwe weke ku fîlmekê temaşe dike hîs dike. Şemo, di romana xwe ya bi navê Jiyana Bextewar de cî daye bi sedan bûyeran. Ji ber ku wî, ev roman bi bûyeran fetisandiye, tam û kalîteya wê kêm bûye. Şemo, bi bûyer û serpêhatîyên Jiyana Bextewarê, dikaribû sê romanan binivîse. Wê demê ew neçar jî nedima ku romanê bi bûyeran tije bike. Şivanê Kurmanca, romana wî ya yekemîn e. Ji serî heya binî jîyana koçerî û gundîtîyê dihewîne. Şemo, di vir de gelek taybetmendîyên vê jîyanê dane. Kêmahîya herî berbiçav a vê romanê ew e ku Şemo, hinek peyvên Tirkî bi kar anîne. Wî, paşê ev kêmahîya xwe dîtîye û di sê romanên xwe yên peyrevê Şivanê Kurmanca de dêvla van peyvan peyvên Kurdî bi kar anîne. Bi taybetî

[*] Xwendekarê Doktorayê yê Beşa Ziman û Çanda Kurdî. ebubekirgoren@gmail.com. Orcid ID: 0000-0002-6584-9166

gotina “min dûşûrmîş kir” bi gotina “ez fikirîm” guhertîye. Lê dema ku em bi gelemperî li zimanê Erebê Şemo yê ku di romanên xwe de bi kar anîye binêrîn, em ê Kurmancîyeke serkeftî û paqij bibînin. Şemo, bi Kurmancîyeke zelal û nêzî zimanê gel nivîsîye. Di çêkirina lehengan, hûnandin û bi peywendîkirina bûyeran de jî serkeftî ye.

Erebê Şemo, di Hopo de berovajî her sê romanên xwe yên din, jîyaneke aram vegotîye. Di her sê romanên wî yên pêşîn de şer, pevçûn, şoreş, guherînên mezin, hilweşîn û hwd. hene lê di vê romanê de bûyer kêm in. Dîsa li gorî her sê romanên din, di Hopo de gelek dîyalog cî digirin. Şemo, bi awayekî serkeftî roman bi dîyalogan hûnandîye û tama romanbûna wê gelekî zêde kirîye.

Di her sê romanên pêşîn ên Erebê Şemo de civak her tim di nav jinûveavakirinê de ye. Lê di romana Hopo de rewş cuda ye. Şemo, di romanê de jîyana gundekî Kurdan a di dema sosyalîzmê de vedibêje. Li gund, sîstema kolxozvanîyê hatîye avakirin û gundî bi awayekî serfiraz û jidil di karên gund de dişixulin. Zilma beg, axa û şêxan ji holê rabûye. Jixwe serdema desthilatdarîya wan qedîyaye. Şerên mezin jî yên mîna şerên yekemîn û duyemîn ên cîhanê di paş de mane. Civak, di nav aramî û serfirazîyê de ye. Li gel jiholêrabûna desthiladarîya axa û began û hatina sîstema sosyalîzmê, di nav civakê de xwendin belav bûye. Ciwanên gundên Kurdan diçin bajarên weke Rewan, Moskova û Tiflîsê xwendina bilind diqedînin. Dibin endazyarê çandinîyê û hwd. û vedigerin gundên xwe. Li gundên xwe di xebata kolxozê de dibin rêvebir. Gava ku mirov vê romanê dixwîne, mirov guherîna di nav civakê de bi awayekî berbiçav dibîne. Pergaleke nû ava bûye. Mercên jîyanê hêsan bûne. Gundî bi xwe dikin û bi xwe dixwin. Ji xanîyên bin erdê derketine. Teknîka herî pêşketî di hilberînê de dixebitînin. Zarok tev dixwînin. Ji bo zarokên ku hîna naçin dibistanê bexçeyên zarokan hatine avakirin. Her wisa têkilîyên nav malbatê jî guherîne. Jin xwedî maf û raye ne. Lehenga bi navê Zînê mînaka guherîn û pêşveçûna jinê ye. Ew keçeke sêwî ye, xwendîye û bûye endazyara çandinîyê û ji bo pêşveçûna gelê xwe ji dil û can dixebite. Ev guherîn û pêşketina di nav civakê de ji alîyê hemû nûnerên wê ve nayê pejirandin. Li hemberî van guherînan hinek nerazîbûn jî derdikevin holê. Bo nimûne:

“Ez ku niha li cahilan dinihêrim, dibînim cahilên din in, ne mîna wexta me ne. Kê dikaribû turiş bikira, wekî bûk li kêleka xesîya xwe rûnên, devên xwe vekin, nan û kevçî bibe gebola xwe û tevî wê nên bixwe û bi ser de jî pê re xeber bide. Niha êdî eyb hatîye hildanê û kesek ji kesekî şerm nake. Wekî mezinên me ji gorê rabûna û ev yek bidîtana, wê bi dest xwe re ziravqetî bibûna û dîsa têketana gorê.”

Şemo, di romana Hopo de cî daye gelek edetên Kurdan. Xwestîye ku jîyana wan a civakî bide naskirin. Wî di vê romanê de jîyana civakî bi kîtekît vegotîye. Ji rabûn û rûniştinê bigire heta şîn û şahîyan qala her tiştî kirîye. Roj û edetên giring yek bi yek di berhemê de tomar kirine. Bo nimûne, wiha qala mirina Xwedêda ( Xudêda” lehengekî romana Hopo ye. ) dike: “Li Çelayê, gundê Ermenîya, tabût dabûne çêkirinê. Wextê Xwedêda kirine tabûtê bîst û neh gulîyên ku ji serê jinan hatibûn jêkirin, anîn û danîn ser tabûta wî. Xort ketine bin tabûtê û ber bi gorê çûne.” Yên ku van rêzikan bixwînin wê bizanibin ku “kezîkur, porkur, serê (porê) min meqes û dûzan kirino!” ji bo rewşên çawa tên gotin û çima ev peyv ketine nav zimanê me.

Ji ber ku Kurd li welatên cihê dijîn û asta wan a civakî cihê cihê ye; mirov dibêje qey niha gelek cudahî ketîye navbera wan. Lê bi qasî ku em ji berhemên Erebê Şemo hîn dibin ne wisa ye. Mînakeke din ev e: Dema mêvanek tê malekê, cîran, ji bo ku bizanibin ka kî ye ew mêvan, bi hinceta standina xwê, ar û hwd. diçin wê malê.

Şemo, bi romana Hopo wêneyeke jîyana gundên Kurdan ên li dora Çiyayê Elegezê girtîye. Guherîn û pêşketina di civakê de bi awayekî serkeftî vegotîye. Xwezî û daxwaza wî ya jîyaneke bextewar ji bo wî û gelê wî ku di her sê romanên xwe yên pêşîn de digot, di vê romanê de dibe rastî. Gel digihêje azadî û wekhevîyê ku ew mafên gel ên herî xwezayî ne.

